

BÎNGEHÊN INCÎLÊ

Pirtûka Destan ya Xebatê

**Diyarkirina Hêmînî û Hezkirina
Xirîstiyaniya Rasteqîn**

DUNCAN HEASTER

CARELINKS, PO BOX 152, MENAI NSW 2234
AUSTRALIA

WWW.CARELINKS.NET EMAIL:
INFO@CARELINKS.NET

BÎNGEHÊN INCÎLÊ

Mijar 1: YEZDAN	1
1.1	Hebûna Yezdan
1.2	Kesayeta Yezdan
1.3	Reftar (nîtelîk) û navê Yezdan
1.4	Melaîket
Mijar 2 : YÊN YEZDAN	14
2.1	Giyanê Yezdan: Danasîn
2.2	Sîrûşdan (esînleme)
2.3	Xelatên Giyanê Pîroz
2.4	Paşde Birina Xelatan
2.5	Desthilata Bi Tenê Incîl
Mijar 3 : SOZÊN YEZDAN	40
3.1	Sozên Yezdan: Destpêk
3.2	Soza Li Bexçeyê Bihuştê
3.3	Soza Ku Ji Bo Nuh Hat Dayîn
3.4	Soza Ku Ji Bo Ibrahîm Hat Dayîn
3.5	Soza Ku Ji Bo Dawid Hat dayîn
Mijar 4 : YEZDAN Û MIRIN	66
4.1	Cewherê Însan
4.2	Rewan (can)
4.3	Giyanê Însan
4.4	Mirin jixweçûyîn e
4.5	Vejîn
4.6	Daraz (yargî)
4.7	Cihê Xelatê: Bihuşt an jî Dinya?
4.8	Berpirsyariya Li Hemberî Yezdan
4.9	Dojeh
Mijar 5 : SERDESTIYA YEZDAN	92
5.1	Danasîna Serdestiyê
5.2	Serdestî Niha Nehatiye Avakirin
5.3	Di Dema Derbasbûyî de Serdestiya Yezdan

5.4	Di Pêşerojê de Serdestiya Yezdan	
5.5	Mîlenyum	
Mijar 6 :	YEZDAN Û XERABÎ	108
6.1	Yezdan û Xerabî	
6.2	Şeytan û Iblîs	
6.3	Cin	
Mijar 7:	JÊDERKA ÎSA	123
7.1	Di Derbarê Îsa de Kehanetên Ahîda Kevin	
7.2	Bûyîna Ji Keçekê	
7.3	Li Cem Yezdan Cihê Mesîh	
7.4	“Destpêkê Soz Hebû” (Jn. 1: 1-3)	
Mijar 8 :	KESAYETA ÎSA	138
8.1	Kesayeta Îsa : Destpêk	
8.2	Cudabûnên di Navbera Yezdan û Îsa de	
8.3	Kesayeta Îsa	
8.4	Mirovahiya Îsa	
8.5	Têkiliya di Navbera Yezdan û Îsa de	
Mijar 9: VAFÎZMA BÎ NAVÊ ÎSA		150
9.1	Girîngiya Vaftîzmê	
9.2	Çawa Em Dikarin Vaftîz Bibin?	
9.3	Wateya Vaftîzmê	
9.4	Vaftîzm û Xelasî	
<i>Gotina Navbend: Careke din Vaftîzbûn</i>		
Mijar 10: JIYANA MESÎHÎ		163
10.1	Xebata Incîlê	
10.2	Dua	
10.3	Waaz	
10.4	Jiyana Komelayetî	
10.5	Parvekirina Nan	
10.6	Zewac	
10.7	Hevparî	

Di dawiya her beşî de pirs hene. Bersivên xwe di rûpeleke cuda de binivisînin. Nav û navnîşana xwe bi awayekî ku were xwendin li bin binivisînin.

Hûn dikarin bersivên xwe bişînin navnîşana jêr:
Bible Basics, PO Box 3034 South Croydon
Surrey CR2 0ZA ENGLAND
CARELINKS, PO BOX 152, MENAI NSW 2234
AUSTRALIA
WWW.CARELINKS.NET EMAIL:
INFO@CARELINKS.NET

1.1 HEBÛNA YEZDAN

“Kesên ku nêzikî Yezdan bibin, divê baweriya wan bi hebûna Wî hebe û bizanibin ku Ew, kesên ku li Wî digerin, xelat dike.” (Heb. 11.6). Armanca vê xebatê destpêkê ewe ku “ew, Ew e” bawerî bi yek Yezdanî were û yên ku dixwazin baweriya xwe bi Wî bînin, alîkariya wan bike. Ji ber vê yekê emê têkiliya xwe bi wan delîlan re yên ku piştgiriya baweriya bi hebûna Yezdan dikin, çênekin. Dema ku em çêbûna bedena xwe ya tevlihev û şeweya gulekê di ber çavan re derbas dikin, dema em di şeveke vekirî de berê xwe didin bê dawîtiya uzayê, û dîmenên wiha ku di jiyana me de bi tenikî hatine hûnandin, didin nîşandan ku mirov nikare baweriya xwe bi Ateîzmê bîne. Bawerkirina bi hebûna Yezdan, ji bawerkirina bi hebûna wî bêhtir îmanê dixwaze. Heger Yezdan nebûya wê danasîneke bingehîn ji bo tu nîzam, armanc û gerdûnê jî tune ba û wê yekê bandoreke mezin li ser jiyana yê Ateîst bikra. Dema ku mirov vê taybetiyê dide ber çavên xwe, mirov dibîne ku di nava civakên herî materyalist de jî piraniya însanan heya radeyekê baweriya xwe bi Yezdan tînin û dipejirînin.

Lê belê cudabûneke mezin heye di navbera bawerkirina bi hêzeke nediyar û hêzeke diyar de. Tiştêkî pir cuda ye, dema ku mirov bibêje, hêzeke mezintir heye lê ne diyar e, û pir cuda ye dema ku mirov bizanibe ew çi ye û bi zanebûn baweriya xwe pê bîne. Heb.11:6 (*Ibrani, beş 11, ayeta 16*) vê yekê bi vî awahî tîne ziman:

Lazîme (Em) baweriya xwe pê bînin ku Ew (Yezdanê bi tenê) heye.

Û Ew xelatdarê lêgerên xwe ye.

Piraniya Incîlê danasîna dîroka gelê Yezdan e, ku ew bixwe Ibrani ne. Bi dehê caran tê diyar kirin ku ewana hebûna Yezdan dipejirînin, lê belê îmana xwe bi sozên wî naynin. Ji aliyê rêberê wan yê mezin Musa ve ev yek ji bo wan hatiye gotin: *“Ji ber vê sedemê bizanibin û bi dilê xwe jî bidin pejirandin ku Mirzayê me, ango Yezdan bixwe, li*

jor li asîman e û li jêr jî li ser ruyê erdê ye. Yekî din mîna wî nîne. Ji ber vê yekê fermanên wî bi cih bînin.” (Dt.4: 39,40).

Ji ber vê yekê mirov dikare, heman mijarê bi vî rengî jî bîne ziman: Têgihîştina hebûna Yezdan, nayê wateya ku emê ji aliyê Yezdan ve werin pejirandin. Eger em pê bawerbin ku em xwediyê Yezdanekî ne, “lazîme em fermanên Wî jî bi cih bînin”. Armanca vê xebatê ewe ku van fermanan bide nasandin û awayê pêkanîna wan nîşan bide. Li gel lêkolînkirina nivîsên pîroz, emê bibînin ku baweriya me ya bi hebûna Yezdan jî bi hêz dibe.

“Îman bi bihistinê û bihistin jî bi soza Yezdan derdikeve holê” (Rom. 10.17).

Her wiha Îşaya 43:9-12 (beşê 43. ayetên di navbera 9-12 de), *“ku ez ew'im” (Is. 43:13)* Yezdan bi me dide nasandin û rê nîşandide ji bo em kehanetên wî yên ji bo pêşerojê şîrove bikin. Ango, wateya navê Yezdan *“Ez ku ew ez im”* bi tevayî raste (*Ex.3:14*). Hewarî Pavlus, hatibû bajarê Veriya ku niha li bakurê Yunanê ye. Li wê derê di derbarê mizgîniya (nûçeyên baş) Yezdan de waaz didan. Lê belê gelê herêmê, li şûna ku gotina Pavlus yekser bipejirînin, *“wan (gotina Yezdan ne ya Pavlus) bi balkêşiyê mezînan guhdar dikirin, û her roj li ser nivîsên pîroz lêkolîn çêdikin ji bo bizanibin ka, tiştên ku fêrî wan dikin rast in an na. Bi vî awayî gelek ji wan baweriya xwe pê anîn.”*(*Acts 17:11-12*). Baweriya wan bi sedema bîrweriya wan û bi awayekî (rojane) lêkolîn kirina Incîlê çêbûbû.

Têgihîştina baweriya rasteqîn, ne ji nişkêve di encama emeliyateke giyanî ya dil de çêbû, û ne jî Yezdan ji nişkêve ew bawerî xiste dilê wan. Tevayî wan mirovan ji bo tekoşîna Billy Graham wê çawa bimeşin, wan jî weke yên xwedan bawerî Pentikost, ji nû ve wê bi çi awayî beşdarî meşa protestokirina civîna çêbûnê bibin? Lêkolînkirina nivîsên pîroz çiqasî piştgiriya van bûyerên nimûne kiriye? Ev kêmbaweriya bê piştgiriya Incîleke rasteqîn, dibe sedem ku gelek kes baweriya xwe bigûherin, xebata Xirîstiyaniyê ya ku piştî hatiye kirin bê wate bibînin û ji tevgera evangelîst bi dûr kevin.

Armanca vê xebatê ewe ku rê nîşanî we bide, ji bo hûn bikaribin bi awayekî rêk û pêk, li ser wan nivîsên pîroz lêkolîn ku dikarin baweriya we jî çêbikin. Li ser girêdana di navbera haydarbûna ji mizgînê û baweriyeke rasteqîn, di Incîlê de pir tişt hatine gotin. Wiha:

- *“Piraniya Korîntiyên ku guhdariya (Pavlus) kirin, baweriya xwe pê anîn û vaftîz bûn”* (*Acts 18:8*)

- *“Gel li belavoka Mizgînê guhdarî dîke û baweriya xwe pê tîne”* (*Acts 15:7*)

- *“Me di nava we de belav kir, we jî baweriya xwe pê anî”* (*1 Cor. 15:11*)

- *“Di şibandina li ser yê ku çandiniyê dîke de, gotina “tov” ya Yezdan bixwe ye (Lk. 8:11); heger bi qasî tovê xerdelekê baweriya we hebe... (Lk. 17:6); tê dîtîn ku bawerî, dema ku “gotina bawerî” (Rom. 10:8) tê fêmkirin, derdikeve holê; “gotinên baweriyê, zanebûna herî giranbiha ne” (1 Tim. 4:6); Di nava dilekî vekirî de, girêdana soza Yezdan bi baweriyê re (Gal. 2:2, krş. Heb. 4:2). Hewarî Yuhanna dibêje ku, di nivîsîna jiyana Mîrzayê me Îsa de wiha hatiye gotin: “ji bo ku hun baweriyê pê binin wî rastî got (Jn. 19:35).*

Gotina Yezdan weke “*rastiyê*” tê binav kirin (*Jn. 17:17*) ku em baweriya xwe pê tînin.

1.2 KESAYETA YEZDAN

Di Incîlê de, mijareke herî balkêş jî ewe ku Yezdan mîna hebûneke bi beden ku mirov bikaribe dest bidîyê diyar dike. Her wiha, di Xirîstiyaniyê de baweriyeke bingehîn jî ewe ku Îsa lawê Yezdan e. Heger Yezdan ne hebûneke xwedî beden bûya, nikarîbû bûbûya xwediyê lawekî ku bixwe “*rengê hebûna wî ye (Heb. 1:3)*” Heger Yezdan bi tenê di bîra me de weke gotinekê be, yan jî giyanek be li asîman, zehmete ku mirov têkiliyeke zindî li gel wî deyne. Cihê mixabiniyê ye ku piraniya olan xwediyê şîroveya Yezdanekî wiha xeyalî ne.

Ji ber ku Yezdan ji me berztire, gelek kes xwe bi sozên wiha ve girê didin ku ewê di dawiya baweriya xwe de Yezdan bibînin. “*Hûn*

(Îbrani) *nebûn xwedan bawerî bi qasî ku hûn bikaribin şiklê Yezdan bibînin*” (*Jn. 5:37*) tê gotin û ev jî nîşan dide ku Yezdan xwedî beden û şikl e. Baweriyeke wiha bi nasîn û îman anîna bi soza Yezdan pêk tê:

“*Xwezî bi dilê wan kesên dil pak! Ji ber ku ewê Yezdan bibînin. (Mt. 5:8)*

Wê ebdên wî (Yên Yezdan) perestiya wî bikin û wê ew ser çavên wî bibînin û wê navê wî (Navê Yezdan-Bk. Rev. 3:12) li ser eniya wan be” (Rev. 22:3,4).

Heger em ji dil baweriya xwe pê bînin, wê hêviyeke wiha mezin di jiyana me de xwediyê bandoreke bêhempa be:

“*Bi herkesî re di nava aştiyê de bin, û pîroz bin, bêyî van wê tu kes nikaribe Yezdan bibîne” (Heb. 12:14).*

Lazime em sund nexwin, ji ber ku: “*yê ku li ser asîman sund bixwe, wê sundê li ser textê Yezdan û yê li ser text dixwe (Mt. 23:22).*

Heger Yezdan ne hebûneke bi beden be, ev tişt tev bê wate dibin.

“*Emê wî bi tevayî bibînin (Dema ku Mesîh derkeve holê). Yên ku li gel Mesîh xwediyê vê hêviyê bin, li gorî ku Mesîh pak e, wê xwe jî pak bike (1 Jn. 3:2,3)*

Li vê jiyane em Bavê Asîmanî baş fêhmakin. Lê belê di nava tarîtiya vê jiyana tevlihev de, em dikarin bi hêvî bin ku emê di encam de Wî bibînin. Dema ku em Wî bibînin,

Wê mêjîyê me were fereh kirin û emê bikaribin xwe li gorî Wî bi rêk û pêk bikin. Bi vî awahî Eyub ji kuraniya elema însan, tecrubeya roja dawî jîn kir û bi têkiliyeke bêhempa li gel Yezdan, gihîşt kêfxweşiyê:

“Piştî ku kurmên bedena min (ango mirin) vê bedenê tarûmar jî bikin, ezê bê goştê bedena xwe jî Yezdan bibînim: ezê bixwe Wî bibînim, û wê çavên min temaşeya Wî bikin, ne yên kesên din” (Job. 19: 26,27).

Û hewarî Pavlus ji êş û tevliheviya jiyana din dike fîgan:

“Em niha her tiştî di neynikê de wendabûyî dibînin; lê wê demê emê rû bi rû bibînin” (1 Cor. 13:12).

Têgihîştina Yezdan, mifteyê ji bo vekirina deriyên danasîna Incîlê. Lê belê, çawa ku derewek rê li pêşiya dereweke din vedike, têgihîştina Yezdan bi awayekî ne rast jî, rêkûpêkiya rastiyên ku di nivîsên pîroz de hatine pêşkêş kirin, serûbinî hev dike.

Heger baweriya me bi vî beşî hatibe, ev pirs derdikeve holê: *“Birastî tu Yezdan nas dikî?”*. Emê niha jî danasîna Incîlê ya di derbarê wî de ji nêzik ve lêbikolin.

1.3 REFTAR (NÎTELÎK) Û NAVÊ YEZDAN

Eger Yezdanek hebe, wê hinek tiştên ku bikaribe xwe bi riya wan bi me bide naskirin jî derxîne holê. Em pê bawerin ku Incîl xelateke Yezdan e ji bo însan û di wê de hebûna Yezdan tê diyar kirin.

“Ev; sedema ku soza Yezdan weke tovê wî were danasîn (1 Pet. 1:23). Ji ber ku heger ew bandorê li ser zanebûna me bike, wê di nava me de tiştek bi wesfên Yezdan biafire (James 1:18 ; 2 Cor.5:17). Ji ber vê yekê em çiqasî xwe bidin soza Yezdan û dersan fêr bibin, emê hewqasî “teşbîhî rewşa şibhetê lawê Wî bibin (Rom. 8:29); û law bixwe jî “di şibhetê Yezdan de ye” (Col. 1:15). Li vira girîngiya xebata li ser aliyên Incîlê yên dîrokî derdikeve holê. Ev her demê

Heman tiştî diyar dikin, û li ser têkiliyên Yezdan û mirovan û netewan tijî nimûne ne. Di zimanê Ibranî de, navê mirovekî kesayeta wî û agahdariyên di derbarê wî kesî de dide nîşandan. Li ser vê mijarê hinek nimûneyên vekirî:

Jesus (Îsa): Rizgarkar. Ji ber ku *“Ew’ê gelê xwe ji gunehên wî xelas bike. (Mt. 1:21)*

Abraham (Ibrahim) Bavê civakeke mezin. *“Ji ber ku min tu kirî bavê gelek netewan” (Gen. 17:5).*

Ji ber vê yekê tê hêvî kirin ku nav û nîşanên Yezdan, dikarin di derbarê Wî de gelek agahdariyan bidin me. Ji ber ku gelek awayên reftar û armanca Yezdan hene, ew xwediyê gelek navane jî. Piştî vaftîzbûnê hêjaye ku mirov di derbarê navên Yezdan de xebateke

berferreh bike. Ji ber vê yekê agahdariyên ku li jêr hatine dayîn, bi tenê weke destpêkekê ne.

Musa, di wextekî zehmet yê jiyana xwe de, ji bo ku baweriya xwe ya bi Yezdan xurt bike xwest agahdariyên berferehtir bi dest xwe ve bîne. Wê demê melaîketekî ji wî re ev yek got : *“Navê Yezdan beyan bike: Mirzayê me qadirê her tiştî ye, Mirzayê me Yezdan e, yê ku diparêze û dibexşîne. Sebr, hezkirin û sedeqeta wî pir e. Ew dilovaniya bi hezaran dike, xerabî û gunehan dibexşîne, tawanbaran tu caran bi tawan dernaxîne”* (Ex. 34:5-7).

Navên Yezdan di têgihîştina kesayeta Wî de pişteke bi hêz in. Ev jî delîlê wê yekê ne ku Yezdan kesayetêke bi beden e. Yezdan navekî wiha ji xwe re hilbijartiyê ku bikaribe bi riya wî ji aliyê gelê xwe ve were naskirin û bibîranîn. Ev cewherê plana wî ya ji bo mirovan e. Îsraîlî li Misrê kole bûn û pêwîstî pê hebûn ku plana Yezdan ya di derbarê wan de were bibîranîn. Bi qasî ku ji Misrê derkevin û dest bi rêwîtiya ber bi axa pîroz ve bikin Musa navê Yezdan ji wan re diyar kiribû, ji bo ku alîkariya motîvasyona wan bike (bk. 1 Cor. 10:1). Em jî berî ku em vaftîz bibin û dest bi rêwîtiya xwe ya ber bi desthilatiya Yezdan ve bikin em pêwîst dibînin ku prensîbên bingehîn yên di derbarê navê Yezdan de fêr bibin.

Yezdan ji Îsraîlê re gotibû ku navê wî *“ez, ez im”*, yan jî bi wergerandineke rasttir *“ezê bibim ku ezê bibin (Ez, Ew im)”* yanî gotibû ew YEHOVA (YAHWEH, YHWH) ye (Ex. 3:15). Ev nav piştê hinekî hate berfirehkirin *“Yezdan ji Musa re zêdetirî vê yekê got: Wê demê pêwîste tu ji zarokên Îsraîlê re vê yekê bibêjî, ‘Mirzayê we Yezdan (YEHOVA) Yezdanê bavên we ye, Yezdanê Îbrahîm e, Yezdanê Îshaq e, û Yezdanê Yaqûb e... Ev navê min yê nemir e, û bîranîna min e, ji bo hemû nîşan’* (Ex. 3:15). *Wê demê nevê Yezdan bi tevayî wiha ye: ‘Yezdanê me hakimê her tiştî ye (di zimanê Înglîzî de gotina The LORD ya ku bi tîpên mezin tê nivîsandin, YEHOVA tê wateya Yezdan)’. Peymana kevin bi giranî bi zimanê Îbranî hatiye nivîsandin û dema ku ji bo zimanê Înglîzî hatiye wergerandin gelek gotinên ku bi Îbranî ji bo Yezdan hatine gotin, ji ber çavan wenda bûne. Yek ji wan gotinên ku bi wateya ‘Yezdan’ hatiye wergerandin*

“Elohim”e, ku dixwaze bibêje “yê ku hakimê her tiştî ye”. Bi vî awahî navê ku Yezdan dixwaze em Wî pê bibîrbînin wiha ye: YAHWEH ELOHIM (Di nava yên ku li ser her tiştî hakim in, wê Ew were diyarkirin). Ev plana Yezdan e, ji bo ku bi riya wê bikaribe kesayeta xwe diyar bike û hebûna xwe ya bedenî ya di nava komeke mezin de eşkere bike. Bi riya îteeta soza Wî,

em niha dikarin di nava xwe de, hinek taybetiyên Yezdan bi pêş xînin. Bi vî awahî Yezdan li vê jiyane bi riya kesên xwedan bawerî, kê m be jî xwe diyar dike. Û dîsa navê Yezdan kehaneta wê yekê ye ku wê cîhan bi yê wekî Wî were tîjî kirin (Bk. 2 Pet. 1:4). Heger em bixwazin bi pîlana Yezdan re, ji nêzîk ve têkiliya xwe çêbikin, di nava rêkûpêkîyeke exlaqî de heya dawî bijîn, û bixwazin bi awayekî nemir teşbihî Yezdan bibin, lazime em têkiliya xwe bi navê Wî re xurt bikin.

Riya pêkanîna vê yekê ewe ku, mirov bi navê Wî, (ango YAHWEH ELOHÎM) vaftîz bibe (Mt. 28:19). Wê ev çalakî me bike yek ji neviyên Îbrahîm (Gen. 17:8; Rom. 4:13) ku ji bo wî soza bûyîna mîrasvanê sererd yê herdem hatiye dayîn (Gal. 3:27-29). Wê bi vî awahî koma bi hêz ya di kehaneta navê Yezdan de “*Elohîm*” tamam bibe. Ev beş, di mijara 3,4’ de bi berferêhî tê diyar kirin.

1.4 MELAIKET

Her tiştê ku me heta niha di vê xebatê de aniye ziman, bi keda melaîketan derketiye holê. Melaîket:

- Hebûnên fîzîkî û kesayetî ne;
- Navê Yezdan hildigrin;
- Dibin serdestiya giyanê Yezdan de têne birêvebirin;
- Daxwaza Yezdan bi cîh tînin;
- Li gora pîlan û cewherê Yezdan dimeşin;
- Û bi wî awahî Wî tînin ziman.

Me berê jî di mijara 1,3’ de dabû xuya kirin ku di zimanê ibranî de, yek ji gotinên ku herî zêde ji bo Yezdan tê bikaranîn, “*Elohîm*”e ku

bixwe tê wateya “*kesên bi hêz*”. Ew kesên bi hêz yê ku navê Yezdan hildigrin, bi Wî re di nava têkiliyeke nêzîk de ne û di pêkanîne de weke “*Îlah*” têne binavkirin. Ev hebûn, melaîket in.

Di beşê yekemîn yê afirandina cîhanê de tê gotin ku Yezdan ji bo afirandinê hinek ferman dane, û ‘ew hatine pêkanîn’: “*Melaîket ketin rewşa bi qûdret, dengê soza Wî bihîstin û fermanên Wî bi cîh anîn*” (Ps. 103:20).

Ji ber vê yekê, kîjan demê em li ser afirandina cîhanê ya ji aliyê Yezdan ve tiştêkî bixwînin, di cîh de ye ku mirov bihesibîne ku ew xebat ji aliyê melaîketan ve hatiye kirin. Eyub di beşê 38. de’ di ayetên navbera 4-7 an de (Job 38:4,7) behsa vê yekê dike. Weke ku di beşê yekemîn yê afirandina cîhanê de hatiye nivîsîn, niha dema wê ye ku em bi kurtayî li ser bûyerên afirandinê rawestin:

Roja yekemîn : “Yezdan fermana çêbûna ronahiyê da, û ronahî çêbû” (a.3).

Roja duwemîn : “Yezdan ferman da ku di nava avan de (yên sererd) av ji avan (yên ewran) veqetin û bibe asîman û ev yek çêbû” (a 6,7).

Roja sêyemîn : “Yezdan got: ‘em avên dibin asîmande bikin yek (çêbûna derya û okyanusan) û axa zûha derxin holê’ û wiha bû” (a.9).

Roja çaremîn : “Yezdan got: ‘bera ronahî li asîmanan çêbibin’ û wiha çêbû” (a.14,15)

Roja pêncemîn : “Yezdan got: ‘bera av tiji zindiyên bi hereket bibin...bera çivîk bifirin...’ û Yezdan her tiştê zindî afirand-ango wiha çêbû” (a.20,21).

Roja şeşemîn : “Yezdan got: ‘bera sererd tiji tebayên zindî bibin...tiştê ku dimeşin û dixijiqin...’ û wiha bû” (a.24).

Însan jî di roja şeşemîn de hat afirandin. “Yezdan got: em di şibhetê xwe de û bi şibandina xwe însanan biafirînin” (Gen. 1:26). Me ev ayet di mijara 1,2 de guftûgo kiribû. Niha jî em dixwazin bibêjin ku, li vira gotina Yezdan

Ne bi tenê ji bo Yezdan hatiye gotin, hevoka ku dibêje “em însanan biafirînin” ji bo gelek kesan hatiye gotin. Li vir behsa ‘Elohîm’ an tê kirin ku bixwe kesayetên bi hêz in û têne wateya

melaîketan. Madem em ji aliyê melaîketan ve li gorî wêna wan hatine afirandin, wê demê ew jî xwediyê bedeneke mîna ya me ne. Wê demê ewana jî hebûnên rastîn û bedenî ne ku bi Yezdan re yek cewherî par vedikin.

Li vê derê ‘cewher’ ji bo wan kesan tê bikaranîn yê ku bi sedema hebûna xwe ya fîzîkî di bingeh de dişibin hev. Di Incîlê de du ‘cewher’ hene (di aliyê mîzacî û bedenî de). Bi sedema wateya esasî ya gotinê, ne gengaze mirov van herduyan bi carekê de bikar bîne.

Cewherê Yezdan (cewherê îlahî):

Nikare gunehan bike (têgihîştî ye)

(Rom. 9:14 ; 6:23 ; krş. Ps. 90:2 ; Mt. 5:48 ; James 1:13).

Nikare bimre, ango bêmirine (1 Tim. 6:16).

Tiji hêz û taqet e (naweste) (Is. 40:28).

Tiştên ku li jor hatine nivîsandin, cewherê Yezdan û melaîketa ye û ev yek piştî vejîne ji bo Îsa jî hatine pêşkêş kirin (Acts 13:34; Rev. 1:18 ; Heb. 1:13).

Ev ew cewkerê ku ji bo me hatiye waad kirin e (Lk. 20:35,36 ; 2 Pet. 1:4 ; Is. 40:28, krş. 31).

Cewherê Însan:

Bi riya semaxeke xwezayî û xerabe (Jer. 17:9 ; Mk. 7:21-23)

Dikare were eyar kirin ku gunehan bike (James. 1: 13-15).

Mehkumê mirinê ye, ango dimre (Rom. 5:12,17 ; 1 Cor.15:22).
Xwediyê hêzeke bi sînor e: him fizîkî (Is. 40:30)
Û him jî zanistî (Jer. 10:23)

Niha tevayê insanên baş û nebaş xwediyê vî cewherî ne. Dawiya vî cewherî mirin e (Rom. 6:23). Îsa jî di dema jiyana xwe ya bi mirin de xwediyê vî cewherî bû (Heb. 2:14-18 ; Rom. 8:3 ; Jn. 2:25 ; Mk. 10:18).

Bêsiudîyeke mezine ku di zimanê Îngîlîzî de ‘cewher’ weke ‘nature’ tê nîşandan û pir ne vekiriye. Em dikarin vê yekê di hevokeke wiha de bikarbînin: ‘John kesayetekî dest vekirî ye, ev tişt di xwezaya wî de heye’. Li vir tiştê ku dixwazin bibêjin ewe ku John ne xwediyê taybetiyên xerabe. Lê belê ew dikare bi erebeya xwe jî gelekî serbilind be. Di vê xebatê de sedema bikaranîna gotina ‘nature’ (xweza, taybetiya xwezayî) ne ev e.

ŞIKLÊ MELAIKETAN

Ji ber ku Melaîket ji cewherê Yezdan bixwe ne, ew jî bê guneh in. Guneh mirinê bixwe re tînin (Rom. 6:23) ji ber vê yekê di cîh de ye ku mirov bibêje Melaîket bêmirinin. Ewana xwediyê awayekî jiyânê û bedenekê ne, ew rastiyeke in. Ji ber vê sedemê dema ku Melaîket li ser erdê peyda dibin, ew mîna însanan têne xuya kirin.:

-Melaîket hatin cem Ibrahîm ji bo ku gotinên Yezdan ji bo wî bibêjin;

Di destpêkê de Ibrahîm, ji ber şiklê wan ew mîna însanan dîtine û pêrgî wan çûye. Ji bo vê yekê ew weke “*sê zilaman*” têne danasîn: “*Hinek av bînin, ez ji we tika dikim, bînin lingên xwe bişon û li binê darê bêhna xwe vekin*” (Gen. 18:4).

-Û dido ji Melaîketan, çûn cem Lut ku li welatê Sodomê dima.

Û ewana dîsa him ji aliyê Lut ve û him jî ji aliyê gelê Sodomê ve, bi tenê wekî “zilaman” hatin naskirin. “*du Melaîket hatin Sodomê*”, Lut ew vexwendin cem xwe ji bo ku şeva xwe bi wan re bibuhurîne. Lê belê zilamên Sodomî hatin mala wî û bi şeweyeke dijwar ev pirs ji wî kirin: “Ew zilamên ku îşev hatin cem te li kuderê ne?”. Lut li ber wan geriya û got, “*van zilaman tiştê nekiriye*”. Qeyda ku bi wehîyê re hatiye jî wan weke “zilaman” bi nav dike. : “*Zilaman (Melaîketan) destê xwe ber bi pêş ve dirêj kirin*” û Lut xelas bû; “*Û zilaman ji Lut re gotin ku... Yezdan tu ji bo tune kirina Sodomê birê kiriye*”. (Gen. 19:1,5,8,10,12,13).

Ahîda nû, dema ku van bûyeran şîrove dike, dide xuya kirin ku Melaîket di şiklê însanan de ne : “*Di pêşwazî kirina biyaniyan de nebaşiyê nekîn; ji ber ku hinekan (nimûne Ibrahîm û Lut) bi nezanî pêşwaziya Melaîketan kirin*” (Heb. 13:2).

-Yakub bi zilamekî nenas re, şevêkê sax bi afra list (Gen. 32:24). Piştîre ji bo me hat ragihandin ku ew zilam Melaîketeke (Hos. 12.4).

-Dema ku Îsa ji nû ve vejîya (Lk. 24.4) û ew rakirin asîman (Acs. 1:10), du zilam di nava kincên berqokî de amade bûn. Ewana bê guman Melaîket bûn.

- Mirov digihîje encamekî wiha “*pîvana însanekî, yanî Melaîket*” (Rev. 21:17).

MELAÎKET GUNEHAN NAKIN

Ji ber ku Melaîket ji cewherê Yezdan bixwe ne, ew bêmirinin. Ji ber ku guneh mirinê bixwe re tîne, ewana guneh nakin. Di zimanê Yunanî û Ibranî de gotinên ku weke Melaîket têne wergerandin, wateya wan ‘peyamvane’. Melaîket xizmetkar ango peyamkarên Yezdan in. Perestiya Wî dikin, ji ber vê yekê mirov nikare wan gunehkar bibîne. Gotina Yunanî ‘aggelos’ ku tê wateya Melaîket, dema ku bi însanan re tê axaftin weke ‘peyamkar’ jî tê wergerandin-nimune Yehyayê vaftîzvan (Mt. 11:10) û peyamkarên wî (Lk.7:24) ; peyamkarên Îsa (Lk.9:52) û zilamên ku li Erîha casusiyê dikin (James 2:25). ‘melaîketên’ ku têne wateya peyamkarên însan dikarin gunehan bikin.

Di nivîsa li jêr de ev tişt têne diyar kirin ku; (ne bi tenê hinek) tevayê Melaîketan bi sedema cewherê xwe perestiya Yezdan dikin û nikarin gunehan bikin:

“Yezdan li asîman textê xwe û serdestiya xwe amade kir (ango li bihuştê tu serhildan nikarin li dijî Yezdan çêbibin). Ey ewên ku dengê gotina Wî dibihîzin û fermanên wî bi cîh tînin, Melaîketên Wî yên bi qudret, Yezdan pîroz bikin. Ey hun, yên li mala Wî, xizmetkarên Wî, yên ku daxwaza Wî bi cîh tînin; Yezdan pîroz bikin” (Ps. 103:19-21).

“Pesnê wî bidin, Melaîketên Wî...Yên li mala Wî” (Ps. 148:2).

“Melaîketno...hun tevayê giyanên alîkar; ma ne hun hatin şandin ji bo ku hun xizmeta wana (yên bi bawerî) yên ku wê bibin mîrasvanê rizgariyê bikin” (Heb. 1:13,14).

Dubarebûna gotina ‘tev’ dide nîşandan ku Melaîket nikarin bibin du komên ku yek baş be û yek jî gunehkar be. Girînge ku mirov cewherê Melaîketan fam bike, ji ber ku xelata yên xwedan bawerî ewe ku wî cewherî bi wan re par vekin: *“Yên ku hêja têne dîtin...ne dizewicin...û ne jî dimrin: Ji ber ku ew mîna Melaîketa ne” (Lk. 20:35,36).* Ev mijareke pir girînge ku pêwîste baş were fam kirin. Melaîket nikarin bimrin: *“Mirin...nikare Melaîketan bi dest xwe ve bîne (Heb. 2:16 , têbîniya Dioaglott).* Heger Melaîketan guneh bikirana, di vegeza Îsa de yên ku hêjayî xelatkirinê hatin dîtin jî wê guneh bikirana. Û heger mirov bide ber çavê xwe ku guneh

mirineke bê dawî bixwe re tîne (Rom. 6:23), di encama vê de wê ewana nebûna xwediyê jiyanêke bê dawî; heger em xwediyê derfetê kirina guneh bin, wê demê em xwediyê taybetiya mirinê ne jî. Di vê rewşê de em nikarin bibêjin ku Melaîket gunehan dikin.

Lazime em bidin ber çavê xwe ku xelata me, parvekirina cewherê Melaîketa ye. Dema ku bi awayekî diyar û ber bi çav behsa Melaîketan tê kirin (Lk. 20:35,36), êşkere dibe ku di nava Melaîketan de cuda bûna baş û gunehkar tune ye; bi tenê regekî Melaîketan heye.

Heger Melaîketan bikarîbûna guneh bikin; Wê Yezdan nikarîbûya bi riya wan bandora xwe li ser tevayê pirsgerêkên cîhanê û jiyanê me bikira. Melaîket ew giyanên ku ji aliyê Yezdan ve hatine afirandin bixwe ne, ji bo ku bi riya wan bikaribe xebata xwe birêve bibe û bi serkeve (Ps. 104:4). Di vê rewşê de nabe ku ewana perestiya Wî nekin. Xirîstiyane ku her roj dua dike ji bo ku serdestiya Yezdan dakeve ser erdê, weke ku niha li bihûştê tê kirin, mecbûre daxwazên Wî bi cîh bîne (Mt. 6:10). Heger ku Melaîketên Yezdan, bi Melaîketên gunehkar re li bihûştê tekoşîn bikirana, wê bihata wateya ku îradeya Wî nikare li wir serdest be û ev rewş di serdestiya Yezdan ya pêşerojê de jî derketa holê. Wext derbaskirina li cîhanêke ku bibe qada şerê guneh û perestiyê, cesaret nade mirovan. Lê belê, bê guman rewşeke wiha ne mewz û behse.

LÊ BELÊ...?

Gelek komikên Xirîstiyana di wê baweriyê de ne ku Melaîket dikarin gunehan bikin, û niha li ser erdê, berpirsyarê tevayê pirsgerêk û gunehan Melaîketên gunehkar in. Emê vê têgihîştina çewt, di mijar:6 de guftûgo bikin. Niha emê li jêrê van xalan diyar bikin:

-Genesis (afirîn) weke ku di beşê 1. de jî hatiye gotin, dibe ku berî me jî afirînek hebe. Ev rewşeke wihaye ku dişibe hebûna me ya li jiyanê, weke têgihîştina 'başî û xerabiyê'. Dibe ku Melaîketên wê demê jî bi vê yekê hisiya bin (Gen. 3:5). Heger hinek tebayên ku di wê demê de jiyan e, guneh kiribin jî ev yek derveyî mijara me ye. Li beramberî vê yekê jî hinek kes hez dikin ku li dijî vê spekulasyona di mêjiyê xwe de zeîf bimînin. Incîl dixwaze ji me re li ser rewşa niha tiştê ku lazime em bizanibin bibêje, û ev yek jî ewe ku tu Melaîketên gunehkar tune ne û tevayê Melaîketan perestiya Yezdan dikin.

- Li bihûştê yek hebûna gunehkar jî nayê pejirandin. Ji ber ku Yezdan : *"Xwediyê çavên safî ye ku nikare li xerabiyê temaşê bike"* (Hab. 1:13). Her wiha, di Ps. 5:4,5 de, li ser kesên di qonaxa Yezdan ya asîmanî de ev tişt têne gotin: *"Tu xerabî nikare li gel te danîşe. Yê ku ne hêja be li gel te namîne"*. Fikra ku dibêje, li bihûştê melaîketên

gunehkar li dijî Yezdan di serhildanê de ne, bi tevayî çewtî van tiştên ku di vir de hatine eşkere kirin e.

- Weke ku me berê jî nîşan dabû, di zimanê Yunanî de gotina ku weke 'Melaîket' tê wergerandin, tê wateya 'peyamkar' û ji bo însanan jî tê bikaranîn. Bê guman ew 'peyamkarên' însan dikarin gunehan jî bikin.
- Di putperestiyê de, yek ji baweriyên herî xurt ewe ku hinek tebayên xerab û gunehkar hene ku tevayê aliyên jiyanê yê xerab dibe barê ser milên wan. Her wiha hinek fikrên putperestî yê li ser Noelê jî cihê xwe di zanîna hin komên qaşo Xirîstiyani de girtine ku bixwe gotinên putperestî yê ne.
- Hinek metnên Incîlê hene ku bi şaş famkirinê piştgiriya fikra hebûna Melaîketên gunehkar dike. Evana ji bo lêkolînkirina 'Şeytan' tene kom kirin û mirov dikare li gel weşanxaneyan bibîne. Lazime destur neyê dayîn ku ev metnên navborî hinek gotinên zanistîya Incîlê derewîn derxînin.

MIJAR 1: PIRS

1. **Ji bo pêxistina baweriya we ya bi Yezdan, tiştê herî baş çi ye?**
 - a) Çûna dêrê
 - b) Xebata li ser Incîlê ya bi awayê perstkar
 - c) Axaftinên bi Xirîstiyanan re
 - d) Temaşe kirina xwezayê

2. **Kîjan ji vana danasîna Yezdan ya rasteqîn e?**
 - a) Bi tenê xeyaleke di hişê me de
 - b) Perçeyek giyane li atmosferê
 - c) Yezdan tune ye
 - d) Kesayetek xwedan beden e

3. **Yezdan ev e:**
 - a) Yekîtiyek e (unity)
 - b) Sêyîtiyeke (trinity)
 - c) Gelek îlah di nava yekî de
 - d) Ne mumkîne mirov bikaribe bi awayekî bide nasîn

4. **Wateya navê Yezdan “Yehova Elohîm” çi ye?**
 - e) Ew ku wê bibe ew
 - f) Ji nava komek kesên bi hêz yê ku wê were diyar kirin
 - g) Yekî mezin
 - h) Hêz

5. **Wateya ferhengî ya gotina “Melaîket” (Angel) çi ye?**
 - i) Weke însan
 - j) Bi baskan hatiye pêçan
 - k) Peyamvan
 - l) Alîkar

6. **Gelo Melaîket dikarin gunehan bikin?**
 - a) Belê
 - b) Na

2.1 GIYANÊ YEZDAN : DANASÎN

Yezdanê ku xwediyê kesayeteke rasteqîn, his û cîhaneke hundirîn e, ji bo ku daxwaz û hisên xwe bi me zarokên xwe re par veke, wê serî li hinek rê û rêbazan bide û tê hêvî kirin ku bandora xwe li ser jiyana me bike. Yezdan tevayê van tiştan bi riya giyanê Wî dike. Heger em bixwazin Yezdan binasin û têkiliyeke rast bi Wî re deynin, lazime em giyanê Yezdan û awayê xebata wî binasin.

Şîrove kirin û diyar kirina gotina ‘giyan’ ne hêsan e. Wek nimune, heger em çûbin dawetekê, em dikarin bibêjin, “*Li wir giyanekî baş hebû*”. Qesta mirov ji vê yekê ewe ku rewşa dawetê bi giştî baş bû; herkesî kincên xweşik li xwe kiribûn, xwarin baş bûn, herkes bi herkesî re kubar bû, bûk xweşik bû û her wiha... bi vê yekê mirov dixwaze bibêje ku li dawetê her tişt baş derbas bû. Ev tişt tev rih (hewa) merasîma dawetê ji mirov re eşkere dike. Bi heman şeweyî giyanê Yezdan jî kûrtayîya her tiştê di derbarê Wî de diyar dike. Di Ahîda kevin de, gotina Ibranî ya ku weke ‘rih’(giyan) tê wergerandin, tê wateya ‘nefes’ an jî ‘hêz’. Wî çaxî giyanê Yezdan ‘nefesa’ wî ye û cewherê wî dide nîşandan. Di mijar 4,3’ de emê bidin xuya kirin ka gotina ‘rih’ bi çi awahî di derbarê hiş û mîzaca yekî de tê bikar anîn, û emê nimuneyan li ser vê yekê bidin. Giyan bi serê xwe nabe nîşana hêza Yezdan û ev yek di, Rom. 15:19’ de jî eşkere ye: “*Hêza giyanê Yezdan*”.

Di ilmê Incîlê de tê pejrîrandin ku însan fikrê xwe bi liv û hereketa xwe eşkere dike (Prov. 23:7 ; Mt.12:34). Mirov dikare bi riya hinek liv û hereketên xwe vê yekê rast derxîne. Em li ser tiştêkî difikirin û piştê jî em wî tiştî dikin. Rih an jî hişê me, dikare xwe di dema birçîbûna me de eşkere bike û di rastiya xwarin xwestina me de diyar bibe. Em li medbexê muzeke ku nehatiye xwarin û li aliyekî hatiye hiştin dibînin; wê demê daxwaza giyanê me dikeve livê- em xwe digihînin muzê, wê diqêşêrin û dixwin. Bi vê nimuneya biçûk diyar dibe ka ji bo çi gotina ‘rih’ di zimanê Ibranî de tê wateya nefes an jî hiş. Giyanê me, cewherê me û fikrên me diyar dike û ji bo eşkere kirina his û fikrên xwe jî em dikevin nava livbaziye. Giyanê Yezdan jî bi pîvaneke bilindtir heman xebatê pêk tîne. Ew bi riya vê hêzê; cewherê Wî, mîzaca Wî û pîlana Wî diyar dike. Yezdan difikire û piştê tiştê ku fikiriye dike: “*Ez çawa fikirîbim wê wiha bibe û min çawa çêkiribe wê wiha bimîne*” (Is. 14:24).

HÊZA YEZDAN

Gelek tişt eşkere dikin ku giyan û hêza Yezdan yek in. Dema afirîna gerdûnê, “*Giyanê Yezdan li ser ruyê avan liviya. Û Yezdan got, “bera ronahî çêbibe û ronahî çêbû” (Gen. 1:23).*

Giyanê Yezdan, ronahî û her wiha...yê ku her tiştî diafirîne hêz e : “*Wî bi riya giyanê xwe asîman xemilandin; destê Wî şikil da marê şahîk jî” (Job. 26:13). “Bi gotina Yezdanê ku hakimê her tiştî ye asîman hatin afrandin; bi riya hilma devê wî jî her tiştê semawî” (Ps. 33:6).*

Di vê rewşê de giyanê Yezdan dikare wiha were ziman:

“Hilma Wî
Soza Wî
Destê Wî”

Ji ber vê yekê ew bi riya hêza xwe, di her tiştî de biserdikeve. Bivî awahî li ser daxwaza Yezdan, yên xwedan bawerî carekedin çêdibin (Jn.1:13); û ev yek bi riya giyanê Wî dibe (Jn. 3:3-5). Daxwaza Wî bi riya giyanê dikeve livbaziye. Di hemû axaftinên li ser li ser afirîna xwezayî de em vê dixwînin: “*Tu giyanê xwe dişîni, ewana têne afirîn; û bi vî awahî tu ruyê erdê nû dikî” (Ps. 104:30). Ev rih û hêz çawa ku dibe wesîteya afirîna her tiştî, her wiha wan bi hêz jî dike. Heger ev taybetiya giyanê Yezdan nebûya, mirov dikarîbû bifikirya ku ev jiyana trajîk bi hesanî dikarîbû tijî xapînok û çewtî bûbûya. Eyubê ku ji vê jiyana aciz bûbû, gotina pêxemberekî tîne bîra me ku dibêje “Heger Ew (Yezdan) giyan û hilma xwe di nava xwe de bicivîne, wê tevayê mirovahiyê tune bibe û wê benîadem careke din li axê vegere” (Job. 34:14,15). Dawid jî dema ku ketiye tengasiyeke mezin, ji Yezdan daxwaz kiriye ku bi wî giyanî alîkariya wî bike, ango jiyana wî bibexşîne (Ps. 51:12).*

Emê di mijar 4,3 de piştgirîya ku ev giyan dide jiyana me û tevayê afirînan bibînin. Em di nava xwe de xwediyê ‘hilma giyanê jiyana’ne (Gen. 7:22 A.V.mg.) ku ev yek di dema çêbûna me de ji aliyê Yezdan ve, ji bo me hatiye pêşkêş kirin (Ps. 104:30 ; Gen. 2:7).

Ev yek Wî dike “*Yezdanê giyanê tevayê mirovahiyê” (Num. 27:16 krş. Heb. 12:9). Ji ber ku Yezdan hêza jiyana ya piştgirî kirina tevayê afirîna ye, giyanê wî li her derê ye. Dawid ev yek baş fêhm kiriye ku; ew li kuderê dibe bera bibe, Yezdan bi riya giyanê xwe bi wî re ye, û bi riya wî giyanî û wê hêzê ew her dera hiş û fikrê dawid nas dike. Bi vî awahî giyanê*

Yezdan, her çiqasî ew li bihûştê be jî, dibe sedema ku ew li her derê be.

“*Tu rabûn û rûniştina min dizanî, fikara min jî dûr ve fam dikî...ma ezê ji ber giyanê de çawa bi dûr kevim? An jî ezê ji ber hebûna te bi ku de birevim? Heger ez li aliyên deryayan yên herî dûr jî rûniştîbim, wê destê te yê rastê (ango giyanê te) min bigre (Ps. 139:2,7,9,10).*

GIYANÊ PÎROZ

Me dît ku giyanê Yezdan ji bo têgihîştinê gelekî berferehe. Ew, hişê Wî, mîzaca Wî û her wiha hêza pêkanîna fikrê Wî ye. “Mirovek bi çi awahî ji dilê xwe bifikire, ew wiha ye (Pro. 23:7) ; û bi vî awahî Yezdan fikrê wî ye, giyanê wî ye (Yezdan giyan e) (Jn. 4:24). Lê belê ev nayê wateya ku Yezdan ne zatî ye. (Binêre li gotina navê 1). Ji bo ku di têgihîştina ferehiya giyanê Yezdan de alîkariyê bike, em hinek caran behsa ‘giyanê Wî yê pîroz’ (Holy Ghost, di wergerên nûjen de Holy Spirit) dikin. Ev yek di Ahîda kevin de, wiha hatiye ziman: ‘giyanê Yezdan’ an jî ‘mîrzayê me yê hakimê her tiştî’. Ev di beşa duwemîn ya Acts (karên pêxemberan de) hatiye qeyd kirin ku roja Pentikostê giyanê pîroz bi ser hewariyan de tê rijandin. Petrus vê yekê weke, temam kirina kehaneta Yoelê bi van gotinan diyar dike, ‘ezê ji rihê xwe (yê Yezdan) birijînim’ (Acts. 2:17). Dîsa di Lk. 4.1’de tê gotin ku Îsa ji çemê Şerîa (Urdunê) “tîjî giyanê pîroz” vegehiya ye; û di heman beşê de Îsa di beşê 61 mîn yê Îsaîah (Îşaya) de dibêje ku ev yek temamkirina vê hevokê ye: “Giyane mîrzayê me Yezdan li ser min e”. di van her du bûyeran de (û di gelekên din de jî) gotina giyanê pîroz, heman gotina “giyanê Yezdan) ya di Ahîda kevin de ye.

Di hevokên jêrîn de bibînin bi çi awahî giyanê pîroz û hêza Yezdan digihêje hevdu û bi hev re dimeşe:

- “Wê giyanê pîroz were ser te (Meryem), û wê hêza yê herî berz te di bin siya xwe de bihêle” (Lk. 1:35).
- “Hêza giyanê pîroz... hêza giyanê Yezdan, û behît û darberz” (Rom. 15: 13, 19).
- “(Ya ku hate ragihandin) Mizgîniya me... bi qudret, bi ‘giyanê pîroz’ re hat” (Thes. 1: 5).
- Di derbarê sozên giyanê pîroz de, ji şagirtan re hatiye gotin ku ewê “bi hêza ku ji asîman were, werin pêçan” (Lk. 24:49).
- “Îsa bi xwe bi ‘giyanê pîroz’ û hêzê hatiye pêçan” (Acts. 10:38)”.

Pavlus, wa’zên xwe bi nîşandana hêza Yezdan ya ku nayê înkarkirin, xurtkirin e: “Axaftina min û wa’za min... xwenîşandana giyan û hêzê ye” (1 Cor. 2:4).

2.2 SÎRÛŞDAN

Me da xuya kirin ku, giyanê Yezdan; hêza Wî, fikir û mîzaca Wî ye ku bi riya xebata xwe ji me re diyar dike. Di beşê berî vê di afirînê de me bi vî awahî behsa xebata giyanê Yezdan kir: “Wî bi riya giyanê xwe asîman xemilandin”(Job. 26:13); Giyanê Yezdan, ji bo ku bibe sedema afirînê li ser

ruyê avan diliviya (Gen. 1:2). Her wiha em vê yekê jî dixwînin: “Bi gotina mîrzayê me Yezdan” cihan hate afirandin (Ps. 33:6). Weke ku di pirtuka afirîn (Genesis) de jî hatiye gotin, Yezdan gotiye bera hinek tişt werin afirandin û ew yek hate pêkanîn. Ji ber vê yekê; giyanê Yezdan, di gotina wî de baş tê dîtin- weke ku gotinên me bixwe jî fikir û daxwazên di nava me de, ango rastiya me tîne ziman. Îsa bi zanistî ev yek destnîşan kiriye: “Dev, tiştê ku ji dil (hiş) derdikeve dibêje” (Mt.12:34). Bi vî awahî heger ku em mecbûr bimînin gotinên xwe kontrol bikin, lazime berî her tiştî em fikrên xwe têxin bin kontrolê. Di vê rewşê de gotina Yezdan, wêneyeke giyan û ramanên Wî ye. Çi kêfxweşiyêke mezine ku em bi xêra Incîlê bûne xwediyên gotinên Yezdan yên nivîsandî. Û em bi vê riyê dikarin giyan û hişê wî nas bikin. Yezdan ev mucîzeyê diyar kirina giyanê xwe bi riya gotinên nivîsandî, bi xêra pêvajoya DANA ÎLHAMÊ (Wahî) (Inspiration) pêkanî ye. Ev gotin digihîje gotina ‘giyan’ (Spirit).

IN-SPIRIT-ATION

“Giyan”, tê wateya hilm an jî hilm standinê; “Dana Îlhamê” tê wateya kişandina hilmê. Ev tê wateya vê yekê ku, mirov bi stendina îlhama jî Yezdan gotinan dinivîsin û ew gotin jî tîne wateya ku bixwe gotinên giyanê Yezdan in. Pavlus, jî Timuteyus re dibêje ku; naskirina Incîlê nayê wateya jî bîr kirina rastiya ku ew gotinên Yezdan bixwe ne. Lazime mirov desturê nede vê yekê; û ji ber vê, ew (incîl) di derbarê Yezdan de tevayê agahdariyên rast yê ku pêwîstiya me bi wan heye, dide:

“Tu ‘nivîsên pîroz’ yên ku bi riya baweriya te ya bi Mesîh Îsa, dikarin bi hêza xwe te bikin alim û bigihînin rizgariyê, ji zarotiya xwe ve dizanî. Tevayê nivîsên pîroz bi riya dana îlhama Yezdan hatine şandin; û ji bo fêr kirin, anîna ser rê, û perwerde kirina li ser rastiye pir baş in. Bi xêra van, mirovê Yezdan dikare bi her tiştê baş were xemilandin û bi rêk û pêk be” (2 Tim. 3:15-17).

Heger nivîsên pîroz yên ku hatine şandin, agahiyên wiha temam bidin, wê demê ji bo ku rastiye di derbarê Yezdan de nîşanî me bikin, pêwîstî bi ‘ronahiyên veşartî’ namîne. Lê belê însan, weke çavkaniya agahiyên xwe yên di derbarê Yezdan de, çiqasî dikarin behsa his û tecrubeyên xwe bikin! Heger ku bi baweriyeke mezin pejirandina gotina Yezdan, di jiyana Xirîstiyân de kesayetê bi xemilîne, wê demê di jiyane de pêwîstiya me bi hêzeke din namîne. Heger pêwîstiyêke wiha hebûya, wê gotina Yezdan, weke ku Pavlus dibêje, nikarîbûya me bixemilîne. Ji bo ku em Incîlê li ser destê xwe bigrin û pê bawerbin ku ew bi rastî gotina giyanê Yezdan e, pêwîstiya me bi îmanê heye. Weke gelek “Xirîstiyânên” îroyîn, Ibraniyan jî eleqeyêke bi sînor nîşanî wateya soza Yezdan dabûn. Tevayê rewşa me, di vê hevoka, Heb. 4:2’ de hatiye ziman:

“Ji bo me jî wekî wan (Ibraniyên li çolê) ‘peyama baş’ hate ragihandin.

Lê ji ber ku wana ew soz bi baweriya xwe re nekirin yek, tu fêdeya wê li wan nebû”.

Li şuna ku mirov bi îmaneke mezin berê xwe bide giyan-soza Yezdan ya ragihandî, û di tevayê jiyana xwe de perestiya wê bike û rê bide ku giyanê Yezdan bi vî awahî bandora xwe li ser dilên me çêbike, hinek kes riya kurt hildibijêrin û weke ku bibêjin, ‘hêzeke rastiye ya ku bikaribe me li dijî Yezdan têxe warê pejirandinê ji nişkêve bi ser me de hat’.

Nepejirandina hêza giyanî ya di soza Yezdan de hiştiye ku ev pirs di serê gelek Xirîstiyanan de çêbibe, gelo tevayê nivîsên pîroz ji aliyê Yezdan ve bi riya Wehî yê hatine şandin an na? Ev kesana dibêjin ku, hemû nivîsên Incîlê nerînên şexsî yên zanayên kevin in. Lê belê Petrus vê nerînê vala derdixîne:

“Bi vî awahî gotinên pêxemberan ji bo me têne wateyeke mezin. Eger hûn bala xwe bidin van gotinan hûnê tiştê baş bikin, berî her tiştê vê bizanibin ku (ev xwediyê pêwîstiyê jiyani ye): Gotinên di nivîsên pîroz de ji şîroveyên pêxemberan nehatine. Ji ber ku gotina pêxemberan ji daxwazên mirovan derneketine, mirov ji aliyê giyanê pîroz ve hatine birêvebirin û li ser Yezdan axifîne” (2 Pet. 1:19 - 21 N. I. V.).

Berî her tiştî divê em bawer bikin ku Incîl bi riya Wehî daketiye, ji ber vê yekê me bi awayê baweriya **Birayên ligel Mesîh** (Christadelphian) ji bo şîroveyê bingeh girt.

NIVÎSKARÊN INCÎLÊ

Wê demê bawerkirina ku nivîsên pîroz bi riya Wehî daketine xwediyê girîngiyeke jiyani ye. Kesên ku Incîl nivîsandine ji aliyê giyanê îlhamdar ve hatine birêvebirin û ev gihaye radeyeke wiha ku gotinên wan ne yên wan bin. Eger ku soza Yezdan ji bo gelek kesan ne balkêş be sedem ewe ku rastiye tîne ziman (Jn. 17:17), mirovan tîne ser rê (2 Tim. 3:16,17) û ji ber ku - rastî tehl e- ne tiştê ecêb e. Pêxember Yeremya dema ku gotinên ku Yezdan ji wî re ragihandibûn belav dikirin li berxwedanê rast hat. Û êdî xwe nade ber ragihandin an jî nivîsandina wan gotinan. Lê belê nivîsandina soza Yezdan ji daxwaza mirovan zêdetir encameke daxwaza Yezdan e, lewre tu mafê wî yê hilibjartinê tune ye, min got: “Tevayî rojê ez bûm pêkenok, her kes sebra xwe bi min tîne... û ‘êdî ez wî bi bîr naynim, êdî ezê bi navê wî nebêjim’, lê belê gotina wî di dilê min de, di hestiyên min weke agirekî dişewite; ez êdî nikarim xwe bigirim, ez êdî tehemul nakim” (Jer. 20:7,9).

Her wiha dema ku Belam biryar da ku Îsraîlê birecimîne (lanet bike) li şuna wê giyanê Yezdan pîroziyek bi wî daye gotin (Num. 24:1-13 krş. Dt. 23:5).

Gelek kesên ku Yezdan bandora xwe li ser wan çêkiribû ji bo ku soza xwe bi wan bide axaftin, piştî demekê pêvajoyeke dilsariyê derbas kirine:

Musa (Ex. 4:10) Pavlus (Acts. 18:9)
Hezekyel (Ez. 3:14) Timoteyus (1 Tim. 4:6-14)
Yunis (Jonah 1:2,3) Balam (Num. 22-24)

Tevayê van agahiyan ji me re diyar dike ku ev hevoka ku em ji 2 Pet. 1;19-21'fêr bûne "Soza Yezdan ne nerîna şexsî ya hinek kesa ye, encama îlhama nivîsandina tiştên ku ji wan re hatiye gotin e" di cihê xwe de ye û raste. Pêxember Amos vê yekê diyar dike: "Mîrzayê me yê hakimê her tiştî Yezdan got, kî pêxemberiyê nake?". Musa bi awayekî pir bi hêz ji aliyê Yezdan ve dihat birêve birin ku hinek çar digihîşte radeya ku hisa xwe ya şexsî wenda bike : "Tevayê van fermanên ku Yezdan bi riya Musa ragihandine..." (Num. 15:22,23); ku ev gotin di rastiya xwe de ji aliyê Musa ve (weke ku Yezdan ji wî re gotibû) hatibû gotin (Num. 15:17).

Nîşaneke din ya vê yekê ewe ku, nivîskarên Incîlê pê hisiyane ku ew bixwe pir tiştan ji yên ku nivîsandine fam nakin. Wana (Pêxemberan) ji bo ku bikaribin baş şîrove bikin, lêkolîn çêkirin û tê derxistin ku (giyan diyar kiriye) û wan nivîsandiye: "Bi tiştên ku ji wan re hate ragihandin, ne xizmeta xwe lê belê ya me kirin (1Pet. 1:9-12). Ev lêkolîna wan diyar dike ku nivîsên ku nivîsandine ne şîroveyên wan bixwe ne. Ev pêxember li ser vê mijarê nimuneyên baş didin: Daniel (Dan. 12:8-10), Zekarya (Zech. 4:4-13), Petrus (Acts 10:17).

Heger ev zilamana bi sînor bihatana bandor kirin, me nikaribû em xwe bigihînin giyan an jî soza Yezdan ya rasteqîn. Heger tiştê ku wan nivîsandiye, bi rastî soza Yezdan be, wê demê diviya bû ku ewana di pêvajoya îlhamstandinê de ji aliyê Yezdan ve bi dijwarî werin kontrol kirin. Heger ne wiha bû ya, tiştê ku derketiye holê, bi tevayî nedibû soza Yezdan. Pejirandina ku soza Yezdan bi tevayî ya Wî ye, ji bo me di xwendin û perestiya wê de dibe alikariyeke mezin: "Gotina te gelekî safî ye, ji ber vê yekê ebdê te ji wê hez dike" (Ps. 119:140).

Bi vî awahî em dibêjin ku pirtûkên Incîlê ne berhemên însanan e, bi riya giyanê Wî, xebateke Yezdan e. Rastiya vê yekê jî ewe ku Ahîda nû, destnîşaniya nivîsên Ahîda kevin dike:

- Mt. 2:5 (R.V. k.n.) dide nîşandan ku ev bi çî awahî ji aliyê pêxemberan ve hatiye nivîsandin. Bi riya wan Yezdan dinivîsand. R.V. (wergera ku di ber çavan re hatiye derbas kirin) têbîniya kêlekê (k.n.) dema dixwaze bibêje ku Yezdan bi wesîteya pêxemberan nivîsandiye, her demê gotina 'bi riya wan' bikar tîne.
- "Giyane pîroz ji devê Dawid ragihand..." (Acts 1:16).
- Ev diyar dike ka Petrus bi çî awahî ji pirtûka Îlahiyan têbinî girtine (Krs. Heb. 3:7).

Ji ber vê yekê nivîskarên Incîlê yên însan ji bo Xirîstiyânên destpêkê ne girîng bûn. Rastiyekek hebû ku gotina wan di bin bandora giyanê Yezdan de bû.

HÊZA SOZA YEZDAN

Giyanê yezdan ne bi tenê hiş û mîzaca Wî, her wiha hêza Wî ya ku bi riya wê ramanên xwe diyar dike jî, tîne ziman. Giyan/gotina wî ne bi tenê diyarkirina hiş û bîra Wî ye. Di wê sozê de hêzeke dînamîk jî heye. Têgihîştina vê hêzê wê ji bo bikaranîna wê daxwazeke mezin bi me re çêke. Di pêkanîna wê de eger em dilsar bibin emê bikaribin bi riya zanebûna xwe bi serkevin. Perestiya soza Yezdan wê hêzeke mezin bide me, ji bo ku em ber bi rizgariyê ve bikaribin lezê bidin tiştên biçûk yên jiyane. Di vê derbarê de Pavlus li ser bingeha serboriyên xwe wiha nivîsandiye:

“Ez ji ber mîzginîya (soza) Îsa ve şerm nakim. Ji ber ku ew ji bo rizgariyê hêza Yezdan e (Rum. 1:16).

Luke 1:37 (R.V.) di hema mijarê de îsraar dike: “Wê tu soza Yezdan bê hukum nemîne”.

Ji ber vê yekê fêrbûna Incîlê û pêkanîna wê di jiyana me de pêvajoyeke dînamîk e.

Tu girêdanên vê yekê bi nêzîkbûnên sar û akademîk yên zanyarên olî re tune ye. Her wiha tu girêdanên wê bi gelek komikên Xirîstiyân re jî tune ye ku bi tenê bi armanca çêkirina bandoreke dilovanî, çend beşên Incîlê tînin ser ziman, lê belê ji bo têgihîştin û pêkanîna wê ne xwediyê tu kedê ne. “Soza Yezdan zindî û bi bandor e”; “Gotina qudreta Wî (Yezdan)” (Heb. 4:12;1:3). “Soza Yezdan li ser we bawermendan bi bandor pêk tê” (1 Thes. 2:13). Bi riya gotinê Yezdan di her saata rojê de di hişê bawermendên rast de bi bandor pêk tê.

Ji ber vê yekê mesaja bingeşîn ya Incîla ku hûn fêr dibin hêza Yezdan ya rast e. eger hûn destûrê bidin wê hêz di vê jiyane de heya radeyekê bîr/giyanê Yezdan nişanî we bide û we ji bo vegeza Îsa amade bike.

Ji bo ku we bike zarokekî Yezdan, wê di jiyana we de bi kar were (2 Pet. 1:4). Daxuyaniya Pavlus jî bi “nişandana hêz û giyan” (1 Cor. 2:4) pêk hatibû.

Derdorên me tijî ew kes in, yên ku bi baweriyeke nîve nîv girêdayî Incîlê ne û armanca wan ya bingeşîn êrîşkirina ser Îsa ye. Ewana dibêjin ku girêdayî Yezdan in, lê belê bawer nakin ku Ew kesayeteke bi rêk û pêk e. Her wiha napejirînin ku tevayê nivîsên pîroz bi wehî hatine û ew ji fikr û ramanên me yên şexsî berztirin. Ew kes bi vî rengî hêza Yezdan jî înkâr dikin. Em gotinên di 2 Tim. 3:5 de binin bîra xwe: “Yên ku xwe didin nişandan, ku di riya Yezdan de ne, lê hêza vê riyê (ango hêza gotina Incîlê) înkâr dikin...”

Dinya yariyên xwe bi zagonvaniya me dike (“Hûn wiha nafîkirin ne wisa ?!”), ev yek hatibû serê Pavlus û koma waîzan jî : “Belavoka di derbarê çarmîxê de, ji bo yên ku tarûmar dibûn pêkenok, lê belê ji bo me yên ku em rizgar dibin, hêza Yezdan e” (1 Cor. 1:18).

Piştî van tiştan tevan, gelo ma em nikarin Incîlê têxin destê xwe, hîn bêhtir pêk bînin, fêm bikin û perestiya wê bikin?

HELWESTA GELÊ YEZDAN YA LI HEMBERÎ SOZA WÎ

Bi balkêşî xwendina nivîsên Incîlê, diyar dike ku nivîskarên wê bandora xwe li ser nivîskarên berî xwe jî kirine. Mîrzayê me Îsa di vê derbarê de yê herî baş e. Dema ku Îsa hinek Îlahîyên Dawid bi lêv dike, wiha dest pê dike: “Dawid bi giyan re...” (Mt. 22:43), ev dide nîşandan ku ew dipejirîne ku gotinên Dawid di encama bandora (giyan) de derketine holê. Dîsa Îsa gotiye “nivîsên” Musa (Jn. 5:45-47), ev jî eşkere dike ku ew baweriya xwe pê tîne ku, pênc pirtukên Ahîda kevin jî aliyê Musa ve hatine nivîsandin. Xirîstiyânên ku ji wan re ‘rexnegirên dijwar’ tê gotin, bi gumanin ku ew nivîs jî aliyê Musa ve hatibin nivîsandin. Lê belê nêzîkbûna Îsa, bi tevayî çewtî helwesta van kesa ye. Îsa navê “fermana Yezdan” li nivîsên Musa kiriye (Mk. 7:8,9). Heman koma gûmankarên sexte, dibêjin ku piraniya Ahîda kevin derewe. Lê ne Îsa û ne jî Pavlus ev tişt bi vî awahî nedîtine. Wek nimune, Îsa behsa *Melîkeya Saba* (Melîkeya başûr) kiriye ku weke rastiyeke dîrokî tê pejirandin (Mt. 12:42); û negotiye ‘*li gorî çîroka ku di derbarê Melîkeya Saba de tê gotin...*’.

Helwesta hewariyan weke ya Yezdanê wan bû. Ev tişt jî aliyê Petrus ve bi nimuneyan hatiye diyar kirin ku wî gotinên Îsa bi guhên xwe bihîstine “soza pêxemberiyê” (2 Pet. 1:19-21) û li dijî wê yekê hêz û taqeta xwe wenda kiriye. Petrus, gotina nivîsên pîroz bikar aniye ku ev gotin ji bo nivîsên Ahîda kevin tê bikar anîn. Û baweriya xwe pê aniye ku nameyên Pavlus jî bi qasî ‘nivîsên pîroz’ yên din ‘pîroz’ in. Wê demê em dikarin bibêjin ku Petrus, nameyên Pavlus mîna Ahîda kevin dîtine ku mirov dikare baweriya xwe bi wan bîne.

Di pirtukên *karê qasidan*, *name û ilhamê* de, li ser Mizgîniyan pir tiştên ne bi awayekî rasterast hatine gotin (nimune. Krş. Acts. 13:15 ; Mt. 10:14). Evana bi tenê nabêjin ku ev daxuyanî jî aliyê heman giyanî ve hatine bandor kirin, her wiha dibêjin ku ev jî aliyê nivîskarên Ahîda nû ve weke ku ji bo nivîsên vê Mizgînê bi Wehî hatibin tene nîşandan. Pavlus, di *1Tim. 5:18* de, him (ji Ahîda kevin) jî *Dt. 25:4* û him jî ji ayeta *Lk. 10:7* weke “**Nivîsên Pîroz**” têbînî girtine.

Pavlus bi israr dide xuya kirin ku ev daxuyanî ne ya wî lê belê ya Îsa bixwe ye (*Gal. 1:11,12; 1 Cor. 2:13; 11:23; 15:3*). Qasidên din jî bi vê yekê hisiyane. Yakup jî di *James 4:5* de, ji gotinên Pavlus yên di *Gal. 5:17* de weke “**Nivîsên Pîroz**” têbînî girtine.

Yezdan Îsa jî bi me re axifiye; ji bo vê yekê pêwîst nake mirov tiştêkî zêde bike (Heb. 1:2). Mirov dikare bibîne ku Incîl hinek nivîsên ku niha ne di dest de ne, lê belê bi Wehî hatine jî tîne ziman (nimune. Pirtuka Jasher, nivîsên Pavlus yê ji bo Nathan Elijah, û Korint û Sêyemîn nameya Yuhanna ya ku ji bo komika Diotrephes nivîsandibû û wana perestî nepejirandibûn; nameyeke ku nehatiye veşartin). Ji bo çi ev nivîsana ji bo me nehatine veşartin? Sedemê wê jê bingehîn ewe ku ew nivîs ne li ser me ne. Wê demê em dikarin bi dilekî fereh bawer bin ku Yezdan her tiştê li ser me û girêdayî me diparêze.

Hinek caran tê gotin ku pirtukên Ahîda nû, hêdî hêdî tîne pejirandin, lê belê fikara ku qasid ji bo nivîsên hev dikin û dibêjin ku bi Wehî hatine, vê yekê bi tevayî derew derdixîne. Ji bo ku diyar bibe ka name an jî soz bi rastî weke ku tê gotin bi Wehî hatine an na, xelateke giyanî hebû (*Cor. 14:37; 1 Jn. 4:1; Rev. 2:2*). Ev tê wateya ku nameyên ku bi Wehî hatibûn, weke xwe û yekser dihatin pejirandin. Di derbarê naveroka Incîla me de

heger hîlbijartina mirovên ku nehatine bandor kirin hebûya, wê pirtûk ne xwediyê serdestiyekê bûya.

2.3 XELATÊN GIYANÊ PÎROZ

Yezdan, di hinek deman de, di tîkiliyên xwe yên bi însanan re, desturê dide ku hêza Wî (Giyane Pîroz) li hemberî mirovan were bikar anîn. Ev yek tu caran bi rengekî vekirî nabe. Heger wiha bûya, wan çi bixwesta, wê bi wana bida kirin; û wê bikar anîna **Giyane Pîroz**, her demê ji bo armanceke taybetî bûya. Dema ev biserketa, wê xelata Giyanê Pîroz bi paş ve bihata kişandin. Lazime em vê yekê bibîr bînin ku, giyanê Yezdan di riya armanca ramana wî de kar dike. Armanca Wî, ji bo ku pîlana Wî ya demdirêj pêk bîne, hinek caran di jiyana însanan de, rê li pêşiya kurtedemên bi şê jî vedike (Binêre. Mijar 6.1). Bi vî awayî, herdemê giyanê Wî yê pîroz nikare di vê jiyane de ji bo sivikkirina êşa insan were bikaranîn. Alîkariya ku ew bi awayekî bike jî, wê li gorî ramana Yezdan ji me re ji bo armanceke berztir be.

Ev yek bi nerînen Xirîstiyani yê belavbûyî re di nava nakokiyekê de ye. Tiştê ku dihêle baweriya wan bi Îsa were, ewe ku wê Îsa bikaribe bi alîkariya giyanê Pîroz wan ji nexweşiyên sax bike û her wiha gelek faydeyên bedenî li wan bike. Ev yek ji me re eşkere dike, ka ji bo çi li welatên mîna Uganda di nava zoriyê de, hewqas kes hene ku dibêjin ew xwediyê xelatên

başkirinê yê giyan in. Gotin û îddîyên wekî vê, di dîrokê de, her demê di wextê xela û zoriyê de derketine holê. Ev di nava xwe de, li şûna hinek rewşên bi guman, îddîyên bidestxistina giyan derdixê holê. Heger yek, ji bo xelas kirina derdên mirovan li tecrubeyekê bigere, pir hêsane ku mirov îddîa bike ku ew tişt tê peyda kirin.

Di roja me de gelek Xirîstîyan, dibêjin ku ew xwediyê xelatên giyanê Pîroz in. Lê belê dema ku mirov di derbarê armanca wan ya bingehîn de dikeve gumanan, mirov rastî nediyarbûnekê tê. Yezdan herdemê ji bo bi serketina armancên taybetî û diyar giyanê xwe dide. Ji ber vê yekê, yên ku bi rastî xwediyê xelatên giyan in, wê bizanibin wan ji bo çî bikar bînin, û her wiha di bikaranîna wan de, wê serkevtina wan ne bi sînor be. Ev yek bi şkestin û başkirinên bi sînor, yên wan kesên ku dibêjin em xwediyê xelatên giyan in, di nava nakokiyê de ye.

Tevayê nimûneyên li jêr sedem û armancên taybetî yê bexşandina xelatên giyan didin nîşandan. Di van bûyerên nimûneyî de, tu nêzîkbûneke subjektîf li ser xwedantiya xelatan nîne. Ê ne jî xwediyên xelatan dikarin wan li gorî daxwaza xwe bikarbînin. Ji ber ku em li ser giyanê Yezdan diaxifin. Ev xelatana ne ji bo pêkanîna daxwaza kesên ku ji bo demekê xwediyê wan in, lê belê ji bo pêkanîna daxwazên Yezdan yê taybetî û diyar hatine dayîn. Ji ber vê yekê nabe ku însan biryara bikaranîna wan bidin (krş. Isa. 40:13).

- Di dîroka Ibranî ya kevin de, ferman ji wan re hat dayîn ku konekî (Konê perestiyê) çêbikin ji bo ku kevirê sunakê û tiştên din yê pîroz tede biparêzin; her tiştê pêwîst ji bo pêkanîna perestiya Yezdan hatiye dayîn. Ji bo biserxistina vê armancê Yezdan hinek ji giyanê xwe da hinek kesan. Ewana: “Jibo çêkirina kincên Harun, bi giyanê zanistiyê hatin tijî kirin... û her wiha. (Ex. 28:3).
- Yek ji wan kesan Betzalel bû û “...ji bo ku bi zêr kar bike û ..kevîran bikole...ji bo ku bikaribe her hunerî bikar bîne; di alimî, fêmdarî û hemû hunerên destan de bi giyanê Yezdan hat tijî kirin (Ex. 31:3-5).

Ayetên di Num. 11:14-17’ de dibêje ku; hinek ji hêz/giyanê ku ji bo Musa hatiye pêşkêş kirin, dane rîsipîyên Îsrailê ji bo ku barê li ser piştê Musa sivik bikin û gazinên gel bi awayekî rast şîrove bikin. Berî mirina Musa bi hinekî, xelata giyan ji wî derbasî Yeşu bû û wî jî gelê Yezdan li gorî rastiye birêve bir (Dt. 34:9).

- Piştî ku gelê Îsrailê ket axa xwe û heta dema Melîkê yekemîn (Saul), Ji aliyê kesên ku ji wan re digotin ‘dadger’ ve hat birêve birin. Di wê demê de, ewana gelek caran ji aliyê neyarên wan ve

hatin perçiqandin. Lê belê pirtûka **'Dadgêran'** diyar dike ku di wê demê de, giyanê Yezdan hatiye hinek dadgêran, ji bo ku bikaribin Îsraîlê ji dagirkeran rizgar bikin. Evana nimûneyên wê yekê ne: Otniel (Jud. 3:10), Gideon (Jud. 6:34) û Yeftah (Jud. 11:29).

- Giyanê Yezdan ji bo dadgêrê ku navê wî Samson bû jî hate pêşkêş kirin, ji bo kuştina şerekî (Jud. 14:5,5), kuştina 30 zilamî (Jud. 14:19) û ji bo şetandina werîsê ku pê hatibû girêdan (Jud. 15:14). Samson her demê nebûbû xwediye **'Giyanê Pîroz'**. Ew ji bo biserxistina hinek tiştên taybetî ji wî re hat, û piştê dîsa vegehiya:

Ev tiştana nabin sedema bidestxistina xelata bikaranîna giyanê Yezdan ji bo armançê:

- Temînateke rizgariyê
- Tiştêkî ku di tevayê jiyana însan de bi bandor be
- Hêzeke veşartî di nava însana de
- Tiştêkî ku bi tecrubeyeke şexsî tê bidestxistin.

Lazime were gotin ku di derbarê xelata Giyanê Pîroz de pir tişt tene gotin. Hinek kes dibêjin ku wan Giyanê Pîroz bidest xwe ve anîne û li gelek salonên Mizgînê, li pêşiya wan kesên ku Îsa pejiwandine, gîzera (sunda) *'xwedantiya xelatên giyan'* dihejin. Lê belê pêwîste ev pirs were kirin: *'kîjan xelat?'*. Ne mumkîne ku însan nizanibin ew xwediye kîjan xelata ne. Ji bo ku Samson şerekî bikuje, hêzeke giyan ji wî re hatibû pêşkêş kirin (Jud. 14:5,6) ; dema ku bi şêrê har re ru bi ru bû, wî dizanibû bê ji bo çî xwediye giyan e. Di vê derbarê de tu guman di serê wî de tune bûn. Ev yek jî ji bo rewşa wan kesên ku dibêjin me giyanê pîroz bidest xistiye, lê heta niha tu karekî taybet biserxistine û nizanin xwediye kîjan xelata ne, nimuneyeke. Her wiha bi rewşa wan re di nava nakokiyê de ye.

SEDEMÊN XELATÊN SEDSALA DESTPÊKÊ

Em tiştên bingehîn yê di derbarê xelatên giyanê Yezdan de bînin bîra xwe û niha jî em werin ser nivîsên Ahîda nû yê li ser xelatên giyan yê ku civakên destpêkê (ango civaka bawermendên ku piştî nivîsê Îsa jiyana e) bikaranîne.

Fermana Îsa ya dawî ji bo hewariyan ew bû ku, ew ji bo belavkirina Mizgînê li her çar aliyên cîhanê bigerin (Mk. 16:15,16). Wana jî mijara mirin û ji nû ve vejîna Îsa ji xwe re kirin mijara bingehîn û ferman pêk anîn.

Lê belê bînin bîra xwe ku di wê demê de, weke tê zanîn Ahîda nû tune bû. Dema ku ewana li bazar û kolanan derketin holê û li ser vî zilamî 'Îsa yê

ji Nasira' axifîn, çîroka wan ya ku digot, -'Ji Îsraîlê xeratekî baş mir û piştre ji bo pêkanîna kehaneta Ahîda kevin carekedin zindî bû, ku ji ber vê yekê ewana dihatin vexwendin ji bo ku vaftîz bibin û bidin pey şopa Wî' weke ecêbekê dihat dîtin.

Wan rojan hinek kesên din jî hebûn ku dixwestin alîgiran ji bo mezhebên xwe peyda bikin. Lazim bû riyek were dîtin û ji bo tevayê cîhanê were ragihandin ku daxuyaniya Xirîstiyanan, ne felsefeya komek masîvanên bakurê Îsraîlê ye, ew ji Yezdan bixwe hatiye.

Di roja me de, ji bo ku em bidin nîşandan ku daxuyaniya me ji Yezdan e, em serî li danasîna Îsa û nivîsên Ahîda nû didin. Lê belê wan rojan hîna ev nehatibû nivîsandin û neketibû destê kesî. Ji ber vê yekê Yezdan destur da waîzan ku ji bo diyar kirina rastiyê giyanê Wî yê Pîroz bikar bînin. Di nava pencereya cîhanê de, ji bo bikar anîna xelatan ev sedemek bû. Tunebûna Ahîda nû, zoriyeke mezin bû, ji bo ku komên bawermendên nû bawerîya xwe bi pêş ve bibin. Di pêkanînê de, pirsgerêkên ku di nava wan de derdiketin, ne xwediyê çareseriyê vekirî bûn. Heta ku Ahîda nû ya daxuyaniyan û danasîna Îsa hate nivîsandin û belav kirin, bawermendên nû bi riya daxuyaniyên bi bandor riya xwe ronî kirin û xelatên Giyanê Pîroz bidest xistin.

Weke herdemê, sedemên bexşandina Giyanê Pîroz bi awayekî vekirî hatine rêz kirin:

- "Dema ku Ew (Îsa) derkete bilindayîyê (asîman),...xelat (giyanî) dane însanan: Ji bo pêşxistina yên pîroz, ji bo pêkanîna xizmetê (wa'z), ji bo pêşxistina gelê Mesîh -ango bawermendan..." (Eph. 4:8,12).
- Bi vî rengî Pavlus ji bo bawermendên li Roma yê ev nivîsand: "*Ji bo bi hêz kirina we, û pêşkêş kirina xelateke giyanî ez pir dixwazim we bibînim*" (Rom. 1:11).

Ji bo pêşxistina belavkirina Mizgînê, di derbarê bikaranîna xelatan de, em van tiştan dixwînin:

- "Mizgîna ku em belav dikin, ji were ne bi tenê weke gotinê, her wiha weke hêzê jî, tevî Giyanê Pîroz û bi ewlekariyê mezin -mucîze pêk anîn- û hat" (1 Thes. 1:5 krş. 1 Cor. 1:5,6).
- Pavlus ev yek got: "ji bo ku yên bê bawer perestiyê bikin, bi gotin û çalakî (mucîzeyî) bi nîşandana tiştên nedîtî, bi riya hêza giyanê Yezdan ev tiştên ku Mesîh li ser min pêk anîne..." (Rom. 15:18,19).
- Em li ser Waîzên Incîlê vî tiştî dixwînin: "Yezdan jî, him bi nîşan û şahnaziyên xwe û him jî bi gelek

mucîzeyan...bi xelatên Giyanê Pîroz şahidîya wan kir (Heb. 2:4).

- Li Qibrisê kampanya belavkirina Mizgînê, bi mucîzeyan bi vî awahî hatibû piştgirî kirin: “Dema ku wekîl (Walî)tiştên ku dihat kirin dîtin, li hemberî ilmê wan matmayî ma û baweriya xwe pê anî (Acts. 13:12).

Bi vî awahî mucîzeyan, hişt ku walî rêzdariya doktrîna wan bike. Li Konyayê jî : “Mîrzayê me Yezdan...şahidiya gotina dilovaniya xwe kir; hêza pêkanîna mucîzeyan pêşkêşî wan kir” (Acts. 14:3).

Em dikarin tevayê van tiştan bi guftûgoya li ser perestiya hewariyan ya ji bo fermanên ku wê werin belav kirin ve girê bidin: “Ewana jî çûn û (Gotina Yezdan) li her derê belav kirin. Mîrzayê me Yezdan jî bi wan re kar dike, û bi nîşanên ku li pey wan têne dîtin, gotina wan rast derdixîne (Mk. 16:20).

TIŞTÊN TAYBETÎ DI DEMÊN TAYBETÎ DE

Ji ber vê yekê ye ku ev xelatên giyan, ji bo bi serxistina tiştên taybetî di demên taybetî de hatine dayîn. Ev yek diyar dike ku, kesek nikare di tevayê jiyana xwe de bibe xwediyê xelatan. Hewariyên ku Petrus jî di nava wan de bû, di yortiya Pentîkosê (paleyî) de, ya piştî çûyîna Îsa ya ji bo asîman “bi Giyanê Pîroz hatin dagirtin” (Acts. 2:4). Ewana ji bo belavkirina Mizgîna Xirîstîyan, bi riyeke awarte dest bi axaftina zimanên biyanî kirin.

Dema ku rayedaran xwestin wan bidin rawestandî, “Petrus bi Giyanê Pîroz hat dagirtin” û bersiva wan bi şêweyeke baş da (Acts. 4:8). Ji bo ku bikaribin bi berdewamî ilmê xwe belav bikin, ji aliyê xelatan ve, berdana wan ya ji zîndanê hate pêkanîn: “Ewana tev bi Giyanê Pîroz hatin dagirtin û bi mêrxasî gotina Yezdan belav kirin” (Acts. 4:31).

Xwendevanê balkêş, wê bibîne ku ev yek nehatiye gotin. “Ewana yên ku ji berê ve tijî Giyan bûn’ ew tişt kirin”. Ewana ji bo ku hinek tiştan bigihînin serkeftinê tijî giyan bûn, lê ji bo ku bikaribin tiştêkî din di pîlana Yezdan de biserxînin, diviyabû ku careke din bi giyan werin dagirtin. Her wiha Pavlus jî di vaftîza wî de “Bi Giyanê Pîroz hat xemilandin”, lê piştî salan, dîsa ji bo ku bikaribe zilamekî xerab bi kor kirinê ceze bike, “bi Giyanê Pîroz hat dagirtin” (Acts 9:17 ; 13:9).

Di derbarê xelatên mucîzeyî de Pavlus ji bo kesên ku nû bawerî anîne ev yek li ser tiştê ku ew xistine bin bandora xwe nivîsandiye: “li gora pîvana xelata Mesîh” (Eph. 4:7). Wateya gotina “pîvan” bi zimanê Yunanî ‘beşekî bi sînor an jî eyar’ê (lihevhatina hêzê). Bi tenê Îsa xwediyê xelatên bê sînor bû; ango Ew di bikaranîna wan de bi tevayî azad bû (Jn. 3:34).

Emê niha jî xelatên giyan yên ku di sedsala yekemîn de hatine pêşkêş kirin bînin ziman, ango yên ku bi piranî behsa wan dibe.

XELATÊN GIYAN YÊN SEDSALA YEKEMÎN

KEHANET

Wateya gotina Kahîn (Pêxember) di zimanê Yunanî de wiha ye, ‘yê ku gotinên Yezdan digihîne derve’ –ango yê ku gotina Yezdan belav dike, û hinek bûyerên ku wê di pêşerojê de bibin, dibîne û dibêje, kesê ku Wehî jê re hatiye (Binêre. 2 Pet. 1:19-21). Bi vî awahî **“Pêxemberên”** ku xelata kehanetê girtine, “...Ji Qudsê hatin Antakyayê. Ji wana yek bi navê Agabus derket holê û bi riya giyan ragihand ku wê xelayeke mezin li tevayê cîhanê çêbibe, û ew di dema Împaratoriya Klavdiyus Sezar de çêbû. Di vê rewşê de murîdan biryar dan ku her yek li gorî hêza xwe alîkariya birayên xwe bikin” (Acts 11:27-29). Ev kehaneta taybetî ya ku di nava çend salan de pêk hat, niha li gel wan kesên ku xwe xwediyê xelata kehanetê dibînin nayê dîtîn. Bi rastî jî, di nava bawermendên destpêkê de, kesên ku xwediyê vê xelatê bûn hebûn.

Û ewana ji bo sivikkirina zoriya ku kehaneta wê kirine, dem û pereyên xwe dane. Di nava komikên roja me de yên ku qaşo tijî giyanin, mirov kêmanî nimuneyên vê yekê dibîne.

SAXKIRIN

Heger ku hewarî, peyamên (Mizgînî) baş li ser serdestiya Yezdan ya li sererdê belav dikin, wî çaxî wê kengî “çavên koran vebin û guhên kerran bibihîzin... û wê kengî kesê kut xwe hilçene...” (Isa. 35:5,6) lazime bi mucîzeyan ji berê ve fêhm bikin û gotinên xwe rast derxînin. Di derbarê şertên dibin serdestiya Yezdan de li Mijar 5 binerin. Dema ku serdestiya Yezdan li ser erdê ava bibe, wê sozên bi vî awahî nîvenîv nemînin, û wê pirsra ka serdestî wê li vir be an ne li vir be jî tarî nemîne. Dema ku Yezdan daxuyaniyê bi hinek mucîzeyan rast derdixîne, sedem eve ku Serdestî bi qasî ku newe înkâr kirin safî ye û diyar e. Ji ber vê yekê saxkirinên ku ji aliyê bawermendên destpêkê ve bi awayekî mucîzeyî hatin kirin, li pêşiya çavê raya giştî çêbûn.

Nimuneyeke klasîk ji bo vê yekê ewe ku Petrus, parsekekî topal ku her sibeh dianîn ber deriyê perestgehê sax kiriye. Li gora ku di Acts. 3:2 de hatiye diyar kirin, ew her roj dianîn wê derê –wê demê ew wêneyeke naskirî bû. Petrus xelata giyan bikar anî û ew sax kir, “Ew hilpekiya û rabû ser xwe, dest bi meşê kir û bi hilpekandin û meşê bi wan re ket hûndirê perestgehê...Û tevayê şênî dît ku ew meşiya û pesnê Yezdan da; û ewana naskirin ku ew kes heman parsekê ku li devê deriyê perestgehê yê ‘Deriyê bedew’ parsekî dikir. Û li hemberî bûyera ku çêbû matmayî man. Dema ku

zîlamê topal yê saxbûyî xwe li Petrus girt... tevayê gel bi hev re û matmayî reviyam cem wan...” (Acts 3:7-11).

Wê demê Petrus, yekser di derbarê vejîna Îsa de dest bi axaftineke vekirî kir. Li hemberî wê nîşana ber bi çav ya bi rengê ‘parsekê saxbûyî’ êdî guman nîne ku gel gotinên Petrus weke gotinên Yezdan pejirandin. “Di seeta duan de” (Acts 3:1) gel, weke ku rojêke şemiyê biherikin bazara kirîn û firotinê, diherikîn devê deriyê perestgehê. Yezdan cihêkî wiha hîlbijart ji bo ku belavkirina gotina xwe bi mucîzeyêke wiha vekirî rast derxîne. Her wiha em di Acts 5:12’ de jî vê yekê dixwînin: “Bi riya hewariyan di nava gel de gelek nîşan û mucîze dihatin pêkanîn”.

Ji aliyên saxkirvanên yortiya Pentîkost û yên wekî wan ve, (Îro) îddîyên ku têne kirin: ne li dêrên li ser kolanên navendî, lê belê li wan dêrên li kolanên navîn, ne li pêşiya raya giştî ya ku ji dilovaniyê hatiye xelas kirin, lê belê li pêşberî temaşevanên ku li hêviya çêbûna mucîzeyekê ji ser hişê xwe çûne tîn kirin.

Pêwîste ev yek were gotin ku nivîskarê vê pirtukê, li ser van mijaran gelekî bi parêzvanên xwedantiya giyan re guftûgo kiriye û xwediyê tecrubeya şahidiya îddîyên wan e. Ne pêwîste ku mirov bi rengekî taybetî li ser şahidiya min raweste ku min dîtîye gelek saxkirin bê encam mane û dîtina çareseriyê pir bi sînor maye. Ji endamên van dêran yekî bi rêkûpêk dikare diyar bike ku hîna jî ev tişt têne kirin. Bi gelek wesîleyan, min ji hevalên xwe yên Pentîcostên rastîn re ev yek anî ziman: “Ez ne bê daxwazim ji bo ku ez baweriya xwe bi we bînim ku hûn xwediyê hêzên mezin in. Lê belê Yezdan her demê bi şeweyêke vekirî daye nîşandan ka kî xwediyê hêzê ye. Ji ber vê yekê tiştêkî durî aqîla ye ku ez ji we nîşaneke rastiyê bixwazim- ku di vê rewşê de ez dikarîbûm werim bandor kirin, ji bo ku bikaribim rewşa we ya nezerî ya ku nikarim bi Nivîsên Pîroz re binim ber hev bipejirînim”. Tu caran “nîşandana giyan û hêzê” pêşkêşî min nekirin.

Çewtî vê helwesta min, cihûyên ortodoks yên sedsala yekemîn, (Ferîsî) li dijî rastiya ku Xirîstiyên dikarin bibin xwediyê xelatên giyan yên mucîzeyî, hişên xwe girtin. Lê dîsa jî mecbûr man ku vê yekê bipejirînin: “Ev zîlam gelek mucîzeyan pêk tîne (Jn. 11:47), û “Bîrastî mucîzeyêke nedîtî hat afirandin... û ew nîşanî tevayê şênîyê Qudsê kirin; û em nikarin wê nebînin” (Acts 4:16). Her wiha yên ku dîtî, hewarî bi zimanên biyanî diaxifin “mat man” (Acts 2:6). Heman tişt, li hemberî gotinên Pentîkostiyan yê bê wate îro nabe. Ev rastiyêke diyar e ku hinek kes bi hezkirin nêzîkî mezhebvanên protestanên Pentîkostal yên modern dibin, lê ew jî bi pîvaneke di cîh de gihîştina wan ya mucîzeyan derewîn derdixînin. Heger li tevayê Qudsê bi tenê mucîzeyek bigihîştî manşê, wê ne di cîh de ba ku mirov wê weke mucîzeyêke rast ku li London li meydana Trafalgar an jî li Naîrobî li parka Nyaharuru bûbe bide nîşandan. Ma wê demê ev nedihate wateya ku di roja me de jî mirov dikare bibe xwediyê xelatên giyanî yên Yezdan? Mucîzeyên

Pentikostî, ji bikarhatina giyanê Yezdan wêdetir, hinek encamên psîkolojî û dilovaniya însan in. Lê belê Petrus rastiya vê yekê û xelata rasteqîn ya mucîzeyan, bi saxkirina însanên li kolanan eşkere kiribu (Acts 5:15). Gelek putperestên ku li bajarê Lîstra (li başûrê Konyayê) dijiyan bûn şahidê Pavlus di bikaranîna xelatên mucîzeyî de (Acts 14:8-13). Her wiha rayedarekî desthilatiyê yê bê bawer jî bû şahidê vê bûyerê (Acts 13:12,13). Xelatên giyan bi armanc û rûmeta xwe ve tiştên pêwîst in. Ev tişt li ber çavê her kesî hatine kirin. Li vir hêza Yezdan ji aliyê ebdên wî ve hatiye nîşandan û lazime ev yek wiha were zanîn. Dervevî vê rastiye mirov nikare tu daxuyaniyên din bide pêş.

Bandora mucîzeyaya saxkirinê ya Mesîh careke din jî mîna ya berî vê bû: “herkes (yên ku ew dîtin) mat ma, û bi gotina ‘me tişteki wiha nedîtibû’ pesnê Yezdan dan” (Mk. 2:12)

ZIMANÊN BIYANÎ

Hewariyên ku hinek ji wan hin masîvanên ne kubar bûn, ji bo belav kirina Mizgînê wezîfeya gera li cîhanê hildan ser milê xwe (Mk. 2:12). Dibe ku nerazîbûna wan ya yekemîn wiha bû: “Lê ez zimanên biyanî nizamim ku!” Ji bo wan tişteki wiha jî ne gengaz bû: “Li dibistanê di aliyê zimanên biyanî de ez ne pir baş bûm”, ji ber ku ew neçûbûn dibistanê. Dema ku wezîfeyê wiha derketiye, di derbarê wan de ev hatiye nivîsandin: “Ewana kesên bê perwerde û nezan bûn” (Acts 4:13). Her çiqasî Waîzên bi perwerde (nimune Pavlus) hebûn jî, nezaniya zimanên biyanî pirsgerêkeke mezin bû. Dema ku şûna wezîfeya xwe diguhertin, her yekî dixwest di mijara perwerdeyê de (di dema nebûna Ahîda nû de) baweriya xwe bi yê din bîne, û ji ber vê yekê tenegehîştina zimanê yê din dibû pirseke mezin.

Ji bo çareser kirina vê yekê, xelata axaftin û fêmkirina zimanên biyanî ji bo wan hate pêşkêş kirin. Di têbîniyê kelekê ya N.I.V. (wergera Incîlê ya nû -bi zimanê Ingîlîzî- di saheya navnetewî de) de ‘ziman’ weke ‘lîsan’ hatiye wergerandin. Di navbera vê nêzîkbûna ‘zimanan’ û nêzîkbûna hinek Xirîstiyanan de nakokiyê mezin heye. Mirov dikare vê nakokiyê bi rîya şîroveya Incîlê ya ku dibêje ‘ziman’ ‘lîsanên biyanî’ ne çareser bike.

Piştî ku Îsa derkete asîman, di yortiya Pentikostê ya cihûyan de Hewarî: *“Tev bi Giyanê Pîroz hatin dagirtin û dest bi axaftina zimanên biyanî kirin...Hemû hatin gel hev (carekedin nîşandaneke vekirî ya xelatan!) û mat man, ji ber ku axaftina wan ji aliyê her kesî ve bi zimanê wan yê zikmakî dihat bihîstin. Û wan ji hev re gotin: ‘Binerin evê ku diaxifin ma hemû ne ji Celîlê ne? Çawa çêdibe ku em her yek bi zimanê xwe yê zikmakî (heman gotina Yunanî weke ‘lîsanan’ hatiye wergerandin) dibihîzin? Kesên Medî, yê Partî, ... em tev zimanê xwe yê zikmakî ji wan dibihîzin’ û li xwe û ecêba li hemberî xwe mat man...Û ewana bi tevayî mat man”* (Acts 2:4-12). Bi

taybetî du caran tê diyar kirin ku gel mat maye. Heger ku wî gelî gotinên tevlîhev û bê wate yê kesên ku di roja me de dibêjin ku ew xwediyê xelatê ne bibihîstana wê ew encam derneketa holê. Û wê demê li şûna bûyera ku di Acts 2' de hatiye jîyîn, wê rewş bi awayekî din bûya. Wê bûba sedema biçûk kirin û henekpêkirinan.

Ji xeynî nêzîkbûna di navbera 'ziman' û 'lîsan'an de, di Acts 2:4-11 de, 'ziman'; bi wateya 'lîsan' ji beşên din yê Ahîda nû zêdetir hatiye bikaranîn. Gotina "gel, netew û ziman" di pirtûka **Îlhamdan**'ê de, ji bo diyarkirina tevayê gelên cîhanê pênc caran hatiye bikaranîn (Rev. 7:9 ; 10:11 ; 11:9 ; 13:7 ; 17:15). Gotina Yunanî ya ku tê wateya 'zimanan' di versiyona Yunanî ya Ahîda kevin de (ya ku jê re Septuagint tê gotin) weke 'lîsan' derbas dibe (Binêre. Gen. 10:5 ; Dt. 28:49 ; Dan. 1:4).

Di **1 Cor. 14**'de li ser bikaranîna xelata zimanan lîsteyeke fermanan heye. Ayeta 21 emîn ya ku ji Is. 28:11 hatiye girtin, ji me re diyar dike ka ji bo şahidiya li dijî Cihuyan xelat bi çi awahî hatiye bikaranîn: "Di zagona Pîroz de wiha hatiye nivîsandin: ' (Yezdan) Bi yê ku bi zimanên din diaxifin û bi lêvên din ezê banga xwe bigihînim gel'...". **Is. 28:11** dibêje ku dagirkerên Îsraîlê, bi zimanekî ku Cihûyan nizanibû diaxifin. Girêdana di navbera 'zimanan' û lêvan'de dide nîşandan ku 'ziman' 'lîsanên biyanî'ne. Di vî beşî de Pavlus komika yekemîn rexne dike ku ew, xelatan bi awayekî xerab bikar tînin. Dema ku ev rexne tê kirin, li ser pêxemberî û xelatên zimanan pir gotinên nû jî tene gotin. Emê niha şroveyeke kurt li ser vê yekê bikin. Li vir ayeta bingehîn, ayeta 37 emîn e ku li jêr tê pêşkêş kirin:

"Yekî ku xwe pêxember an jî ruhanî dibîne hebe, lazime bizanibe ku ez fermanên Yezdan ji we re dinivîsînim."

Yê ku xwe xwediyê xelata giyanî dibîne, lazime fermanên Yezdan yê di derbarê bikaranîna xelatan de ku bi Wehî hatine, bipejirîne. Ji ber vê yekê yê ku îro perestiya wan fermanan nakin, bi awayekî vekirî dixwazin bibêjin ku ew rêza gotinên Yezdan nagrin û wan biçûk dibînin. **Ayetên 11-17** bi vî awahî ne:

"Ji ber vê eger ku ez wî zimanê ku tê axaftin nizanibim, ez û ye axaftvan emê ji hevdu re biyanî bin."

Ji ber ku hûn dixwazin bibin xwediyên xelatên giyanî, divê hûn di pêşxistina civakê de serkevî bin. Lewre kesê ku bi zimanekî din diaxife lazimê ji bo wegerandina wî duan bike.

Eger ez bi zimanekî ku nizanîm duan bikim wê demê wê giyanê min duan bike, lê belê mêjiyê min tu berheman nade.

Wê demê divê çi were kirin? Ezê bi giyanê û mêjiyê xwe duan bikim: Ezê bi giyan û mêjiyê xwe jî îlahiyan bibêjim.

Eger ne wisa be dema ku tu bi giyanê xwe şukur bikî û ew kesê nezan yê li odeyê tiştêkî ji te fêm neke, wê çawa bibêje ‘Amîn!’

Dibe ku tu bi awayekî baş şukur dikî, lê ew kesên din bi pêş naxe.”

Ji ber vê yekê di ayînekê de axaftina ku kes jê fêm neke, ne watedar e. Destûra bikaranîna gotinên têkel û bêname nîne. Wê mirov çawa ji bo duayeke tevlihev û bêwate bi durustî bibêje ‘Amîna?’ Bînin bîra xwe ku **Amîn** tê wateya “Bila wiha be” yanî “Dîvê duayê de çi hatibe gotin ez dipejirînim.” Pavlus wiha dibêje: “Eger hûn bi zimanekî biyanî bi birayên xwe re biaxifin, ew bi pêş nakevin.”

19. Ayet

“Li şûna ku ez di nava civakê de bi zimanekî ku nayê zanîn deh hezar gotin bibêjim ezê bi riya gotina xwe ji bo perwerdekirina kesên din jî bi mêjiyê xwe pênc gotina bibêjim wê baêtir be.” Ev tiştêkî eşkere û diyare. Bi zimanê min yê zikmakî hevokeke kurt jî di derbarê Mesîh de, wê ji min re baştir be, ji gelek gotinên biyanî yên têkel ku bi saatan ez lê guhdarî bikim.

22. Ayet

“Ji ber vê yekê axaftina bi zimanên ku nayê zanîn ne ji bo bawermendan (we were ragihandin) lê belê nîşana hebûna heksên bêbawerî ye. Pêxemberî ne ji bo yên bêbawer e. Ew ji bo bawermenda ye.”

Lewre zimanên biyanî di bangên berê yên Mizgînê de dihate bikaranîn. Lê dîsa jî di roja me de ew kesên dibêjin ku ew xwediyê xelata ‘zimanan’ e, tecrubeya wan şexsî ye û di nava komên bawermend de belav nebû ye. Êdî mirov rastî wan kesan nayê ku bi awayekî mucîzeyî bi zimanên biyanî diaxifin û Incîl belav dikirin. Di destpêka salên 1990 de, li rojhilatê Ewropa ji bo belavkirina ola baweriyên Mesîh dergehek vebû, lê belê komikên ku ji wan re dibêjin “**Evangelîst**” bi sedema nezaniya ziman neçar man ku çavkaniyên xwe yên nivîskî bi zimanê Înglîzî belav bikin. Eger ku ew xwediyê xelata ‘zimanan’ bûn, gelo çima bi kar nehanîn? Her wiha Evangelîstê bi navê **Reinhardt Seiber** ku gelek kes li xwe kom kiribûn û xwe xwediyê tenha yê giyan didît li bajarê Kampala yê Ogandayê neçar ma ku bi riya wergêrekî xîtabî gel bike.

23. Ayet

“Eger tevayî bawermendan li cihekî bicivin û her kes bi zimanekî ku nizanibe biaxife û di wê demê de yekî nezan yan jî bê bawerî têkeve hundir ma wê nefikire ku hûn din bûne?”

Musulman û pûtperestan jî li seranserê Afrîka rojhilat tinaziyên xwe bi wan kesên ku xwe xwediyê xelata zimanan didîtin kirin. Yekî Xiristiyani jî eger nêzikî civîneke Pentikostan bibe wê bifikire ku tevayî endaman dîn bûne.

27. Ayet

“Eger ku wê kesek bi zimanekî biyanî biaxife pêwîste du an jî bi piranî sê kes bi dorê biaxifin û yek îj wergerîne.”

Di ayînekê de lazim bû du an jî sê kesên ku bi zimanê biyanî biaxifin hebin. Wê demê nabe ku mirov bi zêdetirî sê zimanênbiyanî cuda xîtabî civakeke guhdar bike. Eger ku her hevoka axaftvan bi du zimanên cuda were wergerandin wê ayîn di demeke kurt de ahenga xwe wenda bike. Eger ku li navenda Londonê li gel civaka Înglîz hinek turîstên Alman û Fransîz jî amade bin û ew xwediyê xelata zimanan bin axaftvanan dikaribûn bi vî awahî dest bi axaftina xwe bikin. **Rhîb:** Good evening (Şevbaş.)

Axaftvanê yekemîn bi zimanê biyanî: Bon soir

Axaftvanê duwemîn bi zimanê biyanî: Guten Abend

Lê belê lazime ew li pey hev biaxifin, eger ku hemû bi hev re biaxiviyana wê tevlîhevî derketa. Lê dîsa jî ji ber taybetiya dilovanî ya ‘axaftinên bi zimanên biyanî’ bûyer bi awayê ku gotin ji devê gelek kesan bi carekê derkevin çêdibin. Li gorî çavdêriya min dema ku kesek dest bi wergerê dike yê din yekser dikevin bin bandora pêkanîna heman karî.

Xelata zimanan, bi piranî ji bo ku axaftvan bikaribe banga Yezdan (bi riya xelata zimanan) bi zimanekî biyanî jî (bi riya xelata pêxemberiyê) pêşkêş bike, hatiye bikaranîn. Nimûneyeke bikaranîna van her du xelatan dikare di, Acts 19:6 de were dîtin. Li gel vê yekê, heger ku li Londonê di civînekê de, li gel şênîyê Ingilîz gelek mêvanên Frensî jî amade bin û di wê civînê de axaftvan bi Frensî biaxife, wê Ingilîzên li wir bi pêş nekevin. Ji ber vê yekê lazime xelata wergera zimanan, bi awayê ku her kes bikaribe fêm bike –di nimuneya me de, wergerandina ji zimanê Frensî bo Ingilîzî- were pêşkêş kirin. Heger ku ji aliyê beşdarekî Frensî ve pîrsek bihatiba kirin, her çiqasî ew xwediyê xelata axaftina bi zimanê Frensî be jî, wê axaftvan bê alîkarî ji wê pîrsê fêm nekira. Ji ber vê yekê xelata wergerê weke alîkariyekê tê pêşkêş kirin.

Dema ku pêwîstî were dîtin, û kesek ne xwediyê xelata wergerê be, mirov nikare xelata ziman jî bikar bîne: “bi yekî bidin wergerandin. Lê heger wergêrek nehat dîtin, wî di nava civatê de bêdeng bikin” (1Cor. 14:27,28). Ev rastîyeke ku, xwedanên xelata ziman yê dema me, ku bi zimanekî biyanî û bê wergêr diaxifin, bi van fermanan re di nava nakokiyekê de ne.

32. û 33. Ayet

Giyanê pêxemberan, dibin kontrola wan de ye. Ji ber ku Yezdan, di tevayê civakên Pîroz de, başiyê diafirîne.

Bi vî awahî xwedantiya xelatên Giyanê Pîroz, bi tecrubeya mirov ya derketina derveyî sinorên fêhm kirina şexsî re dibe yek. Giyan ne hêzeke ku xebatkarên xwe têxe bin bandorê û tiştên derveyî daxwaza wan bi wan bide kirin. Ew dikeve bin bandora xebatkar. Gelek caran şaşiyêke wiha tê kirin û tê gotin ku ew bi awayekî bê parastin xwediyê şeytan an jî ‘giyanên xerab in’. Lê belê Giyanê Pîroz mirovan têr dike. Lê belê hêza giyan ya ku behsa wê di *1 Cor. 14:32* de tê kirin, ji bo armancên taybetî dibin kontrola xwedî de bû, li vir li dijî hêza xerab ya di cewherê însan de, behsa hêzeke baş nayê kirin. Û me berê jî dabû xuyakirin ku ev hêza Giyanê Pîroz ne her demê, lê belê hinek deman ji bo pêkanîna armancên taybetî ji hewariyan re dihat. Ji xwediyên xelatan lava tê kirin ku ew wan di cihên baş de, wekî hezkirina Yezdan ya ji hizurê û dijîtiya wî ya li hemberî têkeliyê (a. 33) de bikar bînin. Lê belê ev yek di nava komikên ‘Pentfokostî’ de weke nezaniyê tê dîtin.

34. Ayet

“Di civînan de bila jin ên we b ê deng bin; ji ber ku mafê wan yê axaftinê tune ye; lê belê mîna ku zagona Pîroz dibêje, ferman hatiye dayîn ku ew perestiyê bikin.”

Di çerçoveya bikaranîna xelatên giyan de, wisa bi cîh bûye ku jin nikarin van xelatan di dema Ayînê de bikar bînin. Heger ku şeweya axaftina têkel, di nava komekê de bi gotinên hişyarkirina dilovaniyê were diyar kirin, hêvî ewe ku her kes dibin wê bandorê de nemîne. Dibe ku jin û zarok –(ku di rastiyê de temsîla mîzacên bêdeng dikin) têkevin bin bandora van gotinan û bi awayekî şaş gotinên wekî ‘xelata zimanan’ bikin. Li Dêrên modern, nav û dengê jinên ku bi xelata ziman axifîne an jî pêxemberî kirine, gelek e. Lê belê ew yek bi fermana Ayetê re di nava nakokiyekê de ye. Hinek ramanên ne di cîh de hene ku dibêjin, Pavlus neyarê jinan bû ye. Lê belê ev ramana ne rast piştî Ayetan tê vala derxistin: “Heger yek xwe pêxember an jî ruhanî dibîne, pêwîste bizanibe ku ez ji we re fermana Yezdan dinivîsînim (1 Cor. 14:37) – ne ya Pavlus bixwe.

2.4 PAŞVEBIRINA XELATAN

Xelatên mucîzeyî yên giyanên Yezdan, wê piştî vegera Mesîh ji bo avakirina serdestiya Yezdan li vê cîhanê, carekedin ji aliyê bawermendan ve

wê werin bikaranîn. Bi vê sedemê ev yek ji bo xelatan tê gotin, “hêzên cihana pêşerojê (Heb. 6:4,5). Û Joel 2:26-29 jî dibêje, piştî ku Îsraîlê tobe kiriye gelek xelatên giyan hatine rijîn. Wê ev xelat piştî vegera Mesîh ji bo însanan werin pêşkêş kirin, û ev yek jî diyar dike ku niha kes ne xwediyê wan e. Heger Xirîstiyanekek bi balkêşî berê xwe bide, Nivîsên Pîroz û bûyerên cihanê, wê bibîne ku vegera mîrzayê me Îsa pir nêzîk e (Binere. Li lêk 3).

Di navbera sedsala yekemîn û hatina duwemîn (ya Îsa) de, di wextekî de xelat bi paşve hatine birin, û li ser vê yekê di Incîlê de kehanetên vekirî hene.

“Wê pêxember xelas bibin; wê dawîya zimanan were û wê zanebûn (xelata wê) jî holê rabe. Ji ber ku zanebûna me û pêxemberiya me bi sînor in. Lê dema yê bi rêk û pêk were wê yê bi sînor jî holê rabe” (1 Cor. 13:8-10). Xelat “ji bo demekê ne” (G.N.B.).

Xelatên ku di sedsala yekemîn de hebûn, “dema ku yê bi rêk û pêk were” wê bi paşve bêne kişandin. Ev yek ne hatina Îsa ya duwemîn e, jî ber ku wê di wê demê de xelat carekê din werin dayîn. Gotina ‘bi rêk û pêk’ di zimanê Yunanî de tê wateya ‘yê tijî ango temam’. Û ev her wiha tê wateya yê bê guneh.

Wê vî tiştê tijî (gihîştî) şûna zanebûna bi sînor ya ku weke xelata pêxemberiyê di dema Xirîstiyaneke destpêkê de dihat pêşkêş kirin bigirta. Bînin bîra xwe ku pêxemberî ragihandina gotinê Yezdan e. Incîl jî nivîsandina van hevokan pêk tê.

Di sedsala yekemîn de, bawermendekî encex dikarîbû mîna me beşekî ji Ahîda nû bizanibe. Wî dikarîbû bi gelemperî hinek tiştan li ser jiyana Îsa bizanibe. Yan jî çend nameyên Pavlus di dema xwendinê de guhdar kiribûn. Lê belê dema ku gotinê pêxemberan hatin nivîsandin û belav kirin, êdî pêwîstî bi xelata pêxemberiyê nema. Ya ku hate temam kirin û xizmeta xelatên giyan berdewam kir **Ahîda nû** bû:

“Tevayê Nivîsên Pîroz dibin bandora Yezdan de hatine dayîn, û ew jî bo fêrkirin, anîna ser riya rast û perwerde kirina di riya rast de baş in: bi vî awahî zilamê Yezdan dikare bi rêk û pêk be” (2 Tim. 3:16,17).

Yên ku mirovan bi rêk û pêk dikin ‘teveyê Nivîsên Pîroz in’. Ji ber vê yekê piştî ku teveyê Nivîsên Pîroz hatin nivîsandin û “yê bi rêk û pêk hat” xelatên mucîzeyî bi paş ve hatin kişandin. Efesî 4:8-14 yan di wê demê de kevir bi cîh kirin û xaçepirsa li hev anîna wan çareser kirin:

“Dema ku Ew (Îsa) derkete bilindayîyê (asîman), wî... jî bo ku bedena (civaka) Mesîh bi pêş xîne, xelatên (giyanî) dane mirovan; heta ku em tev bigihîjin yek baweriyê û zanebûna Lawê Yezdan... Êdî em ji niha û pê ve, ne ew zarokin ku bi ber bayê her gotinê kevin.”

Xelatên sedsala yekemîn ta gihîştina zilamê bi rêk û pêk hatibûn dayîn. Û 2 Tim. 3:16,17 ; bi riya pejirandina rêberiya Nivîsên Pîroz wê yekê dibêje: “Zilamê Yezdan bi rêk û pêk (e)”. Col. 1:28 jî dide zanîn ku bi rêkûpêkî jî

bersivdana Soza Yezdan hatiye. Piştî ku mirov bibe xwediyê tevayê Nivîsên Pîroz, êdî ne pêwîste ku hinek komik mirov di nava têkeliya doktrînan de mat bihêlin. Bi tenê Incîlek heye ku em bikaribin bi riya wê “Gotina te rastî bixwe ye” (Jn. 17:17) û bi riya xebata di nava rûpelên wê de *Eph. 4: 13* yek baweriyê, “**yekîtiya baweriyê**” bibînin. Bi vî awahî Xirîstiyânên rasteqîn, di encama yê temambûyî û bi rêk û pêk de (weke ku hatiye nivîsandin, gotina Yezdan ya temambûyî) gihîştine radeya bi rêkûpêkiyê û bidestxistina yek baweriyê. Berî derbaskirina vê mijarê bala xwe bidin *Eph. 4:14* ku dibêje, dema ku mirov dibin xizmeta xelatên pîroz de be, mirov wekî zarokekî giyanî ye. Her wiha ji bo kirina pêxemberiyê û birina xelatên mucîzeyî jî hinek tiştan dibêje. *1 Cor. 13:11* de jî heman tiştan diyar dike. Di dema me de bang kirina ku mirov niha jî dikare bibe xwediyê xelatên giyanî, ne nîşana gihîştina bi rêkûpêkiyê ye. Tiştê ku lazime xwendevanên van gotinan bikin ewe ku, bi riya wan xwe diyar kirina Yezdan ya ji bo me bibînin, bi perestiyêke rêzdar bersiva wê bidin û gotinên Yezdan yên nivîsandî teqdîr bikin.

MIJAR 2: PIRS

1. Wateya ferhengî ya gotina “giyan”ji yên li jêrê kîjan e?
 - a) Hêz
 - b) Pîroz
 - c) Hilm
 - d) Toz
2. Giyanê Pîroz çi ye?
 - a) Kesek e
 - b) Hêz
 - c) Hêza yezdan
 - d) Beşekî ‘sêyîfîyekê’
3. Incîl bi çi awahî hatiye nivîsandin?
 - a) Însana fikrên xwe nivîsandin
 - b) Însanan ramanên xwe yên di derbarê wateya Yezdan de nivîsandin
 - c) Bi wesîteya giyanê Yezdan û îlhamdana mirovan
 - d) Hinek beş bi bandorê û yên din bê bandor in
4. Ji yên li jê rê kîjan sedemên dayîna xelatên giyan yên mucîzeyî ne?
 - a) Piştgirî kirina daxuyaniyên Incîlê yên devkî
 - b) Pêşxistina komika yekemîn
 - c) Bikaranîna zorê ji bo ku însan bigihîjin rastiye
 - d) Parastina hewariyan ji zoriyên kesanî
5. Em dikarin rastiya yezdan ji kuderê fêr bibin?
 - a) Hinekî ji incîlê û hinekî jî ji cem xwe
 - b) Derveyî nivîsên Incîlê, bi gotina giyanê yezdan
 - c) Bi tenê ji Incîlê
 - d) Ji wezîfedarên olî/rahîban

3.1 SOZÊN YEZDAN: DESTPÊK

Di vê qonaxa xebata xwe de, em têgihîştin ka Yezdan kî ye û bi çi awahî xebatê dike. Bi vî awahî me gelek raman û têgihîştinên çewt derxistin ronahiyê. Niha jî emê bi awayekî berferê li ser sozên ku Yezdan ji bo hezkiriyên xwe kirine rawestin. Bi şertê pêkanîna fermanên Wî (Jn. 14:15) Yezdan hinek soz dane hezkiriyên xwe (James 1:12 ; 2:5).

Di Ahîda kevin de sozên Yezdan, yên pêkanîna hêviya Xirîstiyaniya rasteqîn in. Dema ku Pavlus bi daxwaza mirinê dihate dadkirin, ew amadebû her tiştî bide û ji ber vê yekê behsa xelata pêşerojê kiriye: “Ji bo ku min hêviya xwe bi soza ku Yezdan dabû bav û kalên me ve girêdaye ez li vir im û tê me dadkirin...Ez di oxira hêviyê de...tême tawanbar kirin (Acts 26:6,7). Wî piraniya temenê xwe bi belav kirina ‘peyama xweş’ (Mizgîn)ê; awayê soza ku ji bav û kalan re hatiye kirin derbaskir “Yezdan Îsa (ji mirinê rakir) bilindî aşîman kir û ev yek pêkanî” (Acts 13:32,33). Pavlus di roja dadkirina bawerkirina van sozan û vejîna ji mirinê de (Acts 26:6-8 krş. 23:8), da xuya kirin ku ew hêviya hatina Îsa ya duwemîn û pêşketina serdestiya Yezdan (Acts 24:25) ; 28:20,31) dide.

Ji ber ku Ahîda kevin ji behda jiyana bê dawî bêhtir behsa dîroka Îsraîlê dike, dihêle ku em têkevin nava efsaneyekê. Yezdan ji beriya 2000 sal ve ne ji nişkê ve biryar da ku bi riya Îsa jiyana bê dawî pêşkêşî me bike. Ev pîlan ji destpêkê ve bi wî re bû.

“Yezdan berî destpêka cîhanê soz kir ku hêviya jiyana bê dawî bide me; lê wî gotina xwe di belavokan de (di derbarê vê de) di wextê wê de ragihand (Tit. 1:2,3).

“Jiyana bê dawî ya li gel bav, ya ku ji me re hat ragihandin...” (1 Jn. 1:2).

Heger ku pîlana Yezdan ya ku jiyaneke bê dawî pêşkêşî gelê xwe bike, ji berê ve bi wî re bû, wê demê çawa dibe ku ew li gora Ahîda kevin di tîkiliya xwe ya 4000 sal de li gel mirovan di derbarê vê yekê de bédeng maye. Di rastiye de Ahîda kevin tîjî kehanet sozên di derbarê vê hêviyê de ne ku Yezdan ji bo gelê xwe amade kiriye. Sedemê vê yekê ewe ku, fêmkirina sozên ku Yezdan dane bav û kalên Cihuyan ji bo rizgariya me gelekî watedar in. Li ser vê yekê Pavlus aniye bîra bawermendên li Efesê ku ewana : “Bê Mesîh bûn, li derveyî civaka gelê Îsraîlê bûn, û li cîhanê bê hêvî û bê yezdan, ji peymanên soz re biyanîbûn” (Eph. 2:12). Bê gûman, ew di wê baweriyê de bûn, ku ramana putperestiyê berî vê hinek hêvî û zanebûna yezdan dabû wan. Lê belê ev yek dîsa jî dide nîşandan ku, nezaniya sozên yezdan yên Ahîda kevin, ciddiyeta cîhaneke bê hêvî û bê yezdan dide nîşandan. Bînin bîra xwe ka Pavlus hêviya Xirîstiyaniyê çawa dide naskirin : “Hêviya soza ku yezdan daye bav û kalên me (Cihû)” (Acts 26:6).

Cihê xemgîniyê ye ku kê m civat (dêr) girîngiyê didin van beşên Ahîda kevin. Weke ku “Xirîstiyani” oleke bi tenê girêdayî Ahîda nû be – û hetta ji wê jî bikaranîna çend ayetan – ji rastiya wê tê bi dûr xistin. Îsa riya rastî bi vî awahî dide nîşandan:

“Heger ew gûh nedin yê Musa (ango her pênc pirtûkên Incîlê yê ku ji aliyê Musa ve hatine nivîsandin) û pêxemberan, wê yekî ku piştî mirinê zindî jî bibe nikaribe wan bîne ser rê (Lk. 16:31).

Hişê xwezayî dikare bawer bike ku Îsa ji nû ve zindî bûye (krş. Lk. 16:30). Lê belê Îsa bixwe gotiye ku; bêyî bawer kirina bi Ahîda kevin ev yek (îman)ne gengaze. Piştî ku Îsa di çarmîxê de hat kuştin, baweriya mûrîdan şkest. Vî tiştî nîşan dida ku ew bi balkêşî li ser Ahîda kevin kûr nebûne. Ev ji aliyê Îsa ve hat dîtîn:

“Wî (Îsa) ji wan re got: ‘Bê aqilno û kê m bawerîno li hemberî gotinên pêxemberan: Ma ne pêwîstbû ku Mesîh van tiştan (êşan) bikşîne û bigihîje rûmeta xwe (mirina wî)?’ û hemû tiştên li ser xwe yê di Nivîsên Pîroz de, ji yê Musa bigre ta yê tevayê pêxemberan ji wan re gotin (Lk. 24:25-27).

Bala xwe bidinê ku çawa tevayê Ahîda kevin wî tîne ziman. Tiştê ku li vir tê gotin ne ewe ku mûrîdan gotinên Ahîda kevin nebihîstine an jî qet nexwendine, tê gotin ku wan ew gotin baş fêmkirine û ji ber vê yekê pê ne bawer in. Ji ber vê yekê, ji bo pêşxistina baweriyê rast, xwendin bi tenê ne bes e, fêmkirina soza Yezdan bi awayekî rast pêwîste. Cihû, di xwendina Ahîda kevin de pir heweskar bûn (Acts 15:21) ; lê belê ji ber ku wan nîşanên Îsa û Mizgîna wî fêmkiribûn, baweriya wan jî bi awayekî rast pê nehatibû. Ji ber vê yekê Îsa ji wan re ev got:

“Heger we baweriya xwe bi Musa anîbûya, we yê baweriya xwe bi min jî bianiya. Ji ber ku wî di derbarê min de nivîsand. Lê belê, heger hûn baweriya xwe bi nivîsên wî neynin hûnê çawa baweriya xwe bi gotinên min binin? (Jn. 5:46,47)

Her çiqasî wan Incîl dixwend û ji bo pêkhatina rizgariyê hêvîdarbûn jî, wan banga Îsa ya rastî nedîtîn. Îsa ji wan re wiha got:

“Hûn nivîsên Pîroz lêdikolin (ango bi şeweyê rast-krş. Acts 17:11); ji ber ku hûn difikirin ku di wan de jiyaneke bê dawî heye (hûn pê bawerin) û yê ku şahidiya min dikin jî ew bixwe ne” (Jn. 5:39). Û bi vî awahî wê gelek kes bibin xwediyê kurtahîya zanebûn û bûyerên Ahîda kevin. Ev zanebûneke ku wan ji nişkêve li hev kom kirine. Dîsa, banga Mesîh û mizgîna serdestiya Yezdan ji ber çavên wan wenda dibe. Armanca vê xebatê ewe ku wateya rastî ya sozên Ahîda kevin nîşanî we bide û derxîne derveyî vê rewşê.

Sozên di Ahîda kevin de : **li bexçeyê bihuştê, j i bo Nuh, Ibrahîm û Dawid** hatin dayîn. Agahiyên di derbarê wan de, di her pênc pirtûkên Incîlê yê ku Musa nivîsandine de û di nivîsên pêxemberên Ahîda kevin de têne dîtîn. Her tiştê Mizgîna Xirîstiyanan li wir tê dîtîn. Pavlus ev yek anî ziman ku ev yek di belavoka Mizgîna de jî gotiye: “Evana ew tiştên ku Musa û

pêxemberan digotin ku ewê çêbibin; yek ji wan ewe ku lazime Mesîh êşê bikşîne û bibe yekemîn kesê ku piştî mirinê zindî dibe û bibe ronahî li pêşiya gel” (Acts 26:22,23). Û di rojên wî yên dawiyê de jî daxuyanî weke xwe ma: Wî (Pavlus) serdestiya Yezdan ragihand û şahidiya wê kir...li ser bingeha nivîsên Musa û pêxemberan, ji sibehê ta êvarê” (Acts 28:23).

Divê hêviya Pavlusê berz yê Xirîstiyên, ji me re jî bibe hêza meşê. Lazime ew ronahiya bi rûmet ya li dawiya tûnelê jiyana wî, bibe nesîbê her Xirîstiyaneke. Bi vexistina wî agirê pîroz, em niha dikarin Nivîsên Pîroz lêbikolin.

3.2 SOZA LI BEXÇEYÊ BIHUŞTÊ

Çiroka xemgîn ya çêbûna benîadem, di 3.beşê afirînê de hatiye ziman. Mar hate lanet kirin ji ber ku wî gotina Yezdan şaş got û hewwa ji rê derxist ku êdî perestiya wî neke. Jin û zilam bi sedema bi cîh neanîna perestiyê hatin ceze kirin. Lê dema ku Yezdan vê yekê ji mar re dibêje, di wî şiklê tarî de ronahiyeke hêviyê vêdikeve:

“Ezê dijminatîyê têxim navbera te û jinan, navbera nîjada te û ya wan; wê ew (nîjada jinê) serê te biperçiqîne û tê jî kabîka wê biêşîne” (Gen. 3:15).

Ev ayet gelekî berferehe, lazime em pir tiştan bi bi taybetî bidin naskirin. ‘nîjad’ (dol) tê wateya neví an jî ewlad. Lê ev her wiha dikare ji bo miletê ku ji nîjadekê tên jî were gotin. Emê pişre jî bibînin ku nîjada Ibrahîm (dola wî) Îsa bû (Gal. 3:16) ; lê eger ku em bi riya vaftîzme xwe bigihînin Îsa, em jî ji wê nîjadê ne (Gal. 3:27-29). Ev gotina nîjad, tê wateya sperm (dol) jî (1 Pet. 1:23) ; bi vî awahî wê doleke rast, taybetiyên bavê xwe hilgire.

Ji ber vê yekê, nîjada mar û yên ku bi şibheta xwe dikevin wê nîjadê ev in:

- Yê ku gotina Yezdan çewt dike
- Yê ku derewan dike
- Yê ku berê yên din dide gunehan

Weke ku emê di mijar 6 de jî bibînin, kesekî rastîn ku van dike nîne. Lê belê di nava me de ev hene:

- ‘Kesê bi temen’ yê bedena me (Rom.6:6)
- ‘Kesê xwezayî’ (hebûna taybetî, nefis) (1 Cor. 2:14)
- ‘Kesê bi temen yê ku bi sedema xapînokan xerabûye’ (Eph. 4:22)
- ‘Kesê bi temen li gel çalakiyên xwe’ (Col. 3:9)

Ev 'kesê' gunehkar yê di nava me de, şeytanê di Incîlê de ye û ji nijada mar e.

Pêwîste nijada jinê kesekî taybetî be. "Tu yê (nijada mar) kabika wê biêşîne" (Gen. 3:15). Wê ev kes her demê nijada mar, ango guneh biperçiqîne : "Wê ew serê te biperçiqîne". Lêdana mar ji serî, ji ber ku mêjiyê wî di serê wî de, derbeya mirinê ye. Ji bo nijada jinan, berendamê tenha, dibe ku Mîrzayê me Îsa be:

Mesîh Îsa, (bi riya çarmîx) mirin (û ji ber vê yekê jî hêza guneh- Rom. 6:23) ji holê rakir; û bi riya Mizgînê jiyan û bê mirinê derxiste holê (2 Tim. 1:10).

"Yezdan lawê xwe yê rastî, di şibhetê kesê gunehkar de, ji bo guneh bi rê kir, û guneh di hundirê însan de -nijada mar, şeytanê di Incîlê de- mehkum kir (Rom. 8:3).

Îsa, "ji bo tunekirina gunehan derkete holê" (1Jn. 3:5).

"Tu yê nav lê bikî Îsa (tê wateya: Rizgarkar): ji ber ku wê ew gelê xwe ji gunehê wan rizgar bike" (Mt. 1:21).

Her çiqasî Yezdan bavê wî be, Îsa yê lawê Meryem "ji jinekê çêbûye" (Gal. 4:4). Ew bi riyeke ku însanên din nikarin çêbibin, ji aliyê Yezdan ve hat afirandin û bû **nîjada jin** ê. Nijada jinê ji bo demekê, ji aliyê guneh - nijada mar- ve hat êşandin:

"Tu yê kabika wê biêşîne" (Gen. 3:15). Dema ku mirov pêvedana mar ya bi kabikê ve, bide ber lêdana mar ya ji serê wî ve, birîneke ne xedare. Gelek awayên axaftinê ji Incîlê hatine girtin: (nimune) gotina "li serê wî bide" (ango dawîya tiştêkî bîne û wî rawestîne) dibe ku girêdana wê bi kehaneta Îsa, ya lêdana mar ji serê wî ve hebe.

Mehkumkirina guneh û nijada mar, bi qurbandana Îsa ya di çarmîxê de pêk hat. Ayetên ku me li jorê têbînî ji wan girtine, serkevtina Mesîh ya li dijî gunehan, bi raweya dema derbasbûyî anîne ziman. Ji ber vê yekê, êşa ku birîna di kabikê de daye Îsa, nişana mirina wî ya di sê rojan de ye. Dema ku mirov ji nû ve zindîbûna wî, û derbeya mirinê bide ber hev, tê dît ku ya Îsa birîneke derbasbûyî bû. Tiştêkî balkêşe ku nivîsên li derveyî Incîlê jî, dibêjin ku qurbanên çarmîxê, ji kabikên wan ve bi dar ve têne mîx kirin. Bi vî awahî, bi riya mirina xwe Îsa: "ji kabika xwe ve birîndar bû". Is. 53:4,5, dide nasandin ku ew bi riya mirina xwe ya di çarmîx de, ji aliyê Yezdan ve hatiye 'birînkirin'. Ev bi awayekî vekirî di Gen. 3:15 de behsa kehaneta ku dibêje wê Îsa ji aliyê nijada mar ve were birînkirin dike. Di encam de Yezdan, bi riya kambaxiya ku hatiye serê Mesîh şuxulîye. Ku wî di vir de lawê xwe êşandiye û bi riya kontrolkirina hêzên xerabiyê weke yê ku birîn çêkiriye tê nasandin (Is. 53:10). Ê bi vî awahî Yezdan bi riya serboriyên xerabiyê zarokên xwe jî kar dike.

ŞERÊ ÎRO

Dibe ku ev pirs ketibe serê we: “Heger ku Îsa guneh û mirin (nîjada mar) tune kiribe, wê demê çima di roja me de ev tişt dibin?”. Bersiva vê ev e, Îsa di çarmîxê de hêza guneh di nava xwe de tune kiriye: Kehaneta di Gen. 3:15 de, li ser şerê di navbera Îsa û guneh de ye. Ev tê wê wateyê ku, Wî em vexwendin ji bo ku em jî (weke wî) li hemberî mirin û guneh biserkevin, û serkevtina wî par bikin. Yên ku ji bo parvekirina serkevtina wî nehatine vexwendin, an jî nepejirandine, bê guman ewê hîna tecrubeya mirin û guneh bijîn. Tecrubeya mirin û guneh ji aliyê bawermendan ve jî tê jiyîn, lê belê ji ber ku ew bi riya vaftîzê bi nîjada jinê re dibin yek, (Gal. 3:27:29), gunehên wan dikare were bexşandin û ew dikarin ji mirinê xelas bin. Îsa di çarmîxê de, ta ku pîlana Yezdan ya di derbarê serzemîn de biqede, û di encama Mîlenyumê de (yekemîn yekhezar saliya serdestiya Yezdan) însan bi rastî mirinê bidin rawestandî, wî mirin ji holê rakiriye (2 Tim. 1:10). Wê demê wê kes êdî nebe şahidê mirinê: “ji ber ku wê serdestiya Yezdan (di yekemîn beşê serdestiya Yezdan de) bidome ta ku tevayê neyarên wî li ber lingên wî werin raxistin. Dijminê dawî yê ku ji holê were rakirin mirin e” (1 Cor. 15:25,26).

Heger em vaftîz bibin, emê bikaribin sozên di derbarê Îsa de, weke yê di Gen. 3:15’de ji xwe re têxin warekî kesani. Ewana êdî ne bi tenê beşên Incîlê yê balkêş in, ewana kehanet û sozên ku ji bo me hatine pêşkêş kirin bixwe ne. Weke nîjada jinê emê jî di demeke kurt de, li dijî gunehên xwe biserkevin. Ta ku mîrzayê me Îsa vegere dema jiyana me, emê jî weke wî ji kabîka xwe ve were birîn kirin, û emê bimrin. Eger em bi rastî ji nîjada jinê bin, wê ev birîn derbasbûyî be. Kesên ku bi riya daketina nav avê li gel Îsa vaftîz bibin, wê xwe bi mirin û zindîbûna wî re (derketina wî ya asîman) – bi riya derketina ji nava wê avê bike yek (binere. Rom. 6:3-5).

Heger em bi rastî ji nîjada jinê bin, wê gotinên di Gen. 3:15 de, cihê xwe di jiyana me de bigrin û wê di nava me de her demê şerê di navbera başî û nebaşiyê de li dar be. Hewariyê mezin Pavlus gotiye ku, di nava wî û gunehê wî de her demê şerekî xurt li dar bûye (Rom. 7:14,25).

Ev şerê me yê li dijî gunehê di nava me de, piştî vaftîzê jî wê bidome û her û her mezin bibe. Ev hinekî zor e. Ji ber ku taqeta hêza guneh zêde ye. Lê belê ji ber ku em li gel Îsa ne ku wî berê di vî şerî de serkevtin bidestxwe ve aniye, emê zêde zorê nebînin. Di Eph. 5:23-32 de, wiha tê diyar kirin ku, heger mirov ji nîjada jinê be, mirov jî dibe jin û ji ber vê yekê yê bawermend weke jinan têne danasîn.

Nîjada jinê, berpirsyariya Îsa û yê ku dixwazin taybetmendiya wî bigrin dike. Bi vî awahî nîjada mar jî berpirsyariya guneh (‘şeytanê’ di Incîlê de) û kesên ku dixwazin taybetmendiya mar û guneh bigrin dike. Kesên wiha guh nadin gotina Yezdan, an jî çewt dikan, ev jî dihêle ku ew di encam de weke

Adem û Hewa şermezar bibin û ji Yezdan bi dûr kevin. Heger em bidin ber çavê xwe ku cihûyan Îsa kuştine û jin ji kabika wê ve birîndar kirine, divê em bibînin ku ewana yekemîn nimûneya nîjada mar in. Ev yek ji aliyê Yehya yê vaftîzvan û Îsa ve wiha tê gotin:

“Yehya dît ku gelek Ferîsî û Sadukî (komika cihû ya ku Îsa mehkum kirin) bi armanca vaftîzê hatin cem wî. Li ser vî bingeşê wî (Yehya) ji wan re got: ‘Hey gidî nîjada engerekan (yên ku ji mar çêbûne)! Kê hûn hişyar kirin ku hûn ji ber xezeba ku wê were birevin?’” (Mt. 3:7).

“Îsa ramana wan (ya Ferîsîyan) naskir û got... ‘Hey gidî nîjada engerekan! Xerabên weke we wê çawa bikaribin tiştên baş bibêjin?’” (Mt. 12:25,34).

Tevayê alemê, alema olî jî, xwediyên taybetmendiyên mar in. Bi tenê yên ku li gel Îsa vaftîz bibin, wê xwe bigihînin nîjada jinê. Yê dinê tev bi awayekî ji nîjada mar in. Divê nêzîkbûna Îsa ya ji bo kesên ji nîjada mar, ji me re nimûne be:

- *Wî, bi hezkirin û dudilî xîtabî wan kir, lê dîsa jî,*
- *Wî, destur neda ku rê û ramana wan bandora xwe li ser wî çêbike; û*
- *Wî, bi riya awayê jiyana xwe, dilovaniya Yezdan nîşanî wan da.*

Dîsa jî wan ji Îsa hez nekir. Keda wî ya ji bo perestiya Yezdan ew hesidandin. Malbata Wî (Jn. 7:5 ; Mk. 3:21) û hevalên Wî yê nêzîk jî (Jn. 6:66) sînor xistin navbera xwe û Wî, hetta hinek jê ji wî bi dûr ketin. Pavlus jî di van tecrubeyan re derbas bû; û dema ku şîna yê ku di rojên xweş û nexweş de bi wî re bûn girt, wiha got:

“Ma ji ber ku ez rastiyê ji we re dibêjim, ez dibim neyarê we?” (Gal. 4:16).

Rastî tu caran populer nebûye. Naskirin û jiyandina wê, ji bo me dibe zilm û pirsgerêk:

“Ji ber ku yê ku ji bedenê diafire (bi zanistiya rast ya gotina Yezdan –1 Pet. 1:23) zilmê li yê ku ji giyan diafire dike; û niha jî ew yek dibe (Gal. 4:29).

Heger em bi rastî bi Îsa re bûbin yek, ji bo ku em xelata wî ya berz parvekin, lazime em hinek tiştên ku wî dîtine, bijîn. Dîsa Pavlud di vê derbarê de, nimuneyeke bêhempa ye ji bo me :

Ev gotineke di cih de ye: Ji ber ku heger em bi wî re (Îsa) bimrin, emê bi wî re bijîn jî. Heger em bi wî re biêşin, emê bi wî re serdestiyê jî bikin...Ji ber vê yekê ez her tiştî didim ber çavê xwe (2 Tim. 2:10,12).

“Heger wana zilm li min (Îsa) kiribin, wê li we jî bikin...Wê ji ber navê min zilmê li we bikin” (Jn. 15:20,21)-ango ji ber ku em bi navê Îsa vaftîz dibin (Acts. 2:38 ; 8:16).

Dema mirov rastî ayetên wiha tê, ev gotin dikare mirov ji ser rê bibe. “Heger ev ji ber yekbûna bi Îsa re be, û her tişt girêdayî hatina ji nîjada jinê be, ez xwe naxim nava vê zilmê”. Lê belê em tu caran ne li hêviya tiştêkî ne ku emê nikaribin pê re bimeşin. Ji bo ku em xwe bi Îsa re bikin yek, fedakariyeke mezin pêwîste. Di encam de, wê yekbûna me ya bi Wî re, were xelat kirin û “emê nikaribin rûmeta wê xelatê bidin ber êşa ku em niha dikşînin”. Û xwe qurban kirina wî, niha jî ji bo dîtina çareseriyê birînê jiyane, duayên me bi cîh tîne. Û girêdayî vê yekê, ev ewlekariya li jêr **Li gel Mesîh Bira** di weşanên civata me yên girêdayî Incîlê de gelek caran tên ziman:

“Baweriya xwe bi Yezdan binin. Ew bi ceribandîna ku zêdeyî hêza we ne, êşê bi we nade kişandin. Ji bo hûn bikaribin li berxwe bidin, li gel ceribandîna wê riyeke felatê jî nîşanî we bide” (1 Cor. 10:13)

“Ez van ji we re dibêjim ku hûn li gel min di nava aramê de bin. Hûnê li dinyayê pêşberî gelek zoriyan werin. Lê bi aram bin: ez li hemberî dinyayê bi ser ketim e” (Jn.16:33).

“Emê ji bo van tiştan çî bibêjin? Heger Yezdan li aliyê me be, kî dikare li hemberî me raweste?” (Rom. 8:31).

3.3 SOZÊN KU JI NUH'RE HATINE DAYÎN

Piştî dewrana Adem û Hewa, bi pêşketina dîroka mirovahiyê re, her ku çu însan xera bû. Rewş gelekî xerab bû û medeniyet di aliyê exlaqî de tarûmar bû. Ji ber vê yekê Yezdan biryar da ku derveyî Nuh û malbata wî, tevayê hebûnê heyî tune bike (Gen. 6:5-8). Jê re hat gotin ku ew keştiyekê biafirîne, ji bo ku di dema tofanê de bikaribe xwe û nimuneyên giyandaran (heywanan) têde biparêze. Di vê navberê de, derveyî Nivîsên Pîroz, gelek sedemên zanistî yên bawer kirina rabûna wê tofanê hene. Bînin bîra xwe ku armanc ne tune kirina serzemîna ye, armanc tune kirina “tevayê bedenên ku li serzemîna dilivin”e (Gen. 7:21), ango tunekirina însanên xerab e. Îsa (Mt. 24:37) û Petrus (2 Pet. 3:6-12), herduwan jî di cîhana Nuh de dîtî ku wê tiştên di dema vegera Mesîh de bûyî, dúbare bibin, û roja dakirinê were. Kambaxiya însanên de dewrana Nuh de, li cîhana me jî tê dîtî ku ewê bi

vegera Îsa re were ceze kirin. Ji ber gunehkariya însan û destpêkirina pîlana tune kirina vê gerestêrkê (gezegen), di nava Xirîstiyanan de jî baweriya tune kirina vê serzemînê çêbûye. Ev raman dide nîşandan ku nivîsên Incîlê bi balkêşî nayêne şîrovekirin. Yezdan bi karê vê gerestêrkê re bi awayekî aktîf mijûle. Û wê Îsa ji bo avakirina serdestiya Yezdan ya li serzemîna me, di demeke nêzîk de vegere. Heger destûr bihata dayîn ku însan vê gerestêrkê tune bike, wê demê wê ev soz nehatana bi cîh anîn. Delîlên ku wê serdestiya Yezdan li serzemînê were avakirin, dikarin di Mijar 4.7 û Mijar 5 de werin dîtin. Di vê navberê de, tiştên ku emê li jêr bidin, delîlên baş in ku dibêjin, wê cîhan û sîstema stêrkan neyê tune kirin:

“Wî cîhan bi awayekî bê dawî avakir” (Ps. 78:69).

“Wê cîhan heta hetayî bimîne” (Ecc. 1:4).

“Roj û heyv...stêrk...asîman...Wî ew jî ji bo heta hetayî afirandin û biryara mayîna wan da” (Ps. 148:3-6).

“Weke ku av deryayan dadigrin, wê serzemîn jî tijî zanebûna Yezdan bibe” (Is. 11:9 ; Num. 14:21). (Zehmete ku Yezdan dinyayê bi xwe bide tune kirin. Ev soz hîna bi cîh nehatiye.)

“Yezdan bixwe serzemîn afirand; Wî, ew avakir. Wî ew ne bê sedem avakir; ew jî bo lêrûniştinê çêkir” (Is. 45:18). Heger Yezdan serzemîn bi tenê ji bo ku li tunebûna wê temaşe bike, ava bikra; wê xebata wî bi erdê de biçûya.

Lê belê, dema ku mirov vedigere *Afirîn*’ê, mirov dibîne ku Yezdan soza van tiştan dabû Nuh jî. Belkî jî Nuh di dinyaya piştî tofanê de jî ditirsiya ku careke din tofaneke weke ya borî çêbibe. Dibe ku piştî tofanê bi barîna her baranekê re ev raman ketibe serê Nuh. Bi vê sedemê Yezdan di derbarê dûbarenebûna tofanê de peymanek (rêze sozek)çêkir:

“Vaye ez peyman xwe bi tere datînim...Ezê peyman xwe bi tere deynim (Bala xwe bidin dûbarebûna gotina ez. Wekî însanekî bi mirin ku newazeya (harika) Yezdan e, ji xwe re dayîna sozan hilnebijêre!). Wê tevayê beşeriyetê êdî bi avên tofanê neyêne rawestandî; wê jî bo tunekirina serzemînê tofan ranebe” (Gen. 9:9-12).

Ev peyman bi riya **keskesorê** hat pejirandin:

“Dema ez ewrekî (ewrê baranê) bînim serzemînê, wê di nava ewr de keskesor were dîtîn: û ezê peymanî di navbera me de bînim bîra xwe...peyman bê dawî ya di navbera Yezdan û tevayê tebayên li serzemînê...Ev, (keskesor) nişana peymanê ye” (Gen. 9:13-17).

Ev peymanêke bê dawîye di navbera Yezdan û însan û lawirên (heywanên) serzemîn de. Ji ber vê yekê pêwîste însan û lawir heta hetayê li ser vê serzemînê bijîn. Ev di nava xwe de diyar dike ku wê serdestiya Yezdan ji asîman (bihûşt) zêdetir, li serzemîn be.

Bi vî awahî soza ku ji Nuh re hatiye dayîn, bingehê Mizgîniya serdestiya Yezdan e. Ew dide nişandan ku bala Yezdan tim û tim li ser vê gerestêrkê ye û pîlana wî ya di derbarê wê de demdirêje. Di dema xezebê de jî Ew, dilovaniyê tîne bîra xwe (Hab. 3:2); û hezkirina wî wiha ye ku ew ihtîmâmê dide lawirên xwe jî (1 Cor. 9:9 krş. Jonah 4:11).

3.4 SOZA KU JI IBRAHÎM'RE HATIYE DAYÎN

Mizgîna ku Îsa û hewariyên wî fêr dikirin, di bingehê xwe de ji ya ku Ibrahîm fêm kiribû ne cuda bû. Bi riya Nivîsên Pîroz Yezdan, ji berê ve “mizgînî gihande Ibrahîm” (Gal. 3:8). Ev soz hewqasî girîngin ku Petrus, banga xwe ya Mizgînê, ya ji bo gel, bi wana destpêkiriye û qedandiye (Acts 3:13,25). Heger em tiştên ku ji Ibrahîm re hatibû şandin, fêmbikin emê bibin xwediyê wêneyekî bingehîn yê Mizgîna Xirîstiyî. Hinek nişanên din jî hene ku dibêjin, dana ‘Mizgîn’ ne di dema Îsa de destpêkiriye:

- *“Em ji bo we; peyama baş (Mizgînê), bi cih anîna soza ku ji bav û kalan re (ji cihûyan re) hatiye dayîn, radigihînin” (Acts 13:32,33).*

- *“ Yezdan, soza Mizgîna xwe bi riya pêxemberên xwe (ango Ibrahîm – Gen. 20:7) di Nivîsên Pîroz de da” (Rom. 1:1,2).*

- *“Ji ber vê yekê Mizgîn, ji bo miriyan jî hat ragihandin” (1 Pet. 4:6)- ango, bawermendên ku sedsala yekemîn de jiyane û mirine.*

- *“Ji ber ku Mizgîn, mîna wan –ango Îsrailîyên li çolê- ji bo me jî hat ragihandin” (Heb. 4:2).*

Sozên ku ji Ibrahîm re hatine dayîn, mijara du beşan e:

- (1) Tiştên girêdayî nîjada Ibrahîm
- (2) Di derbarê welatê ku soza wî ji bo Ibrahîm hatiye dayîn

Ev soz di Ahîda Nû de têne şrove kirin. Emê siyaseta xwe ya ji xwe re şrovekirina Incîlê biparêzin, û ji bo dîtina peymanê ku bi Ibrahîm re hatiye çêkirin, emê daxuyaniyên her du Ahîdan bikin yek.

Ibrahîm li bajarekî dewlemend bi navê **Ur**, ku li Îraq'a niha dikeve, jiyaye. Arkeolojiya modern, diyar dike ku di dema Ibrahîm de medeniyet gihîştibû radeyeke baş. Sîstema bankayê, xizmetên gelî û sîstema binê erdê hebû. Li gora ku tiştêkî cuda tune, Ibrahîmê ku bi qasî zanebûna me, zana û xwedî tecrubeye, jiyana xwe li wir domandiye. Lê piştê, banga Yezdan giha wî ku dibêje, lazime ew dest ji wê jiyana pêşketî berde û dest bi rêwîtiya ber bi welatê navborî bike. Her tiştê ku hatiye kirin û yê ku nebûye jî eşkere ye. Heger em hesabê hemiyar bikin, wî rêwîtiyek ji 1500 milî (2400km) kiriye. Ew welat Kenan- Îsraîla niha bû.

Di dema jiyana wî de Yezdan hinek caran xwe pêşberî Ibrahîm kir, û soza xwe ya ji bo wî dúbare û berferê kir. Ew soz, bingehên Mizgîna Mesîh'in. Ji bo Xirîstiyaniyê rasteqîn jî wê rojekê banga ku ji bo Ibrahîm hatibû were. Wê demê pêwîste ew dest ji her tiştê jiyane yê temen kurt berdin, û bidin pey gotina Yezdan.

Em dikarin di xeyala xwe de zindî bikin, ka Ibrahîm di dema rêwîtiya xwe de çiqasî kur li ser sozên Yezdan raman kiriye:

“Bi xêra baweriyê Ibrahîm, ji (Ur'ê), ber bi welatê (Kenan) ku wê weke mîrat bistenda, hat vexwendin, û wî perestiya fermanê kir û bêyî ku bizanibe bi kuderê ve diçe, daket ser rê” (Heb. 11:8).

Dema em li ser sozên Yezdan difikirin, em nikarin bizanibin ka welatê serdestiya Yezdan yê ku soza wî hatiye dayîn çawa ye. Lê belê divê baweriyê me bi gotina Yezdan hewqasî xurt be ku, em bikaribin bi daxwaz perestiya wê bikin.

Ibrahîm ne koçerek gerok bû ku bikaribe bi riya vê sozê, derfetekî ji yê di dest xwe de baştir bibîne. Heger mirov bala xwe bidiyê, tê dît ku paşerojê wî hema hema mîna ya me hebû. Biryarên zor û zehmet yê ku derketine hemberî wî, dema ku em jî biryara pêkanî an jî nepêkanîna sozên Yezdan bidin, wê derkevin pêşberî me jî. Tiştên weke nerînên hevkarên mirov yê watedar, çavdêriya cîranan (yên ku bûne xwedan ol!)... û her wiha, ji aliyê Ibrahîm ve dihatin zanîn. Ji bo hembêz kirina van tiştan teva xuyaye ku pêwîstiya Ibrahîm bi hêzeke mezin hebû. Di hemû salên rêwîtiya wî de, bi tenê soza Yezdan jê re bû alîkar. Pêwîstbû wan gotinan ji bîr neke û her roj li ser wateya wan kur bibe. Bi heman şeweya helwestê, heger ku em bixwazin bibin hevalên Yezdan (Is. 41:8), em bixwazin zanebûna Yezdan bibînin (Gen. 18:17) û dibin serdestiya Yezdan de, baweriyê xwe bi jiyaneke bê dawî binin, em jî dikarin bibin xwediyê heman şahnaziyê. Em dixwazin dîsa dúbare bikin ku Mizgîna Îsa girêdayî sozên ku ji Ibrahîm re hatine dayîn

e. Ji bo ku em baweriya xwe bi banga Xirîstiyaniyê bînîn, lazîme em sozên ku ji Ibrahîm re hatine dayîn, bizanibin. Bêyî wan îmana me, ne îman e. Ji ber vê yekê pêwîste em bi balkêşî, danûstendina di nava Yezdan û Ibrahîm de bixwînin û carekedin bixwînin.

WELAT

- 1) *“Tu biçê derveyî welatê xwe... biçê welatê ku ez nîşanî te bidim” (Gen. 12:1).*
- 2) Ibrahîm *“rêwîtiya xwe domand...Ber bi Beytelê ve (di nava Israîlê de ye). Û Yezdan ji Ibrahîm re got, ‘Niha serê xwe rake û ji cihê ku tu lê yî, li başûr û bakûr, rojhilat û rojava binere: ezê van xakên ku tu dibînî bidim te, û nîjada te ji bo heta her demê...li seranserê vê axê bimeşe...Ji ber ku ezê wê bidim te” (Gen. 13:3, 14-17).*
- 3) *“Yezdan bi Ibrahîm re peyman çêkir û got: ‘Ji çemê Misrê ta çemê mezin, ta çemê Feratê min ev diyar da te û nîjada te” (Gen. 15:18).*
- 4) *“Ezê vî diyarê ku ji bo te biyanî ye, diyarê Kenanê, wekî mal û milkekî ebedî bidim te û nişê te yê pêşerojê (Gen. 17:8).*
- 5) *“Soza ku Ibrahîm bibe mîratxwirê cîhanê” (Rom. 4:13).*

Em li vir dibînin ku her demê sîrek ji bo Ibrahîm tê gotin:

- 1) *‘Welatekî ku ez dixwazim tu biçiyê heye’.*
- 2) *‘Tu niha gihîştîye herêmê. Wê tu û zarokên te heta hetayê li vir bijîn’.* Bala xwe bidîne ku ev soza jiyana bê dawîn, bê şox û perçinandin hatiye nivîsîn. Bê gumane ku wê nivîskarekî însan ev yek bi awayekî din diyar bikra.
- 3) Herêma xakên ku soza wan hatiye dayîn, bi taybetî hatiye danasîn.
- 4) Ibrahîm ne li hêviya wê bû ku li vê jiyana bibe xwediyê wê sozê. Her çiqasî ewê piştre heta hetayê li ser wan xakan bijî jî, ew weke “biyanîyekî” li ser wan xakan bû. Tiştê jê tê fêhm kirin ewe ku ewê bimre û piştre, ji bo bi dest xistina derfeta vê sozê carekedin zindî bibe.
- 5) Dema ku Pavlus dibin telqînê de bû dît ku, sozên ku ji bo Ibrahîm hatine dayîn, têne wateya ku ewê bibe mîratxwirê hemû dinyayê.

Nivîsên Pîroz, tînin bîra me ku Ibrahîm di xweşiya xwe de pêkhatina sozan bi dest xwe nexistiye û derdikevin derveyî sînorên behsa xwe:

“Bi xêra baweriyê ew (Ibrahîm); weke biyanîyekî, di konên seyar de jîn bû, û li ser xakên ku soza wan girtibû, ji bo demekê (riya jiyaneke ji bo demekê tîne ziman) ma” (Heb. 11:9).

Li welat wekî biyanîyekî, belkî jî bi bêbaweriyeyeke mîna ya penaberekî jiyana kir. Ew li ser xakên xwe tevî zarokên xwe di nava zoriyê de dijiya. Tevî zarokên xwe Ishaq û lawê wî Yakup (ku soz ji bo wî jî hatin dubare kirin) ew, *“di nava îmanê de mir: nehîşt sozên ku hatibûn dayîn, lê ew ji dûr ve dîtibûn û qane bûbû, ew hembêz kiribûn û pejirandibû ku li cîhanê biyanî û mêvan in” (Heb. 11:13).*

Bala xwe bidin van çar pêvajoyan:

- Bi naskirina sozan – weke ku em di vê xebatê de dikin.
- *“Bawerîya xwe bi wan anî”* – heger ku qane bûna Ibrahîm hewqas wext xwaribe, gelo wê ya me çiqas wext bixwe?
- Ew hembêz kirin – Bi riya vaftîzbûna li gel Îsa (Gal. 3:27-29).
- Bi pejirandina ku cîhan riya jiyana me ye – Ev dinya ne mala me ya rastîn e; lê em bi hêviya hatina dema pêş dijîn.

Heger em van tiştan bipejirînin, Ibrahîm dikare bibe lehengê me. Dema ku xanima wî mir, ji bo ku wê binax bike, hinek ji wê axa ku soza wê hatibû dayîn kirî (Acts 7:16). Birastî jî Yezdan *“Tu mîrat ji wan axan nedayê, bi qasî şopa lingên wî jî nedayê, lê belê Wî dîsa jî soz dayê ku wê axê weke milk bide wî” (Acts 7:5).*

Nîjada Ibrahîm ya niha, -li gora ku dinya weke mîrata wan ya ebedî û şexsî ji wan re hatiye hiştin!- dema ku milkan dikrin an jî kirê dikin, dikarin bi wan hestên cudatîyê bihisin.

Dîsa jî Yezdan sozên xwe bi cîh tîne. Divê rojek were ku Ibrahîm û her kesê ku ev soz ji wan re hatiye dayîn, werin xelat kirin. *Heb. 11: 13, 39.40,* dawiya vê mijarê bi vî awahî aniye:

“Ew kesana tev, ji bo ku bêyî me negihîjin bi rêkûpêkiyê, bê bidestxistina sozan bi bawerî mirin; Yezdan ji me re tiştêkî baştir amade kir”.

Ji ber vê yekê, wê teyayê bawermendan, di heman wextî de, ango di roja dawîn ya kûrsiyê dadê de werin xelat kirin (2 Tim. 4:1,8 ; Mt. 25:31-34 ; 1 Pet. 5:4). Ji bo vê yekê, pêwîste Ibrahîm û yên ku hayê wan ji sozan hebûn, berî roja biryarê bi rojekê zindî bibin ku bikaribin di dadkirinê de amade bin. Heger ewana niha negihîstibin sozan, û heger wê vê yekê bi vegera Mesîh re piştî zindîbûn û dadkirina xwe pêkbînin, divê em bipejirînin ku Ibrahîm û

yên di rewşa wî de, niha bi çar çavan li benda hatina Mesîh in. Dîsa jî li ser mozaîkên cam yên dêrên seranserî Ewropa, Ibrahîm weke ku li bihûştê be hatiye teswîr kirin. Bi sedsalan ev raman hatine pejirandin. Ji bo derbaskirina vî sînorî gelo wê cesaretek li ser bingeha Incîlê bi we re çêbibe an na?

NIJAD

Weke ku di Mijar 3.2 de jî hatiye gotin, soza nijadê cara yekemîn ji bo Îsa û yên li gel wî tê dayîn û ji ber vê yekê ewana weke nijada Ibrahîm jî têne pejirandin:

- 1) “Ezê te bikim neteweyeke mezin û pîroz bikim...û wê tevayê qebileyên cihanê yên li cem te werin pîroz kirin” (Gen. 12:2,3).
- 2) “Ezê nijada te bikim mîna toza serzemînê: wisa (pir) ku heger yek bikaribe toza serzemînê bijimêre, wê nijada te jî were jimartin...Tevayê vî welatê ku tu dibîne, ezê heta hetayê bidim te û nijada te” (Gen. 13: 15,16).
- 3) “Niha li asîman binere û stêrkên bibêje (bijmêre), heger ku tu bikaribî bijmerî...Wê nijada te wiha be...Min ev diyar da nijada te” (Gen. 15:5,18).
- 4) “Ezê diyarê Kenanê weke milkekî ebedî bidim te û nişê te yê pêşerojê; û ezê bibim Yezdanê wan (Gen. 17:8).
- 5) “Ezê nijada te bi qasî stêrkên li asîman û bi qasî quma li kêleka deryayê zêde bikim; û wê nijada te bibe serdestê deriyên dijminên xwe; û wê di nijada te de tevayê neteweyên dinyayê werin pîroz kirin (Gen. 22:17,18).

Bi vî awahî nijada Ibrahîm tê berferreh kirin:

- 1) Di destpêkê de, bi awayekî jê re hatiye gotin ku wê gelek neviyên wî çêbibin û bi riya nijada wî tevayê dinyayê were pîroz kirin.
- 2) Piştî ji wî re hatiye gotin ku, ewê bibe xwediyê gelek ji nijada xwe. Wê ew kes li Kenanê ango li diyarê ku ew gihîştîyê de, jiyaneke bê dawî bi wî re biborînin.
- 3) Jêre hatiye gotin ku wê nijada wî bi qasî stêrkên li asîman pir be. Ev tê wateya ku ewê bi qasî tiştên xwezayê (mîna toza dinyayê) bibe xwediyê neviyên giyanî (manewî).
- 4) Di sozên berî vê de jî hatibû gotin ku, yên ku bibin beşek ji vê nijadê, wê bibin xwediyê têkiliyê kesên jî li gel Yezdan. Ev soz careke din dubare dibe.
- 5) Nijad, li dijî neyarên xwe serkeftinê bi dest xwe ve tîne.

Bala xwe bidinê ku nijad dikare “pîroziyê” ji bo hemû kesên li cîhanê bîne. Di Incîlê de gotina pîroz kirinê, gelek caran tê wateya bexşandina gunehan.

Dîsa jî ev pîroziya herî mezine ku hezkiriyên Yezdan dikarin bixwazin. Em tiştên bi vî awahî jî dixwînin: “Yê ku hatiye pîroz kirin, ewe yê ku fermanên Yezdan perçiqandine û hatiye bexşandin” (Ps. 32:1). “Tasa şukranê (pîrozkirin)” (1 Cor. 10:16). Tê wateya tasa şerabê ya ku xwîna Îsa temsîl dike, û bi riya wê derfetê bexşandinê çêdibe. Yekemîn neviyê Ibrahîm yê ku bexşandina ji gunehan aniye dinyayê, bê guman Îsa ye. Û daxuyanîyên Ahîda nû yên di derbarê soza ji bo Ibrahîm de, ji bo vê yekê pişteke xurt in:

“Ew (Yezdan) weke ku qesta gelek kesan bike, nebêje ‘û yên ku ji nijada te ne’ ew dibêje ‘û yê ku ji nijada te ye’ û qesda yek kesî dike ku Mesîh bixwe ye” (Gal. 3:16).

“...Yezdan ji bo Ibrahîm di peymanê bi bav û kalên me re de wiha gotibû: ‘Wê di nijada te de, tevayê gelên serzemînê werin pîroz kirin. Yezdan ji bo ku we ji kambaxiyan vegefirîne û pîroz bike, ebdê xwe (lawê xwe Îsa, ango nijad) derxiste holê û berî her kesî ji we re bi rê kir’ (3:25,26).

Bala xwe bidin têbîniya ku Petrus ji Gen. 22:18 girtiye û binerin bi çî awahî şîrove dike:

NIJAD (dol)...Îsa

PÎROZBÛN...Bexşana ji gunehan

Li gora sozê wê nijad, Îsa li hemberî neyarên xwe biserketa. Li gel van tiştên ku em dixwînin, tê dîtîn ku serkeftina wî ya li dijî guneh – ku ew neyarê gelê Yezdan û yê Îsa ye- niha baş bi rêk û pêk dibe.

TEVLÊBÛNA NIJAD

Divê ku xalên bingeîn yên Mizgîna Xirîstiyân, ku bi riya Ibrahîm têne fêhm kirin, niha safî bûbin. Ev sozên girîng, ji bo Ibrahîm û nijada wî Îsa ne. Yên din bi kû de çûn? Heger bi awayekî bedenî, di navbera mirov û Ibrahîm de girêdaneke xwîni jî hebe, mirov nikare bibe beşek ji wê nijada taybet û tenha (Jn. 8:39 ; Rom. 9:7). Ji bo ku sozên wî nijadî bi me re werin parvekirin, lazime em bi awayekî bibin beşek ji Îsa. Ev jî bi riya vaftîzma li gel Îsa ye (Rom. 6:3-5)

Em her demê vaftîzma bi navê wî dixwînin (Acts. 2:38 ; 8:16 ; 10:48 ; 19:5). Gal. 3:27-29 vê xalê wiha tîne ziman:

“Hun herkesê ku di Mesîh de vaftîz bûne, we xwe bi Mesîh girêda. Êdî ne cihû, ne jî Yunan (yên ne cihû) heye; ne kole û ne jî azad heye; ne nêr û ne jî mê heye: Hun tev di Mesîh Îsa de (bi vî şertî) yek in (bi riya vaftîzmê)

Û heger hun li gel Mesîh bin (bi riya vaftûzmê li gel bin), wê demê hun ji nijada Ibrahîmin û li gora sozê hun mîratxwir in”.

-Soza jiyaneke bê dawî, bi riya pîrozbûna bexşandina ji aliyê Îsa ve gengaze. Ev bi riya vaftûzbûna di Îsa û nijad de dibe. Bi vî awahî emê bikaribin sozên ku ji bo wî hatine dayîn, par vekin; û weke ku di Rom. 8:17 de tê gotin, wê ji me re bibêjin “mîratxwirên hevbeş yê Îsa”.

Bînin bîra xwe ku pîrozî bi riya nijad, ji bo hemû gelên cîhanê hatiye. Pêwîstbû nijad, bi qasî quma li keviyên deryayê û stêrkên li asîman be. Ev jî diyar dike ku bi gihîştina pîroziya wan, bûne nijad. Bi vî awahî wê nijad, (bi tenê) “teveyê nifşekî (ango gelek kes) ji Yezdan re we re behs kirin (Ps. 22:30).

Em dikarin du milên sozên ku ji Ibrahîm re hatine dayîn, bi vî awahî şrove bikin:

(1) WELAT

-Wê Ibrahîm, nijada wî Îsa û yê li gel Îsa, wê diyarê Kenanê weke mîrat bigrin, wê li teveyê dinyayê belav bibin, û heta hetayê li wir bijîn. Wê ew vê yekê (jiyana bê dawî) ne li vê jiyane bistînin; wê ew roja dawî, dema ku Îsa vegere biserkevin.

(2) NIJAD

- Ev, Îsa bixwe ye. Wê bi riya wî pîroziya bexşandinê li dinyayê belav bibe, û wê gunehên (neyarên) mirovahiyê werin rûxandin.

Em bi vaftûza bi navê Îsa, dibin beşek ji nijad.

Ev her du mil, di bangên Ahîda Nû de jî derdikevin holê, û dibêjin: ‘însan bi bihîstina fêrkirina wan vaftûz bûn’. Ev riya tenha bû ku dikaribûn sozan bigihînin me û wiha jî bû. Em niha baştir tê dighîjin, ka çima Pavlusê kal hambêza xwe ji mirinê re vekir. Pavlus ev hevî weke “hêviya Îsrailê” bi nav kir ku: hêviya rasteqîn ya Xirîstîyan, hêviya Cihû ya orîjînal e. Şîroveya Îsa ya ku dibêje: “rizgarî ji Cihûya ye” (Jn. 4:22) diyar dike ku, divê mirov bi giyanê Cihû be, ji bo ku bikaribe bi riya Îsa, fêdeyê ji soza rizgariyê bibîne, ku ew ji bo pêşiyên Cihûyan hatibû dayîn.

Em dibînin ku ji bo Xirîstîyanên destpêkê ev tişt hatine ragihandin:

- 1) “Tiştên di derbarê serdestiya Yezdan de û
- 2) “Navê Mesîh Îsa” (Acts 8:12).

Ev her du tişt dibin sernivîsên cûda de, ji bo Ibrahîm jî hatibûn rave kirin:

- 1) Sozên di derbarê welat de, û
- 2) Sozên di derbarê nijad de.

Her wiha bala xwe bidinê ku, her tiştê di derbarê serdestiya Yezdan û Îsa de, bi awayê **“ragihandina Mesîh”** hatiye ziman (Acts. 8:5 krş. a. 12). Evana her demê ji bo wateyêke wiha têne kişandin: “Îsa ji we hez dike. Hûn bi tenê yê ku pê bawerin bibêjin. Ew ji bo we mir û hûn kesayetek rizgarkirî ne”. Lê belê gotina “Mesîh” di derbarê wî û serdestiya wî ya pêşerojê de, gelek tiştan bi awayekî vekirî diyar dike. Di derbarê vê serdestiyê de, peyamên baş yên ku ji bo Ibrahîm hatin ragihandin, di bangên Mizgînê yên destpêkê de, roleke mezin dileyizin.

Pavlus: Li Korîntê, “Ji bo ku di derbarê serdestiya Yezdan de guftûgo bike û wan qane bike, sê meh derbas kirin” (Acts 19:8); li Efes’ê ‘banga serdestiya Yezdan’ (Acts 20:25) belav kir û li Roma’yê banga wî ya dawîn ya berî mirinê jî wiha bû, “Wî, diderbarê serdestiya Yezdan de daxuyanî da û şahidî kir, xwest wan di derbarê Îsa de qane bike...bi şerîeta Musa û nivîsên pêxemberan” (Acts 28:23,31). Ev xala ku di derbarê wê de hevqasî tê axaftin, nîşan dide ku, mesaja Mizgînê ya di derbarê serdestiyê û Îsa de, ne bi tenê gotina “bi Îsa bawer bin’e. Banga Yezdan ya ji bo Ibrahîm, ji ya li vir berferetire û sozên ku ji wî re hatine dayîn, bingehên Mizgîna Xirîstiyân in.

Me da bû xuya kirin ku, vaftîzma li gel Îsa me dike beşek ji nijad û derfeta mîratgirtina sozan ji me re çêdike (Gal. 3:27-29). Lê belê, ji bo ku em rizgariya ku soza wê hatiye dayîn, bi dest xwe ve bînin, vaftîzm bi serê xwe ne bese. Heger nêta me hebe ku em xwe bigihînin sozên ku ji bo nijad hatine kirin, lazime em li gel nijad û Îsa bimînin. Ji ber vê yekê vaftîzbûn, bi tenê destpêkeke. Em ketine pêşbaziyekê, û divê em bibezin. Pêwîste em ji bîr nekin ku, di aliyê şikil (Xwînê de) hatina me ya ji nijada Ibrahîm, nayê wateya pejirandina me ji aliyê Yezdan ve. Îsraîlî, bi awayekî ji nijada Ibrahîm in, lê ev nayê wateya ku ewê bikaribin bê vaftîzbûn û pêkanîna şertên jiyana Mesîh û Ibrahîm rizgar bibin (Rom. 9:7,8 ; 4:13,14). Îsa ev yek ji Cihûyan re got: “Ez dizanim ku hûn ji nijada Ibrahîm in; lê belê hûn dixwazin min bikuji... Heger hûn zarwên Ibrahîm bûna, we yê karê Ibrahîm bikira” (Jn. 8:37,39); weke yên ji nijada xwedî soz, we yê jiyaneke li gorî pîvanên Yezdan û Îsa bidomanda (Jn. 6:29).

Divê nijad (dol) xwediyê taybetiyên bapîrên xwe be. Heger nêta me hebe ku em bibin ji nijada Ibrahîm, wê demê lazime ne tenê bi vaftîzbûnê, her wiha em di pêkanîna sozên Yezdan de jî xwediyê baweriyêke mîna ya wî bin. Ji ber vê yekê ev nav li wî tê kirin: “Bavê tevayê bawermendan...Bavê yên ku didin pey şopa baweriyê kalkê me Ibrahîm jî” (Rom. 4:11,12)

“Ji ber vê yekê bizanibin ku (ango wî bi rastî têxin dilê xwe) yên xwedan bawermend, mîna zarokên Ibrahîm in” (Gal. 3:7).

Baweriya rastîn di hinek livbaziyan de xwe diyar dike. Heger nekir, ew di çavên Yezdan de ne bawerî ye (James 2:17). Em baweriya xwe ya bi van sozan, bi riya vafîzbûnê diyar dikin (Gal. 3:27-29). Wê demê, bi rastî baweriya we bi sozên Yezdan tê? Divê em vê pirsê di tevayê jiyana xwe de ji xwe bipirsin.

PEYMANA KEVIN Û NÛ

Heta niha eşkere bûye ku sozên ji bo Ibrahîm, di Mizgîna Îsa de hatine zimant.

Koma din ya sozên ku Yezdan kirine, di çerçoveya Cihûyan û şerîeta Musa de ne. Ev jî diyar dikin ku heger Cihûyan perestiya wê şerîetê bikrana, ewê di vê jiyane de bi awayekî bedenî bihatana pîroz kirin (Dt. 28). Di vê koma sozan an jî ‘peymanê’ de soza jiyanekê bê dawî nîne. Wî çaxî lazime em her du peymanên ku çêbûne binasin:

- 1) Ji bo Ibrahîm û nijada wî. Bi vegera Îsa re, dibin serdestiya Yezdan de, soza bexşandin û jiyanekê bê dawî ji wan re hatiye dayîn. Ev soz di bexçeyê bihûştê de, ji bo Dawid jî hat dayîn.
- 2) Di dema Musa de, ji bo gelê Cihû. Heger ew perestiya şerîeta ku Yezdan daye Musa bikin, wê di vê jiyane de, aramî û şadiyê bibînin.

Yezdan soza bexşandin û jiyanekê bê dawî da Ibrahîm. Lê ev bi riya qurbandana Îsa gengaz bû. Ji ber vê yekê em dixwînin ku mirina Îsa ya di çarmîxê de, tê wateya rast derxistina sozên Ibrahîm (Gal. 3:17 ; Rom. 15:8 ; Dan. 9:27 ; 2 Cor. 1:20). Bi vê sedemê ji xwîna Wî re dibêjin “Xwîna Ahîda Nû” (peyman. Mt. 26:28). Divê were zanîn ku Îsa ji me re gotiye, ji bo bibîranîna van tiştan divê em her demê tasa şerabê têxin destê xwe ku sembola xwîna wî ye (binere. 1 Cor. 11:25): “Ev tas, ahîda (peyman)nû ye ku bi xwîna min (pêk hatiye) (Lk. 22:20). Bê fêmkirina van tiştan, tu wateya ‘parkirina nan’ ya ji bo bîranîna Îsa û karê wî nîne.

Qurbandana Îsa, derfeta bexşandina dibin serdestiya Yezdan de, û jiyanekê bê dawî derxist holê. Bi vî awahî wî (Îsa) bingeha sozên ku ji bo Ibrahîm hatibûn dayîn, qewîn kir; ew, ‘bu kefilê peymanekê baştir’ (Heb. 7:22). Ibrani, 10.Beş, ayeta 9 an; ji bo Îsa dibêje “ji bo avakirina ya dûwemîn, ya yekemîn (peyman) radîke”. Ev dide nîşandan ku dema Îsa sozên ji bo Ibrahîm rast derxistina, peyman ku bi riya Musa hatibû dayîn, ji bikarhatinê derxistiye. Ayetên ku me berî niha jî têbîni ji wan girtibûn, dibêjin ku Îsa bi mirina xwe peymanekê nû pejirandiye û behsa hebûna peymanekê kevin dikin ku wî ji bikarhatinê derxistiye (Heb. 8:13).

Ev dide nişandan ku peyman di derbarê Îsa de, ji berê ve pêk hatiye, lê belê ta mirina wî bikar nehatiye û di encama vê de jî, jê re gotine peyman 'nû'.

Armanca peyman kevin ya ku bi riya Musa hat kirin ew bû ku balê bikşîne ser xebata Îsa û girîngiya bawer kirina sozên di derbarê wî de bîne ziman (Gal. 3:19,21).

Bi gotineke din; baweriya bi Îsa, rastiya şerîeta Musa bi hêz dike (Rom. 3:31). Pavlus vê yekê bi awayekî xerîb şîrove dike: "Ji bo ku em bi riya baweriyê werin bexşandin, şerîet bû mamosteyê me, yê ku berê me dida Îsa" (Gal. 3:24).

Bi vê armancê, şerîeta ku bi riya Musa daket, hat parastin û hîna jî em di xebatên xwe de, fêdê jê dibînin.

Ev tiştên ku bi xwendina cara yekemîn fêm kirina wan zehmete, wiha têne ziman:

Sozên ku di derbarê Mesîh de ji bo Ibrahîm hatin dayîn - Peymana Nû.

Sozên şerîeta Musa yên girêdayî Îsraîlê – Peymana Kevin.

Mirina Mesîh. Peymana kevin bi dawî bû (Col. 2: 14-17). Peymana Nû hat bikaranîn.

Bi vê sedemê, pêkanîna adetên mîna roja Sept û gelekên ku perçeyek ji Peymana Kevin bûn, niha ne mecbûrî ye –Binere. Mîjar 9.5. Wê peyman nû piştî ku ew tobe bikin û Mesîh bipejirînin, bi Îsraîliyên xwezayî re were çêkirin (Jer. 31: 31,32 ; Rom. 9:26,27 ; Eze. 16:62 ; 37:26). Dîsa jî, bê gûman heger ku niha Cihûyek li gel Îsa vaftîz bibe, wê yekser têkeve Peymana Nû ya ku cûdabûna Cihû û ne cihû tê de nîne (Gal. 3: 27-29).

Têgihîştina van tiştan, wê bihêle ku em baweriya xwe bi hebûna sozên Yezdan binîn. Yên bi guman, waîzên yekemîn yên Xirîstiyên bi nedana daxuyaniyê baş tawanbar kirin. Pavlus bersiva wan da û got ku, ji ber mirina Mesîh, sozên Yezdan ji aliyê Wî ve rast hatine derxistin û ew hêviya ku ew didin ne tişteki bi şik û guman e: "Ji bo mafê rastiya Yezdan, gotina ku em ji we re radighînin, ne erê û na ye. Kurê Yezdan, Mesîh Îsa yê ku me bi we da naskirin, ...ne erê û na bû, li gel wî bi tenê erê hebû. Li gel wî tevayê sozên Yezdan erê ne û bi riya wî Amîn" (2Cor. 1:17-20).

Ev hemû ji bo vê helwestê ne: 'Belê, ez texmîn dikim ku di van tevan de jî aliyekî rast hebe...?'

Weke Ibrahîm û her kesê ku sozên Yezdan girtin, Dawid jî nebû xwediyê jîneke hêsan. Ew, di Îsraîla berî zayîne ya salên hezarî de, weke lawê herî biçûk yê malbatekê mezin bû. Wî pez diçêrand û karên ber destê birayên xwe dikir (1 Sam. 15-17). Ew fêrî perestiya Yezdanekî bû, ku heta wê rojê kêma kes nêzîkî wî bûbûn. Li dijî Îsraîliyan roja meydan xwendina Filîstiyên hatibû. Filîstiyên meydan li wan xwendin û gotin: bera zilamekî we, li gel şampiyonê Filîstî Golyat ê dêw şer bike, yê ku bi serkeve wê bibe hakimê yê din. Dawid, bi qewsikekî, bi alîkariya Yezdan, li dijî Golyat biserket û ji

Melîk (Saul) bêhtir navûdengê wî belav bû. Gotina “Hesûdî weke tîrbê ye, nayê debar kirin” (Song 8:6) ji bo Saul di cih de ye ku wî nêzikî çolên Îsraîlê, di nava 20 salan de, bi zilma xwe ya li dijî Dawid ev yek eşkere kiriye.

Di encam de Dawid bû melîk. Jiyana wî li çolan derbas dibû. Ji bo ku minetdariya xwe ya li hemberî hezkirina Yezdan bide nişandan, biryar da ku perestgehekê ji bo Yezdan ava bike. Yezdan di bersiva xwe de gotibû ku divê perestgeh ji aliyê kurê Dawid, Silêman ve were ava kirin. Û Yezdan ji dawid xwest ku ew malekê ava bike (2 Sam. 7:4-13). Piştî vê yekê sozên ji bo Ibrahîm hatin dubare kirin û li gel hinek tiştên din, sozeke din hat dayîn:

“Û dema ku rojên te تمام bibin û tu li gel bapîrên xwe rakevî, ezê pişt te re nijada te ya ku wê ji nava te derkeve biafirînim; û ezê Melîkiya wan bi hêz bikim. Ewê bi navê min, malekê ava bike û ezê textê Melîkiya wî heta hetayê bi hêz bikim. Ezê ji wî re bibim bav, ewê ji bo min bibe law. Heger şaşiyên bike, ezê wî bi darê mirovan û derbeyên benîadem bînim ser rê. Lê belê ez wekî ku min (merhameta xwe) ji Saul stend nakim, wê merhameta min (hezkirin) ji ser wî kêm nebe. Û wê mala te û Melîkiya te, li ber çavên te, heta heta yê werin bi hêz kirin (2 Sam 7:12-16).

Em ji xebatên xwe yê borî tê derdixînin ku nijad, Îsa ye. Danasîna wî weke kurê Yezdan vê yekê rast derdixîne. Daxuyaniyên gelek beşên Incîlê jî vê yekê Îspat dikin:

- Îsa got ku: “Ez... ji nijada Dawid im” (Rev. 22: 16)
- “(Îsa), yê ku weke beden ji nijada Dawid hat afirîn” (Rom. 1:3).
- “Yezdan soza xwe bi cîh anî û ji nijada wî zilamî (ya Dawid) ji bo Îsraîlê rizgarkarek, Îsa afirand (Acts.13:23)
- Melaîket ji Meryema bakîre re di derbarê kurê wê Îsa de got ku: “Wê mirzayê me Yezdan textê bavê wî (bapîrê wî) Dawid bide wî...û wê dawiya serdestiya wî tune be” (Lk. 1: 32,33).
- Ev, di soza nijada Dawid ya 2 Sam. 7:13 de tê pêkanîn.

Bi taybetiyeke mezin, diyarkirina nijad û Îsa, bi gelek xalên ku ji ber çavan wenda bûne, girîngiyê dide qezenc kirin:

1) NIJAD

“Yê ku wê ji nava te derkeve... nijada te... Ezê bibim bavê wî û ewê bibe kurê min”. “Ezê fêkiyê bedena te, li ser textê te bidim runiştandin” (2Sam. 7:12,14; Ps. 132: 10,11).

Dibe ku Îsa, nijad; kurê Yezdan û neviyê bedenî yê Dawid be. Ev bi tenê, weke ku di Ahîda Nû de tê ziman, bi riya ji dayikbûna ji bakîreyekê gengaze. Dayika Îsa Meryem, neviyeke Dawid e (Lk. 1:32); lê belê Îsa ne xwediyê bavekî însan e. Yezdan ji bo ku bi Îsa ducan bibe, malzaroka Meryem bi riya Giyanê Pîroz xist bin bandorê. Û ji ber vê yekê Melaîket ev şîrove kir: “Bi vî awahî ew tiştê pîroz yê ku ji te re çêbibe jî wê kurê Yezdan be” (Lk. 1:35). “**Bûyîna ji Bakîreyekê**”, Ji bo pêkanîna soza Dawid, riya yekemîn bû.

2) MAL

Gotina, “Ewê bi navê min malekê ava bike” (2 Sam. 7:13), dide nîşandan ku ewê Îsa ji bo Yezdan, perestgeheke him rastî û him giyanî ava bike.

Beşên 40-48 yên Hezekyel, di Milenyumê de (piştî vegeer Îsa ya serzemînê, yekemîn hezarsaliya serdestiya Yezdan) behsa avakirina perestgeha li Qudsê dike. Mala Yezdan, cihê jiyana wî ye. Û Is. 66:1,2 ji me re, ji dilê hezkiryên Wî re dibêje ku ewê ji bo jiyana vegere. Ji ber vê yekê Îsa, ji bo jîna Yezdan perestgeheke giyanî ji bawermendên rast ava dike. Şîroveyên ku dibêjin, Îsa di perestgeha Yezdan de kevirê bingehîn (1 Pet. 2:4-8) û Xirîstiyên jî kevirên avakirinê ne (1 Pet. 2:5) niha li cihê xwe rudine.

3) TEXT

“Ezê textê serdestiya Wî (ya Mesîh) heta hetayê xurt bikim...mala te (ya Dawid) û melîkiya te...wê textê de heta hetayê were bi hêz kirin” (2 Sam. 7:13,16 krş. Is. 9: 6,7). Ji ber vê yekê wê serdestiya Mesîh, piştî xwe bide melîkiya Dawid ya Îsraîlê. Wateya vê ewe ku wê bi hatina serdestiya Yezdan re, Melîkiya Îsraîlê carekê din ava bibe –di derbarê vê yekê de, ji bo agahdariyên berferê li Mijar 5.3 binerin. Ji bo pêkanîna vê sozê, pêwîste Mesîh, li ser ‘text’ an jî cihê birêvebiriya Dawid, hukum bike. Ev di rastiya xwe de li Qudsê bû. Ev jî delîlê wê ye, ku ji bo pêkhatina sozan, divê serdestî li serzemînê were avakirin.

4) SERDESTÎ

Gotina “Mala te û serdestiya te, wê li ber te heta heta yê were mezin kirin” (2 Sam. 7:16) dide nîşandan ku wê Dawid bibe şahidê serdestiya Îsa ya bê dawî. Her wiha ev yek dixwaze bi awayekî bibêje ku wê di vegeer Îsa de Dawid jî zindî bibe, ji bo ku li gel Îsa wê serdestiya mezin ya ku ji qudsê tevayê cîhanê birêve dibe, bibîne.

Têgihîştina sozên ku ji Dawid re hatine dayîn, xwediyê girîngiyeke jiyani ne. Dawid bi kêfxweşî wiha behsa van tiştan dixe: “Peymaneke ebedî...Ev, tevayê rizgariya min û daxwaza min e” (2 Sam. 23:5). Ev tiştana girêdayî rizgariya me ne jî. Divê em jî bi wan kêfxweş bibin û ew bibin daxwaza me jî. Dîsa em dibînin ku ev agahdarî girîngin.

Cihê xemgîniyê ye ku alema Xirîstiyân, van baweriyân bi awayekî berevajî dide fêr kirin:

- Heger Îsa, bi awayekî bedenî “berê jiya be”, yanî berî şêbûna xwe weke kesekî jiya be, wê demê tu wateya wê namîne ku mirov bibêje Îsa ji nijada Dawid e.
- Heger ku serdestiya Yezdan li bihûştê (asîman) be, Îsa nikare careke din Melîkiya Dawid ya Îsrailê ava bike û li ser ‘textê’ Dawid serdestiyê bike. Ji ber ku ev tiştana di rastiya xwe de li serzemînê bûne, divê dubarebûna wan jî li heman cihê be.

GELO BI SILÊMAN RE PÊK HAT?

Kurê Dawid yê rasteqîn Silêman, hinek sozên Dawid bi cih anîn. Wî ji bo Yezdan perestgeheke rast ava kir (1 Kings 5-8) ; û bû xwediyê Melîkiyeke pir dewlemend. Tevayê welatên cîran qasidên xwe bi rê kirin û rêzên xwe ji bo Silêman pêşkêş kirin (1 Kings 10); û ji ber bikaranîna perestgehê pîrozîyeke giyanî (bereket) hebû. Desthilatiya Silêman dide nîşandan ku piraniya sozên Dawidê ku wê di serdestiya Îsa de were dîtin, hatine pêkanîn.

Hinek kes dibêjin ku sozên ji bo Dawid, bi Silêman re bi temamî bi cih hatine û vê nerfna xwe diparêzin. Lê belê ev yek bi van gotinên li jêr tê red kirin:

- Gelek delîlên Ahîda Nû, nîşan didin ku ‘nijad’ ne Silêman e, lê belê Îsa ye.
- Tê dîtin ku Dawid, di navbera sozên ji bo xwe û yên Ibrahîm de, girêdanek çêkiriye (1 Chron. 17:27 ; Gen. 22: 17,18).
- Diviyabû serdestiya ‘nijad’ heta hetayê be, lê ya Silêman ne wiha bû.
- Dawid têgihîşt ku soz ji bo jiyaneke bê dawî ne: “Herçiqasî mala min ne li gel Yezdan bû jî, wî bi min re peymaneke bê dawî çêkir” (2 Sam. 23:5).
- Nijada Dawid, Mesîh e, rizgarkarê ji guneha ye (Is. 9:6,7 ; 22:22 ; Jer. 33: 5,6,15 ; Jn. 7:42). Lê belê piştê

Silêman, bi zewacên xwe yê li gel kesên derveyî
hêviya Îsraîl, ji Yezdan vegeriya (1 Kings 11:1-13;
Neh. 13:26).

MIJAR 3 : PIRS

1. Kîjan soza Yezdan, tekoşîna di navbera guneh û راستiyê de dide nîşandan?

- a) Soza ji bo Musa
- b) Soza li bexçeyê Bihûştê
- c) Soza ji bo Dawid
- d) Soza ji bo Ibrahîm

2. Di derbarê soza li Bexçeyê Bihûştê de, kîjan gotina jêr raste?

- a) Nijada mar Iblîs e
- b) Îsa û yê rast ji nijada jinê ne
- c) Nijada mar ji aliyê Îsa ve ji bo demekê hate eşandin
- d) Bi riya mirina Îsa, nijada jinê birîndar bû.

3. Wê nijada Ibrahîm heta hetayê li kuderê bijî?

- d) Li bihûştê
- e) Li bajarê Qudsê
- f) Li serzemînê
- g) Hinekî li Bihûştê û hinekî li serzemînê

4. Kîjan sozên li jêr ji bo Dawid hatin dayîn?

- h) Ku wê neviyê wî yê bijarte heta heta yê serdestiyê bike
- i) Ku wê nijada wî li bihûştê xwediyê serdestiyekê be
- j) Ku wê nijad, kurê Yezdan be
- k) Ku nijada wî, Îsa berî ku li dinyayê çêbibe, li bihûştê dijya.

4.1 CEWHERÊ ÎNSAN

Piraniya însanan li ser mirinê, yan jî li ser cewherê xwe yê ku dibe sedema mirinê, kêr difikirin. Mirov xwe di ber çavan re derbas nakin û bi vî awahî di derbarê xwe de ne xwediyê agahdariyên berferê in. Di encama vê de jî însan di tevayê jiyana xwe de, bi ber bayê zora daxwazên xwe dikevin û diçin. Ev yek dema ku mirov li keştiya jiyane siwar be, tê wateya ne pejiwandina ku em nikarin ji hatina mirinê birevin. “Ma jiyana we çi ye? Ew, weke buxarê ye ku di demeke kin de tê dîtin û wenda dibe. Divê em wekî ava ku li ser axê were rijandin û careke din nikaribe were gel bimirin. Weke giyayê ku mezin dibe, yê ku sibehan gul lêdikevin û mezin dibe (ciwaniya me); û êvaran jî tê qut kirin û diçilmise” (James. 4:14 ; 2 Sam. 4:14 ; Ps. 90:5,6). Musa zilamekî rasteqîn yê tefkîrê bû; bi vê yekê hisiya û li ber Yezdan geriya: “Wê demê hejmara rojên me pêş me bike, ji bo ku em dilê xwe bidin zanistiyê” (Ps. 90:12). Di encama vê yekê de, divê em li hemberî kurtiya jiyane, bi dest xistina zanebûnê bikin karê xwe yê bingehîn.

Nerazîbûna însan ya li dijî mirinê bi awayên curbecur e. Ji bo sivikkirina hesta wendabûnê, hinek kultur merasîma mirinê û meytê dikan beşek ji jiyane. Ji van kesan piraniya yê ku navê ‘Xirîstiyân’ hildigirin, gihîştine vê encamê ku însan di nava xwe de xwediyê ‘giyanekî nemir’ê, lê belê ewê ji bo xelat an jî cezayê xwe biçê derekê. Felaketa herî mezin ya ku tê serê însan mirin e. Ji bo kêr kirina bandora vê yekê, însan tevayê zanebûna xwe bi kar tîne. Bi vê sedemê, li ser mirinê û cewherê însan gelek teorîyên şaş peyda bûne. Ji bo ku em di derbarê vê mijara girîng de, xwe bigihînin rastiyê, emê weke her carê devê Incîlê vekin. Bînin bîra xwe ku, di Incîlê de derewa yekemîn ya marê li bexçeyê bihûstê ye. Li hemberî gotina Yezdan ya ku dibêje, heger însan têkeve guneh wê bimre, (Gen. 2:17) mar gotiye, “Tu namirî” (Gen. 3:4). Ev helwest, napejirîne ku mirin dawiya her tiştî ye û bûye taybetiyeke bingehîn di tevayê olên çewt de. Bi taybetî di vê babetê de eşkere ye ku têgihîştineke şaş, rêberiya yeke din, yekedîn û yeke din dike. Berevajî vê yekê, weke ku di 1 Cor 15:13-17 de hatiye nîşandan, perçeyek rastî jî rêberiya yeke din dike. Li vir Pavlus xwe ji rastiyekê davêje ya din (bala xwe bidin gotinên “heger...heger...heger...”).

Ji bo têgihîştin û ravekirina cewherê însan, pêwîstiya me bi daxuyaniyên Incîlê yê di derbarê afirîna însan de heye. Dema ku em gotin bi gotin li ser nivîsê rawestin, wê ji me re bi awayekî ku gumanan nehêle ronî bike, ka em çi ne (di derbarê safîtiya pirtûka Afirînê de, li Gotina navberê ya 18 binere). “Mirzayê me Yezdan, însan ji toza serzemînê afirand. .. Ji nava wê (ji nava axê) tu derketî (Adem); ji ber ku tu ji axê ye, wê tu dîsan li wê vegeirî” (Gen. 2:7 ; 3:19). Li vir, di derbarê nemiriya însan de tiştek nîne, û tu beşê wî yê ku wê piştî mirinê zindî bimîne jî nîne.

Di Incîlê de, bi taybetî tê diyar kirin ku însan ji axê hatiye afirandin: “Em ritam (balçik) in” (Is. 64:8); “însan ji erdê, ji axê ye” (1 Cor. 15:47); “Bingeh (ya însan) di axê de ye” (Job. 4:19). Ibrahîm, pejiran dku ew “ji ax û xweliyê ye” (Gen. 18:27). Piştî ku li bexçeyê bihûştê, fermana Yezdan nehat pêkanîn, Yezdan “însan qewitand..ji bo ku ew ji dara jiyane nexwe û heta hetayê neji” (Gen. 3:24,22). Heger ku însan di nava xwe de, xwediyê taybetiya nemiriniyê bûya, wê ev yek nehata gotin.

NEMIRIYA BI ŞERT

Di Incîlê de, herdem tê dubare kirin ku, însan dikare bi riya xebata Mesîh, ji bo bidestxistina nemirî û jiyaneke bê dawîn, riyekê bibîne. Awayê bi tenha yê nemiriniyê ku incîl tîne ziman eve. Riya bi dest xistina nemiriyê ya bi tenha, perestiya fermanên Yezdan e. Yên ku perestiyeke bê kêmanî bikin, wê nemiriyê di rewşeke bi rêkûpêk de derbas bikin- xelata rastiye.

Daxuyaniyên li jêr didin nîşandan ku, nemirî bi şert û merc e û ne tişteki wiha ye ku em bi hêsanî bi dest xwe ve binin:

- “Mesîh... bi riya Mizgînê jiyane û nemirî derxistiye holê” (2Tim. 1:10 ; 1 Jn. 1:2).
- “Ta ku hûn goştê benîadem nexwin û xwîna wî venexwin, jiyane di we de çênabe (ango ne xwezayî ye). Kî goştê min bixwe û xwîna min vexwe, wê bibe xwediyê jiyaneke bê dawî; û ezê wî di roja dawî de, zindî bikim” – ji bo ku ez vê jiyaneke bê dawî bidimê de (Jn. 6:53,54).
- Di seranserê beşê 6. yê Yuhanna de, Mesîh dibêje ku ew “**nanê jiyane ye**” û encex bi riya bersivdana wî, mirov dikare bibe xwediyê hêviya nemiriyê (Jn. 6:47,50,51,57,58).
- “Yezdan jiyaneke bê dawî pêşkêşî me (bawermendan) kir; û ev jiyane di kurê Wî de ye (1 Jn. 5:11). Ji bo kesên ku ne li gel “Mesîh”in, dibe ku hêviya nemiriyê nebe. Bi tenê bi riya Mesîh nemirî çêbûye. Ew, “çavkaniya jiyane ye” (ya bê dawî) (Acts 3:15 A.V: kn.) – ji bo herkesê ku perestiya wî dikin, çavkaniya rizgariya ebedî ye” (Heb. 5:9). Wî çaxî nemiriyê însanan bi xebata Îsa pêk tê.
- Bawermendê rasteqîn li nemiriyê digere û ji ber vê yekê bi xelata jiyaneke bê dawî tê xelat kirin – tişteki ku ew bi xwezayî xwediyê wê ye nîne (Rom. 2:7 ; 6:23 ; Jn. 10:28). Di vegera Mesîh de, divê bedena me ya bi mirin “nemiriyê li xwe ke (1 Cor. 15:53). Bi vî awahî însan niha ne xwediyê nemiriyê ye, ew tişteke ku hîna soza wê tê dayîn (1 Jn. 2:25).

4.2 REWAN (CAN)

Bi ronahiya gotinên jorîn, wê hatibe fêmkirin ku însan di xwezaya xwe de ne xwediyê canekî nemir e. Emê niha jî têkeliya li derdora gotina ‘Can’ safî bikin.

Di Incîlê de, gotina ‘can’ bi vî awahî ji bo zimanên Ibranî û Yunanî tê wergerandin (**Nephesh û Psuche**), her wiha ew dikare weke gotinên jêrîn jî were wergerandin:

Beden	Hilm
Teba	Dil
Bîr	Kes
Nefs	

Bi vî awahî gotina ‘Can’ tê wateya kes, beden û nefse jî. Gotina bi navûdeng ya ku dibêje ‘Save Our Souls’ (S.O.S.) bi awayekî vekirî tê wateya ‘Me ji mirinê xelas kin’. Wê demê ‘Can’ kurtayîya ‘kes’ an jî her tiştê ku kesayetê tine holê ye. Di gelek versiyonên Incîlê de, (wek nimûne N.I.V.), weke ‘kes’ an jî ‘şexs’ kêma hatiye wergerandin. Heywanên ku Yezdan afirandine, weke “tebayên ku dilivin...hemû tebayên ku dijî” (Gen. 1:20,21) tene bi nav kirin. Di vir de gotina Ibranî ya ku weke ‘teba’ tê wergerandin ‘nepresh’ e. Û ew weke di nimûneya Gen. 2:7 de dikare weke ‘can’ jî were wergerandin : “... û însan bû canekî ku dijî”. Bi vê sedemê weke ku heywan ‘teba’ne, însan jî ‘teba’ye. Cudabûna di navbera însan û heywan de ewe ku însan di aliyê mêjî de ji heywan pêşketîtir e. Însan, di şibhetê fîzîka Yezdan de hatiye afirandin (Gen. 1:26; li Mijar1,2 binere); û bang ji hinek însanan re tê ji bo ku hêviya nemiriyê bistînin (2 Tim. 1:10). Di babeta awayê mirina me û cewherê me yê bingehîn de, di navbera însan û heywanan de ferq nîne:

“Ji ber ku tiştê tê serê benîadem, tê serê heywanan jî; tiştê tê serê wan yek e (bala xwe bidin dûbarebûna gotinê) weke ku yek dimre, yê din jî dimre...ji bo ku însanek xwe di ser heywanekî re nebîne...Hemû (yanî însan û heywan) diçine derekê (gorê). Tev ji axê ne; û tev li axê vedigerin” (Ecc. 3:19,20).

Nivîskarê pirtûka W’az yê ku Wehî jêre hatiye, ji bo ku însan vê rastiye bibîbe, û Yezdan alîkariya wan bike wiha bang dike: “Ji bo ku (însan) bibînin ku heywanin” (Ecc. 3:18). Dibe ku gelek kes di pejirandina vê de zoriyê bikşînin. Pejirandina ku em awayekî heywanane û em jî bi hestê xwe parastin û afirandinê dijî, zehmete û dibe ku me biçûk jî bike. Di wergera N.I.V ya Ecc. 3:18 de tê gotin ku; Yezdan însan ‘diceribîne’ ji bo ku bide

nîşandan ku ew heywane. Yên ku bi qasî bûyîna gelê wî dilnizm bin, wê rastiya vê yekê bipejirînin, lê belê yê ku ne wiha bin, wê di vê ceribandîna de bisernekevin. Felsefeya Însanîtiyê (humanîzm) – fikra ku dibêje însan xwediyê rûmet û girîngiya tewre bilinde- di sedsala bîstan de, bi bêdengî li her derê dinyayê belav bûye. Ne hêsane ku em ramana xwe ji bin bandora însanîtiyê derxînin. Gotinên di Ps. 39:5 de alîkariya vê yekê dikin: “Bi rewşa xwe ya herî baş însan, bi tevayî bê rûmet e”. “Raskirina gavên ku têne avêtin, ne di destê însanê meşvan de ye (Jer. 10:23).

Yek ji tiştên bingeîn ku hun dizanin ewe ku, wê bedenên însanan – di rastiya de yê tevayê ‘tebayên bi can’- di encam de bimrin. Bi vê sedemê ‘can’ dimre; ku ev bixwe dijbera tevayê her tiştê bê mirin e. Ne bê wateye ku di Incîlê de bi piranî gotina ‘can’ bi mirin û tunebûna can re bûye yek. Bikaranîna gotina ‘can’ bi vê şeweyê dide nîşandan ku tiştê bê mirin nîne:

- “Wê canê gunehkar bimre” (Eze. 18:4).
- Yezdan dikare can tune bike (Mt. 10:28). Gotinên din yê di derbarê vê mijarê de, di van ayetan de têne peyda kirin: Eze. 22:27; Prov. 6:32; Lev. 23:30.
- Tevayê ‘canên’ di nava bajarê Hatsorê de bi şûr hatin kuştin (Josh. 11:11; krş. Josh. 30-39).
- ...her canê ku dijîya mir (Rev. 16:3; krş. Ps. 78:50).
- Zagona Musa bi piranî fermana mirina ‘can’ên ku li dijî zagonê derdiketin dida (wek nimûne. Hejmar 15:27-35).
- Gotinên ku dibêjin, can dikeve xefikê yan jî difetise, encex bi têgihîştina ku can dikare bimre, watedar dibin (Prov. 18:7; 22:25 ; Job. 7:15).
- “Tu kes nikare canê xwe bide jiyîn” (Ps. 22:29).
- Mesîh, “canê xwe rijand mirinê” ; ‘canê’ wî an jî jiyana wî ji bo guneh hat pêşkêş kirin (Is. 53: 10,12).

Gotina ‘can’ di piraniya ayetan de hatiye ser ziman, û ji xeynî çend çiruskên nemir yê di nava me de, tê wateya gelek kes û beden. Hinek nimûneyên berbiçav ev in:

- “Xwîna kes an” (Jer. 2:34)
- “Heger kesek têkeve guneh û sund bibhîze...heger wê nebêje... heger kesek destê xwe bide tiştê mirdar...heger kesek bi serê lêvan sund bixwe” (Lev. 5:1-4).

-Ey canê min... her tiştê di nava min de...Mirzayê me Yezdan pîroz bike, ey canê min...Ew, devê te bi tiştên baş dadigre” (Ps. 103:1,2,5).

- “Yê ku bixwaze jiyana xwe (can) xelas bike, ewê wê wenda bike, lê belê yê ku jiyana xwe (can) di oxira min de wenda bike... ewê wê xelas bike” (Mk. 8:35)

- Li vê derê ,can’) bi yunanî ‘psuche’) weke ku li jorê hatiye wergerandin, tê wateya jiyana kesekî ya şexsî û ev jî dibe nişana wê ku gotina ,can’ ne ji bo tiştekî giyanî ku di nava însan de ye tê gotin.

- Num. 21:4, dide nişandan ku, komek kes dikarin xwediyê canekî bin. Bi vê sedemê ,can’ nayê wateya çiruska nemiriyê ya di nava her kesî ji me de.

4.3. GIYANÊ ÎNSAN

Di bîra her kesî de, di navbera gotinên can û giyanê de têkiliyê mezîni heye. Di hinek zîmanan de û di wergerên Incîlê de jî gotina can û giyan bi yek wateyê tê bikaranîn, û ev dibe sedema kûrbûna vê têkiliyê. Gotina ,can’ ku di bingeha xwe de her tiştê girêdayî însan tîne zîman, hinek caran tê wateya “giyan” jî. Weke ku di Incîlê de tê bikaranîn, cudabûnek di navbera ,can’ û ,giyan’ de heye, û ew dikarin ji hev cuda bibin (Heb. 4:12).

Di zîmanê îbranî û yunanî de “giyan” bi rengê (,Rauch’ û ,Pneuma’) û her wiha bi wateya gotinên jêrîn jî tê wergerandin:

Jiyan – Bîr – Hilm – Giyan – Ba

Em di mijar 2.1 de li ser ‘Giyan’ rawestiyay. Yezdan giyanê xwe ji bo domandina afirînê bikartîne. Giyanê Yezdan yê di hundirê însan de, hêza jiyanê ye. “Bedena bê giyan mirî ye” (James 2:26). “Yezdan hilma jiyanê (giyan) pifî nava wî (pozê Adem) kir, û însan bû canekî (taybetî) ku dijî” (Gen. 2:7). Eyûb dibêje: “Giyanê Yezdan, di bêvilên pozê min de ye” (Job. 27:3 krş. Is. 2:22). Bi vî awahî giyanê jiyana di nava me de, di dema zayînê de didin me û ta ku bedena me zindî be, ew bi me re dimîne. Dema ku giyanê yezdan xwe ji tiştekî dikişîne, ew yekser dimire - giyan hêza jiyanê ye. Heger Yezdan “giyan û hilma xwe li gel xwe kom bike, wê tevayî xwedenên bi beden, bi hev re bimirin, û wê însan dîsa li axê vegere. Heger tu niha xwedî bawerî bî li vê guhdar bikî” (Job. 34:14-16). Hevoka dawîn dîsa diyar dike ku cewherê însan yê rastîn ji bo lihevhatina hinekî eks e.

Dema ku yezdan giyanê xwe di dema mirînê de ji me dişîne, ne bi tenê bedena me, her tiştekî me radiweste. Şirovekirina vê ji hêla Dawid ve, dihêle ku ew ji tebayên zeîf mîna însanan bêhtir, bawerîya xwe bi Yezdan bîne. Ps. 146:3-5 bi xwe dijberiyêke bi hêze li dijî nerînên însanetiyê (humanizm).

“Ne baweriya xwe bi prênsan, û ne jî bi benîadem bînin, ku tu rizgarkariya wan nîn e. Giyanê wî derdikeve û ew vedigere erdê (xaka ku em jê afirîne), di heman rojê de ramana wî têk diçe. Xwezî bi dilê ewên ku ji bo rizgariya xwe, xwediyê Yezdanê Yakup in”.

Di mirinê de “wê ax vegere serzemîna ku berê lê bû, û wê giyan jî li Yezdanê ku wî dide vegere” (Ecc. 12:7). Me berê dabû xuyakirin ku Yezdan bi riya giyanê xwe li her derê ye. Bi vê wateyê, “Yezdan giyan e” (Jn. 4:24). Dema em bimirin, “hilma me ya dawîn” tê wateya ku giyanê Yezdan yê di nava me de, ji me cuda dibe. Ev giyan ji aliyê Yezdan ve yê ku li her aliyê me ye, tê kişandin. Bi vî awahî, di mirina me de, “wê giyan, dîsa li Yezdan vegere.”

Ji ber ku giyanê Yezdan hêzê dide tevayî afirînê, heman pêvajoya mirinê ji bo heywanan jî pêk tê. Însan û heywan di nava xwe de xwediyê heman giyan an jî hêza jiyânê ne. “Tiştê ku tê serê benîadem, wê were serê heywanan jî. Tiştê ku tê serê wan bi temamî weke hev e. Yek dimire, yê din jî dimire. Belê, hemû xwediyê yek hilmê (giyanê) ne. Ji ber vê yekê însanek ne di ser heywanekî re ye” (Ecc 3:19). Li vir nivîskar dibêje ku, di navbera cihê çûna însan û heywan de tu cudabûneke girîng nîne û didomîe (Ecc. 3:21). Ev danasîna ku dibêje însan û heywan xwediyê yek giyanê ne û bi heman şeweyê mirinê dimirin, gelekî nêzîkî şiroveya berê ye ku digot, însan û heywan her du xwediyê giyanê jiyânê yê Yezdan in (Gen. 2:7, 7:15) û ewê her du jî di tofanê de bi heman şeweya mirinê bimirin: “Xwediyê tevayî bedenên ku li serzemînê dilivîyan mirin: Çivîk, dewar û heywan û her tiştê ku li serzemînê dixuşîyan û her însan mirin. Tevayî yên ku hilma (giyana) jiyânê di pozê wan de bû... mirin... her tiştê ku dijiya hate tunekirin” (Gen. 7:21-23). Bala xwe bidin ps. 90:5 ya ku me berî niha lêkola, mirinê dişibîne tofanê. Beşê 7 yê Afirînê bi awayekî eşkere diyar dike ku tevayî însanan ji yek çînê ne: “Tevayî xwedanbedenan... her tiştê ku dijî.” Ev, ji ber ku însan jî weke tebayên din xwediyê giyanê jiyânê ye, wiha ye.

4.4 MIRIN JIBÎRÇÛYÎNE

Tiştên ku me heta niha li ser can û giyan dîtin, ji me re diyar dikin ku însan di dema mirinê de bîrborî ye. Wê çalakiyên kesên li hemberî Yezdan berpirsiyar, ji aliyê Wî ve werin bi bîr xistin (Mal. 3:6, Rev. 20:12, Heb. 6:10). Di Incîlê de jî tiştêkî ku îspat bike, însan di dema mirinê de li ser hişê xwe ye, nîne. Di derbarê vê de zehmete ku em eksê gotinê li jêr bibêjin:

“(Ya însan) hilm (giyan) derdikeve, diçe, ew bixwe li axê vedigere, di heman rojê de (kêliyê) de ramanên wî tune dibin” (ps. 146:4).

- “Mirî tişteki nizanin... hezkirina wan, kîna wan û hesûdiya wan, niha tune dibe” *Ecc. 9:5,6). “Li diyarê miriyan hikmet nîne (Ecc. 9:10)- raman nîne û ji ber vê yekê hiş nîne.

- Eyûb di dema mirinê de, dibêje: “Weke ku qet nebûye” (dob 10:18). Wî, mirina ku em berî zayînê xwediyê wê bûn, weke valatî, nezanî û tunebûna hebûnê dît.

- Însan weke heywanan dimire (Ecc. 3:19). Heger ku însan li hinek deveran bi zanebûn jiyana xwe di mirinê de bidomîne, divê heywan jî wiha bin. Dîsa jî hem Nivîsên Pîroz û hem jî zanist, di vê babetê de bêdeng dimirin.

- Yezdan “bi bîr dixê ku em ax in. Însan jî, rojên wî mîna geya ne, weke guleke berî wiha şîn dibe... piştê tune dibe, û cihê wî êdî wî nas nake” (ps. 103:14-16).

Mirin ji bo yê rastîn jî bîrboriyeke. Ebdên Yezdan ji bo ku ew destûra dirêjîya temenê wan bide, bi sedcaran libergera xwe dubare dikin, ji ber ku ew dizanin ku mirin bîrboriyeke û êdî ew piştî mirinê nikarin dua bikin û Yezdan berz bikin. Hezekyel (Is. 38:17-19) û Dawid (ps. 4:6,5; 30:9; 39:13; 115:17) ji bo vê yekê nimûneyên baş in. Mirin, hem ji bo başan û hem jî ji bo xeraban weke xewekê û bêhdanekê tê ziman (Job. 3:11,13,17; Dan. 12:13).

Piranî caran tê dubarekirin û belavkirin ku wê kesên rast biçin kêfxweşîyeke mezin û ewê piştî mirina xwe yekser di bihuştê de werin xelatkirin. Ev yek di Incîlê de nehatiye ziman. Zanistiya mirinê û ya cewherê însan hesta aramiyê dide mirov. Piştî êş û birînên jiyana kesekî, gor bi temamî weke cihê valatîyê ye. Ji bo kesên ku daxwazên Yezdan nizanin, wê ew valatî heta hetayê bidome. Wê hesabê kevin yê wê jiyana xemgîn tu caran dernekevin holê. Wê tirs û hêviyên vala yê mêjiyê însan, pêk neyên û nebin tehdît.

Sîstemeke rastiya xebata Incîlê heye. Lê ew kesên ku Incîlê di ber çavan re derbas nakin, di nerînên wan yê olî de sîstemeke kêmasiyan heye. Keda însan ya ji bo nermkirina xemgîniya mirinê, bê hêvî û encam e, û dihêle ku baweriya xwe pê bîne ku ew xwediyê giyanekî nemir e. dema ku di nava însan de hebûna giyanekî wiha were pejirandin, bi awayekî sxwezayî mirov difikie ku ewê piştî mirina xwe biçê devereke. Ev yek dihêle ku mirov bifikire û bibêje ku di mirinê de, di navbera qedera baş û xerab de cudabûnek heye. Ji bo bi encamkirina vê jî, mirov dibêjin wê giyanên baş yê nemir biçin cihekî ku jêre dibêjin bihuşt, û wê giyanên xerab yê nemir biçin cihê ku jêre dibêjin dogeh. Berî niha me gotibû ku ‘giyanê nemir’ bêderfetiyeke Incîlî ye. Hinek ramanên din yê çewt jî (li jêr, bi rêzê)wê werin lêkolîn:

1. Di mirinê de, xelata giyanên me ya weke ‘giyanê nemir’ tê diyarkirin
2. Cudabûna di navbera baş û xerab de, dema mirinê tê holê.

3. Ji bo yê baş, xelat çûna bihuştê ye.
4. Heger yek xwediyê ‘giyanê nemir’ be, wê demê her kes mecbure an biçê bihuştê an jî dojhê.
5. Wê ‘canên’ (kesên) xerab biçin cihê cezakirinê yê ku jêre ‘dojeh’ tê gotin.

Armanca analizên me ne bi tenê nebaşbûn e. Heger em van xalan bi berferêhî di ber çavan re derbas bikin, emê gelek beşên Incîlê yê li ser rastiya cewherê însan bibînin û diyar bikin.

4.5 VEJÎN

Incîl dibêje, xelata rastiye wê di dema vejînê de bi hatina Mesîh re were dayîn (1 Thes. 4:16). Yekemîn tiştê ku Mesîh bike, zindîkirina miriyên baş e. (li mijar 4.8. binêre), piştê wê demê tu dest pê bike. Heger di mirinê de ‘can’ biçûya bihuştê, wê demê tu sedema vejînê nedima. Paulus dibêje, heger vejîn nebûya, wê demê wê keda ku ji bo perestiya Yezdan hatiye xerckirin, bê wate bûya (1 Cor. 15:32). Wî tiştêkî wiha neaniye ziman ku heger xwedî bawerî be, wê piştî mirinê giyanê wî di bihuştê de were xelatkirin?

Wî weke awayê xelatê baweriya xwe bi zindîbûna bedenê anî. Mesîh bi gotina ku wê bersiva jiyana bi bawerî di dema vejînê de were dayîn, cesaret da me (Lk. 14:14).

Divê em xala dawîn ji bo mijara ku Incîl hebûneke ku ne bedenî be nade fêrkirin deynin, ku ev ji bo Yezdan, Mesîh, Melaîket û însanan tê pêkanîn. Dema ku Mesîh vegere, “wê bedena me ya xerab biguhere û ewê bedena me, weke bedena wî ya berz, were çêkirin” (Phil. 3:20,21). Niha ew ji xwîne zêdetir, xwediyê bedenê ye ku hêza xwe ji giyan distîne. Wê demê emê jî xelateke mîna wê parvekin. Di dadkirinê de em li vê jiyane çawa jiya bin, emê bersiva wê bibînin (2Cor. 5:10). Yê ku jiyaneke ketî û bêrûmet jiya bin, wê piştê xera bibin, bibin ax û ewê di bedena xwe ya bi mirin de bimînin. Yê ku bi xebata xwe hîştine ku daxwazên giyan, bi ser daxwazên bedenê kevin, wê bi şiklê bedenê tijî giyan “ewê ji giyan, jiyaneke bê dawîn bi dest xînin” (Gal. 6:8).

Gelek delîlên din jî hene ku dibêjin wê xelata kesên rast bedenî be, dema ku ev were pejirandin, wê giringiya vejînê bi hesanî were dîtin. Di dema mirinê de hebûna bedena me ya heyî radiweste. Heger ku emê nemirî û jiyaneke bê dawîn, bi tenê bi şêweyeke bedenî bibînin, wê demê pêwîste mirin, wextêkê bîrboriyê be, ta ku bedena me ji nû ve were afirandin û cewherê Yezdan bo me were pêşkêşkirin.

Tevayê Korinti 1, beşa 15. behsa vejîne dîke. Ew herdemê bersiva xwendineke bi bal dide. 1 Cor. 15:35-44, çawa tovek were çandin û piştre ji binê axê derkeve, wê mirî jî dema ku Yezdan wî bi bedenê xelat bike, wiha ji binê axê derkeve. Çawa Mesîh ji gorê rabûbe û bedena xwe ya bi mirin, bi bedeneke bê mirin guhertibe, wê bawermendên rasteqîn jî wiha wê xelatê parve bikin (Phil. 3:21).

Em bi riya Vaftîzmê didin nîşandan ku baweriya me bi parvekirina xelata Mesîh heye û em xwe bi mirin û vejîna wî re dikin yek (Rom. 6:3-5). Emê niha jî bi parvekirina erşên wî, xelata wî jî parvekin: “Ji bo ku jiyana Îsa di bedena me de were dîtin, em mirina mîrzayê xwe Îsa (niha) di bedena xwe de hildigrin” (2 Cor. 4:10). “Ewê ku Mesîh ji mirinê rakir, wê bi riya giyanê xwe, bedenê xwe yê bi mirin jî zindî bike” (Rom. 8:11). Bi vî awahî, em li hêviya “rizgarbûna bedena xwe” ne ji ber ku ewê bê mirin be (Rom. 8:23).

Ev hêviya xelata bedenî, ji destpêkê ve ji aliyê gelê Yezdan ve hat fêmkirin. Ji bo Îbrahîm soz hat dayîn ku seranserê axa Kenanê, weke mîrasekê heta heta ji wî re were pêşkêşkirin (Gen. 13:17, binêre mijar 3,4). Baweriya wî ya bi vî sozê, hîşt ku ew îmana xwe pê bîne ku ewê di dîroka pêşerojê de bedena wî were zindîkirin û wê bê mirin be û bi wî awahî wê soza wî bi cih were.

Bedena Eyûb, di gorê de ji aliyê kurman ve dihat xwarin, lê belê ew diyar dîke, ka wî xelata xwe bi çî awahî wergirtiye: “Rizgarkarê min zindî ye û... wê roja dawîn li serzemînê rabe ser piyan. Û piştî ku kurm çermê min û bedena min tune jî bikin (N.I.V, bi bedena xwe) Yezdan bibînim, ku ezê wî ji bo xwe bibînim û ewê çavên min temaşê bikin, ne yê din, heger hêza min ji nava min were xelaskirin jî” (Job. 19:25-29). Hêviya Îşaya jî wiha ye: “Wê bedena min ya mirî rabe” (Is. 26:19).

Heman gotin, piştî mirina hevalê Îsa yê bi navê Lazar jî hatine, jî hatine gotin. Li şûna ku mîrzayê me Îsa dibêje ku giyanê wî çûye bihuştê û aramiyê bide xwişkên wî, wî behsa roja vejîne kir: “Wê biraderê we careke din rabe (zindî bibê).” Bersiva ku xwişka Lazar, ya bi navê Marta daye, dide nîşandan ku ev yek ji aliyê Xiristiyanên destpêkê ve dihat fêmkirin: “Marta ji wî re got: Ez dizanim ku ewê roja dawîn, di vejîne de rabe” (Jn. 11:23,24). Mîna Eyûb, Marta jî mirin weke ketina deriyê jiyaneke bi kêf nedît, lê belê hêviya wê bi vejîna ‘roja dawîn’ (bi ‘roja dawîn’ ya Eyûb krş) heye. Mîrzayê me Îsa soz da: Ji ber vî yekê ezê herkesê ku bav dibihîse û ji wî fêr dibe... di roja dawîn de zindî bikim” (Jn. 6:44,45).

4.6 DADKIRIN

Li ser dadkirinê, danasîna Incîlê berfereh e. Dadkirin, zagoneke bingehîn e, ku pêwîst e, ji bo baweriyeyeke temam, ew berî vafîzbûnê were fêmkirin (Acts. 24:25, Heb. 6:2). Nivîsên pîroz gelek caran diyar dikin ku, wê kesên di bin bedena Yezdan de, xelata xwe ‘roja dadkirinê’ bistînin (nimûne: 2 pet. 2:9, 3:7, 1jn. 4:17, Jude 6). Em tev “mecbûrin li pêşiya kursiyê dadgeha Yezdan rawestin” (Rom. 14:10). Ji bo bersiva tiştên ku me di jiyana xwe de derbas kiriye, “emê li pêşiya kursiyê Mesîh yê dadkirinê werin dîtîn” (2 Cor. 5:10).

Dîtînen Daniel yên li ser hatina Mesîh ya duwemîn, vê kursiya dadkirinê jî tîne ziman (Dan. 7:9-14). Şibandin, (çîrokên bi wate) alîkariya mirov dikin ji bo kûrbûna li ser mijarekê. Ji vana yek ewe ku di şibheta jêhatîbûna xwezayê de ye: Ji nû ve hatina mîrzayekî ye ku gazî koleyên xwe dike, û şîroveya encama pereyên ku ji wan re danîne dike (Mt. 25:14-29). Di çîroka masîvanan de, banga Incîlê, weke tora masîyan tê dîtîn ku dikare her reng însan li xwe bicivîne. Li ser vî bingehî însan rûdinin (krş. Rûniştina Dadkirinê) û masiyên baş ji yên xerab cuda dikin (Mt. 13:47-49). Rave kiriye: “Wê di dawîya dinyayê de, melaîket werin û xeraban ji başan cuda bikin”.

Li gora tiştên ku me heta niha dîtine, diyar dibe ku, wê piştî hatina Mirzayê me Îsa û vejîna wî, ji bo dîtina Mesîh wê civînek ji wan kesan re were li darxistin yên ku di demekê de, banga Mizgînê ji wan re hatibû kirin. Pêwîste ji aliyê wan ve hesabek were dayîn û wê ew diyar bike, ka kîjan layiqî xelata ketina bin serdestiya Yezdan e. Ev rewşeke taybetiye bi wan kesên rast yên ku wê bêne xelat kirin. Ev dişibe meseleya kombûna mîh û bizinan: Wê benîadem di nava xemla xwe de were, û wê li gel wî tevayê melaîketên pîroz jî werin; wê li ser textê xemla xwe rûne (li ser textê Dawid yê li Qudsê. Lk. 1:32,33); wê li pêşiya wî tevayê netewan têkevin rêzê (ango kesayetên ji her netewî- krş. Mt. 28:19); wê ew jî wana mîna şivanekî ku mîhên xwe ji nava bizinan derfîne, ji hev cûda bike. Wê mîhan li aliyê rastê û bizinan jî li aliyê çepê deyne, wê demê wê yê berz bilind ji yên li milê xwe yê rastê re bibêje, ‘Werin, hûn yên ku bavêmin ew pîroz kirine, werin serdestiya ku weke mîrat ji bo we hatiye amade kirin bibin’ (Mt. 25:31-34).

Wergirtina serdestiya Yezdan weke mîrat û bi destxistina sozên ku ji bo Ibrahîm hatibûn kirin, xelata kesên rast e. Lê belê wê ev yek piştî hatina Mesîh û dadkirinê pêk were. Ji ber vê yekê berî hatina Mesîh xelata bedeneke bê mirin ne gengaze. Divê em bigihîjin baweriyaya ku ji dema mirinê ta vejîna ne gengaze ku em bi awayekî din ji xeynî hebûna bedenekê bikaribin bijîn, û pêwîste em bizanibin ku kesên bawermend ne xwediyê hebûneke zanistî ye.

Lê belê rastiya ku wê bi hatina Mesîh re –ne berî wê- xelat were dayîn, bi caran di Incîlê de dubare dibe:

-“Dema ku serşivan (Îsa) were dîtin, hunê tev bibin taceke xemilandî” (1Pet. 5:4 krş. 1:13)

-“Wê Mesîh Îsa... di teşbîh û serdestiya wî de yên zindî û mirî dadgeh bike... Mirzayême Îsa yê ku dadgêrekî adile, wê di wê rojê de taceke rastiyê bide min (2 Tim. 4:1,8).

-Wê di rojên dawî de, di dema hatina Mesîh de, “yên ku li ser xakên serzemînê radikevin, wê rabin ser xwe (krş. Gen. 3:19); hinek jê ji bo jiyanê bê dawîn û hinek jî ji bo şermê” (Dan. 12:2).

-Roja dadkirinê dema ku Mesîh were, “yên ku di gorê de ne... wê derkevin; yên ku başî kirine ji bo vejîna jiyanê û yên ku xerabî jî kirine ji bo vejîna şermezar kirinê” (Jn. 5:25-29).

-“Ez (Îsa) zu tîm; û xelata her kesî li gora kiryarên wî bi min re ye” (Rev. 22:12). Emê ji bo xelatgirtinê neçin bihûştê; wê mesîh wê ji bo me ji bihûştê bîne.

Dema ku Mesîh xelatên me ji bihûştê bîne, tê wateya ku ew ji bo me li bihûştê hatine amade kirin. Ewê di hatina xwe ya duwemîn de, wan ji me re bîne serzemîn. Mîrata me ya xakên ku soza wan ji Ibrahîm re hatiye dayîn jî bi vê wateyê ye: “(mîrat) ji bo we li asîmanan veşartiyê. (Di dema hatina Mesîh de) bi xêra baweriyê we ya bi rizgariya ku êdî derdikeve holê, ji aliyê hêza Yezdan ve tê parastin”(1 Pet. 1:4,5).

Têgihîştina vê yekê, dihêle ku em bi awayekî baş şîroveya Jn. 14:2,3 jî bikin ku gelek caran ew çewt tê fêm kirin: “Ez (Îsa) diçim ji bo ku cihekî ji we re ama de bikim. Heger ez biçim û cihê we amade bikim (krş. xelata ku li asîman tê veşartin) ji bo ku hun jî li gel min bin ezê vegerim û we bibim cem xwe”. Îsa behsa cihekî din dike ku ewê ji wir were ji bo ku xelatên me bide me (Rev. 22:12); û me dît ku wê ew li ser kursiyê dadkirinê bêne dayîn. Wê Ew li ser textê Dawid yê li Qudsê ‘heta hetayê’ serdestiyê bike (Lk. 1:32,33). Wê Ew bê dawîtiyê li vir, li serzemîn biborîne û ew li kuderê be (li serzemîn di bin serdestiya Yezdan de), emê jî li wir bin. Bi vî awahî em dikarin soza wî ya ku dibêje ‘ezê we bibim cem xwe’ bi awayê ku ewê di dadkirinê de me bipejirîne şîrove bikin. Di Yunanî de, gotina ‘ezê we bibim cem xwe’ di Mt. 1:20 de jî li ser Yusif bi rengê ku ewê Meryemê weke xanima xwe ‘jixwe re bibe’ derdikeve holê. Ji ber vê yekê ne pêwîste ku ev livbaziya bi awayekî bedenî çûna ber bi Îsa de bîne ziman.

Madem wê xelat di hatina Mesîh de û roja dadkirinê were dayîn, ev dide nîşandan ku baş û nebaş di dema mirinê de diçin heman cihê ango heman gorê. Di dema mirinê de tu cudabûn nakeve navbera wan. Yê li jêrê delîlê vê yekê ne:

-Yonatan baş bû lê belê Saul xerab bû; lê dîsa jî “ew di mirina xwe de ji hev cuda nebûn” (2 Sam. 1:23).

- Di dema mirinê de; Saul, Yonatan û Samuel tev çûn cihekî (1 Sam. 28:19)

- Ibrahîmê rast di dema mirina xwe de, tevî “gelê xwe” an jî bav û kalên xwe bû; (ku) ew putperest bûn (Gen. 25:8 ; Josh. 24:2).
- Yê bîaqil û yê bêaqil, bi heman awahî dimrin (Ecc. 2:15,16).

Tevayê van daxuyaniyan, li gel daxuyaniyên ‘Xirîstiyaniyê’ di nava nakokiyê de ne. Li gorî gotina wan yê rast di dema mirinê de yekser diçin bihûştê. Lê belê ev yek pêwîstiya vejîn dadkirinê ji holê radike. Lê belê em van tiştan dîsa jî di pîlana Yezdan ya rizgariyê û banga Mizgînê de weke buyerên girîng dibînin. Daxuyaniya ku pir belavbûye dibêje ku wê yê baş bi riya çûna bihûştê werin xelat kirin, û wê ev ji aliyê yê din ve jî di roja pêş, meha pêş û sala pêş de were şopandin. Ev yek bi daxuyaniya Incîlê re sedî sed di nava nakokiyê de ye ji ber ku Incîl dibêje, wê yê rast bi hev re bêne xelat kirin:

- Wê roja dadkirinê, mîh yek bi yek ji bizinan werin veqetandin. Piştî xelabûna dadkirinê wê Mesîh bixwaze ku tevayê mîhan li aliyê milê wî yê rastê kom bibin: “werin, hun yê ku bavê min ew pîroz kirine, werin serdestiya ku ji bo we hatiye amadekirin, weke mîrat ji xwe re bibin” (Mt. 25:34). Bi vî awahî wê tevayê mîhan di heman demê de serdestiyê weke mîrat wergirin (krş. 1 Cor. 15:52).
- Di dema vegera mesîh û ‘paleyîya’ dadkirinê de, wê tevayê yê ku di Mizgînê de kar kirine, “bi hev re kêfxweş bibin” (Jn. 4: 35,36 krş. Mt. 13:39).
- Rev.11:18 vê yekê tîne ziman: Yezdan “yên ku ji navê te ditirsin, ebdên te, pîroziyên te... dema ku xelat da, “dema dadkirina miriyan jî hat”- ango tevayê bawermendan li gel hev.
- Ibranî beşê 11. listeya kesên rast yê di Ahîda kevin de ye. Li vir Ayeta 13. bi vî awahî rave dike: “ev kesana tev di nava baweriyê de mirin”; bêyî ku bigihîjin soza rizgariyê ya ku bi riya ketina bin serdestiya Yezdan tê bidest xistin û ew ji bo Ibrahîm hatibû dayîn (Heb. 11:8-12). Ji vê yekê diyar dibe ku ev kesana di dema mirina xwe de ji bo girtina xelatê yek bi yek neçûne bihûştê.

Sedema vê yekê di ayetên 39 û 40. de tê dayîn: “Ewana negihîştin sozê. Ji bo ku ew bêyî me negihîjin bi rêkûpêkiyê, Yezdan ji bo me tiştên baştir amade kirine”. Derengmayîna dana xelatê wan ji ber vê yekê ye ku Yezdan dixwaze tevayê bawermendan bi hev re bigihîne ‘birêkûpêkiyê’. Wê ev di roja dadkirinê de, di dema hatina Mesîh de pêk were.

4.7 CIHÊ XELATÊ: BIHÛŞT AN JÎ DINYA?

Ji xeynî sedemên jorîn, yê ku bibêje cihê serdestiya Yezdan, ango xelatê ne serzemîn lê belê bihûşte divê van xalên jêrîn jî diyar bike:

- Dua ya Mirzayê me Îsa, doza serdestiya Yezdan dike (ango li ber Mesîh digere ku ew carekedin vegere); ku wê bi wî re daxwazên Yezdan yên ku niha li asîman pêk tînin, wê li serzemînê jî werin pêkanîn (Mt. 6:10). Ji ber vê yekê em dua dikin ku serdestiya Yezdan were serzemînê. Cihê xemgîniyê ye ku hîna jî bi hezaran kes her roj bê raman lavan dikin û pê bawerin ku serdestiya Yezdan niha li bihûştê hatiye ava kirin û ji ber vê yekê wê serzemîn têk biçe.
- “Xwezî bi dilê bawermendan: ji ber ku ewê serzemînê weke mîrat wergirin” (Mt. 5:5) –ne ji bo canên ku wê biçin bihûştê-. Ev yek beşê 37. yê îlahîyatan tîne bîra mirov ku dibêje wê xelata yên rast li serzemînê were dayîn. Li cihê ku xeraban di dema serdestiya xwe ya derbasbûyî de kêfa xwe anîn, wê yên rast bi jiyaneke bê dawî bêne bersivandin û wê bibin xwediyê vê serzemîna ku demekê dibin serdestiya xeraban de bû (Ps. 37:34,35). Jiyana bê dawî ya li serzemînê tê wateya ku jiyana bê dawî ya li bihûştê ne gengaze.
- “Dawid... hem mir û hem jî hate binax kirin... Dawid bilindî asîman nabe” (Acts 2: 29,34). Li şûna vê Petrus got ku hêviya wî girêdayî vejîna ji mirinê ye ku wê di dema hatina Mesîh de pêk were (Acts 2: 22:36).
- Serzemîn cihê karê Yezdan yê mirovahiyê ye: “Asîman ya Yezdan e; lê belê Wî serzemîn da zarokên însanan” (Ps. 115:16).
- Rev. 5:9,10 wêneyekî ji gotinên kesên li ser kursiya dadkirinê tîne ziman: “(Mesîh) em li gel Yezdan kirin kesên berz û pîroz: û emê serdestiyê li serzemînê bikin”.Ev yeka ku dibêje emê li serzemînê dibin serdestiya Yezdan de hukum bikin, gelekî durî gotina hinek kesa ye ku dibêjin emê li cihêkî asîman di nava kêfxweşiyê mezin de bijîn.
- Kehanetên di Beşên 2 û 3. yên Danîel de li ser silsîleya hêzên siyasî yên ku wê têkevin şûna serdestiya Yezdan de radiweste. Herêma dibin birêvebiriya vê serdestiyê de “wê tevayê binê asîman be” ; ku ev tevayê serzemînê dixê bin hukmê xwe (Dan. 7:25 ; 2:35 krş. a. 44). Wê ev serdestiya bê dawî “ ji bo nijada pîrozên herî berz were pêşkêş kirin” (Dan. 7:27); bi vî awahî xelata wan, jiyaneke bê dawî ye ku ewê di serdestiya xwe ya serzemîn de li binê asîmanan bidomînin.

4.8 BERPIRSYARIYA LI HEMBERÎ YEZDAN

Heger însan bi awayekî xwezayî xwediyê canekî bê mirin bûya, wê bihata mecbûr kirin ku ew li derekê xwediyê qedereke bê dawîn be jî- an cihê ku lê were xelat kirin an jî cihê ku lê were ceze kirin. Ev dide nîşandan ku her kes li hemberî Yezdan xwedî berpirsyariye. Me diyar kir ku Incîl dibêje: bêyî hebûna nemiriyeke xwezayî, însan bi awayekî xwezayî dişibin heywanan. Li gel vê yekê, dibin serdestiya Yezdan de ji bo hinek kesan hevîya jiyaneke bê dawî tê pêşkêş kirin. Eşkereye ku wê her kesê ku dijî zindî nebe. Mîna heywanan însan jî dijîn, dibin mîna axê, xera dibin û dimrin. Dîsa jî ji ber ku wê dadkirin hebe, wê hinek bêne ceze kirin û wê hinek jî bi jiyaneke bê dawî bêne xelat kirin. Divê em bizanibin ku wê di nava însana de hinek kes bêne zindî kirin ji bo ku ew di encama dadkirinê de werin xelat kirin.

Ev yek girêdayî zindîbûn û nezindîbûna wan û berpirsyariya wan ya ji bo dadkirinê ye. Dadkirina me di bingehê xwe de ji bo bersiva me ya li hemberî gotina Yezdan e. Mesîh vê yekê wiha tîne ziman: “Yek heye wê wan kesên ku min napejirînin dadgeh bike; gotina ku min got, mîna gotina yê ku wê roja dawî wî dadgeh bike (Jn. 12:48). Yên ku gotina Mesîh nizanin, fêm nekirine û bi vî awahî nebûne xwediyê derfeta pejirandin an jî nepejirandina wê, wê di dadkirinê de ne berpirsyar bin: “Yên ku bêyî naskirina zagonê (ya Yezdan) guneh kirine, wê bê tunebûna zagonê jî tune bibin; yên ku di nava zagonê de (yanî bi zanebûn) guneh kirine, wê bi zagonê werin dadgeh kirin” (Rom. 2:12). Bi vî awahî yên ku daxwazên Yezdan nizanin, wê mîna heywanan tune bibin; yên ku bi zanebûn zagona Yezdan binpê kirine wê werin dadgeh kirin û ji bo pêşwazî kirina vê dadgehê wê werin zindî kirin.

Di çavê Yezdan de, “bê zagon guneh nayêne kirin” ; “Guneh, binpê kirina zagonê ye (ya Yezdan)” ; “Bi hebûna zagonê, guneh têne fêm kirin” (Rom. 5:13 ; 1 Jn. 3:4 ; Rom. 3:20). Weke ku di gotina Wî de jî tê ziman, bêyî haydariya ji zagonên Yezdan, însan nayêne gunehbar kirin; û bi vî awahî yên di vê rewşê de nayêne zindî kirin û dadgeh kirin. Ji ber vê yekê, yên ku gotina Yezdan nizanin, wê weke heywanan û şinkayiyê, mirî bimîne: “Însanê ku fêm nake, dişibe heywanê ku tune dibe” (Ps. 49:20). “Wê ewana mîna mîhan ber bi diyarê mirinê ve werin ajotin” (Ps. 49:14).

Têgihîştina gotinên Yezdan, dihêle ku mirov li hemberî wî berpirsyar be, û bi vî awahî zindî bibe û li ser kursiyê dadkirinê were dîtin. Bi vî awahî ne bi tenê yên rast û vafîzbûyî, herkesê ku Ew fêm kirine û li hemberî Yezdan berpirsyarin wê werin zindî kirin. Ev yek di Nivîsên Pîroz de pir dubare dibe:

- Jn. 15:22, dide xuya kirin ku zanebûna gotinê, berpirsariyê jî bixwe re tîne: “Eger ez (Îsa) nehatibama gel wan, û min ji wan re negotiba, wê ew ne xwedî guneh bûna: lê belê niha ew nikarin ji ber gunehê xwe bi tu derê de (A.V. têbiniya kêlekê., qisur) biçin. Her wiha Rom. 1: 20-21 jî dibêje, naskirina Yezdan mirovan bê qisur dihêle.
- Ezê (Mesîh) her kesê ku bavê me bihîstibe û ji wî fêr bûbe...roja dawî rakim (zindî bikim)” (Jn. 6:44,45).
- Yezdan guh nade liva kesên ku helwesta Wî nasnakin, lê belê ew bala xwe dide yên ku helwesta wî dizanin, û hêviya bersivê jî wan dike (Acts 17:30).
- “Koleyê ku daxwaza Mirzayê xwe nas bike lê belê xwe jê re amade neke û daxwaza wî bi cih neyne, wê bi xwarina gelek qamçiyên were ceze kirin. Lê belê yê ku bi nezanî derbeyên qamçî heq kiriye, wê çend qamçiyên (ango mirî mayinê) bi tenê bixwe. Herî zêde kê biribe wê herî zêde jî ji wan were xwestin; însan herî zêde emanetî kê bûbin, wê herî zêde ji wî were xwestin” (Lk. 12: 47,48)- wê demê çiqasî zêdetir Yezdan?
- “Yê ku bizanibe başiyê bike û neke, gunehê” (James 4:17).
- Berpirsariya Îsraîl ya taybetî li hemberî Yezdan, ji ber daxuyaniyên pir yên ku Yezdan di derbarê xwe de dane wan (Amos 3:2).
- Ji ber vê berpirsariyê, “li şûna ku riya rast binasin lê dîsa jî ji fermana pîroz vegezin, ji bo wan çêtir ku vê riyê qet nenasin (ji bo wan kesên ku ji riya Yezdan vegeziyan)” (2 Pet. 2:21). Li ser vê mijarê daxuyaniyên din dikarin di: Jn. 9:41 ; 3:19 ; 1 Tim. 1:13 ; Hos. 4:14 ; Dt. 1:39 de werin dîtin.

Têgihîştina Yezdan, me li hemberî kursiyê dadkirinê dike xwedî berpirsariyê. Di encam de yên ku negihîştibin vê zanebûnê ji bo dadkirinê nayêne zindî kirin. Nebûna zanebûna wan wan dike mîna “heywanê ku tune dibe” (Ps. 49:20). Gelek delîl hene, diyar dikin ku wê her kes newe zindî kirin:

- Piştî mirina wan, ezê gelê netewa Babilê yê kevin “ji mirinê ranekim” ji ber ku ew durî zanebûna Yezdan bûn (Jer. 51:39 ; Is. 43:17).

- Îşaya dilê xwe qewîn dike: “Ey Mirzayê me, Yezdanê me (yê Îsraîl) mirzayên berî te serdestiya xwe li ser me ava kirin (wek nimûne, Filistî û Babîlî)...Ewana mirî ne, (wê careke din) nejin. Ewana mirî ne, ranabin...ji bo ku hişê wan bi tevayî têk biçê”. (Is. 26: 13,14). Li vir bala xwe bidin diyar kirina ku ewê careke din neyêne zindî kirin: “Wê careke din nejin...wê ji mirinê ranabin...ji bo têkçûna hişê wan”. Bervajî vê yekê, Îsraîlî ji ber têgihîştina Yezdan ya rastîn xwediye derfetê zindîbûnê bûn: “wê însanên te (yên Îsraîlê) yên mirî bijîn, wê bedena min ya mirî bi wan re rabe ser xwe” (Is. 26:19).
- Dema ku em behsa gelê Yezdan Îsraîlî dikin em dibêjin: di vegera Mesîh de, “wê gelekên ku di xakên serzemînê de raketîne, rabin: hinek jê ji bo jiyaneke bê dawî, û hinek jî ji bo şermezarî û nefreteke bê dawî” (Dan. 12:2). Bi vî awahî wê “piraniya” Cihûyan, lê ne tev de, weke gelê Yezdan yê hîlbijartî, ji ber berpirsariya xwe ya li hemberî Yezdan, bêne zindî kirin. Yê ku ji zanebûna Yezdanê xwe bê par mane jî, ji bo ku gotina mirzayê xwe Yezdan nedîtine wê bikevin û tu caran ranabin (Amos 8: 12,14).

EM FÊRÎ VAN XALAN BÛN:

- 1. Zanîna gotina Yezdan, mirov li hemberî wî dixê bin berpirsariyê.**
- 2. Wê bi tenê yê berpirsîyar bêne zindî kirin û dad kirin.**
- 3. Bi vî awahî kesên ku Yezdanê rasteqîn nanasin, wê mîna heywanan mirî bimînin.**

Wateya van encaman derbeyeke dijwar li şanaziya însan û baweriyên me yê biçûk dixîne. Hem di dîrokê de û hem jî niha, bi milyonan kesên ku ne xwediye zanebûna Mizgînê ne; yê ku di aliyê mêjî de nexweşên giranin û nikarin bangên Incîlê fêm bikin; zarokên ku bêyî naskirina Incîlê dimrin; tevayê van kesan dikevin nava refên yê ku ne xwediye zanebûna Yezdan in û ji ber vê yekê li hemberî wî ne xwedî berpirsariyê ne. Ev tê wateya ku wê neyêne zindî kirin. Ev tiştekî çewtî însaniyetê (humanîzmê) û tevayê hestên me yê xwezayî ye. Lê belê dîsa jî heger em bi dilovaniyeke bê hempa xwe teslîmî gotina Yezdan bikin, emê bikaribin rastiya vê yekê bipejirînin. Derveyî rêberiya Nivîsên Pîroz, lêkolîneke li ser rastiyên jiyana însan jî, me

digihîne encamên ku li jor derketine holê û tu hêviya jiyane ji bo wan kesan nade me.

Lêkolîn kirina vê helwesta Yezdan, suce û nayê bexşandin: “Ey însan tu kî yî ku tu li dijî Yezdan derdikevî?” (Rom. 9:20 A.V. têbiniya kêlekê.). Em dikarin bibêjin ku em wî fêm nakin, lê tu caran em nikarin Yezdan bi bê edaletî an jî ne rastiyê tawanbar bikin. Tawanbar kirina ku Yezdan dikare bê hezkirin be an jî xwedan kêmanî be; şiklê Yezdanekî serdestê her tiştî, bav û afrênerekî ku neheqiyê li mirovên xwe bike derdixe holê. Nivîsa li ser wendabûna derguşa Melîk Dawid, bi fêde ye. 2 Sam. 12:15-24 dide xuya kirin ku Dawid hîna dema ku li jiyane bû çiqas dua ji zaroka xwe re dikirin, lê belê wî rastiya mirinê bi dilferehî pejirand: “Dema ku zarok sax bû min rojî girt û ez giriyam, min ev got: ‘kî dikare bibêje ku wê Yezdan di derbarê jiyana vî zarokî de dilovan be? Lê niha ew mir, ma ezê ji bo çî rojiyê bigrim? Ma ez dikarim wî careke din vegeerînim? ...ew careke din li min venagere”.

Di vê rewşê de Dawid li ber jina xwe digeriya û aramî dida wê û yekser bû xwediyê zarokêkî din.

Di encam de, mirov dikare bibêje ku gelek kes, li beramberî rastiya hilgirtina berpirsariyê û dad kirinê jî, naxwazin bibin xwediyê agahdariyên zêde. Lê belê kesên wiha, ji ber zanebûna xwe ya di derbarê gotina Yezdan de, dizanin ku Yezdan li ser jiyana wan dixebite ji bo bikaribe têkiliyeke rast li ser xwe pêşkêşî wan bike.

Dibe ku ev kesana jixwe heta radeyekê li hemberî Yezdan xwedî berpirsariyê bin. Lazime ev yek bibîr anîn: “Yezdan hezkirin e” ; Ew, “naxwaze kes têk biçe” , û “Wî lawê xwe yê tenha pêşkêşî me kir, ji bo ku yê xwedan bawerî têk neçin û heta heta bijîn (1 Jn. 4:8 ; 2 Pet. 3:9 ; Jn. 3:16). Yezdan dixwaze em dibin serdestiya wî de bin.

Şanazî û derfeteke wiha, mirov dixê bin berpirsariyê jî. Lê belê dîsa jî ew ji bo me ne zor in. Heger em ji Yezdan hez bikin, emê bizanibin ku soza wî ya rizgariyê, ne xelateke wiha ye ku ji bo hinek xebatan tê pêşkêş kirin. Ew xwediyê daxwaziyeke mezine jî bo ku her tiştî ji bo zarokên xwe bike. Yê ku rumeta kesayeta wî ya berz bigrin, wê Yezdan jiyanekê bê dawîn pêşkêşî wan bike û ji bo vê ew xwedî hezkirineke mezin e.

Dema ku em bi riya gotina Wî, banga Yezdan ya ji bo xwe dibîzînin û dest bi pejirandina wê dikin, dema ku em di nava komeke mezin de dimeşin, em dizanin ku Yezdan naxwaze em di pêkanîna berpirsariya xwe de bi ser nekevin. Ew bi balkêşiyê mezin temaşeya bersiva me ya ji bo hezkirina xwe dike. Ew çavê tijî hezkirin ne durî me ye. Em nikarin daxwazên bedena xwe yê durî berpirsariya li hemberî Yezdan, têxin pêşî zanebûna xwe. Li şûna vê yekê em dikarin kêfxweş bin ku em xwediyê nêzîkbûneke taybet in ji bo Yezdan û em baweriya xwe bi mezinbûna hezkirina wî bin. Divê em di derbarê Yezdan de li riyên agahdariyên zêdetir bigerin. Ji bo em

bikaribin Yezdan bi awayekî rastir ji xwe re nimûne bigrin, divê hezkirin û daxwaza têgihîştina helwesta wî, cihê tirsê me ya li hemberî pîroziya wî bigre.

4.9 DOJEH

Heta niha bi giranî nerîneke wiha di derbarê dojahê de heye ku dibêjin, ew ji bo ‘canên bê mirin’ yê xerab, piştî mirinê cihê ceze kirinê ye, û ji bo yê ku nayêne dad kirin cihê îşkencê ye. Baweriya me ewe ku incil dojahê weke gorê dide danasîn ku piştî mirinê tevayê însanan li wir kom dibin. Di zimanê Ibrani de ‘dojah’ bi rengê ‘sheol’ê wergerandin û tê wateya ‘cihekî girtî’.

‘Dojah’ (Di mitolojiya Yunani de diyarê miriyan yê bin erd, Hades, Ing. Hell), versiyoneke sheol ê ye ku em li vir gotinê baş wernagerînin û naxwînin.

Wek nimûne, dema ku di Ingilîzî de gotina ‘helmet’ tê gotin, mirov fêhm dibe ku dixwaze bibêje hell- met, yanî parastinek ji bo serî. Di Incilê de ev ‘cihê girtî’ an jî ‘dojah’ gor bixwe ye. Gelek nimûne di Incilê de hene ku gotina sheol ya eslî, weke ‘gor’ hatiye wergerandin. Birastî jî hinek wergerên Incilê yê modern, hema hema gotina ‘dojah’ qet bikar naynin, û wê weke ‘gor’ werdigerînin. Emê li jêr çend nimûneyên vê rastiyê bidin ji bo ku têgihîştina dojahê ya weke cihê îşkencê di serê kesî de nemîne:

- “Bera yê xerab... di gorê de (sheol) bêdeng bin” (Ps. 31:17) -wê ewana bi êşeke mezin neqîrin.
- “Wê Yezdan canê min ji destê gorê (sheol) xelas bike” (Ps. 49:15) – yanî wê can yan jî bedena Dawid, ji gorê yan jî dojahê zindî bibe.

Heger ku dojah cihê ceze kirina kesên xerab be, wê demê nabe ku kesekî baş biçe dojahê (diyarê miriyan) û careke din ji wir derkeve. Hos. 13:14 vê rastiyê tîne ziman: “ezê bi fîdyê wan (gelê Yezdan) ji destê gorê (sheol) derxînim; ezê wan ji mirinê xelas kim”. 1 Cor. 15:55, jî bo vê dibe têbinî û li ser vejîna dema hatina Mesîhê tê pêkanîn. Bi heman şeweyê, di dema vejîna duwemîn de jî (li Mijar 5.5 binere), “mirin û diyarê mirinê (Hades, dojah) miriyên li cem xwe teslîm kirin” (Rev. 20:13). Bala xwe bidin nêzikariya di navbera mirin, yanî gor û dojahê de (li Ps. 6:5 binere).

Gotinên Hanna yê di 1 Sam. 2:6 de jî pir vekirî ne: “Yezdan dikuje û zindî dibe (bi riya vejîna): dadixîne diyarê mirinê (gor, sheol) û derdixe”.

Li gora ku ‘dojah’ gor e, mirov dikare hêvî bike ku yê rast bi riya vejîna jî wê werin rizgar kirin. Bi vê sedemê gengaze ku mirov biçe diyarê miriyan,

dojehê û piştire bi riya vejînê ji wir derkeve. Di nimûneya Îsa ya berzbilind de, “ku canê wî ne çû diyarê miriyan û ne jî bedena wî xerabûn dît” (Acts 2:31); ji ber ku ew hate zindî kirin. Bala xwe bidin nêzikayiya di navbera can, gewd û bedena Mesîh de. Daxuyaniya ku dibêje, bedena wî “li diyarê miriyan (li dojehê) nehat hiştin” dixwaze wan her sê rojên ku bedena wî di gorê de bû bîne ziman. Çûna Îsa ya diyarê miriyan (dojehê) dide nişandan ku ew der ne bi tenê cihê xeraba ye.

Hem kesên baş û hem jî yên nebaş, wê biçin ‘dojehê’ ango gorê. Bi vê sedemê Îsa, “gora xwe li gel xeraban çêkir” (Is. 53:9). Hinek nimuneyên din jî hene diyar dikin ku kesên baş diçin dojehê ango gorê. Yakup ji lawê xwe Yusuf re, “bi girtina şînê gotiye ku ewê dakeve jêrê ,diyarê miriyan (dojehê)...” (Gen. 37:35).

Yek ji zagonên Yezdan jî ewe ku cezayê gunehkariyê, mirin e (Rom. 6:23 ; 8:13 ; James 1:15). Me berî vê dabû xuyakirin ku mirin bîrboriyeke. Gunehkarî ne bi îşkenceyeke bê dawî, lê belê bi tunebûnê bi encam dibe (Mt. 21:41 ; 22:7 ; Mk.12:9 ; James 4:12) ; weke tune kirina însanan ya di tofanê de (Lk. 17:27,29) û weke Îsraîliyên ku li çolê mirin (1 Cor. 10:10). Di van her du rewşan de jî yên gunehkar, bêyî kişandina îşkence û eziyeteke mezin, bi tevayî mirin (dawiya wan hat). Ji ber vê yekê ne gengaze ku yên xerab bi îşkence û eziyeteke bê dawî bêne ceze kirin.

Me dît ku heger haya me ji gotina wî tune be, Yezdan gunehên me nanivisîne (Rom. 5:13). Yên wiha wê mirî bimînin. Yên ku daxwazên Yezdan nasbikin wê di dema hatina Mesîh de werin zindîkirin û wê bêne dadkirin. Heger xerab bin, wê cezeyê wan mirin (bê dawî) be; ji ber ku ev hukmê gunehkariyê ye. Piştî ku ew bêne ber kursiya Mesîh ya dadkirinê, wê bêne cezekirin û wê carekedin ji bo heta hetayê bimirin. Wê ev bibe “mirina duwemîn” ya ku di Rev. 2:11 ; 20:6 de behsa wê dibe. Wê ev kesana bibin xwediyê mirineke bîrborî. Wê ew di hatina Îsa ya duwemîn de werin zindîkirin û dadkirin û weke mirina xwe ya yekemîn bi mirineke duwemîn bêne cezekirin. Wê ev heta hetayê bidomîne.

Ji ber vê yekê cezekirina gunehkariyê, nabe dawiya mirinê, ew ‘bê dawî ye’. Mirî mayîn, cezeyekî bê dawî ye. Di Incîlê de, nimuneyeke vê yekê di, Dt. 11:4 de tê dîtin. Ev yek tîne ziman ku Yezdan, artêşa Fîr’ewn di deryaya sor de tîk bir û xiste rewşeke ku nikaribe carekedin Îsraîlê aciz bike: “Wî ava deryaya sor bi ser wan de vala kir... Yezdan ew heta îro tune kirin”.

Di dewrana Ahîda Kevin de jî bawermendan fêhm kirin ku vejîn heye û wê di wê rojê de xerabên berpirsyar carekedin li gorê vegezin.

21:30,32 pir vekirî ye: “Wê xerab...roja xezebê derxînin holê (ango zindî bikin) ...Lê belê ewê (piştire) wî carekedin bibin gorê”. Di daxuyaniyeke li ser hatina Îsa de tê gotin ku wê yên xerab, roja biryarê li hizura wî, bêne şûrkirin (Lk. 19:27). Ev berevajî vê yekê ye ku dibêje, wê yên xerab heta hetayê li ser hişê xwe îşkencê bibînin. Çi dibe bera bibe, wê ev rengê

cezekerinê hinekî durî aqilan be- ji bo tiştên ku di 70 salî de (di tevayê temenekî de) hatine kirin, îşkenceyêke bê dawî. Yezdan bi cezekerina xeraban kêfxweş nabe û ji ber vê yekê tê hêvî kirin ku ew wan heta hetayê cezekerî nehêle (Eze. 18:23,32 ; 33:11 krş. 2 Pet. 3:9).

Xirîstiyaniya ji rê derketî, gelek caran dojhê bi ramana agir û îşkencê re dike yek. Ev daxuyanî berevajî daxuyaniya Incîlê ya di derbarê dojhê de ye. Gotina ku dibêje, “Weke mîhên ku xistibin gorê (dojhê) wê mirin wan biçêrîne” (Ps. 49:14) dide xuyakirin ku gor cihekî bi aram yê jibîrkirinê ye. Can an jî bedena Mesîh sê rojan di dojhê de ma û xera nebû (Acts 2:31). Heger dojhê cihê agir bûya ev yek çênedibû. Eze. 32:26-30 dide zanîn ku lehengên bi hêz yê neteweyên derdor, di gorên xwe de di nava aramiyê de raketîne: “ Kesayetên bi hêz yê ku di (şer de) hilweşiyane...yên ku tevî çekên wan yê şer daxistine diyarê miriyan (dojhê), şûrên wan dibin serên wan de ne û raketîne...wê ew tevî yê ku dadikevin çalê rakevin”. Ev yek, adeta binaxkirina şervanan ya tevî çekên wan û xistina şûr ya bin serê wan tîne ziman. Lê belê dîsa jî ev danasîneke dojhê –gorê- ye. Ev kesayetên bi hêz yê ku li dojhê (ango di gora xwe de) raketîne, daxuyaniya ku dojhê cihê agire piştgirî nakin. Tiştên fizikî jî diçin ‘dojhê’, (mînak,şûr). Ev dide nîşandan ku dojhê ne cihê îşkenceyêke giyanî ye. Ji ber vê yekê Petrus ji yekî xerab re wiha gotiye: “Bera pereyên te jî bi te re tune bibin” (Acts 8:20).

Teclubeya Yunis jî bi vê yekê re di nava nakokiyê de ye. Dema ku Yunis ji aliyê masiyekî mezin ve bi saxî hate daqurtandin, “Yunis ji zikê masî dua ji mirzayê xwe Yezdan re kir û got ku ‘min gazî Yezdan kir’...min ji zikê diyarê miriyan hewara xwe gihan de Wî” (Jonah 2:1,2). ‘Zikê diyarê miriyan’ û yê balîna weke hev e. Zikê balîna ‘cihekî girtî bû’ ku bixwe gotina sheol e û weke ‘dojhê’ tê wergerandin. Xuyaye ku ew ne cihê agir bû û dema ku balîna ew ji nava xwe avêt Yunis ‘ji navika dojhê’ derkete derve. Ev destnîşaniya vejîna Mesîh ya ji ‘dojhê’ (gorê) jî dike – binere. Mt. 12:40.

AGIRÊ TEMSÎLÎ

Incîl gelek caran behsa agirê bê dawî dike ji bo ku hêrsa Yezdan ya li dijî guneh bîne ziman. (Bajarê) Sodom bi ‘agirê bê dawî’ hate ceze kirin (Jude a.7), ango ji ber xerabûna şêniyê wî ew hate tune kirin. Xerebeyên vî bajarî dibin ava deryaya mirî (Urdun) de mane. Gotina ‘agirê bê dawî’ weke ku tê dîtin nayê wateya ku tiştek her daîm di nava agir de be. Her wiha ji ber gunehkariya Îsraîl, Quds bi agirê bê dawî yê hêrsa Yezdan hat tehdît kirin: “Wê demê ezê agirekî li devê deriyên wê vêxînim û ewê sereyên Qudsê daqurtîne û ew venamire” (Jer. 17:27). Yezdan nexwestiye ku em vê daxuyaniya di derbarê Qudsê de weke ku tê gotin bixwînin. Wek tê zanîn

kehanet li ser tène kirin ku wê Quds bibe paytexta serdestiya Yezdan ya pêşerojê (Is. 2:2-4 ; Ps. 48:2). Xaniyên mezin yê Qudsê şewitîn û bûne xwelî (2 Kings 25:9) lê ew agir heta hetayê vexistî nema.

Bi heman şeweyê Yezdan welatê Edom'ê jî bi agir ceze kir; wiha ku ew, “ne bi şev û ne jî bi roj venemire. Wê dumana wî agirî heta hetayê derkeve: wê ew jî nifşekî ta nifşê din rût bimîne...wê kund û qelareşk lê runin...wê di serayên wê de stirî hêşîn bibin” (Is. 34:9-15). Li diyarê Edom'ê yê wêranbûyî, heywan û şînkayî heye. Ev jî tê wateya ku gotina agirê bê dawî, jî wateya wê ya ferhengî bêhtir, bi wateya hêrsa Yezdan hatiye ziman.

Di zimanê Ibranî û Yunanî de gotina ‘heta hetayê’ tê wateya ‘bi sedsalan’. Hinek caran ev bê dawîtiyê jî tîne ziman. Mînak, sedsala serdestiya Yezdan. Lê belê ev her demê ne wiha ye. Ez. 32:14,15 mîna keke başe jî bo vê mijarê: “Wê birc û keleh heta hetayê (bi sedsalan) bi hêz bibin...heta ku giyan bi ser me de birije”. Ev jî wateyeke din ya bêdawîtiya di ‘agirê bê dawî’ de ye.

Hêrsa Yezdan ya li dijî gunehkariya Quds û Îsraîlê dişibînin agir: “Ezê hêrs û nifrîna xwe birjînim ser vê deverê (Quds)...ewê vêkeve û nikare were temirandin” (Jer. 7:20 ; mînakên din di Lam. 4:11 û 2 Kings 22:17 de ne).

Di dema vegera Mesîh de wê Yezdan di derbarê gunehkaran de biryarê bide. Agir bi vê biryarê ve jî tê girêdan: “Ji ber ku vaye ew roj tê û wê weke firmê bişewite. Û wê tevayê kesên kubar, û yê ku tiştên ne baş kirine, bibin ka û roja ku tê wê wan bişewitîne (Mal. 4:1). Darek ji kayê yan jî bedena însan dema ku agir pêdikeve dibe xwelî. Ne gengaze ku maddeyek û bi taybetî jî bedena însan heta hetayê bijî. Ji ber vê yekê, gotina ‘agirê bê dawî’ nayê wateya îşkenceyeke bê dawî. Heger tiştêkî ku bişewite tunebe, agir nikare heta hetayê bidome. ‘Divê hun bala xwe bidinê ku ‘dojeh’ tê wateya avêtina nav gola agir (Rev. 20:14). Ev dide nîşandan ku dojeh ne ‘gola agir e’ lê belê tunebûne. Di awayê sembolîk yê pirtuka Îlhamdan’ê de ji me re tê gotin ku wê diyarê miriyan bi tevayî were tune kirin. Ji ber ku wê piştî Mîlenyumê êdî mirin nemîne.

GEHENNA

Di Ahîda Nû de, du gotinên ku weke ‘dojeh’ (an jî diyarê miriyan) têne wergerandin hene. Me berê gotibû ku ‘Hades’ tê wateya sheol a Ibranî. ‘Gehenna’ navê zibaleyekê li derveyî Qudsê bû. Tevayê zibala ku ji bajar dihat, li wir dihat şewitandin. Zibaleyên bi vî awahî, di roja me de li gelek welatên ku ber bi pêşveçûnê ve diçin tene dîtin (mînak, ‘çiyayê bi duman’ yê li derveyî Manîla Fîlîpînan). Weke navekî taybetî,- ango wekî navê cihekî-ev gotin divê weke ‘dojeh’ newe wergerandin, lê belê ew weke eslê xwe ‘Gehenna’ bimîne. ‘Gehenna’ di zimanê Aramî de wergera van gotinên Ibranî ye: ge-ben (gey) Hinom (newala Hinomê). Ev li kêleka Qudsê ye

(Josh. 15:8), û di dema Mesîh de zibaleya bajêr bû. Bedenên kesên xerab, her demê di nava agirê wê zibalê de dişewitîn. Ji ber vê yekê Gehenna bû sembola tune kirin û têk birinê.

Dişa hatiye dîtin ku ew kes heta hetayê di nava wê zibalê de neşewitîne, ji ber ku piştî demekê bedenên wan bûn xwelî. Di roja birayarê de “Yezdanê me agirekî bi şewat e” (Heb. 12:29); wê agirê hêrsa wî ya li hemberî gunehkariyê nehêle ku ew jiyana xwe di nava agir de bidomînin, wê wan tune bike. Dema ku gelê Yezdan, Îsraîl di destê babîliyan de bû, yanî di dema hukmên Yezdan yê di derbarê Îsraîlê de, gehenna tijî bedenên kesên gunehkar yê di nava gelê Yezdan de bû (Jer. 7:32,33).

Mirzayê me Îsa, jî bo bikaranîna gotina ‘Gehenna’ tevayê van fikrên Ahîda Kevin bi hostayî anîne gel hev. Wî gelek çaran gotiye, ku di dema vegera wî de, yê ku li ser kursiya dadkirinê werin red kirin, wê biçin Gehenna (ango dojhê), û wê di nava agirekî daîm de bêyî ku kurmên wan bimrin bimînin (Mk. 9:43,44). Gehenna, li ser tunekirin û tarûmarkirina bedenê ji fikra Cihuyan hatiye derxistin. Em dibînin ku gotina agirê bê dawî jî, tê wateya hêrs û nifrîna Yezdan ya li hemberî gunehkaran û bi riya mirinê tunekirina wan ya bê dawî.

Gotina ku dibêje: “Li wir kurm namrin” tê wateya tunebûnê- ne gengaze ku -kurmên bedenxwir yê di axê de- nemirin. Ev rastiyeke ku, Gehenna di nava gelê Yezdan de cihê cezekirina xeraban bû. Ji ber vê yekê ev awayê Gehenna piştren jî aliyê Mesîh ve jî tê bikaranîn.

MIJAR 4: PIRS

1. Piştî mirinê çi dibe?

- a) Can, diçe bihûştê
- b) Em ji bîra xwe diçin
- c) Heta ku biryar tê dayîn, can li hinek deveran tê veşartin
- d) Canên xerab diçin dojhê û canên baş diçin bihûştê

2. Can çi ye?

- a) Beşekî hebûna me ye û nemir e
- b) Gotineke ku tê wateya 'beden, kes, teba'
- c) Hemwateya giyan e
- d) Ew tişteke ku piştî mirinê an diçe dojhê an jî diçe bihûştê.

3. Giyanê însan çi ye?

- a) Belê
- b) Na

4. Dohê çi ye?

- a) Cihê kesên bê taqet e
- b) Hembêzkirina zoriyên vê jiyane ye
- c) Gor

5.1 DANASÎNA SERDESTIYÊ

Di xebata xwe ya borî de me da xuya kirin ku Yezdan dixwaze, di dema vegera Mesîh de, ebdên xwe yê bawermend bi jiyaneke bê dawî xelat bike. Wê ev jiyana bê dawî li serzemînê were borandin. Di tevayê sozên Yezdan yên li ser vê mijarê de, tu caran nehatiye gotin ku wê bawermend derkevin asîman. “Mizgîna serdestiya Yezdan (peyamên baş)” (Mt. 4:23), weke sozên Yezdan yên di derbarê jiyana bê dawî, ya li serzemînê de ji bo Ibrahîm hatin ragihandin (Gal. 3:8). Ji ber vê yekê ‘Serdestiya Yezdan’ piştî hatina Mesîh, dema pêkhatina sozan bixwe ye. Yezdan niha jî hakimê bi tenha yê tevayê gerdundê ye, lê belê wî birêvebirina dinyayê û ya jiyana kesani bi destê însan ve berda ye. Ji ber vê yekê, dinya bi serdestiya kesan tê birêvebirin (Dan. 4:17).

Dema ku Mesîh vegere, “Wê serdestiyên vê dinyayê bibin serdestiyên Mirzayê me Yezdan û Mesîhê wî; Wê ew heta heta serdest be” (Rev. 11:15). Bi vê sedemê wê daxwazên Yezdan bi tevayî li serzemînê pêk werin. Îsa wiha fermanê dide me ku em dua bikin: “Serdestiya we tê, (ku ew) wê li serzemînê be; weke ku niha li bihûştê ye” (Mt. 6:10). Ji ber vê yekê gotina ‘serdestiya Yezdan’ wiha ye ku dikare cihê xwe bi gotina ‘serdestiya asîman’ re biguhere (Mt. 13:11 krş. Mk. 4:11). Em bala xwe bidinê ku me tu carî li ser ‘serdestiya asîman’ tiştêk nexwendiyê. Ewê piştî hatina Mesîh li serzemînê were avakirin. Serdestiya ku li serzemînê were avakirin bixwe jî ya asîman e. Li asîman melaîket perestiyê ji bo tevayê daxwazên Yezdan dikin (Ps. 103:19-21). Dema ku dinya bibe cihekî ku bi tenê kesên “mîna melaîketan” lê dimînin (Lk. 20:36) wê vîcarê herkes perestiya serdestiya Yezdan ya pêşerojê bike.

Di vegera Mesîh de ketina bin serdestiya Yezdan encama xebata me ya Xirîstiyaniyê ya vê jiyana ye (Mt. 25:34 ; Acts 14:22). Têgihîştina vê yekê girîng e. Di belavoka Fîlîpus de Mesîh bi vî awahî tê danasîn: “Tiştên di derbarê navê Mesîh Îsa û serdestiya Yezdan de” (Acts 8:5,12). Giraniya belavoka Pavlus ew bû ku, awayê serdestiya Yezdan beş bi beş bîne bîra me (Acts 19:8 ; 20:25 ; 28: 23,31). Ji ber ku ev mijar beşekî girîng ji Mizgînê jî tîne holê, têgihîştina wê ji bo me xwedî girîngiyêke taybetî ye.

“Divê em bi zehmetî têkevin bin serdestiya Yezdan” (Acts 4:22). Li dawiya vê tunela jiyana, ronahî heye; û ji ber vê yekê ev hêza pêkanîna pêwîstiyên Xirîstiyaniyê dide me.

Melîkê Babilê Nebukadnetsar, xwest pêşeroja jiyana nas bike (binere. Dan. 2). Pêkerekî mezin ku ji gelek metalên cuda hatibû çêkirin dane wî. Danyal got ku serê zêr temsîla Melîkê Babilê ye (Dan. 2:38). Piştê li herêma nêzîkî Îsraîlê, gelek Melîkî hebûn ku di encama hinek rewşên diyar de, dawî li Melîkiya wan hatibû: “Weke ku hinek tiliyên lingên wî ji hesin û

yên din jî ji ritamê ne, wê Melîkî hinekî bi hêz û hinekî jî bê hêz be” (Dan. 2:42).

Li dinyayê gelek welatên bi hêz û bê hêz hene. Wê demê Danyal kevirekî biçûk dît ku, li lingên pêker dikeve û ziyane didiyê de; û kevir mîna çiyayekî mezin bû û dinya dagirt (Dan. 2:34,35). Wî kevirî temsîla Îsa kir (Mt. 21:42 ; Acts 4:11 ; Eph. 2:20 ; 1 Pet. 2:4,8). Çiyayê ku wî li tevayê serzemîne avakirîye, temsîla serdestiya Yezdan dike ku wê piştî hatina wî ava bibe û heta hetayê bidome. Ev kehanet bixwe delîlê wê ye ku wê serdestî ne li asîman, lê belê li serzemîne were ava kirin.

Serdestiya ku wê piştî hatina Mesîh ava bibe, mijara bingehîn ya gotarên li pêş me ye jî. Pavlus behsa “dadkirina mirî û zindiyên dibin Melîkîya Îsa de” (2 Tim. 4:1) dike. Mîka 4:1, li ser fikrê Danyal radiweste ku ew serdestiya Yezdan mîna çiyayekî mezin şrove dike: “Wê di rojên dawî de diyar bibe ku wê çiyayê mala Yezdan were bi hêz kirin”; piştî jî danasîna vê serdestiya li serzemîne tê kirin (Mic. 4:1-4). Wê Yezdan textê Dawid yê li Qudsê bide Îsa: “Wê ew heta hetayê serdestiyê bike, dawîya serdestiya wî nîne” (Lk. 1: 32,33). Divê ku demeke diyar ji bo destpêkirina vê serdestiya li ser textê Dawid hebe. Ew jî dema vegeza Mesîh e. Gotina ku dibêje “dawîya serdestiya wî nîne” hinekî girêdayî Dan. 2:44 e: “Yezdanê asîmanan tu caran tune nabe wê serdestiyekê ava bike; ew ji nijadên din re nayê hiştin” Rev. 11:15 jî bi heman gotinan danasîna vegeza Mesîh dike: “Serdestiya vê dinyayê dibe serdestiya Yezdanê me û Mesîhê wî; û ewê heta hetayê serdest be”. Dîsa divê demeke diyar ji bo serdestiya Mesîh ya li serzemîne hebe, ev jî dema vegeza wî ye.

5.2 HÎNA SERDESTÎ NEHATIYE AVAKIRIN

Nerîneke belavbûyî heye ku dibêje serdestiya Yezdan ya ku ji –koma-bawermendan pêk tê, niha heye. Her çiqasî daxwaza rizgarkirina bawermendan û cih girtina wan ya di serdestiyê de, hêviyeke mezin be jî, dema em bidin ber çavê xwe ku hîna mesîh ji bo avakirina vê serdestiyê nehatiye, emê bibînin ku em niha ne di dema serdestiyê de ne.

Di encama xebata me ya heta niha de, divê hatibe fêmkirin ku “xwîn û goşt nikarin serdestiya Yezdan weke mîrat wergirin” (1 Cor. 15:50). Vaftîzbûn me dike mîratxwirê sozên ku ji Ibrahîm re hatine dayîn (Mt. 4:23 ; Gal. 3:8, 27-29). Em “weke hezkirên wî mîratxwirên sozên ku ji me re hatine dayîn in” (James 2:5). Ji ber vê yekê wê pêkhatina mîratwergirtina van sozan jî piştî hatina Mesîh be (Mt. 25:34 ; 1 Cor. 6:9,10 ; 15:50 ; Gal. 5:21 ; Eph. 5:5). Bikaranîna rastîn ya gotina mîratê pêşerojê, dide nîşandan ku bawermendên niha hîna nebûne xwediyê serdestiyê.

Ji bo rastkirina gotina kesên ku dixwazin serdestî yekser pêk were Îsa tiştêkî wiha gotiye: “Yekî bi esil, ji bo ku Melîkiyekê ji xwe re peyda bike û vegere çûye welatekî dur. Berî ku biçê hinek berpirsyaî li koleyên xwe belav kiriye. Dema ku ew weke Melîk vegeyriyaye, gazî tevayê koleyên xwe kiriye û ew mehkeme kirine” (Lk. 19: 11-27).

Ev kesê bi esil, temsîla Îsa dike ku ew çûye welatê dur yê asîman û wê roja biryarê tevî serdestiyê vegere. Ji ber vê yekê kole bê mirzayê xwe nikarin bibin xwediyê serdestiyê.

Daxuyaniyên li jêr, delîlê vê yekê ne:

- Îsa ev yek bi awayekî vekirî diyar kiriye: “Serdestiya min ne ji vê dinyayê (sedsalê) ye” (Jn. 18:36). Lê dîsa wî di wê demê de ev yek jî gotiye: “Ez Melîkekim” (Jn. 18:37). Ev dide nîşandan ku Mesîh temsîla melîkiyê dike lê belê hîna melîkiya wî ava nebûye. Tê diyar kirin ku bawermendên sedsala yekemîn jî hîna li hêviya serdestiya Yezdan in (Mk. 15:43).
- Mesîh ji murîdên xwe re gotiye, “Heta ku ez dibin serdestiya bavê xwe de, bi we re ji ya wî ya teze venexwim, ez nema meyê (şerabê) vedixwim (Mt. 26:29)”. Ev dide nîşandan ku wê serdestî weke ku gel ji belavoka Îsa “peyamên baş yê serdestiya Yezdan (ango ragihandina li ser pêşerojê)” (Lk. 8:1) fêmkiriye di pêşerojê de were avakirin. Şîroveya wan wiha bû, “xwezî bi dilê yê ku dibin serdestiya Yezdan de (pêşerojê) nan bixwin” (Lk. 14:15).
- Luka 22:29,30 vê mijarê didomîne û dibêje: “Min ji we re serdestiyek cuda kir; wiha ku hûn bikaribin di serdestiya min de li ser sifreya min bixwin û vexwin”.
- Îsa nîşanên hatina xwe ya duwemîn ragihandine û bi şîroveyekê dawî li vê yekê aniye: “Dema we dît ku ev tişt derdikevin holê, bizanibin ku serdestiya Yezdan nêzîk e” (Lk. 21:31). Heger serdestî berî hatina Mesîh ya duwemîn niha bûya, wê ev daxuyanî bê wate bûya.
- “Divê em bi derbaskirina gelek zoriyan têkevin bin serdestiya Yezdan” (Acts 14:22). Divê em mat nemînin ku her bawermend ji bo hatina serdestiyê duan bike (Mt. 6:33).
- Yezdan “ji bo ketina bin serdestiyê gazî we kir (1 Thes. 2:12); divê em ji bo bersiva wî, bi riya jiyaneke giyanî têkevin bin serdestiyê (Mt. 6:33).

5.3 SERDESTIYA YEZDAN YA LI PAŞEROJÊ

Serdestiya Yezdan ji bo bawermendan, li pêşerojê xelateke. Ev dibe hêzeke mezin ji bo ku ew jî weke Mesîh, demeke tijî zor û zehmetî biborînin. Ji ber vê sedemê tê hêvî kirin ku ew, tevayê rojên xwe bi têgihîştin û teqdîrkirina pêşerojê derbas bikin. Wê ew bibe nîşana xebata wan ya giyanî û hezkirina wan ya ji bo bavê wan Yezdan.

Nivîsên Pîroz tijî mînakên serdestiyê ne. Lê belê ji bo naskirina çendekan ji wan jî be divê mirov di tevayê temenekî de bixebite. Bi xêra prensîbên vê serdestiya pêşerojê em dikarin serdestiya Yezdan ya di dema derbasbûyî de ku xwe bi awayê netewa Îsraîl diyar kiriye, baş şîrove bikin. Wê ew serdestî piştî hatina Mesîh carekedin were avakirin. Di gelek beşên Incîlê de ji bo ku em serdestiya Yezdan ya pêşerojê fêhm bikin, ji me re mînak li ser netewa Îsraîl hatine pêşkêşkirin.

Pirê caran Yezdan wekî 'Melîkê Îsraîl' tê danasîn (Is. 44:6 ; krş. Is. 41:27 ; 43:15 ; Ps. 48:2 ; 89:18 ; 149:2). Ji ber vê yekê gelê Îsraîlê melîkiya wî ye. Piştî ku ew bi riya behra sor hatin xelas kirin, wan li çiyayê Sîna'yê bi Yezdan re peymanek çêkirin û ew bûn melîkiya Yezdan. Ji bo bersiva daxwaza wan ya pêkanîna wê peymanê "Ew bûn melîkiya (Yezdan)... û neteweyekî pîroz (Ex. 19:5,6). Ji ber vê yekê, "dema ku Îsraîl ji Misrê derket... Îsraîl dibin serdestiya wî de bû (Ps. 114:1,2) an jî melîkiya wî bû. Piştî vê peymanê Îsraîl tevayî çola Sîna'yê derbas kir û gihîşt axa Kenanê ya ku soza wê ji wan re hatibû dayîn. Yezdan weke serdestê wan yê bi tenha, hukmê xwe yê li ser wan ne mîna melîkên însan (mînak, Gideon, Samson) lê bi riya 'dadgêr'an domand. Ew dadgêr ne melîk bûn, lê belê ew ji aliyê Yezdan ve dihatin birêve birin û ji tevayê welat bêhtir, serdestiya wan li ser hinek herêma dimeşiya. Ew gelek caran ji aliyê Yezdan ve hatine birêvebirin ji bo ku Îsraîlê bi tobekirin bidin û wê ji neyaran rizgar bikin. Dema ku Îsraîliyan xwestin ku Gideon bibe melîkê wan wî wisa bersiv da: "Ezê li ser we serdestiyê nekim... wê Mirzayê me Yezdan serdestê we be" (Jud. 8:23).

Dadgêrê dawîn Samuel bû. Di dema wî de, Îsraîliyan daxwaza melîkekî însan kirin ji bo ku ew jî bibin mîna neteweyên li derûdora xwe (1Sam. 8:5,6).

Di tevayê dîrokê de gelê Yezdan yê rastîn, têkiliya xwe ya bi Yezdan re sivik dîtîye. Her demê xwestiye vê têkiliya nêzîk feda bike ji bo ku ew jî bibin mîna dinyaya li derûdora xwe. Di dinyaya roja me de jî ev tişt dibin. Yezdan xemgîniya xwe digihîne Samuel: "Ji bo ku ez ne serdestê wan bim, ez red kirim" (1 Sam. 8:7). Yezdan dîsa jî Melîkên xerab yê mîna Saul dane wan. Piştî jî Dawidê rast û silsileyê melîkên ji nijada wî hatin. Melîkên ku di aliyê giyanî de zane bûn fêmkirin, ku li beramberî red kirina gel, Îsraîl hîna jî melîkiya Yezdan e. Her wiha naskirin ku ew Îsraîlê bi navê Yezdan dimeşînin.

Ev yek dihêle ku ev awayê danasîna Silêmanê kurê Dawid bigihîje wateya xwe ya bingehîn: "kesê ku li ser textê (Yezdan) serdestiyê dike, ji bo

ku bibe melîkê Yezdan” (2 Chron. 9:8 ; 1 Chron. 28:5 ; 29:23). Serdestiya Silêman ya tijî dewlemendî û kêfxweşî, nişana serdestiya Yezdan bû (an jî taybetiyên wê yên bingehîn diyar dikir). Ji ber vê yekê ew bi navê Yezdan, melîkê Îsraîlê bû. Wê Îsa jî bi heman şeweyê ji bo Yezdan, mîna melîkê Îsraîlê li ser textê Yezdan danîşe (Mt. 27:37 ; Jn. 1:49 ; 12:13).

HUKMÊ YEZDAN

Ji ber çivanokiya Silêman melîkiya Îsraîlê bû du beş: Kurê Silêman Rehoboam, li ser eşîra Yahuda û Benyamîn û nivê eşîra Manase hukum dikir. (Kurê Nebat) Yeroboam jî li ser deh eşîrên mayî hukum dikir. Vê melîkiya deh eşîrî navê Îsraîl an jî Efraim li xwe kir, ya ku ji du eşîran jî pêk dihat navê Yahuda li xwe kir. Piraniya van eşîran dane pey şopa Silêman ya xerab. Wan digotin ku ew bi Yezdan bawerin, lê belê perestiya putên netewên li derûdorê jî kirin. Yezdan gelek caran bi riya pêxemberan ji wan xwest ku ew tobe bikin, lê belê kesî guh nedayê. Ji ber vê yekê Yezdan ew bi derxistina ji Îsraîl ceze kirin. Babîlî Asurî ketin Îsraîlê û ew dîl girtin: “Te (Yezdan) gelek salan tehemula wan kir û te bi riya giyanê (soza) xwe yê di pêxemberan de şahidiya wan kir. Lê wan guh neda te. Ji ber vê yekê te ew xistin bin destê gelên cîran” (Neh. 9:30).

Melîkiya Îsraîlê ya ku ji deh eşîran pêk hatibû, qet nebû xwediyê melîkên baş. Yeroboam, Ahab, Yehoahaz û yên din jî tev mîna putperestan ketine pirtuka melîkiyê. Melîkê wan yê dawîn Hoşeya bû. Di dema serdestiya wî de, Îsraîl li hemberî Asuriyan şkest û deh eşîr jî dîl hatin girtin (2 Kings 17). Piştê jî ewana tu caran venegeriyan.

Melîkiya Yahuda ya ku ji du eşîran pêk hatibû, her çiqasî piraniya wan xerab bûn jî ew hinek caran bûn xwediyê melîkên baş jî (mînak, Hizkiya û Yoşaya). Ji ber dombûna gunehkariya gel, Yezdan di dema melîkê wan yê dawî Tsedekiya de, melîkî ji wan wergirt û Yahuda hilweşand. Ev bi riya dîl girtina wan ya ji aliyê Babîliyan ve derkete holê (2 Kings 25). Ew 70 salî li Babîlê man. Piştê hinek ji wan dibin rêberiya Ezra û Nehemya de vegeyriyan Îsraîlê. Ewana ji aliyê Babîlî, Yunanî û Romayîyan ve hatin birêvebirin û careke din nebûn xwedî melîkî. Îsa didema serdestiya Romayê de hate dinyayê. Ji ber ku Îsraîliyan Îsa nepejirandin, Romayîyan Piştî Zayînê (P.Z) di 70’ de ew dagirkirin û li tevayê dinyayê belav kirin. Bi tenê di sedsala derbasbûyî de weke mizgîniya hatina Mesîh ew carekedin zîvirîn (Li beş:3 binere)

Di Hezekyel 21:25-27 de, tê ragihandin ku wê dawî li serdestiya Yezdan, ya ku di neteweya Îsraîl de tê dîtin, were: “Tu prensê Îsraîlê yê ku li hemberî tiştên pîroz bê rêz e (ango Tsedekiya), roja wî tê...ji bo wî Mirzayê me Yezdan got: ‘dest ji serdestiyê berde, û tacê ji serê xwe derxîne (ango wê dawî li melîkiya Tsedekiya were); wê ev ne mîna berê be...ezê wî

hilweşînim, hilweşînim, hilweşînim: û maf yê kê be, heta ku ew were wê êdî tiştek çênebe; û ezê vî mafî bidim wî””. Pêxember pesaj bi pesaj şîna têkçûna serdestiya Yezdan digrin (Hos. 10:3 ; Lam. 5:16 ; Jer. 14:21 ; Dan. 8:12,14). Di Hezekyel 21:25-27 an de gotina ezê ‘hilweşînim’ sê caran dubare dibe. Ev, sê seferên dagirkirinê yên ku ji aliyê melîkê Babilê Nebukadnetsar ve hatine kirin, tîne ziman. Şagirtêki bi bal, dikare di van ayetan de bibîne ku serdestiya Yezdan û melîkê wî bi hev re hatiye ziman. Têkçûna Tsedekiya, têkçûna serdestiya Yezdan bû (li Mijar 5.2 binere). Ji ber vê yekê, di neteweya Îsraîlê de dawî li serdestiya Yezdan hat: “Ezê...melîkiya xanedaniya Îsraîlê bidim rawestan” (Hos. 1:4). Piştî dibêje: “ewê êdî tune be ta ku” û wiha berdewam dike, melîkî “mafê kê be, ta ku ew were wê (Yezdan) bide wî”. Ev jî diyar dike ku ew melîkî carekedin derkeve holê. Dema ku Mesîh vegere “wê Yezdan textê paşiyê wî Dawid bide wî (Îsa)...û wê dawîya serdestiya wî tune be” (Lk. 1: 32,33). Wê ev yek di dema pêkhatina soza nûbûna serdestiyê de çêbibe.

JI NÛ VE AVABÛNA ÎSRAÎLÊ

Piştî hatina Mesîh, avabûna serdestiya Yezdan di tevayê Ahîda Kevin de wekî mijareke girîng hatiye dubarekirin. Murîdên Mesîh ev yek pir baş dîtine: “Ji ber vê yekê, kîjan demê ew bihatana gel hev, wan ev pirs ji wî (Îsa) dikirin: ‘Mirzayê me, hûnê di vê demê de serdestiya Îsraîlê carekedin lê vegehin?’”, Ango tiştê ku di Hezekyel 21:27 de hatiye ziman wê nika pêk were? Îsa ji wan re gotibû ku melaîket dibêjin ku ewê carekedin vegere, lê belê dema vegera duwemîn nayê zanîn (Acts 1:6-11).

Ji ber vê yekê wê serdestiya Yezdan/Îsraîl, piştî hatina Mesîh ya duwemîn pêk were. Petrus li ser vê yekê gotiye ku: “Yezdan Mesîh Îsa bi rê kiriye...weke ku pêxemberên Yezdan yên pîroz bi devê xwe gotine, ta ku her tişt bi rêkûpêk bibe divê ew li asîmanan be (ango pêwîste li wir be)” (Acts 3:20,21). Wê vegera duwemîn, weke ji nû ve avabûna melîkiya Îsraîlê, bibe sedema ji nû ve avabûna melîkiya Yezdan jî.

Ji nû ve avabûna serdestiya Yezdan, mijara bingehîn ya tevayê pêxemberên (Yezdan)yên pîroz e:

- Wê weke lutfê text were danîn; wê ew (Îsa) di konê paşiyê xwe Dawid de li ser wî textî danîşe (Lk. 1: 32,33); “bi gera li edaletê...û bi lez pêkanîna rastiyê” (Is. 16:5).
- “Ezê wê rojê konê Dawid yê ketî bidrûm (yanî textê Dawid yê di Lk. 1:32,33 de) û ezê kunên wî bigirim. Ezê aliyên wî yên hilweşiyayî rakim û ezê wî weke rojên berê ava bikim” (Amos 9:11). Gotina dawîn ji nû ve avabûnê tîne ziman.

- “Wî mîna berê zarokên wan (yên Îsraîl) çêbibin û wê li hev civîna wan li pêşiya min pêk were” (Jer. 30:20).
- “Wê Mirzayê me Yezdan, carekedin Qudsê hilbijêre” (Zech. 2:12), wê wir bike paytexta serdestiya xwe ya dinyayî (krş. Ps. 48:2; Is. 2:2-4).
- “Ezê sirgunên Yahuda û yên Îsraîl carekedin bînim û ezê wan mîna berê ava bikim... Wê dîsa li vê deverê dengê şahiyê were bihîstin... Ji ber ku ezê sirgunên welat carekedin mîna berê bizîvirînim... Wê dîsa li vir (li Qudsê) şivan û şênî hebin... wê kerî belav bibin” (Jer. 33:7-13).

Hatina Mesîh ya ji bo avakirina vê serdestiyê, ‘hêviya Îsraîl’e ya ku di dema vaftîzbûnê de em xwe pê ve girê didin.

5.4 SERDESTIYA YEZDAN YA PÊŞEROJÊ

Beşên yekemîn û sêyemîn yên vê mijarê gelek daxuyaniyan li ser awayê serdestiya Yezdan didin. Soz ji Ibrahîm re hat dayîn ku tevayê gelê ji nijada wî yê li çar hawîrê dinyayê were pîroz kirin. Rom. 4:13 vê yekê berferehtir dike û dibêje ku wê tevayê dinyayê ji aliyê nijada Ibrahîm û Mesîhiyan ve weke mîrat were wergirtin. Dan.2 jî hatina Mesîh ya bi rengê kevirekî biçûk û belavbûna serdestiyê ya li çar aliyê dinyayê (krş. Ps. 72:8) diyar dike. Ev yek tê wateya ku wê serdestiya Yezdan, weke ku hinek dibêjin ne bi tenê li Quds an jî Îsraîlê be. Bê guman ew xakana xakên wî yên taybetî ne.

Yên ku li vê jiyanê bidin pey şopa Mesîh, “wê bibin melîk û rahîp û emê serdestiyê li serzemînê bikin” (Rev. 5:10). Emê li ser herêmên curbecur serdestiyê bikin, wê hinek deh bajaran birêvebibin, hinekî din jî pêncan (Lk. 19:17) Wê mesîh serdestiya xwe ya li ser dinyayê bi me re par veke. (Rev. 2:27 ; 2 Tim. 2:12). “Wê melîkek (Îsa) bi durustî serdestiyê bimeşîne û wê prens (bawermend) bi edalet bêne birêvebirin” (Is. 32:1 ; Ps. 45:16).

Wê Mesîh li ser textê Dawid heta hetayê serdestiyê bike (Lk. 1:32,33). Ewê bibe xwediyê cih û wezîfeya Dawid ya li Qudsê. Dema ku Mesîh li Qudsê serdestiyê bike, wê ew der bibe paytexta serdestiyê. Wê li wê herêmê perestgehê were avakirin (Eze. 40-48). Wê gel li çar aliyên dinyayê xwe bavêje dergehên wê perestgehê (Mal. 1:11), û wê ew bibe navenda perestiyê.

Wê hemû netew derkevin derûdora perestgeha li Qudsê, “sal bi sal ji bo ku perestiya melîkê xwe, cenabê heq bikin û yortiya konên perestîna bi cîh bînin” (Zech. 14:16).

Ev Heca salane ya Qudsê di Is. 2:2,3 de jî hatiye ragihandin: “Wê di rojên dawî de, çiyayê mala Yezdan (perestgeh), (Dan. 2:35,34) li ser çiyayan

were avakirin (ango wê melîkiya Yezdan û perestgeh li ser melîkiya însanan were berz kirin)...Wê tevayê netewan berê xwe bidin wir. Û wê gelek kes biçin û bibêjin ku: ‘werin em derkevin çiyayê Yezdan, em derkevin mala Yezdanê Yaqub, û ewê riyanişanî me bide...ji ber ku wê zagon ji Sion’ê û gotina Yezdan ji Qudsê derkeve’. Gel agahiyên serdestiya Mesîh belv dîke û hêdî hêdî derdikeve çiyayê serdestiya Yezdan. Ev weke danasîna rojên yekemîn yê serdestiyê têne xuya kirin. Em di perestiya dîni de dibin xwediyê danasîna daxwazeke rastîn.

Di roja me de, yek ji trajediyên însan ewe ku, gelek ji wan bi hestên xwe, an jî bi sedemên siyasî, civakî û çandî perestiya Yezdan dikin. Di dema serdestiyê de, wê li dinyayê tevî hewesa naskirina rêbazên Yezdan peyda bibe. Wê însan têkevin rewşeke wiha ku ewê ji bo naskirina Yezdan, ji hemû welatên dinyayê yê dîr biçin serdana Qudsê.

Li şûna bêedaletî û tevliheviya ku însanan di dadgêrî û sîstema maf de çêkiriye, wê Mesîh li Qudsê şerfê û gotina Yezdan weke zagona bingehîn îlan bike. Di roja me de gelek kes ji bo bidestxistina van agahdariyan xwe feda dikin. Tê gotin ku wê di wê demê de ev daxwaz zêdetir bibe û “ewê tevayê netewan biherikin” wan runiştinên zanîne.

Ev danasîna ku dibêje, ev welatana diherikin Qudsê, dişibe danasîna di Is. 60:5 de ku dibêje, ji bo perestiya Yezdan li gel Yunaniyan (yê ku ne cihu ne) cihu jî diherikin Qudsê. Ev girêdayî kehaneta serdestiyê ya di Zech. 8: 20-23 de ye:

“Wê gelek nijad û şênîyê pir bajar werin û wê rûniştvanên bajarekî ji yê din re bibêjin: ‘Em biçin li cenabê heq bigerin û li pêşiya Yezdan duan bikin (A. V. têbîniya kêlekê –krş. Zech 14:16 ji salê ta salê). Ezê biçim. Belê, wê gelek nijad û neteweyên bi hêz ji bo gera li cenabê heq werin Qudsê û wê deh zilam xwe bi zimanê hemû welatan bigrin, wê xwe bavêjin dawa yekî Cihû û wê bibêjin: ‘Emê bi we re biçin, me bihistiye ku Yezdan bi we re’.

Ev dibe sebeb ku gelê Cihû li gorî poşmanî û perestiya xwe bibe “Ser, lê ne dûvê” welatan. (Dt. 28:13). Wê, wê demê pîlana Yezdan ya rizgariyê ku li ser bingehê Cihûtiyê ye, ji aliyê her kesî ve were fêmkirin. Wê ji nişkê ve di nava Xirîstiyaniyê modern de dawî li nezanîna vê pîlanê were. Wê mirov bi heweseke mezin li ser van tiştan gotûbêjê bikin û wê ji Cihûyan re bibêjin: “Me bihistiye Yezdan bi we re ye”. Wê demê guhertin ji xeyaleke vala bêhtir di çerçoveya nixê giyanî de çêbibe.

Dema ku ev girêdana mezin ya îlahî li ber çavan were girtin, ev yek ne tiştekî ecêb e: Wê Mesîh, “di nava neteweyan de, serdest be... wê ew şûrên xwe bikin gîsin, û wê rimên xwe jî bikin kêrên kesixandinê: Wê netewe li dijî netewe şûr bilind neke, wê êdî fêrî şerkinê nebin” (Is. 2:4). Wê di bin serdestî û edaleta Mesîh de, hemû netew hacetên xwe yê leşkerî bikin hacetên çandiniyê. “wê di rojên wî de rastî bi pêşkeve” (Ps. 72:7) - Wê demê

wê giyanwerfî bê berzkirin û wê hurmeta kesên adil yê ku xwediyên taybetiyên Yezdanî ne werin girtin. Kubariya roja me, ez-ezî û xwedexistina pêş bi van taybetiyên jorîn re di nava nakokiyê de ne.

Li şûran çêkirinan gîsanan wê li ser zemînê rê li pêşiya pêşveçûnên mezin yê çandiniyê vekin.

Di encama gunehkariya Adem de, ax hate naletkirin (Gen. 3:17-19). Ji ber vê yekê ji bo berhemgirtinê xebateke mezin jêre pêwîst e. Di dema serdestiyê de, “wê li ser zemînê li ser girên çiyayê (yên ku demekê bi kêr nedihatî) berhemên bi berket çêbibin; wê ew berhem, weke (berhemên) Libnanê bihejin” (Ps. 72:16). “Wê yê cotkar bigihêje yê palevan, wê yê ku tirî diperçiqîne, bigihêje yê ku diçîne û wê derbas bibe, wê çiya, Meya şêrîn biniquînin” (Amos 9:13). Wê li ser zemînê berhem zêde bibe û wê naletiya axê kêmbibe.

Wê çandiniyêke wiha bi bereket, têra gelek kesan bike. Kehanetên serdestiyê wisa diyar dikin ku wê awayê jiyana girêdayî çandiniya axê careke din vegere û herkes bikaribe xwe pê xwedî bike:

“Wê herkes li bin mêwa xwe û dara xwe ya hejîran danişe; wê kes nikaribe wan bitirsîne” (Mic. 4:4).

Wê ev têr bûn, bikaranîna xerab ya ji bo bidestxistina diravan (pere) bide rawestan. Wê demê wê kesek heta dawîya temenê xwe ji bo dewlemendkirina hinekî din kar neke.

“Wê ew xaniyan ava bikin û ewê (bixwe) têde danişin; wê bax û bostanan biçînin û wê mêweyê wan bixwe bixwin. Wê di xaniyê wan de hinekî din nejin û wê mêweyê wan ji aliyê hinekî din ve neyê xwarin...yên ku min hilbijartine wê karê destê xwe demeke dirêj bikar bînin. Wê keda xwe li boşê xerc nekin...” (Is. 65:21-23).

Işaya 35:1-7 dibêje; yê ku di axê de dixebitin wê jiyana wan hêsantir û bêhtir giyanî be. Kêfxweşî û bereketa ku ji axa bêkêr bipijiqe wê guhertineke mezin çêbibe: “Wê çol kêfxweşbe...wê berî şa bibe û mîna gulekê kulîlkan veke. Wê bi kêfxweşî şa bibe...ji ber ku wê li çolê av û li beriyê jî çem biherikin. Û wê axa qeliyayî bibe mîna hawizekî”. Wê şerê xwezayî yê di nava heywanan de jî xelas bibe: “wê gur û berx bi hev re biçêrin; wê zarok êdî bikaribin bi maran re bileyizin” (Is. 65:25 ; 11:6-8).

Her wiha, wê naleta ku li ser afirîna xwezayî hatiye danîn were kêmbikin ji bo ku ya li ser însan jî rabe. Wê demê wê xerabiya (guneh û bandorên wî) ku di Rev. 20:2,3 de bi awayekî sembolîk behsa wê tê kirin, yan di dema Mîlenyumê de were girêdan an jî were bi sînorkirin. Wê temen wiha were dirêjkirin ku yek 100 salî bimre, wê wekî zarokê wê dîtî (Is. 65:20). Wê jin di dema zayînê de weke berê êşeke mezin nekşînin (Is. 65:23). “Wê çavê koran û guhê kerran vebin. Wê demê wê yê kop mîna xezalekê bibeze û wê yê bê ziman stran bibêje” (Is. 35:5,6). Wê ev tişt di dema bidestxistina xelatên giyan de pêk werin (krş. Heb. 6:5).

Wê serdestiya Yezdan ne mîna bihušta giraveke tropîkal be ku kesên rast tède şa û kêfxweş bin, weke kesên ku di nava xweşiya xwezayê de ji razana li ber rojê hez dikin.

Armanca serdestiya Yezdan, “mîna avên ku derya dagirtine” (Hab. 2:14) ewe ku serzemînê bi şanazî û rumeta Wî dagire. Ev armanca Yezdan ya nihaî ye: “Bi qasî ku ez bijîm, bêguman wê serzemîn bi rumeta mîrzayê me Yezdan were dagirtin” (Num. 14:21). Li gorî Yezdan rumet ewe ku şênîyê serzemînê taybetiyên wî ji ber bike, pesin bide û teqdîr bike. Ji ber ku wê di wê demê de dinya jî ji bo nişandana vê yekê amade be. Wê demê “wê yên bawermend, (di dema serdestiyê de) dinyayê weke mîrat wergirin û li şuna jiyaneke hêsan, wê xwe bi bereketa giyanî kêfxweş bikin” (Ps. 37:11). Di dema serdestiyê de “wê bendewarên rastiye û yên birçî werin têrkirin” (Mt. 5:6).

Ramana ku wê însan di dema serdestiyê de bibe xwediyê jiyaneke bê dawî, gelek caran ji bo ku bala mirovan bikşînin ser Xirîstiyaniyê, weke ‘gîzerekê’ (ji bo kîvroşkê) tê bikaranîn. Wê dişa jî ew bibe sedema rastîna ya hebûna me ya di dema serdestiyê de. Piştî vaftîzbûnê, di dema me ya mayî de, divê em vê yekê baş fêhm bikin.

Li gora nivîskar, deh salên ku em bi Yezdan re di nava kêfxweşiyê de bijîm, beramberî hemû êşa vê jiyaneke ye. Ev rewşa ku wê heta hetayê bidome, mirov derdixîne derveyî sînoren têgihîştina însan, û mirov ji ser hiş dibe. Dema ku em hinekî din bi gotinên fizîkî nêzîkî meselê bibin, divê ku daxwaza me ya ketina bin serdestiya Yezdan, bibe armanca bingeîn ya jiyana me. Li şuna ku mirov li ser pêşeroja nêzîk bibe xwediyê ramanên kur, Îsa vê şîretê dike: “Berî her tiştî, serdestiya Yezdan û rastiya wê bibînin; wê piştî ew bibin yên we” (Mt. 6:30-34). Her tiştê ku niha di xeyala me de ye û em di oxira wan de kedê xerc dikin, nikarin bi ketina bin serdestiya Yezdan re werin qiyas kirin.

Divê em, li “rastiya (li gel Yezdan)” bigerin; wê li wir tiştên rast werin berzkirin. Ne ji bo ku em dixwazin bi hêsanî bijîm, ji bo ku em dixwazin di aliyê exlaqî de bi rêkûpêk bin, divê em hezkirina taybetiyên Yezdan ya ku tê wateya daxwaza ketina bin serdestiya wî li gel xwe bi pêş xin.

Ev daxuyanî hemû, hêviya Mizgînê bi riyên balkêş pêşkêşî însanan dike. Daxwaza ketina bin serdestiya Yezdan roj bi roj li gel me tê guhertin. Ew ji me re armanceke. Karê me yê yekemîn ewe ku em ferî Mizgînê bibin, û bi riya vaftîzbûnê perestiya xwe ji Yezdan re pêşkêş bikin. Têgihîştina hêviya ku Yezdan pêşkêş dike û daxwaza me ya ketina bin serdestiyê, wê piştî vaftîzbûnê mezintir bibe.

5.5 MÎLENYUM

Di vê xala xebata me ya li ser jiyana serdestiyê de, wê xwendevanekî bi bal vê pîrsê bike: ‘gelo ev teswîra serdestiya Yezdan, ne pir însanî ye?’. Wê însan di dema serdestiyê de jî zarokan bînin (Is. 65:23) û hetta wê bimrin jî (Is. 65:20). Wê ew kes xwediyê nakokiyên bin ku piştî ji aliyê Mesîh ve werin çareserkin (Is. 2:4); û wê ji bo domandina jiyana xwe, ne weke niha zehmet be jî, wê ew çandiniyê bikin. Ev yek diyar dike ku wê tu kes nebe mîna melaîketên ku nazewicin û zêde nabin (Lk. 20:35,36). Her wiha ew nabin xwediyê cewherekî mîna yê Yezdan jî. Bersiva vê yekê di rastiya demdirêjiya serdestiya Yezdan de ye. Wê serdestiya Yezdan 1000 salî – mîlenyumekê- bidomîne (binere. Rev. 20:2-7). Wê di dema wê Mîlenyumê de du komikê gel li serzemînê bin:

1. Yên pîroz – yên ku di vê jiyandê de dane pey şopa mesîh û wê li ser kursiya dadkirinê bibin xwediyê jiyaneke bê dawîn.

Têbinî: Yekî pîroz, tê wateya ‘kesê ku hatiye gazîkirin’ û bawermendekî rast.

2. Kesên bi mirin yê normal – Yên ku di dema vegeza Mesîh de Mizgînê nizanin. Ango ew li ser kursiya dadkirinê ne berpirsyarin.

Di dema hatina Mesîh de, “wê yek ji her du kesên li bostan biçê ji bo (dadkirinê) û wê yê din were hiştin (Lk. 17:36); yên ku dimînin yên komika duwemînin.

Wê li ser kursiya dadkirinê, ji bo bidestxistina cewherê Yezdan, yê pîroz nemirin û zarokan neynin. Ji ber vê yekê divê danasîna kesên ku di dema serdestiyê de van tiştan bijîn, di komika duwemîn de were kirin.

Ev komik ji kesên ku – di dema hatina Mesîh de zindî ne, lê belê pêwîstiyên Yezdan nizanin, pêk tê. Xelata kesên rast ‘melîkî û rahîbî’ ye; û emê “li serzemînê hukum bikin” (Rev. 5:10). Divê ku melîk serdestê hinekan bin. Yên ku werin birêvebirin ewin, yên ku di dema hatina Mesîh de tiştê ji Mizgînê fêmkirine û ji ber vê yekê sax hatine hiştin. Emê bi riya Mesîhiyê, xelata Wî pê re par vekin. Wekî melîkê dinyayê: “ewê ku biserketiye...ezê berpirsyariyeke di ser neteweyan re bidim wî; û wê ew, wan bi darekî hesinî birêve bibe... weke (berpirsyariya) ku min ji bavê xwe girtiye” (Rev. 2: 26,27).

Mînaka Mesîh ya di derbarê diravan de, niha li cihê xwe rudine – Di dema serdestiyê de koleyên dilpak, ji bo birêvebiriya deh an jî pênc bajaran hatin xelatkirin (Lk. 19:12-19). Wê agahdariya riyên Yezdan, yekser piştî ku Mesîh li Qudsê weke Melîk were îlan kirin, belav nebe. Wê gel ji bo bidestxistina agahdariyan, biçê serdana Qudsê (Is. 2: 2,3). Bi çî awahî (kevîrê) di Dan. 2:35,44 de bûbe çiya, (temsîla serdestiya Yezdan dike) wê bang jî wiha hêdî hêdî li serzemînê belav bibe. Belavkirina zanebûna Yezdan û serdestiya wî wê karê pîrozan be.

Dema ku Îsraîl melîkiya Yezdan bû, belavkirina zanebûna Yezdan jî karê rahîba bû (Mal. 2:5-7). Ew ji bo vê armancê li seranserê Îsraîlê hatibûn bi cîh kirin. Wê di dema sersdestiyê de yên pîroz, wezîfeya rahîba hildin ser milê xwe (Rev. 5:10).

Heger îro Mesîh were:

1. Wê miriyên berpirsyar werin zindî kirin û li gel yên ku bi berpirsyarî jiyane, derkevin ser kursiya dadkirinê.
2. Wê xerabên berpirsyar bi mirinê werin cezekirin, û wê ji bo yên rast jiyaneke bê dawî were pêşkêşkirin. Wê neteweyên li dijî Mesîh jî werin cezekirin.
3. Wê demê wê yên rast, yên bê berpirsyarî birêve bibin; û weke “melîk û rahîba” (Rev. 5:10) wê Mizgînê fêrî wan bikin.
4. Wê ev hezar salî dirêj bike. Wê di wê demê de tevayê gelên bi mirin, Mizgînê bibihîzin û wê li hemberî Yezdan bibin xwedî berpirsyarî. Wê ew kes jiyaneke demdirêj û xweş biborînin.
5. Wê di dawiya Mîlenyumê de Yezdan serîhildanekê li dijî Mesîh û yên pîroz biperçiqîne (Rev. 20:8,9).
6. Di encama hezarsalê de, wê kesên mirî werin zindî kirin û dadkirin (Rev. 20:5, 11-15).
7. Wê xerabên di nava wan de werin tunekirin û wê yên rast di jiyaneke bê dawî de beşdarî me bibin.

Wê demê wê pîlana Yezdan ya ji bo serzemînê temam bibe. Wê serzemîn tijî kesên rast û nemir bibe. Wê demê wê navê Yezdan ‘Yahweh Elohim’ (wateya wê: yê ku ji nava komek kesên bi hêz were diyar kirin Ew’e) temam bibe. Wê êdî guneh û mirin li serzemînê nemînin. Wê demê wê soza perçiqandina serê nijada mar, bi cîh were (Gen. 3:15). Wê di dema Mîlenyumê de Mesîh serdest be, ta ku: “(Yezdan) tevayê neyaran dibin lingên wî de raxîne. Dijminê ku dawî were tunekirin, mirin e...dema ku her tişt kete bin serdestiya (Yezdan), wê law jî xwe tebayî Wî (Yezdan) bike ku her tişt tebayî xwe kiriye. Û wê Yezdan di hertiştî de bibe hertişt” (1 Cor. 15:25-28).

“Dema ku ew (Mesîh) serdestiyê teslîmî bavê xwe Yezdan bike ‘dawî’ye (1 Cor. 15:24). Wekî ku me got, dema ku Yezdan bibe ‘di hertiştî de hertişt’ emê di cewherê Yezdan de bibin xwediyê jiyaneke bê dawî, emê wî kêfxweş û bilind bikin. Ev bi tenê nerîneke li ser jiyana piştî Mîlenyumê.

Têgihîştina ‘mizgîna serdestiya Yezdan’ ji bo rizgariya her xwênerekî van gotinan pir girînge. Em hêvî dikin ku hûn vê xebatê carekedin bixwînin û beşên Incîlê yên ku têbinî ji wan hatine girtin bibînin û lê binerin.

Yezdan ji me dixwaze ku em dibin serdestiya wî de bin. Tevayî pîlana wî ji bo me ye. Vaftîzbûn, me digihîne sozên di derbarê vê serdestiyê de.

Hinekî zehmete em bawer bikin ku wê vaftûzbûn û çend salan perestiya gotina Yezdan ketina sedsaleke nû diyarî me bike. Dîsa jî pêwîste hezkirina Yezdan di dilê me de zêde bibe. Pirsgirêkên me çi dibin bera bibin, ma sedemekî aqilane heye ji bo ku em li hemberî banga Mizgînê bisekinin?

“Heger Yezdan bi me re be, ma kî dikare li dijî me raweste?” (Rom. 8:31).

“Êşên vî zemanî, ne hêja ne ku mirov bi rumeta wê demê re qiyas bike” (Rom. 8:18).

“Bi tenê, zoriyên me yên kêliyêkê, dikarin rumet û bilindayîya wê demê pêk bînin (2 Cor. 4:17).

MIJAR 5 : PIRS

1. Kîjan ji yên li jêr dema avabûna serdestiya Yezdan e?

- a) Ew her demê ava bûye
- b) Di dema vegeza Mesîh de
- c) Roja Pentîkostê, di sedsala yekemîn de
- d) Di dilê bawermendan de, dema vegeza wan.

2. Mîlenyum çi ye?

- a) Serdestiya pêşkêşkirinê ya di dilê me de ye
- b) Serdestiya hezarsalî ya bawermendên li bihûştê.
- c) Serdestiya şeytan ya hezarsalî li serzemînê
- d) Yekemîn hezarsala serdestiya Yezdan, li serzemînê

3. Wê di Mîlenyumê de, bawermendên heyî çi bikin?

- a) Wê li ser kesên bi mirin bibin birêvebir
- b) Wê li bihûştê bibin birêvebir
- c) Em wê nizanin
- d) Wê li gerestêrkeke din bijîn

4. Di derbarê serdestiya Yezdan de, bang hat ragihandin?

- a) Bi tenê di Ahîda Nû de
- b) Bi tenê ji aliyê Îsa û hewariyan ve
- c) Hem di Ahîda Kevin û hem jî di ya Nû de
- d) Bi tenê di Ahîda Kevin de

6.1 YEZDAN Û XERABÎ

Mîna gelek olên din, piraniya mezhebên Xirîstiyaniyê jî pê bawerin ku berpirsyarê gunehên ku em dikin û tevayê pîrsgirêkên li dinyayê cenawirek bi navê Şeytan an jî Iblîs e. Incîl bi awayekî eşkere, fêr dike ku Yezdan serdestê her tiştî ye. Me di Mijar 1.4 de dît ku Melaîket nikarin gunehan bikin. Heger em baweriya xwe bi rastî bi van tiştan bînin, wê demê ne gengaze ku li gerdunê li dijî Yezdanê ku serdestê her tiştî ye, hêzeke din hebe. Heger em baweriya xwe, bi hebûna hêzeke wiha bînin, wê demê tê wateya ku em serdestiya Yezdanê ku hakimê her tiştî ye dixin nava gumanê. Divê têgihîştina şeytan û iblîs weke zanîneke girînd were dîtin. Me di Heb. 2:14 de got ku Îsa bi mirina xwe şeytan tune kiriye. Ji ber vê yekê divê em şeytan baş şîrove bikin ji bo em bikaribin xebat û cewherê Îsa jî fêm bikin.

Bi giştî li dinyayê û bi taybetî di nava alema Xirîstiyân de, tê bawer kirin ku di jiyandê de, tiştên baş ji Yezdan û yê xerab jî ji şeytan tên. Ev ne ramaneke nû ye û ne bi tenê Xirîstiyânên ji rê derketî baweriya xwe pê tînin. Wek mînak, Babîliyan bawer dikirin ku du îlah hene: yek yê başî û ronahiyê ye û yek jî yê xerabî û tariyê ye. Melîkê farisan yê mezin Sîrus baweriya xwe bi vê yekê dianî. Ji ber vê yekê Yezdan ji wî re got ku: “Mîrzayê we Yezdan ez im û yekî din nîne; ji min pêve Yezdan nînin...ez reng didim ronahiyê û tarîtiyê diafirînim: ez aramiyê çêdikim û xerabiyê (N.I.V. ‘beleyê’) diafirînim. Mîrzayê we Yezdanê ku van tevan dike ez im” (Is. 45:5-7, 22). Yezdan aramiyê jî çêdike, xerabî û belayê jî tîne. Ango Yezdan bixwe ‘xerabiyê’ diafirîne û wê tîne holê. Di navbera guneh û ‘xerabiyê’ de cudabûnek heye. Guneh weke encama kiryarên însan hatiye dinyayê ne yê Yezdan (Rom. 5:12).

Yezdan ji Sîrus û gelê Babîlê re got ku: “Ji min pêve Yezdanekî din nîne”. Gotina Yezdan di zimanê Ibranî de tê wateya ‘dest’, ‘hêz’ an jî ‘çavkaniya hêzê’. Yezdan dibêje ku ji wî pêve tu çavkaniyên hêzê tunene. Ev sedeme ji bo ku yekî bawermend baweriya xwe bi şeytan an jî cinan neyne.

YEZDAN: AFIRÎNERÊ BELAYÊ

Di Incîlê de bi riya gelek mînakên tê diyar kirin ku Yezdan bixwe ‘xerabiyê’ tîne dinyayê û dixwe jiyana kesên. Amos 3:6 dibêje, heger ku li bajarekî xerabî hebe, Yezdan bixwe wê dike. Wek mînak, heger li bajarekî zelzele hebe, tê bawerkirin ku li ser wî bajarî pîlanên şeytan hene û ew dibe sedema felaketan. Lê belê yê bawermend divê bawer bikin ku Yezdan berpirsyarê wê yekê ye. Ji ber vê sedemê Mîc. 1:12 vê dibêje: “Ji cem Yezdan xerabî (bela) daket ber deriyê Qudsê”. Di pirtûka Eyub de, em

dibînin ku wî wekî kesekî rast û durust bi çi awahî hebûna xwe ya li vê jiyânê wendakiriye. Pirtuk dide zanîn ku tecrubeya mirovekî ya dîtina ‘xerabiyê’ ne girêdayî bawerî û perestiya wî ye. Eyub bi vê yekê hisiya: “Mîrzayê me Yezdan da û Mîrzayê me Yezdan bir” (Job 1:21). Ew vê nabêje: “Mîrzayê me Yezdan da û Iblîs bir”. Ew vê şîroveyê ji jina xwe re dike: “Emê ji bo çi ji destê Yezdan başiyê bigrin, û xerabiyê negrin? (Job. 2:10). Di dawiya pirtukê de hevalên Eyub, “ji bo tevayê xerabiya ku Yezdan bi serê wî aniyê” (Job 42:11 krş. 19:21 ; 8:4) li ber dilê wî didin. Ji ber vê yekê, weke berpirsyarê tevayê pirsgirêkên jiyana me, Yezdan çavkaniya ‘xerabiyane’ jî.

“Yezdan ji kê hezbike wan perwerde dike...heger hûn tehemula perwerdeyê bikin...ew, piştê semereya tijî aramî dide xwediyên vê tecrubeyê” (Heb. 12:6-11). Ev imtîhana yekemîn ya ku Yezdan ji bo pêşveçûna me ya giyanî me tê re derbas dike, nîşanî me dide. Weke ku tê gotin şeytan, pirsgirêkan dixê jiyana me ji bo ku em nikaribin ‘semereya tijî aramî ya rastiyê’ derbasî jiyana xwe bikin. Her wiha tê gotin ku ew me dixê nava guneh û nerastiyan de. Ev nerîna di derbarê şeytan de, li vir rê li pêşya pirsgirêkên mezin vedike. Ev, bi taybetî ji bo hevokên weke van ku teslîmkirina însanekî ji bo şeytan tînin ziman, girînge: “ku giyan rizgar bibe” yan jî “ku ew fêrî xeberan nebe” (1 Cor. 5:5 ; 1 Tim. 1:20). Heger ku şeytan bandoreke xerab li ser giyanê însanan dike, û berê wan dide gunehan, wê demê ji bo çi li vir behsa wî bi başî dibe û ew weke ronahiyeke baş tê diyarkirin? Bersiv eve; neyarek ‘şeytanek’ an jî zoriyeke jiyânê, hinek caran dikare bandoreke baş li ser giyanê bawermendekî bike.

Heger em bipejirînin ku xerabî jî ji Yezdan bixwe tê, wê demê emê ji bo xelabûna ji pirsgirêkên xwe jî, li ber Yezdan bigerin û alîkariya wî bixwazin.

Heger ew tiştê neke, wê demê emê bizanibin ku ew ji bo başiya me ya giyanî ji cem Yezdan hatine şandin. Heger em bi hebûna şeytan û iblîs bawer bin, wê demê em nikarin bi tu awayî bi başiyê re li hev werin. Pêwîste seqetî, nexweşî, mirina ji nişkêve û felaket bi tenê mîna bextekî xerab werin dîtin. Heger şeytan melaîketek bi hêz û gunehkar be, wê demê ewê ji me xurttir be û wê bikaribe ziyânê bide me. Lê belê, em dibin bandora Yezdan de ne: “hertiştê li (jiyanê), bi hev re ji bo başiyê (ji bo bawermendan) dixebitin” (Rom. 8:28). Ji ber vê, di jiyana tu bawermendî de tiştê bi navê ‘şens’ nîne.

ÇAVKANIYA GUNEH

Divê were gotin ku guneh ji nava me bixwe derdikeve. Gunehkarî tawana me bixwe ye. Bê guman wê tiştê xweşbûya heger gunehkarî ne

tawana me bûya. Em bi azadî gunehan dikin û piştîre jî em dibêjin ku ew ne tawana me lê belê ya şeytane û tevayî berpirsariya guneh dikeve ser milê wî. Tê gotin ku kesê tawanbar demekê ketibûye bin bandora şeytan û ji ber vê yekê ew ne tawanbar e, û rehm ji bo wî tê xwestin. Lê belê, ev kêmaniyên biçûk weke ku qet nebûbin têne şîrovekirin û ew kes jî hukmê ku di derbarê wî de hatiye girtin dipejirîne.

Divê em bînin bîra xwe ku, “bedelê guneh mirin e (Rom. 6:23); guneh mirov dibe mirinê. Heger ku gunehkariya me ne tawana me, lê belê ya şeytan bûya, wê demê pêwîst bû Yezdan ji me bêhtir şeytan ceze bike. Lê belê dadbûna me ya ji bo gunehên me, dide nîşandan ku em di ber wan de berpirsarin. Dema em dibêjin ku çavkaniya gunehan ne em in, lê belê çavkanî şeytane, em dixwazin berpirsariya gunehên xwe ji xwe bi dur xin. Ev mîna keke ku însan naxwazin daxuyaniya Incîlê ya di derbarê cewherê mirov de fêhm bikin. Incîl dibêje ‘însan di bingeha xwe de gunehkar e’.

“tiştêk nîne ku ji derve ve têkeve nava însan û wî xerab bike...ji ber ku ramanên xerab, zînê û kujtin, ji nava însan bixwe derdikeve...kubarî, bêaqilî, û her tiştê xerab ji hundir tê û însanan dilewitîne” (Mk. 7:15-23).

Dema em dibêjin ku tiştêkî gunehkar, ji derva ve dikeve nava me û dihêle em gunehan bikin, em bi daxuyaniya Îsa re dikevin nava nakokiyê. Her tiştê xerab, ji nava însan bixwe derdikeve. Ev dibe sedem ku Yezdan di dema tofanê de, bala xwe bide vê yekê: “hêza xeyalî ya dilê însan ji ciwaniya wî ve xerab e” (Gen. 8:21). Yakub 1:14 ji me re diyar dike ka em bi çi awahî ji rê têne derxistin: “Dema ku herkes (ji bo her kesî heman pêvajoyê) ji aliyê daxwazên xwe yê bedenî ve (N.I.V.daxwazên xerab) tê kişandin, ji rê derdikeve û tê xapandin”. Em ne ji aliyê hêzeke derveyî xwe, lê belê ji aliyê daxwazên xwe yê xerab ve têne xapandin. Yakub vê pirsê dike: “sedema şer û pevçûnên di nava we de çi ye? Ma gelo sedem bi tevayî (yên ku di nava we de şer dikin) ne daxwazên we yê bedenî ne? (James 4:1). Em hemû xwediyên xapînokên kesanî ne. Çavkaniya wan bixwe jî, daxwazên me yê xerab in. Ji ber ku ew taybetiyên me ne. Heger gotina rast were xwestin, em bixwe neyarên xwe ne.

Pirtûka *Romayîyan*, bi giranî li ser guneh, sedemên gunehkariyê, çavkaniya wî û şerê li dijî wî ye. Gelekî bi wateye ku di pirtûkê de, hema hema behsa şeytan û iblîs nabe. Di çerçoveya axaftinên li ser çavkaniya guneh de, Pavlus behsa şeytan an jî iblîs nake. ‘Şeytan’ bixwe gotineke Ahîda Nû ye. Heger ku sedema gunehên me hêzeke derveyî me bûya, wê di Ahîda kevin de behsa wê hêzê bihata kirin. Lê belê bi tu awayî behsa vê yekê nehatiye kirin. Nivîsa li ser dema *Dadgêran* an jî Îsraîliyên li çolê dide zanîn ku wê demê Îsraîl di nava gunehan de bû. Lê belê Yezdan, ew di derbarê hêzeke nedîtî de ku guneh bi wan dide kirin, hişyar nekirine û bala wan nekişandiye ser hebûneke wiha. Li şûna vê yekê, li ber dilê wan daye ku

ew nekevin riya daxwazên bedena xwe û gotina wî di jiyana xwe de pêkbînin (mînak, Dt. 27:9,10 ; Josh. 22:5).

Pavlus şînê digre: “Di nava min de (ango di nefsa min de) tiştêkî baş nasekine...ji ber ku ez wî tiştê baş yê ku dixwazim, nakim. Heger ez tiştê ku naxwazim dikim, wê demê yê ku wî dike ne ez im, lê belê gunehê di nava min de ye” (Rom. 7:18-21). Ango ew tawana gunehên xwe, navêje ser milê hebûneke bi navê şeytan. Ew weke çavkaniya guneh ya rastîn, cewherê xwe dide nîşandan: “Wî tiştî ne ez lê belê gunehê di nava min de dike. Wê demê min (di nava xwe de) zagonek dît: dema ez dixwazim başiyê bikim, xerabî bi min re ye (ango di nava min de ye)”. Ew behsa li dij derketina wî tiştî dike ku nav lê kiriye ‘gunehê di nava min de’. Her kesê bi bal û di aliyê giyanî de zana dikare bigihîje agahdariyên di derbarê xwe de.

Divê ev rastî were gotin ku Xirîstiyaneke mîna Pavlus giranbûha dema ku dibe Mesîhî, ne cewherê wî tê guhertin, û ne jî dikeve rewşeke ku êdî nikaribe gunehan bike. Tevgera ‘evangelîst’ ya modern, dibêjin ku ew gihîştine radeya ku guneh nekin û ji ber vê yekê Pavlus, bi sedema daxuyaniya wî ya di Rom. 7:15-21 de dixin nava refên yê ‘rizgarnebûyî’. Ev ayetana ji bo gotinên wan, pirsgerêkeke mezin in. Her wiha Dawid jî ku gotin li ser rastiya wî nayê kirin, dijayetiya gunehkariya cewherê xwe wiha rave dike: “Ez xerab hatim afirandin; dayîka min di nava gunehan de bi min ducan bû” (Ps. 51:5).

Incîl pirê caran gotiye ku cewherê însan di bingeha xwe de xerab e. Heger ev were fêhm kirin, wê demê pêwîstî namîne ku em berpirsyarekî din ji bo gunehên xwe biafirînin. *Jer. 17:9* dibêje ku dilê însan, bi qasî ku em nikarin texmîn bikin, derewîn û gunehkar e. Îsa jî di *Mt. 7:11* de diyar dike ku cewherê însan di bingeha xwe de xerab e. Her wiha *Ecc. 9:3* (metna Ibranî) dibêje: “Dilê benîadem tijî xerabî ye”. *Eph. 4:18* sedema ku însan bi awayekî xwezayî ji Yezdan bi dur dikeve wiha tîne ziman: “ji ber cahiliya di nava wan de, û bi sedema tevliheviya di dilê wan de”. Ji ber tevliheviya di dilê me de, awayê me yê ramanê me ji Yezdan bi dur dixîne. Bi heman şeweyê *Gal. 5:19* jî wiha behsa gunehên me dike: “bikaranîna nefsa me”; tiştê dihêle ku em gunehan bikin, nefsa me û hebûna me bixwe ye. Yek ji van daxuyaniyan jî nabêje ku sedemê gunehên me şeytan e. Ramanên gunehkar bi me re diafirin û mezin dibin ew beşek ji afirîna însan in.

6.2 ŞEYTAN Û IBLÎS

Hinek gotinên bingehîn yê Incîlê, hinek caran nayêne wergerandin û weke eslê wan tîne hiştin (di *Mt. 6:24* de Mammon –pere- mînaekeke aramî ye ji bo vê rastiye). Gotina ‘**Iblîs**’ ku bixwe gotineke Ibranî ye nehatiye wergerandin û weke eslê wê hatiye nivîsandin. Gotinê tê wateya *neyar*; û gotina ‘**şeytan**’ tê wateya derewîn, neyar û bêbext. Ew bixwe wergera

'*diabolos*'a Yunanî ye. Heger em pê bawerin ku şeytan û iblîs sedemên gunehkariya me ne, wê demê her ku em di Incîlê de rastî van gotinan werin divê em fêhm bikin ku ew ji bo wî kesê xerab têne gotin. Bikaranîna van gotinan di Incîlê de, dide nîşandan ku ew dikarin ji bo kesên din jî werin bikaranîn.

Gotinên şeytan û iblîs weke ku di Incîlê de hatine bikaranîn, nayên wateya kesên li derveyî me ku dibin sedema gunehkariya me.

DI INCÎLÊ DE GOTINA 'IBLÎS'

1 Kings 11:14 wiha dibêje: "Û Yezdan ji bo Silêman neyarek (heman gotina Ibranî li hin cihên din weke 'iblîs' hatiye wergerandin) têk da: Ji Edomiyên, Hadat". "Û Yezdan neyarekî din (iblîsekî din) têk da ... Rezan...ew bû neyarekî (iblîsekî) Îsraîlê" (1 Kings 11: 23,25). Ev nayê wateya ku Yezdan ji bo Silêman, mîna neyarekî/iblîsekî melaîketek an jî kesayetek giranbûha têk daye; Wî kesayetên normal têk dane. Mt. 16:22,23 mîna keke din dide. Petrus xwestiye li pêşiya çûna Îsa ya Qudsê û mirina wî ya di çarmîxê de bibe kelem. Îsa li Petrus vegeriya û wiha got: "xwe ji riya min bide alî, Iblîs...tu ji daxwazên Yezdan bêhtir li yênsanan difikirî". Wê demê Petrus weke iblîsekî hat bi navkirin. Nivîs pir vekiriye; dema ku mesîh ev yek got, ew ne bi cenawir an jî melaîketekî re diaxiff, ew bi Petrus re diaxiff.

Ji ber ku gotina 'iblîs' tê wateya 'neyar', însanekî baş û hetta Yezdan bixwe jî dikare weke 'iblîs' were bi navkirin. Di rastiya gotinê de, wateya gunehkariyê nayê dîtin. Ji ber ku cewherê me yê gunehkar, 'iblîs' û 'neyarê' me yê herî mezin e, û ji ber ku di zimanên biyanî de, ev gotin ji bo tiştên guneh tê bikaranîn, ew bûye gotineke ku gunehkariyê bîne ziman. Yezdan bixwe jî dikare bi riya piştgirîkirina çalakiyê me yî xerab, ji me re bibe iblîsek. Lê belê bi gotina 'iblîs' binavkirina Yezdan, nayê wateya ku ew bixwe gunehkar e.

Her çar Mizgîn jî, heman bûyeran bi awayên cûda tînin ziman. Pirtûkên bi navê *Samuel* û *Dîrok* jî van bûyeran diyar dikin. 2 Sam. 24:1 wiha dibêje: "Mîrzayê me Yezdan...Dawid li dijî Îsraîlê xist nava livbaziye", ji bo ku ew li Îsraîlê hejmara şênî derxîne holê. 1 Chron. 21:1 jî wiha dibêje: "Iblîs li dijî Îsraîlê derket û Dawid têk da", ji bo hejmara şênî were naskirin. Di daxuyaniya yekemîn de Yezdan û di ya din de iblîs têk dide. Li vir ev encam derdikeve holê ku Yezdan li dijî Dawid, mîna 'iblîs' an jî 'neyar'ekî tevdigere.

Wî heman tişt anîn serê Eyûb jî. Û Eyûb di derbarê Yezdan de wiha got: "Bi destê xwe yê bi hêz tu jî êrîşî min dikî" (Job. 30:21); Eyûb dixwest vê bibêje, "tu mîna iblîsekî nêzikî min dibî".

DI INCÎLÊ DE GOTINA ŞEYTAN

Heman tişt ji bo gotina ‘şeytan’ jî têne gotin. Îsa got ku: “Ma ne min hûn, her diwanzdeh (hewarî) hilbijartin; û yek ji we ma ne şeytane ke? Wî behsa Yahuda Îskariot dikir...” (Jn. 6:70,71); ku ew însanekî bi mirin û normal bû. Wî ne behsa hebûneke bi qiloç an jî tişteki bi navê ‘hebûneke giyanî’ dikir. Gotina ‘şeytan’ li vir bi tenê tê wateya însanekî xerab û ne baş. 1 Tim. 3:11 mîna keke din dide. Xanimên kesên li pêşiya civakê ‘fitne’ nedikirin. Li vira gotina eslî ya Yunanî ‘dîabolos’ê ku li hinek deveran mîna ‘şeytan’ tê wergerandin. Ji ber vê yekê Pavlus ji Tîtus re got ku jinên bi temen yê civakê nikarin bibin ‘fesad’ an jî ‘şeytan’ (Tit. 2:3). Û bi heman şeweyê wî ji Timoteyus re got ku: “Di rojên dawî de... wî tevayê însanan...bibin fesad (şeytan)” (2 Tim. 3:1,3). Ev nayê wateya ku wê însan bibin tiştên ecêb û nedîtî. Lê belê tê wateya ku ewê xeraptir bibin. Ji van daxuyaniyan hatiye fêmkirin ku ‘şeytan’ û ‘iblis’ ne hebûnên gunehkar yê li derveyî me ne, û ne jî ew melaîketin û ji (asîman) hatine xwarê.

GUNEH, IBLÎS Û ŞEYTAN

Me di Mîjar 6.1 de da zanîn ku gotinên ‘şeytan’ û ‘iblis’ ji bo danasîna gunehkariya di nava me de têne bikaranîn. Evana ‘iblis’ û ‘neyar’ên me yê bingehîn in. Mirov dikare wan daxîne radeyeke şexsî û weke neyarekî an jî fesadekî rastiye behsa ‘şeytan’ bike. Rastiya me çî be –şeytanê rastîn- mîna wê ye. Girêdana di navbera şeytan û daxwazên me yê xerab de –gunehê di nava me de- di beşên cihê de hatiye ziman: “Ji ber ku zarok (em) jî xwîn û goşt in, Wî jî (Îsa) mîna wan şikil girt; bi vî awahî wî yê ku xwediyê hêza mirinê bû, ango şeytan, bi mirina xwe tune kir (Heb. 2:14). Li vir şeytan weke hebûneke ku berpirsyarê mirinê be tê ziman. Lê belê, “bedela guneh mirin e” (Rom. 6:23).

Ji ber vê yekê lazime ku guneh û şeytan mîna hev bin. Bi heman şeweyê James 1:14 behsa daxwazên me yê xerab dike ku dihêlin em gunehan bikin û ji wir jî biçin mirinê. Lê belê Heb. 2:14 jî dibêje ku şeytan mirinê bixwe re tîne. Heman ayet dibêje ku Îsa ji bo tunekirina şeytan, bûye xwediyê cewherê me. Rom 8:3 jî li dijî vê (wiha dibêje:) “Yezdan kurê xwe di şibhetê însanê gunehkar de (ango di cewherê me yê însan de) bi rê kir û guneh mehkum kir”. Ev dide nîşandan ku guneh û şeytan heman tişt bixwe ne. Têgihîştina vê yekê pir girînge; Îsa mîna me hatibû ceribandin. Şaş fêmkirina şeytaniyê, tê wateya ku me kar û cewherê Îsa fêm nekiriye. Ji ber ku Îsa xwediyê cewherê me yê îsanî ye –di nava wî de ‘şeytanî’- em dikarin bibin xwediyê hêviya rizgariyê (Heb. 2:14-18 ; 4:15). Ji bo têk birina daxwazên di nava xwe de, ango têk birina şeytanê di Incîlê de Îsa bû xwediyê şerefa têk birina şeytan di çarmîxê de (Heb. 2:14). Heger şeytan

xwediyê kesayetekê bûya, wê demê ewê niha tune bûya. Heb. 9:26 dibêje ku Mesîh “bi riya tunekirina xwe, ji bo ku guneh tune bike” derketiye holê. Heb. 2:14 jî dibêje ku Mesîh bi riya mirina xwe, şeytanê di nava xwe de tune kiriye û careke din vê rastiyê tîne ziman. Îsa, bi mirina xwe weke ku dihat hêvî kirin, “bedena guneh” ; ango cewherê însan û gunehê ku di bedenên me de derdikeve holê, tune kir (Rom. 6:6).

“Yê ku guneh bi mirov dide kirin, şeytan e” (1 Jn. 3:8) ; ji ber ku guneh, encameke xerabiyên di nava me de ye, ku incîl jê re dibêje ‘şeytan’ (James 1: 14,15). “Bi vê armancê, ji bo têk birina karê şeytan, kurê Yezdan derkete holê” (1 Jn. 3:8). Heger em bipejirînin ku şeytan, daxwaziyên me yên xerab in, wê demê tiştên ku di encama wan daxwaziyan de derdikevin holê jî gunehên me ne. Ev rastî di 1 Jn. 3:5 de jî tê ziman: “Ew (Îsa) ji bo rakirina gunehan derkete holê”. Ev, dide nîşandan ku ‘gunehên me’ û ‘karên şeytan’ heman tişt bixwe ne. Acts 5:3 li ser girêdana di navbera şeytan û gunehên me de mîna keke din dide. Petrus ji Hananya re dibêje: “Çima şeytan dilê te tiji kiriye?”. Piştî di Ayeta 4. de jî Petrus wiha dibêje: “Te çima ev tişt xist dilê xwe?”. Dema em tiştê xerab têxin dilê xwe, tê wateya ku iblîs dilê me dagirtiye. Heger em xwediyê pîlanekî gunehkar bin, ew di dilê me de dest pê dike. Heger jinek bi zarok be (ducan be), ew li derveyî wê çênabe, ew di nava wê de çêdibe. *James 1: 14,15* dide xuyakirin ka daxwazên me yên bedenî bi çi awahî û rê li pêşiya guneh vedikin û berê me didin mirinê. *Ps. 109:6* jî girêdanê di navbera yekî gunehkar û ‘iblîs’ de çêdike: “*Tu zilamekî xerab bide ser wî: û bera li milê wî yê rastê jî iblîs raweste*” , ango bera hukmê wî li ser hebe (*krş. Ps. 110:1*).

BI KESAYETKIRIN

Hun dikarin bersiveke di cîh de bidin: ‘*Ma ne weke ku kesayetek be behsa şeytan tê kirin?*’ Belê, raste. *Heb. 2:14* behsa yê ku “*xwediyê hêza mirinê ye, ango şeytan*” dike. Ew weke ku kesayetek be tê ziman. Ji ber vê yekê *Prov. 9:1* behsa jinekê bi navê ‘pisporî’ dike ku malekê ava dike; û *Rom. 6:23* guneh dişibîne wezîfedarê ku mirov buhayê (pereyê) mirinê didiyê de. Li ser vê taybetiyê di *Gotina navbend 5* de gotubêjeke berferê heye. Şeytanê me ‘**dîabolos**’ gelek caran temsîla daxwazên me yên xerab dike. Dîsa jî mirov nikare wî ji kesayetê cuda bike. Nêt û daxwazên xerab yên di dilê mirovekî de, derveyî kesayeta wî nikarin hebûna xwe bidomînin; di encama vê de ‘şeytan’ tê bi kesayetkirin. Gunehê me hinek caran weke ‘mîrzayekî’ tê bi kesayetkirin (*mînak, Rom. 5:21 ; 6: 6,17 ; 7:14*). Ji ber vê yekê şeytan tê wateya guneh jî û bi vî awahî ew tê bi kesayetkirin. Her wiha Pavlus jî ji me re behsa du hebûnên di bedena me de dike (*Rom. 7: 15-21*)

:însanê nefîsê, şeytan, bi însanê giyan re şer dike. Lê belê ev yek eşkereye ku di nava me de tu kesayetên rastîn yên ku şer dikin tune ne. Ev beşê cewherê me yê gunehkar, weke 'yê xerab' (şeytanê di Incîlê de) tê bi kesayetkirin (*Mt. 13 R.V.*). Heman gotina Yunanî ya ku weke 'yê xerab' tê wergerandin, di *1 Cor. 5:13* de wiha tê ziman: dema ku kesek teslîmî gunehê xwe bibe, ew weke 'yê xerab' an jî 'kesê xerab' tê wergerandin.

BI WATEYA SIYASÎ 'ŞEYTAN' Û 'IBLÎS'

Gotinên 'şeytan' û 'iblis' ji bo şîrovekirina nîzama dinyaya me ya gunehkar jî têne bikaranîn. Mirov dikare dirutiya însanan ya civakî, siyasî û olî jî weke 'şeytan' bi nav bike. Di Ahîda Nû de, piraniya caran şeytan û iblis ji bo bi nav kirina hêza siyasî û civakî ya sîstemên Cihû û Roma têne bikaranîn. Em li şûna rayedarên Roma yên ku bawermendan davêjin zîndan, şeytan dixwînin (*Rev. 2:10*). Di heman çerçovê de, em dixwînin ku civaka Bergamayê li cihê textê şeytane. Lê belê em nikarin bibêjin ku şeytan bixwe weke kesayetekê –heger hebe- li Bergamayê xwediyê textekî ye.

Gunehê şexsî, weke li dij derketina zagona Yezdan tê bi nav kirin (*1 Jn. 3:4*). Lê belê, gunehê hevbeş yê ku mîna hêzeke siyasî û civakî ye li dijî Yezdan, tê wateya hêzeke mezintir. Hinek caran ev hêza hevbeş, weke şeytan tê bi navkirin û weke hebûnekê tê bi kesayetkirin. Ji ber vê yekê Îran û hinek hêzên îslamî, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê weke 'iblisê mezin' –ango di aliyê siyasî û olî de, neyarê wan yê herî mezin- bi nav dikin. Ev diyar dike ka ji bo çî di Incîlê de, gotinên 'şeytan' û 'iblis' pir têne bikaranîn.

Di encam de, pir di cîh de ye ku em bibêjin, di vê mijarê de, li şûna ku em çend doktrînen li ser bingeha çend ayetan binin ziman, divê em piştî gotinên xwe bidin daxuyaniyên Incîlê. Careke din bi balkêşî xwendina *Mijar 6.1* û vî beşî wê mirov bigihîne bersiveke rast. Tiştên ku bi kinayî li vir hatine ziman, bi awayekî rast û durust şîroveya şeytan û iblis kirine. Ev gotin, weke sîfetên normal, hinek caran ji bo diyarkirina gunehê di nava me de jî têne bikaranîn. Hinek ji nerînên ku bi piranî şaş têne fêmkirin, di *Gotinên navbend'*an de hatine ziman.

Yên ku di pejirandina encamên me de xwedî pirsgirêkin, divê van pirsan ji xwe bikin: **(1)** Mirov dikare guneh têxe warekî şexsî? **(2)** Tiştêkî raste ku 'Iblis' bi tenê mîna sîfetekî were bikaranîn? Belê, wisa ye. Tiştê ku dibe pirsgirêk ewe ku em guneh weke neyar/iblis'ê xwe têxin warekî kesanî. Heman gotin di nameyên Yuhanna, û di Mizgînê de (*binere. R.V.*) pirê caran weke kesayetekê hatiye ziman. Ma ji bo vê yekê ji 'iblis' û 'şeytan' baştir, sernivîseke din tê dîtin?

6.3 CIN

Me di her du beşên borî de diyar kir, ka çima em pê ne bawerin ku şeytan an jî iblîs, hebûneke bi kesayet an jî cenawireke.

Heger em şeytan mîna hebûneke bi kesayet nepejirînin, wê demê em hebûna cinan jî napejirînin ku ew mîna xizmetkarên şeytan têne dîtin. Gelek kes difikirin ku di jiyane de her tiştê baş ji aliyê Yezdan ve ji bo me tê pêşkêşkirin û şeytan û cinên wî jî yên xerab didin me û dixwazin başiyên ku Yezdan dide me ji holê rakin.

Incil pir vekirî û safî dibêje ku Yezdan çavkaniya her tiştî ye (binere. Mijar 6.1) û ew di jiyana me de berpirsyarê her tiştê baş û xerab e:

“Ez şikil didim ronahiyê; û tariyê diafirînim: ez aramiyê tînim û belayê diafirînim. Yê ku van tevan dike Ez Mîrzayê we Yezdan im” (Is. 45:7).

Ji ber vê yekê dema ku em di ceribandinên jiyane re derbas dibin, divê em tawana wan navêjin ser milê şeytan û cinan, divê em bipejirînin ku ew dana Yezdan bixwe ne. Eyûb piraniya tiştên xwe yên baş wenda kiribû lê belê wî ev yek negot: “*Van cinan, her tiştê ku Yezdan dabû min birin*”. Na; guhê xwe bidin tiştê ku gotiye:

“*Mîrzayê me Yezdan da û Mîrzayê me Yezdan bir; bera navê Yezdan pîroz be*” (Job 1:21).

Yezdan çavkaniya her rengê hêzê ye (Is. 45:5; 44:8).

Dema ku gelê Yezdan dest bi bawerkirina îlahên din bike û ji Wî re wisa bibêje, Ew diheside dibe: “Tu Yezdanekî mezin û bi hêz î, lê belê heger ne mîna te bi hêz bin jî ez baweriya xwe bi hinek îlahên din tînim”. Ev yek dibe sedem ku em baweriya xwe bi hebûna cin û şeytan neynin. Ev, ew şaşiya ku Îsraîlê kiriye bixwe ye. Beşekî mezin ji Ahîda Kevin li ser helwesta Îsraîlê ya li hemberî Yezdan e. Îsraîl, li gel Yezdan baweriya xwe bi hinek îlahên din aniyê û Yezdan aciz kiriye. Emê di Incîlê de bibînin, kesên ku baweriya xwe bi cinan tînin, çiqasî dişibin Îsraîliyên ku baweriya xwe bi îlahên sexte anîbûn.

CIN, PUT BIXWE NE

Di 1 Korîntî'yan de, Pavlus diyar dike ka çima lazime Xirîstiyên baweriya xwe bi van tiştan neynin û perestiya putan nekin. Di dema (nivîsandinê de) Incîlê de însanan baweriya xwe bi cinan dianîn û ew mîna

îlahên biçûk didîtin. Însanan mîna putan, modêlên cinan çêkirin û perestiya wan kirin. Ev yek eşkere dike ka ji bo çi Pavlus di nameyên xwe de gotinên ‘cin’ û ‘put’ bi heman wateyê û li şûna hev bikar anîne:

“Yên Putperest (neteweyên ne cihû, Yunanî) dema ku tiştê dikin qurban, wî ne ji bo Yezdan, lê ji bo cinan dikin qurban. Ez nikarim bibêjim ku divê hûn bi cinan re xwediyê heman hestan bin...Heger yek, ji wî qurbanê ji bo putan hinekî pêşkêşî we bike, ji bo xatirê wî jê nexwin...” (1 Cor. 10: 20,28).

Bi vî awahî cin û put heman tişt in. Bala xwe bidin gotina Pavlus ya ku dibêje, ew qurbanên xwe ‘ne ji bo Yezdan, lê ji bo cinan (putan),’pêşkêş dikin. Cin ne Yezdan in; bi tenê yek Yezdan heye û ev jî nîşan dide ku tu hêza cinan tune ye û ew ne îlah in. 1 Cor. 8:4 jî vê xalê wiha tîne ziman:

Li ser van tiştên ku weke qurban ji bo putan tene pêşkêş kirin, em dikarin bibêjin ku li dinyayê put (ango cin) tune ne, û bi tenê yek Yezdan heye”.

Putek an jî şeytanek ne xwedî kesayet û hebûn e. Li dinyayê bi tenê hêzek û Yezdanek heye. Pavlus di 1 Cor. 8:5,6 de bi vî awahî berdewam dike:

“Herçiqas pir îlahên di gotin de hebin jî... (gelek îlah û mîrzayên ku – bawerî bi wan tê- hene) (mîna gelek kesên ku baweriya xwe bi hebûna cinên curbicur tînin û cinêk dibe sedema ku ew karê xwe wenda bikin, yek dibe sedema ku jina xwe berdîn û her wiha). Lê belê ji bo me (bawermendan), (weke ku me berê jî got, çavkaniya başî û nebaşiyê) û ya her tiştî bi tenê yek Yezdan, yek bav e”.

Di Dt. 32:17 û Ps. 106:37 de gotina (Septuagint) ‘daimonion’ ya di versiyona Yunanî ya Ahîda Kevin de, weke ‘put’ tê bikar anîn. Û ew di Ahîda Nû de weke ‘cin’ hatiye wergerandin. Ps. 106:36-39, şaşiyên Îsraîlê destnîşan dike û putên Kenanê dişibîne cinan:

“Wan (Îsraîlîyan) perestiya putan kirin ku ji wan re xefikek bû. Birastî jî wan law û keçên xwe ji cinan re kirin qurban; û xwîna keç û kurên xwe yên ku kirin qurbanên putên Kenanê, bê guneh rijandin...Bi vî awahî bi kiryarên xwe bûn mirdar û bi afirînên xwe (karên xwe) zinê kirin.

CINÊN AHÎDA NÛ

Hûn dikarin vê yekê bibêjin: *“Hûn li ser tevayê beşên Ahîda Nû yên di derbarê cinan de çi difikirin?”*

Divê em tiştê diyar bikin: Încîla ku gotina Yezdanê hakimê her tiştî ye bixwe re nakeve nava nakokiyê. Heger em bipejirînin ku Yezdan çavkaniya tevayê hêzê ye û ew dibe sedema tevayê pirsgirêkên me, wê demê Incîl nikare bibêje ku cin – îlahên biçûk yên li dijî Yezdan- van tiştan ji me re tînin. Di Ahîda kevin de gotina ‘cinan’ bi tenê çar çaran û bi wateya destnîşandana putperestiyê hatiye bikar anîn. Lê belê ev gotin di nivîsên

Mizgînê de pirê caran derbas dibe. Sedema vê yekê dikare ev be, ku di dema nivîsandina Mizgînê de, tevayê nexweşiyên ku nedihatî naskirin, weke tawana cinan dihatin dîtin. Heger birastî cin hebana û ew berpirsyarê nexweşî û pirsgirêkên me bana, wê me li ser wan di Ahîda Kevin de zêdetir bixwenda. Lê belê em li wir di derbarê wan de tiştêkî berbiçav naxwînin.

Dema dibêjin ku cin ji nava yekî hatine avêtin, dixwazin bibêjin ku ew ji nexweşiyê mêtî an jî nexweşiyê nenas sax bûye. Kesên ku di sedesala yekemîn de dijiyan, tawana her tiştê ku jê fêhm nedikirin davêtin ser cinan. Ji bo kesên ku aqilê xwe wenda dikirin, dihat gotin ku ‘cinan ew girtine’. Di dema Ahîda Kevin de giyanekî xerab an jî bi gemar, dihat wateya nexweşiyê mêtî (Jud. 9:23 ; 1 Sam. 16:14 ; 18:10). Di dema Ahîda Nû de jî ji nexweşên mêtî re hatiye gotin ku ew ji aliyê giyan/cinên xerab ve hatine girtin. Girêdana di navbera cin û nexweşiyê de, wiha jî tê ziman: *“Ewana gelek kesên ku ji aliyê cinan ve hatibûn girtin, ji wî re (Îsa) anîn û Wî (Îsa) bi gotinekê giyanên xerab qewitandin...ku ew ji bo pêkhatina vê gotina (di Ahîda Kevin de) Pêxember Îşaya bû: ‘Wî bêtaqetiyê me bir û nexweşiyên me hilgirtin’”* (Mt. 8: 16,17). Bi vî awahî nexweşî û bêtaqetiyên însan hatine wateya ku, ew ji aliyê cin û giyanên xerab ve hatiye girtin.

Însanan digotin ku Îsa dîn e û sedem jî ewe ku cinek di nava wî de ye: *“Cinek di wî de heye û (ew) dîne”* (Jn. 10:20 ; 7:19,20 ; 8:52). Ji ber vê yekê wan bawer kir ku cin dibin sedema dîwanetiyê. ‘Kesên ku ji aliyê cinan ve dihatin girtin’ dema ku sax dibûn, dihat gotin ku ew li ‘hişê’ xwe vegehiyane (aqilê wan hatiye serê wan), (Mk. 5:15 ; Lk. 8:35). Ev dixwaze bibêje, ku yek ji aliyê ‘cinan’ ve hatibe girtin, ne li ser hişê xwe ye, û (aqilê wan ne li serê wan e).

Kesên ku ‘ji aliyê cinan ve hatine girtin’ têne ‘saxkirin’ an jî ‘dermankirin’ (Mt. 4:24 ; 12:22 ; 17:18) Wateya vê jî ewe ku yekî bi cin, yekî nexweş e.

MIJAR 6 : PIRS

1. Di encam de kî berpirsyarê derd û pirsgirêkên me ye?
 - a) Yezdan
 - b) Şens
 - c) Hebûneke gunehkar, bi navê şeytan
 - d) Hebûnên gunehkar yên ku ji wan re dibêjin cin.

2. Çi berpirsyarê gunehkariya me ye?
 - a) Cewherê me bixwe
 - b) Yezdan
 - c) Giyanên xerab
 - d) Hebûneke gunehkar bi navê iblîs

3. Şeytan, tê çi wateyê?
 - a) Guneh
 - b) Mar
 - c) Derewîn
 - d) Lusîfer

4. Iblîs tê çi wateyê?
 - a) Yekî gunehkar
 - b) Heywanek
 - c) Neyarek
 - d) Melîkê cinan

5. 'Iblîs' û 'Şeytan' bi awayê mecazî çi îfade dikin?
 - a) Guneh û ji rê derxistinê
 - b) Hêzên şeytanî
 - c) Ejderha

6. Bi wateya ku di Ahîda Nû de hatiye ziman, divê em ji gotina 'cin' çi fêhm bikin?
 - a) Melaîketên gunehkar
 - b) Nexweşî
 - c) Di nava gel de awayê bi lêvkirina nexweşiyên ku cin mîna sedemên wan tene dîtî
 - d) Hebûnên giyanî

7.1 DI DERBARÊ ÎSA DE, KEHANETÊN AHÎDA KEVIN

Mijar 3 da xuya kirin ku pîlana Yezdan ya di derbarê rizgarkirina mirovan de, li derdora Mesîh Îsa digere. Di sozên ji bo Hewwa, Ibrahîm û Dawid de, behsa Îsa weke yekî ku ji nijada wan be hat kirin. Birastî jî tevayê Ahîda kevin destnîşaniya Îsa û kehanetên di derbarê wî de dike. Şerîeta Musa ya ku berî Îsa, Îsraîlî mecbûrî perestiya wê bûn jî, destnîşaniya Îsa dike: *“Şerîet bû perwerdeya ku me bigihîne Mesîh” (Gal. 3:24). Ji ber vê yekê pêwîst bû di cejna Fisihê de bexek bibe qurban (Ex. 12: 3-6). Ev dihat wateya temsîlkirina qurbanbûna Îsa: “Bexê Yezdan yê ku gunehê dinyayê ji holê radike” (Jn. 1:29 ; 1 Cor. 5:7). Ji bo qurbanîna heywanan rewşeke bê qisur pêwîste û ev bi rêkûpêkiya kesayeta Îsa tîne ziman (Ex. 12:5 krş. 1 Pet. 1: 19).*

Di pirtûka Îlahîyan û di pêxemberên Ahîda kevin de, li ser kesaniya Îsa kehanetên bê jimar hene. Ev kehanet bi taybetî li ser awayê mirina wî radiwestin. Ola Cihûyan, napejirînin ku wan girîngî nedaye van kehanetan û ev yek bûye sedema mirina Mesîh. Emê niha çend kehanetan ji wan pêşkêş bikin:

Kehaneta Ahîda Kevin	Pêkhatina di Mesîh de
<i>“Yezdanê min, Yezdanê min, te çima ez bi tenê hiştim?” (Ps. 22:1)</i>	Evana gotinên rastîn yên Îsa ne, di çarmîxê de (Mt. 27:46).
<i>“Ez im yê ku gel wî biçûk dibîne. Yên ku min dibînin tev tinaziyên xwe bi min dîkin û dikenin: Vê dibêjin û serê xwe dihejin, ‘Wî baweriya xwe bi Mîrzayê me Yezdan anî ku wî xelas bike; de bera wî xelas ke” (Ps. 22:6-8).</i>	Îsraîl Îsa biçûk dît û tinaziyên xwe pê kir (Lk. 23:35 ; 8:53). Wana serê xwe dihejandin (Mt. 27:39), û dema ku ew di çarmîxê de dihate daleqandin digotin ‘de bera Yezdan wî xelas bike’ (Mt. 27:43).
<i>“Zimanê min bi çenga min ve zeliqî...Dest û lingên min qul kirin” (Ps. 22:15,16)</i>	Ev, di dema tîbûna Mesîh ya di çarmîxê de çêbû (Jn. 19:28). Qulkirina dest û lingan, awayê fizîkî yê vedana di çarmîxê de tîne ziman.
<i>“Kincên min di nava xwe de par vekirin. Ji bo kincên min yên binî pişkê davêjin” (Ps. 22:18).</i>	Pêkhatina vê yekê di Mt. 27:35 de ye.

<i>“Ezê navê te ji birayên xwe re îlan bikim” (Ps. 22:22).</i>	Di Heb. 2:12 de, bi awayê ku li Îsa were, têbinî jê hatiye girtin.
<i>“Ez di nava birayên xwe de biyanî me; û di nava zarokên diya xwe de ecnebî me ji ber ku keda mala te ez tune kirim” (Ps. 69:8,9).</i>	Ev, hestên Îsa yên biyanîbûna ji birayên wî û malbata wî ya Cihû re destnîşan dike (Jn. 7:3-5 ; Mt. 12:47-49). Di Jn. 2:17 de jî têbinî ji ayeta jorîn hatiye girtin.
<i>“Li şûna xwarinê zirav dane min, û ji bo ez di fibûnê de vexwim, sîrke dane min” (Ps. 69:21).</i>	Ev tişt dema ku Mesîh di çarmîxê de bû çêbûn (Mt. 27:34).
Beşê 53. yê Îşaya, bi temamî li ser mirin û zindîbûna Îsa ye ku, di her ayeteke wê de pêk hatineke eşkere heye. Wê li vir bi tenê du mînak werin dayîn:	
<i>“Wekî mihekê ku li ber hevrîngerê xwe bê ziman be, wî devê xwe venekir” (Is. 53:7).</i>	“Îsa, berxê Yezdan, di dadkirina xwe de bédeng ma (Mt. 27: 12,14).
<i>“Wî gora xwe li gel xeraban çêkir, û di mirina xwe de li gel mirovê dewlemend bû” (Is. 53:9).</i>	Îsa li gel tawanbarên xerab di çarmîxê de hat vedan (Mt. 27:28) ; lê di gora yekî dewlemend de hat binaxkirin (Mt. 27:57-60).

Weke mucîzeyeke biçûke ku Ahîda Nû, tîne bîra me ku şerîet û pêxemberên Ahîda Kevin bûne bingeh ji bo têtîhîştina me ya Mesîhiyê. (Acts 26:22 ; 28:23 ; Rom. 1:2,3 ; 16: 25,26). Îsa bixwe bala me kişandiye ser rastiya ku heger em Musa û pêxemberên din baş fêm nekin, emê Wî jî (Îsa) fêm nekin (Lk. 16:31 ; Jn. 5:46,47).

Madem ku şerîeta Musa behsa Mesîh dike, û pêxember di derbarê wî de kehanetan tînin ziman, wê demê Îsa berî zayîna xwe bi awayekî fizîkî ne li holê bû. Heger mirov bawer bike ku ew berî zayîna xwe hebû, tê wateya ku mirov sozên ji bo Hewa, Ibrahîm û Dawid bê mane dike ku di wan de tê gotin ku ew ji nijada wan bixwe ye. Heger ew di dema wan sozan de, li bihûştê amade bûya, wê Yezdan şaş bikra dema ku soza neviyekî ku bibe Mesîh bida wan. Di Mt. 1 û Lk. 3 de, behsa nijada Îsa ya ku dirêjî demên kevin dibe û digihîje kesên ku Yezdan soz ji wan re dane, dike.

Di derbarê Mesîh de sozek ji bo Dawid hatiye dayîn û wê di wê sozê de behsa hebûna Îsa nabe: *“Ezê nijada te ya ku ji roviyên te derkeve, piştî te ava bikim...Ezê bibim bavê wî û ewê bibe kurê min” (2 Sam. 7:12,14).* Bala xwe bidinê ku ev soz ji bo pêşerojê ye. Jixwe dema ku em bidin ber çavê xwe ku wê Yezdan bibe bavê Mesîh, wê demê ne gengaze ku ew di dema dayîna vê sozê de amade be û hebe. Hevoka ku dibêje wê ev nijad *“ji roviyên te derkeve der”* dide nîşandan ku ew bi awayekî bedenî neviyê Dawid e.

“Mîrzayê me Yezdan, li ser rastiyê ji Dawid re sund xwar...Ezê wî bi bedena wî ve li ser textê te bidim runiştandin” (Ps. 132:11).

Silêman pêkhatina sozê bû. Lê belê di dema dayîna wê sozê de jixwe ew hebû (2 Sam. 5:14), ji ber vê yekê soza ji bo Dawid ya ku ewê bibe xwediyê nijada kurê Yezdan, di derbarê Mesîh bixwe de ye (Lk. 1: 31-33). *“ezê sirguneke nijadê ber bi Dawid ve mezin bikim (Jer. 23:5)- ango, Mesîh.*

Ev hevokên ku raweyên pêşker di wan de hatine bikar anîn, di kehanetên din de jî hatine bikar anîn. Di Dt. 18:18 de wiha tê gotin *“Ezê pêxemberekî mîna te (Musa) derxînim (ji Îsrailê re). Behsa vê yekê di (Acts 3:22,23) de tê kirin û ew ‘pêxember’ weke Îsa tê diyar kirin. “Wê yeke bakîre avis bibe û kurekî bîne dinyayê û wê navê wî bike ‘Îmanuel’ (Yezdan bi mere)” (Is. 7:14). Ev yek di zayîna Mesîh de pêk hat (Mt. 1:23).*

7.2 BÛYÎNA JI BAKÎRÊ

Ducanbûna bi Îsa, û nivîsên li ser zayîna wê didin nîşandan ku ew berê tune bûye. Yên ku baweriya wan bi zanîna ‘Teslîsê’ (sêyîtyê) heye dibêjin ku, demekê li bihûştê sê kes hebûn, ji nişkê ve yek ji wan wenda bû û bi awayekî di malzaroka Meryem de meya. Em di nivîsên pîroz de dibînin ku tevayê hebûnên fizîkî, tevî Yezdan xwediyê bedenekê ne. Ji ber vê yekê em nikarin bipejirînin ku Mesîh ji bihûştê hatibe û di malzaroka Meryemê de cih girtibe. Tevayê vê teolojîya tevlihev, li derveyî nivîsên pîroz e. Nivîsên li ser nijada Mesîh cih nadin ramanên wiha ku bibêjin ew weke hebûneke bedenî ji bihûştê hatiye û ketiye malzaroka Meryem.

Nebûna delîlan, di zanîna teslîsê de wendabûneke mezin e.

Cebraîlê Melaîket bi vê bangê derket pêşiya Meryem: *“Tê di amlzaroka xwe de avis bibe, wê kurek ji te re çêbibe, tê navê wî bike Îsa. Wê ew mezin bibe û wê ji wî re bibêjin, kurê yê herî mezin... Meryemê ji melaîket re got: ‘ez tu zilaman nasnakim, wê ew çawa çêbibe? (ango ew bakîre bû). Û melaîket wiha bersiva wê da, ‘ wê giyanê pîroz were ser te û wê hêza yê mezin siya xwe ber de ser te: ji ber vê yekê wê ji kurê te re bibêjin Kurê Yezdan” (Lk. 1: 31-35).*

Du caran dubare dibe ku ewê kurê Yezdan be. Kurê Yezdan berî zayîna wî tune bû. Dîsa bala xwe bidin raweyên pêşker –mînak: *“ewê mezin bibe”.* Dema ku melaîket ev gotin ji Meryemê re gotin, heger Îsa hebûya ewê jixwe mezinbûya. *Îsa ji zurîyeta Dawid e (Rev. 22:16). Bi yunanî ‘genos’ (afirandin) tê wateya ku Îsa ji Dawid afiriye.*

DUCANBÛNA BI ÎSA

Di encama bandora giyanê pîroz de, (hilm û hêza Yezdan) Meryem bê zilam û têkiliyeke cinsî bi Îsa avis bû. Ji ber vê yekê Yusiv ne bavê Îsa yê rastîn bû. Di vê were fêmkirin ku Giyanê Pîroz ne kesayeteke (li Mijar 2 binere). Îsa ne ku rê Giyanê Pîroz, lê yê Yezdan bû. Yezdan Giyanê Pîroz li ser Meryem bikar anî û *“bi vê sedemê ew tiştê pîroz yê ku ji wê re çêbû, weke Kurê Yezdan hate binav kirin”* (Lk. 1:35). Gotina ‘bi vê sedemê’ dide nîşandan ku heger Giyanê Pîroz bandora xwe li malzaroka Meryem nekira, Îsa, Kurê Yezdan nikarîbû çêbibe.

Ducanbûna Meryem ya bi Îsa (Lk. 1:31) dide nîşandan ku ew berî wê dîrokê ne li dinyayê bû û neafirî bû. Heger em bi ramanekê avis bibin, ew di nava me de dest pê dike. Bi heman şeweyê Meryem jî bi Îsa ducan bû û ew weke tevayê însanan di malzaroka wê de mezin bû. Ayeta Incîlê ya herî bi navûdeng Jn. 3:16 dibêje ku Îsa *“kurê bi tenha yê Yezdan e”*. Bi milyonan kesan ev ayet ji ber kirine, lê di têgihîştina wê de zeif mane. Heger ji bo Îsa ‘bûbin bav’, ew di dema ducanbûna Meryemê de dest pê bûye (bi ingilîzî destpêkirin-begîn- û bûyîna bav –beget- girêdayî hev in).

Heger Yezdan bûbe bavê Îsa, ev tê wateya ku bavê wî ji wî bi tementir e. Destpêka Yezdan nîne (Ps. 90:2) û ji ber vê yekê Îsa nikare bibe Yezdan (ev pirs di Mijar 8 de bi berferêhî tê şîrovekirin).

Tiştêkî watedare ku Îsa ne mîna Adem hatiye afirandin, lê belê Yezdan bûye bavê wî. Ev yek diyar dike ku girêdaneke bi hêz di navbera Yezdan û Îsa de heye- *“Yezdan, li gel Mesîh dinya bi xwe re li hev anî”* (2 Cor. 5:19). Li şûna ku ji axê biafire, Mesîh bi bavîtiya Yezdan hatiye dinyayê û ev yek alîkariya wî di aliyê çêbûna taybetmendiyên xûristî de jî dike.

Is. 49:5,6 di derbarê Mesîh de, dibêje ku ew ronahiya dinyayê ye û kehanetekê destnîşan dike ku Îsa ew pêk aniye (Jn. 8:12). Ew bi awayê ku ramaneke wiha bike tê danasîn: *“Mîrzayê me Yezdan, ez ji yê di malzarokê de, ji bo bûyîna ebdekî xwe afirandim”*. Bi vî awahî Îsa ji aliyê Yezdan ve, di malzaroka Meryem de, bi riya hêza Giyanê Pîroz hat afirandin. Malzaroka Meryem, jêderka Mesîh ya bedenî ye.

Me di Mijar 7.1, Ps. 22 de dît ku li ser ramanên Mesîh yên di çarmîxê de pir tişt têne ziman. Ew vê dibêje: *“Yezdan ez ji malzarokê derxistim...Ji roja ku ez di malzarokê de peyda bûme, ez dame te: Ji zikê dayika min ve tu Yezdanê min î”* (Ps. 22:9,10). Di dema mirina xwe de Mesîh li jêderkên xwe –bi hêza Yezdan çêbûna xwe ya di malzaroka Meryem de- temaşe kir. Di mizgînan de Meryem weke dayika Mesîh tê danasîn, û ev yek ramana ku Îsa berî zayîna xwe jî hebû vala derdixîne.

Meryem miroveke xwedî dê û bavên însan bû. Ev yek bi vê rastiye jî tê ziman ku hemmalbatiyeke wê Yehyayê vaffîzvan aniye dinyayê (Lk. 1:36). Li gora ramana Katolîk ya Romayê, ji ber ku Meryem ne xwediyê taybetmendiyên mirovên normal e, Îsa jî nikare bi carekê de hem bibe

‘benîadem’ û hem jî bibe ‘kurê Yezdan’. Ev navana di seranserê Ahîda Nû de ji bo Îsa hatine bikar anîn. Ew, ji dayikeke însan hatiye dinyayê û ji ber vê yekê ‘benîadem e’, û ji ber ku bi hêza Giyanê Yezdan yê Pîroz di malzaroka Meryem de meyaye ew ‘kurê Yezdane’ (Lk. 1:35). Heger Meryem ne miroveke ji rêzê bûya, wê ev şroveya xweşik bê wate bimaya.

“Kî dikare ji tiştêkî bi gemar, tiştêkî pak bi dest xwe ve bîne? Tu kes nikare...ma însan çi ye heta ku pak be. Û tiştê ku jinek tîne dinyayê çi ye ku rast be? ...Tiştê ku ji jinekê çêbibe wê çawa pak be?” (Job 14:4 ; 15:14 ; 25:4). Ev yek delîle ku ne Meryem û ne jî Îsa ne mirovên pîr û pak in.

Meryema ku xwediyê dê û bavekî însan bû û ‘ji jinekê hatibû dinyayê’ xwediyê cewherê me yê ne pak bû. Û ev yek derbasî Îsa jî kir ku ew jî ‘ji jinekê çêbû’ (Gal. 4:4). Çêbûna wî ya ji Meryem, delîle ku ew bêyî wê nikarîbû biafire û berî wê nikarîbû li dinyayê be. Diagglot Gal. 4:4 bi vî awahî werdigerîne: *“Yê ku ji aliyê jinekê ve hatiye afirandin”*.

Nivîsên mizgînê gelek caran behsa miroviya Meryem dikin. Îsa, bi sedema kêmbûna têgihîştina giyanî, sê caran bala Meryemê kişand û dilê wê hişt (Lk. 2:49 ; Jn. 2:4). Wê her tişt; ku Îsa digot fêhm nedikir (Lk. 2:50). Mirov dikare vê yekê bipejirîne ku bixwe însan e, kurê wê kurê Yezdan e, û her çiqasî kur jî xwediyê cewherê însan be di aliyê giyanî de ji wê têgihîştîr e. Piştî çêbûna Mesîh, Yusiv bi Meryemê re kete têkiliya cinsî (Mt. 1:25). Û piştî wê demê êdî sedemek tune bû ku însan bibêjin ew ne xwediyê têkiliyeke malbatî ne û ne zewicîne.

Di Mt. 12:46,47 de behsa ‘xwişk û bira û dayika’ Mesîh tê kirin. Ev jî delîle ku piştî Îsa Meryemê hinek zarokên din jî anîne dinyayê.

Îsa ‘zarokê wê yê yekemîn’ bû. Zanistiya Katolîk dibêje ku Meryem her û her bakîre maye û derketiye asîman, lê belê ev raman, ji piştgiriya Încîlê bê par e. Weke her însanî Meryem jî pîr bû û mir. Her wiha em di Jn 3:13 de vê dixwînin: *“(ji xeynî Îsa) Tu însan derneketiye asîman”*. Ev rastiyeke ku Îsa xwediyê cewherê însanan bû (Binere: li Heb. 2:14-18 ; Rom. 8:3). Ev tê wateya ku dayika wî jî xwediyê wî cewherî bû, lê bavê wî na.

7.3 DI PÎLANA YEZDAN DE CIHÊ MESÎH

Yezdan di derbarê pîlanên xwe de ji nişkê ve biryaran nade. Li gora pêşveçûna dîroka mirovahiyê, pîlanên wî zêde dibin. Yezdan, ji destpêka afirînê ve pîlaneke bê kêmanî çêkiribû (Jn. 1:1). Ji berê ve di pîlana wî de hebû ku bibe xwediyê kurekî. Piraniya Ahîda kevin li ser pîlana Yezdan ya di derbarê Mesîh de ye ku ew dixwaze bi riya wî însaniyetê rizgar bike.

Me gelek caran anî ziman ku Ahîda kevin bi riya sozan, bi riya kehanetên Pêxemberan û şerîeta Musa pîlana Yezdan ya di derbarê mesîh de diyar dike. Bi sedema teqdîra Yezdan e ku; Ew bû xwediyê kurekî û bi riya wî gerdûn afirand (Heb. 1:1,2 di metna Yunanî A.V. de gotina 'bi riya wî' weke 'bi sedema wî' baştir tê wergerandin). Bi sedema Mesîh e ku sedsalên dîroka mirovahiyê, ji aliyê Yezdan ve hatin çêkirin (Heb. 1:2 bi Yunanî). Di encama vê yekê de, weke ku di Ahîda Kevin de jî hatiye gotin, Îlhama ku heta niha ji bo însan hatiye daxistin, tijî raveyên di derbarê Mesîh de ye.

Ji bo me ne hêsane em mezinayî û girîngiya Mesîh ya li gel Yezdan fêhm bikin. Ji ber vê yekê, her çiqasî ku Îsa bi riya Meryem û ji wê hatibe dinyayê jî, di cih de ye ku em bibêjin, hatina wî ji berê ve di mêjî û pîlana Yezdan de hebû. Heb. 1:4-7 ; 13,14 dide zanîn ku Mesîh ne melaîket e. Mesîh di jiyana xwe ya bi mirin de, xwediyê radeyeke kêrnî ya melaîketan bû (Heb. 2:7), lê belê dema em bidin ber çavê xwe ku ew 'kurê bi tenha yê Yezdan bû' (Jn. 3:16) emê bibînin ku şanaziya wî ji ya wan bilindtir e. Me berî niha jî dabû xuyakirin ku li gora agahdariya Nivîsên Pîroz, însan encex bi awayekî bedenî hebe. Ji ber vê yekê Mesîh, berî zayîna xwe ne bi rengê însan û ne jî weke giyanekî tune bû. 1 Pet. 1:20 di vê derbarê de dibêje: *"Ew (Mesîh) berî avakirina dinyayê pêwîst hat dîtin (hat hilbijartin), lê belê di van sedsalên dawîn de derket holê"*.

"Yezdan di Nivîsên Pîroz de bi riya pêxemberên xwe sozên xwe yên di derbarê kurê xwe de dan û diyar kir ku ewê bi bedena xwe ji nijada Dawid be (bi bavîtiya Yezdan hatiye afirandin), û wê bi riya giyanê pîrozîyê û zindîbûna xwe ya ji mirinê weke Kurê Yezdan were îlankirin. Ew Îsa Mesîh, Mîrzayê me", (Rom. 1:1-4).

Ev paşeroja Mesîh diyar dike:

1. Di Ahîda Kevin, ango di pîlana Yezdan de soza hatina wî heye;
2. Wekî mirovekî ji nijada Dawid, bi riya zayîna ji bakîreyekê, mîna kesayeteke bedenî hatiye afirandin.
3. Ji ber ku di dema mirina wî de, kesayeta wî ya bi rêkûpêk hate dîtin (giyanê pîrozîyê),
4. Ew zindî bû, û careke din bi riya belavokên hewariyên bi xelata-giyan, weke kurê Yezdan hat îlankirin.

ZANÎNA YEZDAN YA JI BERÊ VE

Heger em li hev bikin ku Yezdan her tiştê ku wê di pêşerojê de bibe dizane, wê demê emê bizanibin ku berî çêbûna wî ya bi awayekî bedenî jî mêjiyê Yezdan li ser Mesîh dagirtî bû. Ew (Yezdan) her tiştî bê kêmanî ji berê ve dizane. Ji ber vê yekê, di derbarê tiştên nebûyî de, Yezdan dikare

weke ku hebin bifikire û biaxife. Zanebûna wî ya li ser pêşerojê pir e. Yezdan, “gazî tiştê tune dike, weke ku hebe” (Rom. 4:17). Bi vî awahî ew dikare ragihîne bibêje: “ezê dawiyê ji destpêkê ve, tiştên nebûyî, ji dema kevin ve bibêjim, wê şîreta min bimîne û ezê bigihêmir miradê xwe” (Is. 46:10). Ji ber vê yekê Yezdan dikare bi miriyan re biaxife weke ku zindî bin, û dikare bi însanan re berî zayîna wan biaxife weke ku zindî bin.

‘Şîretê’ ango gotina Yezdan ji berê ve xebera hatina Mesîh dabû. Ew her demê di nava pîlana Yezdan de bû. Ji ber vê yekê Mesîh di demekê de hatiye dinyayê. Yezdan pîlana xwe ya ji bo Mesîh pêk anî. Bi vî awahî zanîna Yezdan ya pêşerojê di pêkanîna vê yekê de eşkere bû. Zimanê Ibrani yê ku di Incîlê de hatiye bikaranîn, di diyarkirina sozên Yezdan yên ji bo pêşerojê de, raweya “dema borî ya girêdayî pêşerojê bikar tîne. Bi vî awahî Dawid got ku: “Ev mala Mîrzayê me Yezdan e” (1 Chron. 22:1), ku wê demê hîna perestgeh (tune bû) bi tenê Yezdan soza wê da bû. Baweriya Dawid bi sozên Yezdan hewqasî zêde bû ku, ji bo danasîna bûyerên pêşerojê, raweya dema niha bikar anî. Nivîsên Pîroz tijî mînakên zanîna Yezdan ya di derbarê pêşerojê de ne. Yezdan pir bawer bû ku wê sozên wî yên ji bo Ibrahîm pêk werin, û ji ber vê yekê dema ku hîna yek zarokê Ibrahîm jî tune bû, ji wî re got ku: “Ez vî diyarî didim nijada te...” (Gen. 15:18). Di dema berî zayîna (Ishak/Mesîh) de, ku ew jî ji nijadê bû, Yezdan wiha got:

“Min tu kirî bavê gelek neteweyan” (Gen. 17:5). Di rastiye Yezdan “behsa van tiştên nebûyî, weke ku bûbin dike”.

Ji ber vê yekê Mesîh di dema wa’îziya xwe de, her çiqasî wê demê tişteki wiha nebûbe jî dibêje ku Yezdan “her tişt daye destê wî (Mesîh)” (Jn. 3:35). “Te her tişt xist bin lingên wî (Mesîh) û te bi (Wî) ve girêda... Lê belê em hîna jî nabînin ku her tişt girêdayî wî ye” (Heb. 2:8).

“Ji destpêka dinyayê ve, bi devê pêxemberên xwe yên pîroz” û bi riya Îsa, Yezdan di derbarê pîlana xwe ya rizgariyê de axifî (Lk. 1:70). Ewana bi pîlanên Yezdan re di nava girêdaneke mezin de bûn. Ji ber vê yekê ev zilamana, weke ku ji destpêkê ve hebin têne axaftindan. Em dikarin bibêjin ku pêxember jî ji destpêkê ve di nava pîlana Yezdan bûn. Yeremya mînakeke başe ji bo vê yekê. Yezdan ji wî re ev got: “Berî ku ez di zikê dayikê de şikil bidim te, min tu naskirî; û berî ku tu ji malzaroka dayikê derkevi, min tu pîroz kirî û tu bûyî pêxember” Jer. 1:5. Bi vî awahî Yezdan her tiştê di derbarê Yeremya de berî zayîna wî jî dizanîbû. Bi heman şeweyê Yezdan di derbarê Melîkê Farisan Sîrus de jî berî zayîna wî, weke ku wê demê hebe axifiye (Is. 45:1-5). Mînakeke din ya axaftinên di derbarê kesên nebûyî de, weke ku hebin di, Heb. 7:9,10 de ye.

Yeremya û pêxemberên din, di pîlana Yezdan de xwedî wezîfe bûn, ji ber vê yekê Yezdan berî zayîna wan weke ku hebin bi wan re axifiye. Bi heman şeweyê bi bawermendan re jî (berî zayîna wan) weke ku hebin tê

axaftin. Wê demê diyare ku em derveyî bîra Yezdan, tune ne. Yezdan, “Berî destpêka dinyayê, armanca xwe bi riya Mesîh Îsa gihande me, em rizgar kirin, û bi bangeke pîroz gazî me kir... (2 Tim. 1:9). Yezdan, “li gora daxwaza xwe... em ji berê ve diyar kirin... û berî avabûna dinyayê em di Mesîh de hîlbijartin...” (Eph. 1: 4,5). Dema ku Yezdan ji destpêka her tiştî ve kesayetan nas dîke û wan ji bo rizgariyê hildibijêre, tê wateya ku ew ji destpêkê ve di hişê Yezdan de ne (Rom. 8:27 ; 9:23).

Di ronahiya van daxuyaniyan de, niha ne ecêbe ku Yezdan berî zayîna wî bi Îsa re weke ku hebe axifî be. Ew, “ji avabûna dinyayê ve, berxekî qetilkirî bû” (Rev. 13:8). Wê demê birastî jî Îsa nemir; ew ‘berxê Yezdan bû’ yê ku piştî 4000 sal di çarmixê de hat qurbankirin (Jn. 1:29 ; 1 Cor. 5:7). Çawa ku Îsa ji destpêkê ve hatibe hîlbijartin (1 Pet. 1:20), bawermend jî bi heman şeweyê hatine hîlbijartin (Eph. 1:4) (Di van ayetan de, bi wateya ‘hîlbijartî’ heman gotina Yunanî tê bikaranîn).

Ji bo me zehmete ku em van tiştan tevan fêmkirin. Ji ber ku em nikarin di xeyala xwe de zindî bikin ku Yezdan li derveyî wextê diyar jî kar dîke. ‘Bawerî’ ewe ku mirov bikaribe bi çavên Yezdan, li derveyî çerçoveya wext jî li bûyeran binere.

7.4 “DESTPÊKÊ SOZ HEBÛ”

(Jn. 1:1-3)

“Destpêkê soz hebû; Soz jî li gel Yezdan bû û Soz Yezdan bixwe bû. Heman tişt destpêkê li gel Yezdan bû. Tevayê tiştan bi riya wî hatin afirandin” (Jn. 1:1-3).

Heger ev ayetana baş werin fêmkirin, wê encamên beşa derbasbûyî xurt û berferêh bikin. Çewtiyeke mezine ku mirov bibêje Îsa berî zayîna xwe li bihûştê bû. Têgihîştina van ayetan girêdayî têgihîştina ‘Soz’ê ye. Ev rasterast kesayetekê nayne ziman. Ji ber ku yek kes nikare di heman demê de ‘bi yezdan re’ be û ‘Yezdan be’. Gotina Yunanî ‘logos’ ya ku weke ‘Soz’ tê wergerandin, bixwe nayê wateya ‘Îsa’. Ew bi giştî weke ‘Soz’ tê wergerandin, lê dikare were van wateyan jî:

Beyan, Jêderk ; Ragihandin ; Doktrîn ; Mebest
Daxuyani (wa'z) ; Sedem ; Metelok ; Nûçe.

'Soz' bi tenê nêr e, ji ber ku 'logos' di zimanê Yunani de nêr e. Dîsa jî ev nayê wateya ku ew zilamekî tîne ziman, û behsa Îsa dike. Versiyona (Luther) Almanî vê gotinê weke 'das' (xwezayî) (das Wort) diyar dike. Versiyona (Segond) Frensi wê dike mê 'la' (mê) (la parole) û diyar dike. Tevayê van mînakên diyar dikin ku 'soz' (the word) kesekî nêr nayne ziman.

“DI DESTPÊKÊ DE”

'Soz' di bingeha xwe de tê wateya diyarkirina ramana hundirîn, bi riya gotin û daxuyaniyan. Di destpêkê de Yezdan xwediyê vê 'sozê' bû. Mesîh bû navenda vê pîlanê.

Me da xuyakirin ka Yezdan bi çi awahî giyan û ramanên xwe yê hundirîn derbasî çalakiyê dike û me girêdana di navbera giyanê Wî û soza wî de jî diyar kir. (Binere: Beş 2.2). Giyanê Yezdan ji destpêkê ve pîlana wî ya bi însanan re pêk tîne, û gotina wî ya nivîsandî belav dike. Her wiha, kar û xebata wî û ramanên wî yê di derbarê mesîh de jî radighîne. Mesîh, 'soz'a Yezdan bû, û ji ber vê yekê Giyanê Yezdan pîlanê wî yê di derbarê Mesîh de, di tevayê çalakiyên xwe de tîne ziman. Ev jî me re diyar dike, ka çima bûyerên Ahîda Kevin bi piranî girêdayî Mesîh in. Li gel vê yekê, baş nayê ziman ku Mesîh weke kesayetekê ne soz e. Di pîlana Yezdan ya rizgariyê de, ku wê bi riya Îsa pêk were ew (Îsa) 'soz'e. Di mizgîna li ser Mesîh de 'soz' gelek caran tê bikar anîn –wek mînak 'soza Mesîh' (Col. 3:16; krş. Mt. 13:19; Jn. 5:24; Acts 19:10; 1 Thes. 1:8 û her wiha). Bala xwe bidinê ku 'soz' li şûna kesayeta Îsa, bi piranî jî bo Mesîh (rizgarkar) tê bikar anîn. Dema ku Mesîh çêbû, ew 'soz' bû xwîn û goşt – “Soz, bû (beden)însan” (Jn. 1:14). *Îsa bixwe 'soza însan (beden) bû'; ew bi riya çêbûna ji Meryem, bi kesani bû 'soz'.*

Pîlan an jî daxuyaniya di derbarê Mesîh de, berî her tiştî bi Yezdan re bû. Lê belê ev rastî di kesayeta Mesîh de, û di daxuyaniyên Mizgînê yê di derbarê wî de hat ziman. Bi vî awahî Yezdan soza xwe bi riya Mesîh jî me re got (Heb. 1:1,2). Divê careke din were gotin ku Mesîh gotinên Yezdan anîn ziman; û jî bo ku Yezdan bi me bide naskirin, mucîze çêkirin (Jn. 2:22 ; 3:34 ; 7:16 ; 10:32,38 ; 14:10,24).

Mesîh ferman da ku mizgîna di derbarê wî de ji bo 'tevayê neteweyan' were ragihandin, û Pavlus ev ferman bi cîh anî: “Belavoka di derbarê Mesîh Îsa de, bi tenê niha derkete holê...ji bo tevayê neteweyan hat ragihandin” (Rom. 16: 25,26) krş. 1 Cor. 2:7). Ji bo însan, jiyaneke bê dawî, di encama xebata Mesîh de çêbû (Jn. 3:16; 6:35). Yezdan ji destpêkê ve, xwediyê

pîlaneke wiha bû ku bi riya wê bikaribe jiyaneke bê dawî pêşkêşî însanan bike. Diyarkirina vê yekê piştî zayîn û mirina Îsa pêk hat: *“Yezdan berî çêbûna dinyayê soz da, lê belê soza wî (jiyana bê dawî) bi riya belavokê, di zemanê munasib de hat zimân”* (Titus. 1:2,3). *Li gel van tiştan, em dibînin ku Yezdan her demê li gel pêxemberên xwe yên ku hîna ne amade bûn axîfîye* (Lk. 1:70).

Meseleyên Îsa piraniya van tiştan ji me re diyar kirin. Bi vî awahî wî kehaneta di derbarê xwe de pêk anî: *“Ezê devê xwe bi meseleyan vekim; ezê tiştên ku ji destpêka dinyayê ve veşartî mane bibêjim”* (Mt. 13:35). Ev tê vê wateyê ku *“Destpêkê...soz, di dema zayîna Mesîh de, ji bo çêkirina bedenê, bi Yezdan re bû...”*

“SOZ YEZDAN BÛ”

Niha divê em li ser wateya vê gotinê bifikirin: *“Soz Yezdan bû”*. Pîlan û ramanên me, di bingeh de em bixwe ne. ‘Ez diçime Londonê’, ‘soz’êke wiha ye ku armanca min diyar dike, ji ber ku ew pîlana min e. Pîlana Yezdan ya di Mesîh de dikare wiha were fêmkirin: *“Yek di dilê xwe de bi çi awahî bifikire, wiha ye”* (Prov. 23:7); û Yezdan bi çi awahî bifikire, wiha ye. Bi vî awahî soz û ramana Yezdan, ew bixwe ye: *“soz Yezdan bû”*. Ji ber vê yekê di navbera Yezdan û soza wî de girêdaneke mezin heye. Girêdanên weke ya di Ps. 29:8 de pir in: *“Dengê Mîrzayê me Yezdan, çolê dihejîne, Mîrzayê me Yezdan, çolê dihejîne”*. Di nava pêxemberan de, gotinên mîna vê pir tene gotin: *“Yezdan dibêje ku, ‘we li min guhdarî nekir’”* (Jer. 25:7). Di rastiyê de Yezdan dixwaze vê bibêje: *“We guh neda soza min ya ku ji aliyê pêxemberan ve hat gotin”*. Dawid, soza Yezdan mîna lembe û ronahiya xwe dît (Ps. 119:105); û wiha anî zimân: *“Tu lembeya min î, Ey Mîrzayê me Yezdan: û wê Mîrzayê me Yezdan tarîtiya min ron bike”* (2 Sam. 22:29). Evana girêdana di navbera Yezdan û soza wî de didin xuyakirin. Bi vê sedemê, niha diyare ka ji bo çi soza Yezdan tê bi kesayetkirin, û her çiqasî ne wiha be jî behsa wê weke ku kesek be tê kirin (Li Gotina Navbend 5, li ‘zagona kesayetkirin’ê binere).

Yezdan bixwe rastî ye (Jn. 3:33; 8:26; 1 Jn. 5:10); û ji ber vê yekê soza Yezdan jî rastî ye (Jn. 17:17). Bi heman şeweyê Îsa jî xwe bi sozên xwe tîne zimân û soza xwe dike kesayet: *“Yek heye ku wê kesê ku min nepejirîne û guh nede gotinên min, mehkembike: yê ku wî mehkeme bike gotina min bixwe ye”* (Jn. 12:48). Îsa weke xwe behsa gotin û soza xwe dike. Gotin û sozên wî kesayeta wî bûn, ji ber ku ew girêdayî Îsa bûn.

Bi vî awahî di Jn. 1: 1-3 de, gotina Yezdan weke ku Yezdan bixwe be, tê zimân. Em dikarin li ser sozê vê yekê bibêjin: *“Her tişt bi riya wî hat afirandin”* (Jn. 1:3). Li gel vê yekê Yezdan her tişt, *“bi riya fermana gotinê*

afirand” (Gen. 1:1). Ji ber vê yekê soza Yezdan, weke ku Yezdan bixwe be hat ziman.

Li vir tiştê balkêş ewe ku Yezdan, bi riya soza xwe ya di dilê me de pir nêzîkî me dibe.

Di Gen.1 de tê dîtin ku Yezdan ne bi riya Îsa, lê belê bi riya gotina xwe diafirîne. Wekî yê ku her tiştî diafirîne, ne kesayeta Mesîh, lê belê gotin derdikeve pêş (Jn. 1:1-3). *“Bi gotina Mirzayê me Yezdan, asîman hatin afirandin; û bi hilma devê wî, tevayê cisman (ango, stêrk)...wî got û pêk hat”* (Ps. 33:6,9). Niha jî bi gotina wî ye ku afirîna xuristî didome: *“Ew fermana xwe li serzemînê belav dike: gotina wî bi lez diçe. Ew berfê dide...Ew, gotina xwe dişîne...û av diherikin”* (Ps. 147: 15-18).

Wî hêza xwe ya afirêner, gotina Yezdan, ji bo bavîtiya Îsa di malzaroka Meryemê de bikar anî. Gotin, bi riya pîlana Yezdan, û Giyanî wî yê Pîroz, derbasî çalakiyê dibe (Lk. 1:35). Û bi vî awahî Meryem bi Mesîh ducan bû. Meryem nûçe wergirt ku ewê di pêşerojê de bi Îsa ducan bibe û wiha bersiv da: *“Bera weke ku tu ji min re dibêjî bibe”* (Lk. 1:38).

Me dît ku Soz/Giyan’ê Yezdan pîlana wî dide nîşandan ku bixwe di seranserî Ahîda Kevin de hatiye ziman. Rastiya vê yekê di Acts 13:27 de ye ku li wir Îsa li gel pêxemberên Ahîda Kevin tê axaftin: *“(Cihuyan) ew nasnekirin; lê ne gotinên ku pêxemberan digotin”*. Dema ku Îsa hate dinyayê tevayê Soz/Giyan’ê Yezdan di kesayeta Îsa Mesîh de hat ziman. Hewarî Yuhanna yek ji murîdên Îsa bû, ji wa yên ku destê xwe dane bedena wî û ew dîtine. Yuhanna pir kêfxweş bû ku pîlana Yezdan di kesayeta Îsa de derbasî jiyaneke bû. Wê demê pê hisiya ku ew, ji aliyê gotina Yezdan û pîlana rizgariyê ya li gel Mesîh ve tê birêvebirin (1 Jn. 1:1-3). Herçiqasî em nikarin Mesîh bibînin jî, em dikarin xwe bi nêzîkbûn û têgihîştina wî kêfxweş bikin. Bi riya wî em dikarin pîlana Yezdan ya di derbarê xwe de ji nêzîk ve bibînin û xwe bigihînin jiyaneke pîroz (1 Pet. 1:8,9). Divê em vê pirsê ji xwe bikin: *“Gelo birastî ez Mesîh dinasim?”*. Ne bese ku em bipejirînin, ku di wextekî de mirovekî baş bi navê Îsa hebû. Ev yek bi riya xebata Incîlê ya perestkar, û têgihîştina ku ew rizgarkarê me bû gengaze. Her wiha lazime em bi riya vaftîzmê xwe nêzîkî wî bikin.

MIJAR 7 : PIRS

1. Îsa berî zayîna xwe, mîna kesayetekê hebû an na?

- a) Belê
- b) Na

2. Bi çi wateyê tê gotin ku Îsa berî zayîna xwe hebû?

- a) Mîna melaîketekî
- b) Mîna perçeyekî sêyîtiyê (teslîs)
- c) Mîna giyanekî
- d) Bi tenê di hiş û pîlana Yezdan de

3. Kîjan daxuyaniya di derbarê Meryem de rast e?

- a) Ew, jineke bê guneh û bi rêkûpêk bû
- b) Ew jineke ji rêzê bû
- c) Ew bi riya Giyanê Pîroz bi Îsa avis bû
- d) Ew niha duayên me pêşkêşî Îsa dike

4. Ma Îsa serzemîn afirand?

- a) Belê
- b) Na

8.1 KESAYETA ÎSA : DESTPÊK

Yek ji trajediyên mezin yê ramana Xirîstiyaniyê ewe ku, Mîrzayê me Îsa Mesîh, bi sedema serkeftina xwe ya li dijî guneh, (bi temamî) negihaye rûmet û bilindayîya pêwîst. Ramana 'teslîs' ya ku pir kes pê bawerin, Îsa dike Yezdan. Dema em bidin ber çavê xwe ku Yezdan nayê xapandin (James 1:13) û qet nikare gunehan bike, wê demê tê wateya ku Îsa li dijî guneh şer nekiriye. Dema em bibêjin ku ew di tecrubeyên însanan re derbas dibû, lê belê nedikete bin bandora wan, tê wateya ku ew bê hest bû û jiyana wî ya li serzemînê jî bê wate bû.

Komikên mîna Mormoniyan û Şahidên Yehova nikarin fêhm bikin ku Îsa kurê Yezdan yê bi tenha ye. Her wiha ew nikare bibe melaîketek an jî kurê Yusif yê xuristî. Hinek dibêjin ku kesayeta Îsa mîna kesayeta Adem ya berî hatina dinyayê ye. Nerîneke wiha di Incîlê de nehatiye ziman û weke ku em dizanin, Yezdan Îsa ji bo kurîtiya xwe di malzaroka Meryemê de peyda kir, lê belê Adem ji axê afirandiyê. Bi vî awahî her çiqasî ew ne xwediyê bavekî însan be jî, Îsa mîna me hatiye dinyayê. Gelek kes napejirînin ku mirovekî mîna me, bibe xwediyê kesayeteke wiha bi rêkûpêk. Ev yek di Mesîhiyê de rê li pêşiya baweriyeke rasteqîn digre.

Ne hêsane em bawer bikin ku Îsa mîna me bû, lê belê kesayeta wî her demê li dijî guneh û xapînokan bi ser diket. Ji bo ku em Mesîhiya rasteqîn de bigihîjin îmaneke bi hêz, divê em li ser jiyana wî ya bi rêkûpêk rawestin û ji bo vê jî gelek delîl hene ku diyar dikin ew ne Yezdane. Pir hêsane em bawer bikin ku ew bixwe Yezdan e û ji ber vê yekê bi rêkûpêk e. Lê belê ev nerîn jî mezinatiya serkeftina Îsa ya li dijî guneh û cewherê însan, biçûk dike.

Ew xwediyê kesayeta însanan bû. Wî tevayê taybetmendiyên me yê gunehkar par vekirin (Heb. 4:15) û dîsa jî girêdayî riya Yezdan ma û bi alîkariya wî li dijî wan bi ser ket. Yezdan bi kêfxweşî ev mertebe pêşkêşî wî kir: *"Yezdan di mesîh de bû, ji bo ku xwe û dinyayê li hev bîne"*; *bi riya kurê xwe yê rasteqîn (2 Cor. 5:19).*

8.2 CUDABÛNÊN DI NAVBERA ÎSA Û YEZDAN DE

Di navbera van beşan de dengeyeke mezin heye ku bala însanan dikşîne ser radeya gotina 'Yezdan di Mesîh de bû'. Beşê duwemîn yê van beşan, nerîna Teslîsî ya ku Îsa mîna Yezdan dibîne û bi awayê 'Yezdanê rasteqîn yê Yezdanê rast' tîne ziman, şaş dibîne. (Gotina Yezdanê rasteqîn yê Yezdanê

rast, cara yekemîn Piştî Zayînê di 325 de, li konseya Iznîkê hat bikar anîn). Di Incîlê de gotina ‘sêyîtî’ nîne. Mijar 9 li ser serkeftina Mesîh ya li dijî guneh, û rola Yezdan ya di wê yekê de radiweste. Dema ku em dest bi vê xebatê dikin, divê em bînin bîra xwe ku xelasî girêdayî têgihîştina Îsa Mesîh e (Jn. 3:36 ; 6:53 ; 17:3). Dema ku em bi awayekî baş serkeftina wî ya li dijî guneh û mirinê fêhm bikin, êdî em dikarin ji bo parvekirina vê xelasiyê, li gel wî vaftîz bibin.

Mîna keke berbiçav, ya girêdana di navbera Yezdan û Îsa de, di 1 Tim. 2:5 de tê dîtin: “**Yek Yezdan heye û di navbera Yezdan û însanan de jî yek qasid heye: Mesîh Îsa yê insan**”. Fikara li ser gotinên ku hatine reşkirin, mirov digihîne encamên jêrîn:

- Hebûna yek Yezdanî, derfeta ku Îsa Yezdane ji holê radike. Heger bav Yezdan be û Îsa jî Yezdan be, wê demê dibin du Yezdan. “*Lê belê ji bo me bi tenê yek Yezdan heye, Bav*” (1 Cor. 8:6). *Ji ber vê yekê, ‘Yezdanê bav’ Yezdanê tenha ye. Lewre mîna ku Teslîsî dibêjin, hebûna ‘Yezdanê Law’ ne gengaze. Bi heman şêweyê di Ahîda Kevin de Yahweh Yezdanê bi tenê, mîna Bav dide nasîn (mînak, Is. 63:16 ; 64:8).*

- Li gel vî Yezdanê bi tenha, qasid heye: Îsa Mesîhê insan- ...û qasidê bi tenha...”. Gotina ‘û’ cudabûna di navbera Yezdan û Îsa de dide nîşandan.

- ‘Qasid’ nîşane ku Mesîh navbeynkareke. Qasidekî di navbera Yezdanê bê guneh û insanê gunehkar de, nikare mîna Yezdan bê guneh be. Dibe ku ew insanekî bê guneh, lê xwediyê cewherê insanê gunehkar be. Hevoka ku dibêje, “Mesîh Îsa yê insan” tevayê gumanên me yên di vê hêlê de ji holê radike. Pavlus piştî ku Îsa derketiye asîman nivîsiye lê belê dîsa jî nabêje ‘Yezdan Mesîh Îsa’.

Me gelek caran bibîr anî ku, “*Yezdan ne însaneke*” (Num. 23:19 ; Hos. 11:9). Lê dîsa jî Mesîh, weke ku di Ahîda Nû de tê gotin “*benîadem’e*”, ango “*Mesîh Îsa yê insan*” yê di vir de ye. Ew, “*Kurê yê herî berzbilind*” bû (Lk. 1:32). ‘Berzbilindiya’ Yezdan, dide nîşandan ku ew ew bi tenê xwediyê wê radeyê ye. Îsa “*Kurê yê Herî Berzbilind*” nikare Yezdan bixwe be. Awayê binavkirina Bav û Kur yê ku ji bo Yezdan û Îsa tê bikar anîn, diyar dîke ku ew ne mîna hev in. Herçiqasî kurek xwediyê hinek taybetmendiyên bavê xwe be jî, ew nikare bibe mîna wî û ne jî dikare mîna bavê xwe bi temen be.

Bi heman şêweyê, gelek cudabûn di navbera Îsa û Yezdan de hene ku diyar dikin, Îsa bixwe ne Yezdan e:

YEZDAN	ÎSA
“ <i>Yezdan nayê xapandin</i> ” (James 1:13).	“ <i>Di her aliyê jîyanê de xwestin Mesîh mîna me bixapînin</i> ” (Heb. 4:15).

Yezdan nemir e (Ps. 90:2; 1 Tim. 6:16).	Îsa di sê rojan de mir (Mt. 12:40 ; 16:21).
Yezdan ji aliyê mirovan ve nayê dîtîn 1 Tim. 6:16; Ex. 33:20)	Însanan Îsa dîtîn û destê xwe dane wî (1 Jn. 1:1 vê yekê tîne ziman).

Dema em ji rê têne derxistin, zor li me dibe ku em di navbera guneh û Yezdan de hîlbijartinekê bikin. Pirê caran em dijayetiya Yezdan hildibijêrin. Îsa jî xwediyê her du derfetan bû, lê wî her demê perestiya Yezdan ji bo xwe hîlbijart. Bi vî awahî her çiqasî wî di rastiyê de guneh nekiribe jî, ew xwediyê derfeta kirina guneh bû. Mirov nikare bibêje ku Yezdan xwediyê derfeta kirina guneh e. Me di 2 Sam. 7: 12-16 de diyar kir ku nijada Dawid, Mesîh bixwe bû. 2 Sam 7:14 jî dibêje ku Mesîh dikarîbû gunehan bike: *“Heger ew gunehan bike ezê wî bînim ser rê”*.

8.3 KESAYETA ÎSA

‘Kesayet’ ezîtiya me tîne ziman. Me di Mijar 1 de diyar kir ku Încîl behsa du kesayetan dike – ya Yezdan û ya însan. Yezdan bi sedema kesayeta xwe ya taybet nemir e û ji rê nayê derxistin. Lê diyare ku Îsa di jiyana xwe de nebûye xwediyê cewherê Yezdan. Ji ber vê yekê ew xwediyê cewherê însan bû. Ji gotinê diyar dibe ku Îsa nikare bibe xwediyê du kesayetan. Girînge ku Mesîh bixwe jî mîna me hatiye ceribandin (Heb. 4:15); û ji ber ku ew li dijî guneh biser ketiye, em jî bi wî re hatine bexşandin. Daxwaz û mebestên me yê xerab yê ku dibin sedema ji rê derketina me, di nava me de ne (Mk. 7:15-23), ji cewherê me yê însan der diçin (James 1: 13-15). Ji bo ku Mesîh van xapînokan bibîne û li hemberî wan bi ser keve, pêwîst bû di cewherê însan de were dinyayê.

Heb. 2:14-18 bi gelek hevokan vê yekê tîne ziman:

“Mademî ku zarok (em) ji xwîn û goşt in, ew jî bixwe, bi heman şeweyê beşdarî wan bû (cewherê wan) û bû hevbeşê wan –R.S.V.); ku wî bi mirîna xwe... şeytan (hêza mirinê) ji holê rakir... Ji ber ku ew ne ji cewherê milyaketa lê belê ji cewherê nijada Ibrahîm bû. Pêwîst bû ew bi her awayî bişibe birayên xwe ku bikaribe bibe serrahibekî sadîq, û gunehên gel bide bexşandin. Ji ber ku ew di ceribandîna de êşiyaye, wê bikaribe bibize alikariya yê ku têne ceribandin”.

Ev beş girîngiyeke mezin dide rastiya ku Îsa xwediyê cewherê însan bûye: *“ew bixwe jî bi heman şeweyê”* bû hevbeşê wan (*Heb. 2:14*). Ev hevok, xala dawîn ji bo vê mijarê datîne û sê gotinên mîna hev bikar tîne. Wî jî cewherekî *“mîna yê wan”* girt. Dikarîbû bibêje, ‘wî (Îsa), ew bi wan re par kir’ ; lê belê ‘ew’ (cewherê ku hatiye par kirin) bi awayê *“Wî, yekî mîna yê wan parvekir”* tê ziman. *Heb 2:16* jî bi şeweyeke nêzikî vê dibêje ku ew ji nijada Ibrahîm bû, û pêwîst bû ji bo nijada xwe xelasiyê bixwe re bîne. Ji ber vê yekê ew ne xwediyê cewherê milyaketan bû. Pêwîst bû Mesîh xwediyê cewherê însan be. Diviya bû ew bi her awayî *“mîna birayên wî were çêkirin”* (*Heb. 2:17*); ji bo ku bi riya qurbandana wî Yezdan me bibexşîne.

Divê mirov ji bingehên peyamên Îsa bê xeber be ji bo ku mirov bibêje ku ew ne xwediyê cewherê însan e.

Bawermendên ku vaftûz bûne, kîjan demê gunehan bikin, dikarin bi riya Îsa, di duayên xwe de gunehê xwe bînin ziman û xwe bigihînin Yezdan (*1 Jn. 1:9*). Yezdan dizane ku Îsa jî dikarîbû mîna însanan ji rê derkeve, lê belê wî berxwedaneke mezin ku însan nikarin bikin kiriye û li dijî guneh biser ketiye. Ji ber vê yekê, *“Yezdan, dikare ji bo xatirê Îsa”* me bibexşîne. (*Eph. 4:32*). Ji ber vê yekê girînge ku em bizanibin, Mesîh xwediyê cewherê me bû. Xwestin wî jî ji rê derxînin lê belê biser neketin. *Heb. 2:4*, bi awayekî vekirî dibêje ku Îsa, ji ‘xwîn û goşt’ e. Her çiqasî ew xwediyê bedeneke maddî be jî, di cewherê xwe de *“Yezdan Giyan e”* (*Jn. 4:24*); û Ew wekî ‘Giyan’ ne xwediyê xwîn û goşt e. Mesîh xwediyê cewherê ‘goşt’ bû, û ev jî nîşane ku ew di jiyana xwe de nebûye xwediyê cewherê Yezdan.

Ji bo pêkanîna gotina Yezdan û biserketina li dijî xapînokan, gelek însanan hewl dan xwe, lê hewldanên wan bê encam man. Ji ber vê yekê, *“Yezdan, ji bo ku ji guneh re bibe qurban, kurê xwe, di şibhetê însan de bi rê kir û guneh di însan de mehkum kir”* (*Rom. 8:3 A.V. têbînî*).

‘Guneh’ tê wateya daxwaza me ya li dij derketina fermanên Yezdan. Me heta niha destura vê daye û em hîna jî didin. Lê belê *“berdêla guneh, mirin e”*. Ji bo ku însan xwe ji vê rewşa giran xelas bike, pêwîstî dît ku alîkariyê ji derve bixwaze. Însan ew taqet li gel xwe nedît ku bibe xwediyê bêqisuriya di bedenê de. Ji ber vê yekê Yezdan dest avête mijarê, û kurê xwe yê ku xwediyê bedeneke mîna ya me bû şand. Taybetmendiya ku Mesîh ji tevayê însanan cûda dike ewe ku ew jî mîna her kesî dikare gunehan bike lê belê wî rê nedaye biserketina xapînokan. *Rom. 8:3* cewherê Mesîh yê însan weke ‘nefsa însan ya gunehkar’ dide nasîn. Berî vê bi çend ayetan Pavlus dabû xuyakirin ku di nava bedenê (nefsê) de *“tişteki baş nîne”* û daxwazên bedenî (nefsî) li hemberî perestiya Yezdan kelemekî mezinin (*Rom. 7: 18-23*). Di vê çerçoveyê de em di *Rom. 8:3* de dixwînin ku Mesîh xwediyê *“bedeneke*

gunehkar” bû. Ji ber ku ew li hemberî daxwazên bedenê bi ser ketiye, em her demê riyekê dibînin ku xwe ji nefsa xwe xelas bikin.

Îsa dizanîbû ku cewherê wî *gunehkar* e. Carekê bi rengê ku başiya wî diyar bike, hinekan jê re gotibû *“mamostayê baş”*. Wî wiha bersiv dabû: *“tu çima ji min re dibêji baş? Bi tenê yekî baş (bi rêkûpêk) heye, Ew jî Yezdan e”* (Mk. 10: 17,18). Însanan mezinatiya Mesîh bi hinek kerametên ku ji aliyê wî ve hatibûn kirin, didan nasandin. Îsa fêde ji vê derfetê nedît; *“ji ber ku wî her tişt zanîbû, û pêwistiya wî bi şahidiya însanan nebû: ji ber ku nava însanan nas dikir”* (Jn. 2:23-25, metna Yunanî). Ji ber ku wî di derbarê cewherê însan de pir dizanîbû (*“di vê derbarê de her tişt dizanîbû”*), wî tu caran ji însanan ne xwest ku pesnê wî bidin. Ji ber ku wî dizanîbû ku cewherê wî yê însan gelekî xerab e.

8.4 ÎNSANIYETA ÎSA

Nivîsên Mizgînê li ser rastiya ku Îsa xwediyê cewherê însan e, tijî mînak in. Tê gotin ku ew westiyaye û ji bo ku ji bîrê avê vexwe runiştaye (Jn. 4:6). Di mirina Lazar de *“Îsa girîya”* (Jn. 11:35). Nivîsên li ser êş û elema wî, delîlên însaniyeta wî ne: *Wî dua ji Yezdan re kirin ku wî ji êşa mirina di çarmîx de xelas bike û anî ziman: “Ez niha aciz dibim”. “Wî ev yek got û dua kir: ‘Ey bavê min, eger gengaz be, (li ser mirin û ezîyetê) bera ev tas di der min re derbas be; lê dîsa jî bera ne wekî min, wekî ku tu dixwazî bibî (Mt. 26:39). Ev dide nîşandan ku di hinek rewşan de daxwazên Mesîh ji yên Yezdan cuda ne.*

Mesîh, di tevayê jiyana xwe de, ji bo amadekariya ceribandina di çarmîx de, her demê li dijî daxwaza xwe perestiya daxwaza Yezdan kir û serê xwe ji wî re tewand: *“Ez nikarim bi serê xwe tiştêkî bikim: ez weke ku dibihîzim mehkeme dikim û mehkemeya min adil e. Ji ber ku ez ne daxwaza xwe, lê belê daxwaza Bavê ku ez şandime bi cih tînim”* (Jn. 5:30). Cudabûna di navbera daxwaza Mesîh û Yezdan de delîle ku Mesîh ne Yezdan e.

Em di jiyana xwe tevî de, hêvî dikin ku ji tecrubeyên xwe fêr bibin û zanebûna xwe ya di derbarê Yezdan de zêde bikin. Li vir Îsa, mînaka me ye. Ew, (ji zayîna xwe ve) bi qasî ku hatiye ragihandin, ji me zêdetir nebûye xwediyê zanebûna Yezdan.

Di zarotiya xwe de, *“Îsa di aliyê zanistî û kesayetî de (ango gihîştina giyanî, krş. Eph. 4: 13) bi pêş ket û însan û Yezdan li gel wî bûn”* (Lk. 2:52). *“Zarok mezin bû û hêza xwe ye giyanî zêde kir (bi hêz bû)”* (Lk. 2:40). Ev her dî ayet, li gel pêşveçûna giyanî, mezinbûna Îsa ya bedenî jî tînin ziman. Weke ku baweriya Atanasvan dibêje, eger ku ‘kur, Yezdan bûya’ wê ev yek

ne gengaz bûya. Di encama jiyana xwe de jî Îsa gotiye ku ew zemanê vegera xwe ya duwemîn nizane, lê belê Bav dizane (Mk. 13:32).

Piştî wextekî em hemû fêr dibin ku divê em perestiya daxwaza Yezdan bikin. Îsa jî weke her kurekî, ji bo fêrbûna perestiya Bavê xwe di vê pêvajoyê re derbasbû. *“Ew kur bû jî, lê belê wî bi riya tiştên ku ew eşandin, perestî (ango perestiya Yezdan) nas kir û bi rêkûpêk bû (ango di aliyê giyanî de têgihîşt). Ew hate temamkirin û wekî encama mezinbûna xwe ya giyanî, bû çavkaniya xelasiya bê dawî (Heb. 5:8,9). Phil. 2:7,8 (Di Gotina Navbend 27 de bêhtir hate ravekirin) jî mezinbûna Îsa ya giyanî ya ku di mirina wî de gihîşte serî tîne ziman: “Xwe ji berziyê bi dûr xist û xwe xiste kirasê xizmetkarekî...di mirina xwe ya di çarmîx de...xwe nizm kir û bû perestkar”.* Li vir tê gotin ku Îsa daxwaza Yezdan bi cîh anî û di çarmîxê de mir. Wî bi zanebûn xwe nizm kir ji bo ku pêşveçûna xwe ya giyanî nîşan bide. Û ji ber ku wî bersiva rast da eşên xwe ew hate berz kirin.

Wisa diyar dibe ku Îsa mecbûr maye bi zanebûn kedeke mezin xerc bike ji bo ku ew bibe kesekî rast û durust. Yezdan tu caran zor nedaye wî ku ew tiştêkî wiha bike. Îsa bi rastî ji me hez kir û ji ber wê di çarmîxê de can da. Heger mirina wî ya di çarmîxê de bi zora Yezdan bûya, wê demê wê diyarkirina hezkirina wî ya li hemberî me bê wate bûya (Eph. 5: 2,25 ; Rev. 1:5 ; Gal. 2:20). Heger Îsa Yezdan bûya, pêwîstbû ji serî de bi rêkûpêk be û ji ber vê yekê ew di çarmîxê de nedimir. Îsa xwediyê gelek derfetan bû, lê belê wî riya Yezdan hilbijart, ev jî dihêle ku em hezkirina wî berzîbilind bikin û bi wî re têkevin nava têkiliyê kesanî.

Ji ber ku Îsa bi dilê xwe jiyana xwe pêşkêş kir, Yezdan gelekî ji wî xweş bû: *“Bi vî awahî wê Bavê min ji min hez bike; ji ber ku ezê canê xwe bidim...Tu kes nikare wî (canê min) ji min bistîne; lê ezê bixwe wî bidim”* (Jn. 10: 17,18).

Heger Îsa Yezdan bûya, ne gengaz bû ku ew bi rengê têkiliyê li gel însanê gunehkar, dest ji jiyana berde û bi vê perestiya xwe Yezdan kêfxweş bike (Mt. 3:17 ; 12:18 ; 17:5). Di encama vê fedekariyê de Bav bi perestiya Kur kêfxweş bûye. Îsa dikarîbû ji xwe re riyêke din jî hilbijêre lê belê wî bi zanebûn riya perestiya Yezdan hilbijartiye û ev jî delîle ku wî gava xwe bi zanebûn avêtiye.

PÊWÎSTIYA ÎSA YA BI XELASBÛNÊ

Ji ber kesayeta xwe ya însan, Îsa jî mîna me nexweşiyên sivik, westabûn û her wiha derbas kir. Ji ber vê yekê, heger ew di çarmîxê de nemira, wê bi rengekî din, wek mînak, di encama kalbûnê de bimra. Îsa pêwîstî pê hebû ku ji aliyê Yezdan ve ji mirinê were xelaskirin. Dema ku Îsa bi vê pêwîstiyê hisiya, *“li gel fixan û hêsrên çavan, dua û niyazên xwe pêşkêşî Yezdan kirin, ew Yezdanê ku dikare wî ji mirinê xelas bike û bawermendiya wî bibihîze”*

(Heb. 5:7 A.V. *têbinî*). Lava ku Îsa ji Yezdan kiriye ji bo ku wî ji mirinê xelas bike, delîle ku ew bixwe ne Yezdan e. Piştî vejîna Îsa (derketina asîman) serdestiya mirinê ya li ser wî jî êdî nema (Rom. 6:9).

Di pirtuka Îlahîyan de, piraniya îlahîyan, kehaneta Îsa bixwe ne. Ji îlahiyekê dema ku hinek ayet di Ahîda Nû de di derbarê Îsa de bûbin têbinî, manaxwe gelek ayetên din jî ji wê îlahiyê di derbarê Îsa de ne. Bi gelek awayan tê ziman ku Mesîh xwestiye Yezdan wî xelas bike:

- a. Di derbarê Îsa de, di Mt. 4:6 de, ji Ps. 91: 11,12 an, têbiniyek hatiye girtin. Diyar dike ka yezdan bi çi awahî xelasî daye Îsa: “Ezê bi temenî dirêj (ango jiyanêke bê dawî) wî têr bikim û xelaskariya xwe nîşanî wî bidim”. Ps. 69:21, vedana Mesîh ya di çarmîxê de tîne ziman (Mt. 27:34); ramanên Mesîh yê di wê çarmîxa îlahî de tîne ziman: “*Min xelas ke ey Yezdan...Nêzîkî canê min bibe û wî xelas ke...Bera xelaskariya te ey Yezdan, min berzibilind bike*” (Ps. 67:1,18,29).
- b. Ps. 89, şîroveyeke li ser soza ku Yezdan di derbarê Mesîh de daye Dawid. Ps. 89:26 di derbarê Îsa de wiha dibêje: “*Wê Ew (Yezdan) gazî min bike; Tu bavê min, Yezdanê min û lata xelasiya min î*”.

Duayên ku Mesîh ji bo xelasiyê pêşkêşî Yezdan kiribûn, hatin bihîztin. Ew bi sedema giyaniya wî hatin bihîztin, lê ne ji ber cihê wî yê di nava ‘sêyîtî’yê de (Heb. 5:7). Ji aliyê Yezdan ve zindîkirin û bi nemiriyê berzîkirina Îsa di Ahîda Nû de mijareke girîng e:

- c. “*Yezdan...Îsa zindî kir...Yezdan wekî prens û xelaskarekî ew bi aliyê xwe yê rastê berzibilind kir*” (Acts 5:30,31).
- d. “*Yezdan...Kurê xwe Îsa...yê ku ji mirinê zindî kir, berzibilind kiriye*” (Acts 3: 13,15).
- e. “*Yezdan, Îsa zindî kir*” (Acts 2:24,32,33).
- f. *Dema ku wî berzibilindkirina xwe ji Yezdan daxwaz kir, wî ev tişt hemû fêm kirin (Jn. 17:5 krş. 13:32; 8:54).*

Heger Îsa Yezdan bixwe bûya, wê demê pêwîst bû ne mir e. Heger Îsa Yezdan bûya wê pêwîstiya wî bi xelasiyê nebûya. Berzibilindkirina wî ya ji aliyê Yezdan ve, diyar dike ku Yezdan ji wî bilindtîre û cudabûneke mezin di navbera wî û Yezdan de heye. Weke xala 39. ya dêra dewletên Ingilîz, Mesîh nikarîbû bi tu awayî bibe “*Yezdanê bi du kesayetan*”. Hebûnek dikare bibe xwediyê kesayeteke bi tenê. Divê em serê xwe ji gelek delîlan re bitewînin ku Mesîh kesekî mîna me bû.

8.5 TÊKILIYA YEZDAN Û ÎSA

Yezdan, Îsa ji mirinê zindî kiriye. Ev rastî dihêle ku em hinekî li ser têtikiliya di navbera Yezdan û Îsa de rawestin. Heger ew li gora zanîna ‘sêyîtiyê’ mîna hev bûna, lazim bû têtikiliya di nava wan de jî wekhev ba. Lê belê delîlên ku heta niha me dîtine, didin zanîn ku ev yek ne bi awayê fikra me ye. Têtikiliya di navbera Yezdan û Mesîh de, weke têtikiliya di navbera jin û mêr de ye: “*Serê her zilamî Mesîh e, serê jinê zilam e û serê Mesîh jî Yezdan e*” (1 Cor. 11:3). Herçiqasî zilam serdestê jinê be jî, ew xwediyê heman armancê ne. Têtikiliya Yezdan û Mesîh jî wiha ye, ew xwediyê heman armancê ne, lê Yezdan serdestê Mesîh e. Jin malê zilam e, “*Mesîh jî yê Yezdan e*” (1 Cor. 3:23).

Yezdanê Bav, pirê caran weke Yezdanê Mesîh tê bi lêvkin. Dixwazin bi çavekî wiha li Yezdan binerin: “*Yezdan û bavê Mîrzayê me Mesîh Îsa*” (1 Pet. 1:3 ; Eph. 1:17). Piştî ku Mesîh derketiye asîman jî têtikiliya di navbera wan de mîna ya dema ku Mesîh li jiyana bi mirin bû, maye. Xwediyên zanîna sêyîtiyê dibêjin ku Mesîh bi tenê di dema jiyana xwe ya li serzemînê de jî Yezdan nizmîr bûye. Nameyên Ahîda Nû ku ew piştî çûna Mesîh ya asîman bi çend salan hatine nivîsandin, ji bo Yezdan dibêjin, Bav û Yezdanê Mesîh. Îsa dîsa jî Bavê xwe mîna Yezdanê xwe dibîne.

Pirtûka dawîn ya Ahîda Nû Wehî, bi kêmanî 30 salan piştî zindîkirin û berzbilindkirina Mesîh hatiye nivîsandin, lê ew dîsa jî wiha behsa Yezdan dike: “*Bav û Yezdanê Wî (Mesîh)*” (Rev. 1:6 R.V.). Mesîhê ku derkete asîman û hate berzbilindkirin, vê bangê li bawermendan dike û behsa van tiştan dike: “*perestgeha Yezdanê min...navê Yezdanê min...bajarê Yezdanê min*” (Rev. 3:12). Ev delîle ku Îsa hîna jî bavê xwe weke Yezdan dibîne – ji ber vê yekê ew (Îsa) ne Yezdan e.

Îsa di dema jiyana xwe de jî bi Bavê xwe re di nava heman têtikiliyê de bû. Wî bi vî awahî behsa çûna xwe ya asîman kir: “*Ez li bavê xwe û bavê te, li Yezdanê xwe û yê te (vedigerim)*” (Jn. 20:17). Îsa di çarmîxê de, tevayê însaniyeta xwe pêşkêş kir: “*Yezdanê min, Yezdanê min, Te çima ez bi tenê hiştim?*” (Mt. 27:46). Heger Yezdanek bixwe van gotinan bike, ne gengaze ku mêjiyê mirov rake. Ev rastiyeke ku Îsa, “*bi feryad û hêsiyan lava ji Yezdan kir*”, û ev jî di nava xwe de sînoren têtikiliya di navbera wan de diyar dike (Heb. 5:7 ; Lk. 6:12). Diyar e ku Yezdan jixwe lava nake. Niha jî Mesîh ji bo me ji Yezdan lava dike (Rom. 8:26,27 N.I.V. krş. 2 Cor. 3:18 R.V. têbinî).

Me diyar kir ku têtikiliya di navbera Yezdan û Îsa de, niha jî mîna berê ye. Mesîh Yezdan hem bavê xwe û hem jî Yezdanê xwe dibîne û li ber digere,

lava jê dike. Heman tişt piştî derketina Mesîh ya asîman jî didome. Mesîh di jiyana xwe ya li serzemînê de koleyê (ebdê) Yezdan bû (Acts 3:13,26 N.I.V. ; Is. 42:1 ; 53:11). Koleyek bi tenê daxwaza Mîrzayê xwe bi cîh tîne û bi tu awayî nabe mîna Mîrzayê xwe (Jn. 13:16). Hêz û serdestiya Îsa çî dibe bera bibe, wî bixwe gotiye ku wî ew hêz ji Yezdan wergirtiye: *“Ez bi serê xwe nikarim tişteki bikim...Ez daxwaza bavê ku ez şandime bi cih tînim...Kur bi serê xwe nikare tişteki bike”* (Jn. 5:30,19).

MIJAR 8 : PIRS

1. Incîl, dide zanîn ku Yezdan sêyîtiyeke?

- a) Belê
- b) Na

2. Îsa di kîjan aliyan de ji me cûda dibû?

- a) Wî tu caran guneh nekir
- b) Ew, kurê Yezdan yê bi tenha bû
- c) Wî tu caran nikarîbû guneh bike
- d) Yezdan zor li wî dikir ku di riya rast de be

3. Îsa di kîjan aliyan de dişibiya Yezdan?

- a) Ew, di jiyana xwe ya li serzemînê de, xwediyê cewherê Yezdan bû
- b) Ew, mîna Yezdan xwediyê kesayeteke temam bû
- c) Ew, bi qasî Yezdan zana bû
- d) Ew, rasterast mîna Yezdan bû.

4. Îsa di kîjan aliyan de mîna me bû?

- a) Ew xwediyê tevayê tecrubeyên însanî û ji rê derketinên me bû
- b) Dema ku ew zarokê biçûk bû wî guneh kir
- c) Wî pêwîstiya xelasiyê dît
- d) Ew xwediyê cewherê însan bû

5. Kîjan hevokên li jêr rast in?

- a) Îsa xwediyê kesayet û nefsiyeteke temam bû
- b) Îsa xwediyê kesayeteke gunehkar, lê taybetmendiyên temam bû
- c) Îsa hem Yezdan û hem jî însan bû
- d) Îsa xwediyê cewherê Adem yê berî gunehkariyê bû.

9.1 GIRÎNGIYA VAFTÎZMÊ

Me di mijarên xwe yên borî de gelek caran behsa girîngiya vaftîzmê kir. Ev radeya yekemîn ya perestina daxuyaniya Mizgînê ye. Heb. 6:2 vaftîzmê mîna zanistekê bingehîn dibîne. Me lêkolîna wê ji bo dawî hişt. Ji ber ku vaftîzma rast encex bi têgihîştina rastiye û Mizgînê pêk were. Me xebata xwe ya li ser van rastiyan niha qedand. Heger hûn bixwazin xwe bi hêviya Incîlê re bikin yek ku ew bi riya Mesîh Îsa hatiye pêşkêş kirin, wê demê vaftîzmê pêwîstiyekê.

Gotina ku dibêje *“xelasî ji Cihuya ye”* (Jn. 4:22) tê wateya ku sozên di derbarê xelasiyê de bi tenê ji bo Ibrahîm û nijada wî hatine dayîn. Ji bo ku ev soz ji me re jî bîne dayîn, divê em bi navê Mesîh vaftîz bibin û bibin endamêkî nijad (kurên Yezdan), (Gal. 3:22-29).

Bi vê sedemê Îsa ji alîgirên xwe re wiha fermo kir: *“Biçin her derê dinyayê û (Gal.3:8 ya ku sozên ji bo Ibrahîm jî tê de ne) mizgînê bigihînin her tebayî. Yê ku baweriya xwe pê bîne û vaftîz bibe wê xelas bibe”* (Mk. 16:16). Gotina ‘û’ diyar dike ku bi tenê bawerîna bi mizgînê ne bes e. Di jiyana Xirîstiyani de vaftîzmê ne tiştekî girêdayî daxwazê ye, ew pêwîstiya xelasiyê bixwe ye. Mirov nikare bibêje ku çalakiya vaftîzmê bi serê xwe jî têra xelasiya me dike. Divê em di tevayê jiyana xwe de perestiya gotina Yezdan bikin. Îsa vê yekê dibêje: *“Ezê ji we re rastiye bibêjim: heger yek ji av û giyan ne zê, nikare têkeve bin serdestiya Yezdan”* (Jn. 3:5).

Ev zayîna ji *“avê - bi Yunanî ji avê derketin- “tê wateya ku di vaftîzmê de yek ji avê derdikeve der. Piştî vê yekê ew kes careke din ji giyan di zê. Ev liveke herdemî ye: “bi riya gotina Yezdan...careke din zayîn”* (1 Pet. 1:23). *Bi vî awahî em bi riya bersivên xwe yên ji bo gotina Giyan, careke din ji giyan dizên* (Binere. Li Mijar 2.2).

Em *“li gel Mesîh vaftîz dibin”* (Gal. 3:27); *“bi navê wî”* (Acts 19:5 ; 8:16 ; Mt. 28:19). *Bala xwe bidinê ku em ne di rêxistina Birayên li gel Mesîh (Christadelphians) an jî rêxistineke din ya însanan de vaftîz dibin, em li gel Îsa vaftîz dibin. Bê vaftîz em nikarin bibin Mesîhî û ji aliyê xelaskariya wî ve werin parastin* (Acts 4:12).

Petrus di çerçoveya vê rastiye de, keştiya dema Nuh dişibîne Mesîh û dibêje ku wê keştiyê bi çi awahî Nuh û malbata wî ji tofana gunehkaran parastibe, wê vaftîzma li gel Îsa jî bawermendan ji mirineke bê dawî xelas bike (1 Pet. 3:20,21). Nuh bi çi awahî ketibe keştiyê, emê jî wiha bi riya vaftîzmê têkevin Mesîhiyê (civata Mesîh). Yên ku li derveyî keştiyê man li ber avê çûn. Mana li kêleka keştiyê an jî hevaltiya Nuh bê wate bû. Riya xelasiyê, ketina hûndirê keştiyê bû û (niha jî) mayîna li gel Îsa ye. Diyarê ku wê hatina duwemîn ya (Îsa) ku weke lehiyê tê nîşandan (Lk. 17:26,27) di dema me de (di qirnê me de) bi ser me de were (Binere. Li Beş:3). Ji ber vê

yekê bi riya vaftîzmê pejirandina Mesîhiyê xwediyê girîngiyeke jiyânî ye. Ji bo diyarkirina vê girîngiyê bi rastî jî gotin kêman in. Nimûneya ketina keştiya Nuh li vir jî gotinê bi bandortir e.

Xirîstiyânên yekemîn Mizgîn gihandin însanan, ew vaftîz kirin û fermana Mesîh bi cîh anîn. Pirtuka bi navê Karên Qasidan delîlê vê yekê ye. Delîlekî girîngiya vaftîzmê jî ewe ku însanên wê demê çawa ku Mizgîn pejirandine, yekser vaftîz bûne (mînak, Acts 8:12, 36-39 ; 9:18 ; 10:47 ; 16:15). Heger em vaftîz nebin, fêrbûna Mizgînê jî bê fêde ye. Vaftîzm, radeya herî girîng ya riya xelasiyê ye. Nivîsên ku bi Wehî hatine dibêjin ku di hinek rewşan de, gelek sedemên însanî derdikevin pêş ku li pêşiya vaftîzbûnê dibin kelem. Û her wiha gelek zorî derdikevin ku vê çalakiyê li paş dixin. Lê belê însan bi alîkariya Yezdan kedeke mezin jî bo derbaskirina van keleman dide û xwe digihîne vê çalakiya girîng.

Nobedarê li ber hepsa Filipî, bi sedema zelzeleya ku hepsa wî bi erdê re kire yek, kete taya xelaskirina canê xwe. Hepsiyar fersendekî mezin jî bo xelasiyê bi dest xwe ve anîn – ku ev jî bo wî dihate wateya wendakirina jiyânê. Wê demê baweriya wî bi mizgînê hat û wiha pir ku, *“di wê seeta çevê de... yekser vaftîz bû” (Acts 16:26-33)*.

Heger hinekan jî bo li paşxistina vaftîzbûnê, behane bidîtana jî, ew behane ew bixwe bûn. Berî 3000 sal di zelzeleya herî xerab ya Yunanê de, dema ku keriyê hepsiyar dixwestin firara herî dramatîk ya dîrokê pêk bînin, wî bi sedema ihmalkirina wezîfeya xwe, dibin tehdîda îdamê de, çalakiya herî girîng ya tevayê jiyana xwe pêk anî. Bi vî awahî, wî jî bo vaftîzbûnê, guh neda pirsgirêkên dinyayê (mînak, zelzele), û barê karê rojane yê li ser milên xwe.

Gelek berendamên vaftîzmê yên bê biryar dikarin, îlhama xwe jî vî zilamî bistînin. Pêkanîna çalakiyeke wiha bi rûmet, bi tenê bi bihîztina soza Yezdan gengaz e. Ev jî diyar dike ku ew, di derbarê Mizgînê de xwediyê agahdariyên berferê e (Rom. 10:17 krş. Acts 17:11).

Acts 8:26-40 dibêje ku wezîfedarekî fermî ji Etîyopyayê, bi erebeya hespa di çolê re derbas dibû. Û di rêwîtiya xwe de li ser Incîlê dixebitî. Ew, rastî Filîpus hat û jî wî fêr bû ku vaftîzbûn pêwîstiyêke jiyânî ye. Bi gotinên însanî, li wê çola bê av, bi cîh anîna fermana vaftîzbûnê, ne gengaz diyar dikir. Lê belê Yezdan fermaneke ku hinek nikaribin bi cih bînin nade. *“Wana rêwîtiya xwe domandin û gihîştin cihekî ku av lê peyda dibû –ango gihîştin cihekî ku vaftîzbûn lê gengaz bû-“ (Acts 8:36)*. Ev yek bersiva wê nerîna şaş dide ku dibêje: Vaftîzma bi riya tê hildana avê, bi tenê jî bo cihên ku av li wan heye an jî gihîştina avê hêsane hatiye derxistin. Yezdan her demê riyeke rastîn jî bo pêkanîndana fermanên xwe dibîne.

Hewarî Pavlus (navê wî yê berê Saul bû) dibin bandora Îsa de, di demeke pir kin de *“yekser... rabû û vaftîz bû” (Acts 9:18)*. Dîsa jî dibe ku jiyana wî ya karmendî ya payebilind ku di Cihûtiyê de jî bo wî hatibû amade kirin, û

radeya jiyana wî ya civakî, di derengmayîna vaftîzbûna wî de roleke girîng lîstibin. Lê belê wê stêrka dinyaya cihû ya ku bilind dibû, ji nişkê ve biryar da, vaftîz bû û jiyana xwe ya berê li pey xwe hişt. Wî piştî li ser hîlbijartina xwe ya vaftîzbûnê ev gotin kirine: *“Tiştên ku ji bo min qezencbûn, min ew di oxira Mesîh de weke zirarê hesabandin... Ji bo qezenckirina Mesîh min êşa wendakirina her tiştî (tiştên ku wî berê ji xwe re qezenc diditin) da ber çavê xwe; lê ez wan (li hemberî rûmeta naskirina Mesîh) tişteke nahesibînim...ez, her tiştê ku li paş min maye ji bîr dikim (tiştên jiyana Cihûtiyê) xwe dirêjî pêşerojê dikim û ji bo bidestxistina xelatê, ber bi armancê ve dibezim”* (Phil. 3: 7,8,13,14).

Ev daxuyaniya atlêtekî ye ku ji bo qetandina benê dawiyê, xwe davêje pêş. Vaftîzm, destpêka pêşbaziya ber bi serdestiya Yezdan ve ye. Ew bi tenê ne nîşana guhertina dêrê û olê ye. Her wiha ew ne destpêkeke jî ji bo ku mirov xwe bi çend fermanên sist yê Xirîstiyaniyê ve girêde û têkeve jiyaneke pasîf û hêsan.

Vaftîzm, me bi vedana Îsa ya çarmîxê û zindîbûna wî re dike yek û girê dide (Rom. 6:3-5). Îcabên wê ji her alî ve tîjî liv û zindîbûnin.

Pavlusê westiyayî, lê di aliyê giyanî de serbilind, mîna kalekî bi temen wiha behsa rojên derbasbûyî dike: *“Min di pêkanîna fermanên asîmanî de dudilî nekir”* (Acts 26:19). Ev yek hem ji bo Pavlus û hem jî ji bo her kesê ku hatiye vaftîzkirin wiha ye: vaftîzbûn biryareke ku mirov di dana wê de poşman nabe. Emê di tevayê jiyana xwe de pê bihisin ku me biryareke rast daye. Emê di kêma biryarên xwe de mîna vê kêfxweş bin. Divê ev pirs, were bersivandin: Ji bo çi divê ez vaftîz nebim?

9.2 DIVÊ EM BI ÇI AWAHÎ VAFTÎZ BIBIN?

Ji aliyê pir kesan ve tê bawerkirin û pêkanîna ku vaftîzkirina zarokan divê bi riya şuştina eniya wan (merasîma bi navkirinê) were pêkanîn. Ev yek bi daxuyaniya Incîlê re di nava nakokiyêke mezin de ye.

Di incîla Ingilîzî de gotina Yunanî ‘baptizo’ bi rengê ‘baptize’ hatiye wergerandin û ew nayê wateya pişiqandina avê, ew tê wateya ketina nav avê û xwe şuştinê (li danasînên Robert Young û James Strong binerin, çiqasî nêzikî hev in). Ev gotin di Yunanî ya Klasîk de ji bo keştiyên binavbûyî (ango yê di bin avê de mayî) tê bikaranîn. Her wiha ew ji bo qumaşekî ku mirov bixwaze ji rengê bo rengê din boyax bike û di nava rengê nû de ‘hilde’ jî tê gotin. Ji bo guhertina rengê qumaş, mirov boyaxê napijiqîne ser, mirov qumaş di nava boyaxê dide û derdixe. Ev têhildan rengê vaftîzmê yê rastîne û ew ji aliyê ayetên jêrîn ve jî tê ziman:

- Yehya mirov li Aynona nêzîkî Salîmê vaftîz dikirin. Ji ber ku av li wir pir bû: însan hatin û vaftîz bûn” (Jn. 3:23). Ev dide nîşandan ku ji bo vaftîzmê pêwîstî bi aveke pir heye. Heger ew bi pijiqandina çend dilop av pêk bihata, wê demê wê sîtilek av têra bi sedan kes bikira. Li şûna ku Yehya bi şûşeyek av dakeve nava însanan, ew hatin vî cihê li keviya çemê urdunê (Şeria) ji bo ku vaftîz bibin.
- Îsa jî di çemê Urdunê de ji aliyê Yehya ve hat vaftîz kirin: “*Îsa piştî vaftîzbûnê yekser ji avê derket derve*” (Mt. 3:13-16). Vaftîzbûna wî bi têhildana di avê re pêk hat – ew, piştî vaftîzmê “*ji avê derket*”. Yek ji sedemên vaftîzbûna Îsa jî ew bû ku bibe mînak. Bê dubarekirina mînaka vaftîzbûna wî ya ketina nava avê, kesek nikare bibêje ku ew Îsa dişopîne.
- Bi heman şeweyê, Filipus û wezîfedarê Eftiyopî, “*her du jî ketin nava avê...û wî ew vaftîz kir. Û dema ku ew ji avê derketin...*” (Acts 8: 38,39). Bînin bîra xwe ku yê wezîfedar avê dibîne û ji bo vaftîzbûnê tika dike: “*Binêre li vir av heye: ma çi heye ku nehêle ez vaftîz bibim?*” (Acts 8:36). Ev rastiyeke ku ev kes bê av derneketiye rêwîtiya çolê. Bi kêmanî şûşeyek av li gel wî hebû. Heger vaftîzm bi pijiqandina avê pêk bihata, wê demê pêwîstiya wan bi dîtina aveke pir nedima.
- Vaftîzm, tê wateya têhildan û nixumandineke tevayî (Col. 2:12).
- Vaftîzm, weke “*xwe paqijkirina ji gunehan (pakhûn)*” tê bi navkirin (Acts 22:16). Di Rev. 1:5 , Tit. 3:5 , 2 Pet. 2:22, Heb. 10:22, û di gelek ayetên din de guhertina rastî bi ‘xweşûştinê’ tê şibandin. Ev awayê xweşûştinê, pir girêdayî vaftîzmê ye.

Di Ahîda Kevin de, mînak hene ku bi riya hinek awayên xweşûştinê, mirov dikare nêzîkî Yezdan bibe.

Tevayê Rahiban, mecbûr bûn ku berî ayînan xwe di testê de bişon (Lev. 8:6 ; Ex. 40:30-32). Îsraîlî ji bo ku xwe ji hinek mundariyên berpirsyarê guneh paqij bikin, pêwîst bû xwe bişon (mînak. Dt. 23:11). Zilamê bi navê Naaman bi riya Yezdanê Îsraîlê li derman digeriya. Ew bixwe ne Cihû lê Sûrî bû. Wî temsîla kesekî pir gunehkar dikir û di rastiye de jî ji ber gunehê xwe, mîna miriyekî zindî bû. Dermanê wî, ketina çemê Urdunê bû. Di destpêkê de ew difikirî ku wê Yezdan kirina çalakiyeke pir dramatik ji wî

bixwaze, an jî wê bixwaze ku ew xwe têxe çemekî naskirî mîna Abana Şamê. Ji ber vê yekê wî pejirandina vê çalakiya hêsan pir zehmet dît.

Mîna wî em jî dikarin têkevin dudiliyê ku çalakiyêke wiha hêsan, bikaribe me xelas bike. Li şûna vê çalakiya hêsan ya ku me bi hêviya Îsraîlê ve girê bide, ji bo me balkêştir e ku em girêdana xwe bi dêreke naskirî (krş. Çemê Abana) re çêbikin û bifikirin ku ewê bikaribe me bigihîne xelasiyê. Naaman (7 caran) kete çemê Urdunê û derket, goştê wî *“bû mîna goştê zarokekî biçûk û ew (Naaman) pak bû”* (2 Kings 5:9-14).

Tê fêmkirin ku vaftîzm, piştî têgihîştina banga Mizgînê ya bingehîn, xwe têhildana avê ye. Ev danasîna vaftîzmê ya ku di Încîlê de hatiye ziman, serî li rewşa vaftîzvan nade. Ji ber ku vaftîzm, piştî baweriya bi Mizgînê, xwe têhildan û derketina ji avê ye, mirovek bi serê xwe jî dikare vaftîz bibe. Lê ji bo ku di dema vaftîzbûnê de, mirov hinek ramanên rast bi cîh tîne, baştire ku yek li gel mirov hebe da ku radeya zanista mirov şîrove bike û mirov ji aliyê wî ve were vaftîz kirin.

Bi sedemê di nava koma Birayên li gel Mesîh de, kirine adet ku berî vaftîzê bi berendam re gotûbêjeke dirêj bikin. Pirsên ku di dawiya her mijara vê pirtûkê de hatine pirsîn, dikarin bibin bingeh ji bo gotûbêjeke wiha. Birayên li gel Mesîh, ji bo alîkariya vaftîzkirina şexsekî bi tenê, rêwîtiyêke dur û dirêj dikin. Heger şexsek bi tenê be jî ku bixwaze xwe bigihîne hêviya jiyana bê dawî, ew bûyereke mezine û em li ser hejmarê kesên ku hatine guhertin ranawestin.

9.3 WATEYA VAFTÎZMÊ

Vaftîzma ku mirov bi riya wê xwe dixwe nava avê, me bi mirina Mesîh re dike yek û mirina li jiyana me ya gunehkar û cahil nîşanê me dide. Derketina ji avê jî, serkevtina Mesîh, mirin û zindîbûna wî û şkestina guneh ya ji hêla giyanî ve tîne ziman. Me bi hatina Mesîh ya duwemîn ve girê dide û me bi zindîbûna wî re dike yek.

“Piraniya me yê ku em ji Mesîh Îsa re hatine vaftîzkirin, em ji mirina wî re vaftîz bûne. Ji ber vê yekê, weke ku Mesîh bi riya cemala Bav ji mirinê zindî bû, emê jî ji bo meşa li jiyaneke nûjen, bi riya vaftîzbûna bo mirinê, bi wî re werin binaxkirin. Heger em bi (bi riya vaftîzmê) bi mirineke mîna ya wî re bûbin yek, emê bi zindîbûneke mîna ya wî re jî bibin yek” (Rom. 6:3-5).

Xelasî bi riya mirin û zindîbûna Mesîh gengaze. Heger em doza xelasiyê dikin, lazime em xwe bi van tiştan re bikin yek. Bi awayekî sembolîk mirin û zindîbûna li gel Mesîh, ya ku bi riya vaftîzmê pêk tê, dikare me bigihîne vê armancê. Divê hûn bizanibin ku bi riya pîjiqandina avê mirov nagihê

armanca xwe. Di vafîzmê de, *“Hebûna me ya berê, (awayê jiyana me) li gel Mesîhê di çarmîxê de, tê çarmîxkirin”*. Yezdan, di vafîzmê de, *“em li gel Mesîh zindî kirin”* (Eph. 2:5). Piştî vafîzmê jî em xwediyê cewherê însan dimînin û jiyana me ya bedenî didome. Çarmîxkirina bedena me, pêvajoyeke herdaîme ku bi vafîzmê re dest pê dike. Îsa ji bawermenda re gotiye ku divê ew her roj çarmîxên xwe li xwe bikin û bidin pey şopa wî (Lk. 9:23 ; 14:27). Jiyanêke di çarmîxê de, mîna Îsa ne hêsane, lê belê kêfxweşiya zindîbûna li gel wî jî bi gotinan nayê ziman.

Mesîh, *“bi riya xwîna xwe ya ku di çarmîxê de hat niqutandin bû sedema aştiyê”* (Col. 1:20); û *“bû sedema selameta Yezdan ya ku ji her tiştî bi rûmetir e”* (Phil. 4:7). Li ser vê yekê Îsa ev soz da: *“Ez selametê ji we re dihêlim ez selameta xwe didim we: ezê ne mîna ku dinya dide (selamet) we, bidim (Jn. 14:27). Ev selamet û kêfxweşiya giyanî, ji ezabê çarmîxbûna li gel Îsa zêdetire: “Ji ber ku em bi çî awahî bibin hevparê êşa Mesîh, emê hewqasî jî bi riya wî aramiyê bibînin (2 Cor. 1:5).*

Em dizanin ku di her ceribandinekê de Îsa li gel me dijî. Hewariyê mezin Pavlus, xwediyê jiyaneke demdirêj û tîjî bûyer, wiha behsa serpêhatiyên xwe dike: *“Ezê li gel mesîhê di çarmîxê de bême vedan, lê ezê dîsa bijîm, li gel vê yekê ne ez, lê wê Mesîhê di nava min de bijî: û ezê vê jiyana bedena xwe, bi riya baweriya Kurê Yezdan, bidomînim”* (Gal. 2:20).

“Vafîzm, bi riya zindîbûna Mesîhê Îsa, niha we jî xelas dike” (1 Pet. 3:21). Dema ku em xwe bi zindîbûna Mesîhê ya bê dawî re bikin yek, di vegera wî de emê jî bibin xwediyê heman xelatê. Bi riya parvekirina vê zindîbûnê, emê xelas bibin. Îsa ev yek bi gotinên hêsan aniye ziman: *“Ji ber ku ez dijîm, hûnê jî bijîm”* (Jn. 14:19). Bi heman şeweyê Pavlus wiha dibêje: *“bi riya mirina Kurê wî, em bi Yezdan re hatin li hev anîn...emê bi jiyana wî (zindîbûn) xelas bibin”* (Rom. 5:10).

Di vafîzmê de em xwe bi êş û mirina Îsa re dikin yek û parve dikin. Ev jî dihêle ku em di jiyana xwe ya pêşerojê de zindîbûna wî jî pê re parvekin:

- *“Heger em bi hevdu re (li gel Mesîhê) miribin, emê bi wî re bijîm jî; heger em êş û eziyetê bikşînin, emê bi hev re serdestiyê jî bikin”* (2 Tim. 2:11,12).
- *“Ji bo ku jiyana Îsa di bedena me de were dîtin, em mirina Mîrzayê xwe Îsa di bedena xwe de hildigrin...Ji ber ku em dizanin, Yezdanê ku Mîrzayê me Îsa ji mirinê zindî kiriye, wê me jî zindî bike”* (2 Cor. 4:10,11,14).
- *Pavlus ev parve kir: “ez dixwazim di mirina min (bi riya tecrubeyên jiyana wî ya zehmet) mîna ya wî be, ez bibim hevparê êşên wî û mîna wî ji mirinê bigihîjim zindîbûna bê dawî”* (Phil. 3:10,11 krş. Gal. 6:14).

9.4 VAFTÎZM Û XELASÎ

Vaftîzm me bi mirina Mesîh re dike yek û em encex bi riya wê dikarin werin bexşandin. Em, *“hûn di vaftîzmê de (li gel Mesîh) hatin binaxkirin; ji ber vê yekê hûnê bi wî re zindî bibin...bi riya karê Yezdanê ku ew ji mirinê zindî kiriye...û dema ku hûn ji bo gunehên xwe mirî bin...wê Yezdan tevayê tawanên we bexşandin û hûn li gel wî (li gel Mesîh) gihandin jîyanê”* (Col. 2:12,13). Em, *“bi navê Mîrzayê me Îsa... hatin şûştin”* (1 Cor. 6:11) –ango bi navê Îsa û bi riya vaftîzmê gunehên me hatin şûştin û ji me bi dur ketin.

Ev yek di Num 19:13 de tê ziman û mînaka wê jî eve; wê kesên ku neşûştî têkevin konê perestiyê, bimirin. Me di Mijar 10.2 de nîşanî we da ku vaftîzm, pakbûna ji guneha ye (krş. Acts 22:16). Ji ber vê yekê tê gotin ku yên bawermend, di xwîna Mesîh de, ji gunehan hatine şûştin. Ew vê yekê bi riya vaftîzma ku tê wateya *“zayîna ji avê” pêk tînin* (Jn. 3:5). *Her wiha bi riya vaftîzma ku tê wateya “şûştina ji bo zayîneke nû”* (Rev. 1:5 ; 7:14 ; Tit. 3:5 N.I.V.).

Di ronahiya van agahdariyan de, dema ku Pavlus dibêje *“(ji bo xelasiyê) em çi bikin?”* bersiv eve, *“tobe bikin û ji bo ku gunehên we bêne bexşandin, her yek ji we bi navê Mesîh Îsa vaftîz bibin”* (Acts 2: 37,38). Vaftîzma bi navê Mesîh, ji bo bexşandina gunehan e. Bêyî wê mirov nayê bexşandin. Yê ku vaftîz nebûbe, divê *“berdêla guneh” – mirinê –* (Rom. 6:23) bibîne. Ji xeynî xelasiya bi navê Îsa, xelasî nîne (Acts 4:12); û em dikarin vî navî, bi tenê bi riya vaftîzmê bi wî re parve kin. Ev rastî tê wateya ku ji xeynî Xirîstiyaniyê tu ol nikarin me bigihînin xelasiyê. Yek bawermendê Încîlê nikare bipejirîne ku olên din dikarin xelasiyê pêk bînin.

Zindîbûna Mesîh ya ji bo jîyaneke bê dawî, encama serkeftina wî ya li dijî guneh bû. Em bi riya vaftîzmê xwe bi wê re dikin yek. Ji ber vê yekê ji bo me tê gotin ku emê li gel Mesîh werin zindî kirin. Wê ji wê demê û pê ve, tu bandora guneh, li ser me û li ser wî nemîne. Ji ber vê yekê, em bi riya vaftîzmê, *“ji guneh tene azadkirin... (piştî vaftîzmê) guneh nikare li ser we serdest be”* (Rom. 6:18,14). Lê piştî vaftîzmê jî em gunehkarin (1 Jn. 1:8,9). Heger em ji Mesîhiyê vegehin, wê guneh bikaribe me têxe bin bandora xwe. Bi vê sedemê, vaftîzm yekbûna me ya bi zindîbûna Mesîh re tîne ziman û dibe sedem ku em di dema hatina wî de, hevparên wî bin. Ji ber vê yekê em niha mirin û êşa Mesîh par vedikin.

Em bi hêvî li benda azadbûna ji guneh dimînin. Wê di dema vegera Mesîh de, *“bawermend û yên vaftîzbûyî xelas bibin”* (Mk. 16:16). Lê belê xelasiya nihaî ne piştî vaftîzmê, ew li ser kursiya dadkirinê pêk tê (1 Cor. 3:15). Birastî heger ku em bi riya vaftîzmê bigihîjin xelasiyê, wê demê ne pêwîste em bimrin û em zanista roja dadkirinê bizanibin. *“Yê ku heta dawî li ber xwe bide, wê xelas be”* (Mt. 10:22).

Piştî vaftûzbûnê jî Pavlus (û tevayê Xirîstiyanan) ji bo xelasiyê kar dikirin (*Phil. 3:10-13 ; 1 Cor. 9:27*); wî behsa hêviya jiyaneke bê dawî (*Tit. 1:2 ; 1 Thes. 5:8 ; Rom. 8:24*) dikir û dida zanîn ku em “*mîratxwirê xelasiyê ne*” (*Heb. 1:14*). Li ser kursiya dadkirinê, wê yên rast biçin jiyaneke bê dawî (*Mt. 25:46*). Pavlus bi riya *Rom. 13:11* û bi riya ramanên xwe yên ku bi Wehî hatine, ji bo ku em kêfxweş bibin dibêje, “*Niha xelasiya me, ji dema destpêka baweriya me nêziktire*”. *Ew dixwaze bibêje ku em piştî vaftûzbûnê, her roj hinekî din nêzîkî dema vegera Mesîh ya duwemîn dibin. Ji ber vê yekê em niha negihane xelasiyê. Xelasî girêdayî şert e. Heger em bê dudilî xwe bidin baweriya rasteqîn (Heb. 3:12-14), heger em zanista bingehîn ya Mizgînê bibîr bînin (1 Tim. 4:16 ; 1 Cor. 15:1,2) û heger em tiştên ku vê baweriya mezin di dest me de bihêlin bikin (2 Pet. 1:10) emê bigihîjin xelasiyê*”.

Ji ber vê yekê, gotina Yunanî ya ku bi rengê “*rizgar bûye*” tê wergerandin, dide nîşandan ku xelasî, ji ber perestiya me ya ji bo Mizgînê, pêvajoyeke demdirêje ku di nava me de didome û hinek caran ji bo nîşandana vê yekê ew bi raweya dema niha tê bikar anîn. Tê gotin ku, bawermend bi riya bersivên ku didin Mizgînê, “*digihîjin xelasiyê*” (*1 Cor. 1:18 R.S.V.*). *Mînakên din yên li ser vê pêvajoya daimî, di Acts 2:47 û 2 Cor. 2:15 de ne. Ev gotina Yunanî ya ku weke “rizgar bûye” (xelas bûye) hatiye bikar anîn, di rewşekê de bi raweya dema derbasbûyî tê bikar anîn. Ew jî dema ku behsa xelasiya bi riya vaftûzmê dike wiha ye (2 Tim. 1:9 ; Tit. 3:5).*

Tevayê van agahdariyan ji bo têkiliya di navbera Yezdan û Îsraîla giyanî ango bawermendan de bingehin. Îsraîl, Misira ku temsîla nefsa me ya berî vaftûzmê û cîhana olî ya şaş dikir, li cî hişt. Ew di nava Deryaya Sor re derbas bûn. Û piştê di çola Sîna yê re berê xwe dan diyarê serdestiya Yezdan, axa ku soza wê ji bo wan hatibû dayîn. Derbaskirina Deryaya Sor nîşana vaftûzma me ye (*1 Cor. 10:1,2*); rêwîtiya li çolê nîşana jiyana me ye û diyarê kenanê jî weke nîşana serdestiya Yezdan e. Jude (Yahuda) 5. Ayet, diyar dîke ku di dema rêwîtiya çolê de, gelek ji wan tune bûne: “*Yezdan, gelê xwe ji diyarê Misrê xelas kir, lê piştê yên ku baweriya xwe neanîn, tune kirin*”. Bi vî awahî, mîna kesên ku bi riya vaftûzmê xelas dibin, Îsraîlî ji Misrê xelas bûn. Heger mirov ji Îsraîliyêkî ji wan bipirsiya û bigota “*hûn xelasbûn?*” bi ihtîmaleke mezin wê bersiva wî “*belê*” bûya, lê wê ev bersiv nehata wateya xelasiya wan ya nîhaî.

Piştê Îsraîliyan carekedin berê dilê xwe dane Misrê (*Acts 7:39*) û carekedin li jiyana şaş vegeyiran. Kesên ku bi riya vaftûzmê ji guneh xelas bibin jî dikarin dest ji rewşa xwe ya pîroz berdin û vegeyiran. Ihtîmala ku em heman tiştê ku Îsraîliyan li çolê kirin, bikin di *1 Cor. 10:1-12*, *Heb. 4:1,2* û *Rom. 11: 17-21* de têne şirovekirin. Di Nivîsên Pîroz de gelek mînakên wiha hene ku dibêjin, di demekê de hinek bi riya vaftûzmê ji guneh xelas bûn, lê piştê careke din vegeyiran rewşa xwe ya berê û ewê di dema hatina mesîh

de bêne mehkumkirin (Mînak, Heb. 3:12-14 ; 6: 4-6 ; 10:20-29). Bi riya agahdariyên wiha diyar dibe ku nerîna Waîzên evangêlîst şaşê ku ew dibêjin, *“yê ku carekê xelas bibe, ew ji bo her demê xelas dibe”*.

Mîna her tiştê divê em lêkolîneke baş li ser vê jî bikin û bizanibin ka em dikarin bi riya vaftîzmê çiqasî xelas bibin. Divê em bi çavê ku wê ev çalakî şensê xelasiyê pêşkêşî me bike û çawa be ji ihtîmala – vaftîznebûnê çêtirê-lê nenerin. Hêvî heye, ku em bi riya vaftîzmê û mayîna li gel ‘Îsa’ xelas bibin. Heger em mîna dema derketina ji ava vaftîzmê, hebûna xwe ya li gel Mesîh bidomînin, em dikarin hêvîdar bin ku emê têkevin bin serdestiya Yezdan. Divê em xwediyê wê baweriyê bin ku wê piştî vaftîzbûna me, di wextekî de Mesîh careke din were û emê ji bo serdestiya Yezdan werin pejirandin. Em nikarin bi awayekî nîhaî bawer bin, ji ber ku dibe ku em roja duwemîn xwe bidin paş. Em di vê jîyanê de pêşeroja xwe ya kesani û giyanî nizanin.

Divê em her tiştê pêwîst bikin ji bo ku em têkiliya xwe ya wîdanî ya li gel Yezdan bidomînin. Vaftîzm, (li hemberî Yezdan) soza wîdanekî baş e (Bi Yunanî, 1 Pet. 3:21). Berendamê vaftîzmê soz dide ku wîdanekî pak li gel Yezdan bigre.

Vaftîzm, ji bo xelasiya me ya li gel mesîh, gaveke girînge lê belê divê em wisa diyar nekin ku xelasiya me bi tenê bi riya vê çalakiyê pêk tê. Me berî niha da zanîn ku pêwîste em heman hestên Mesîh yê di çarmîx de derbasî jiyana xwe bikin û pê re par vekin: *“heger yek ji av û giyan nehatibe, nikare têkeve bin serdestiya Yezdan”* (Jn. 3:5).

Dema em vê û 1 Pet. 1:23 bidin ber hev, diyar dibe ku piştî vaftîzmê mirov ji giyan di zê û bi riya Giyan/Sozê em gav bi gav ji nû ve têne dinyayê. Xelasî bi tenê ne ji ber vaftîzbûnê ye, ew encameke, xwe pêşkêşkirin (Eph. 2:8), bawerî (Rom. 1:5) û hêviyê ye (Rom. 8:24). Hinek caran tê gotin ku xelasî bi baweriyê pêk tê û çalakiyê mîna vaftîzbûnê bê wate û ne girînge. Lê belê James 2:17-24 dibêje ku ji hev cudakirina bawerî û çalakiyan tiştêkî şaşê û vê xalê ji me re ron dike. Wek mînak, tê nîşandan ku bawerîanîna bi Mizgînê bi riya çalakiyên ku encamên mîna vaftîzbûnê derdixin holê, baweriyê raste. *“însan ne tenê bi îmanê, bi çalkiyê jî pak dibe”* (James 2:24). Di hinek bûyerên vaftîzmê de, yê bawermend li riya xelasiyê pirsî; di bersivê de her demê vaftîzbûnê jî derbas dibû (Acts 2:37 ; 9:6 ; 10 ; 16:30). Ji ber vê yekê pêkanîna çalakiya vaftîzmê, nîşana baweriyê me ya bi Mizgîna xelasiyê ye. Wê çalakiya xelasiya me, di encam de ji aliyê Yezdan û mesîh ve were kirin. Lê belê pêwîste em çalakiyên ku bikaribin *“bersiva tobeya me bidin”* pêk bînin û baweriyê xwe bi wan bînin (Acts 26:20 krş. Mk. 16:15,16). Vaftîzma li gel Mesîh, dihêle ku Yezdan me bibexşîne. Di heman beşî de me anî ziman ku, em bi riya bawerî û poşmaniya xwe, dikarin xwe ji gunehên xwe bişon û pak bikin (Acts 22:16 ; Rev. 7:14 ; Jer. 4:14 ; Is. 1:16); û me da zanîn ku Yezdan weke kesê ku me

ji gunehan pak dike tê dîtin (*Ez. 16:9 ; Ps. 51:2,7 ; 1 Cor. 6:11*). Ev dide nişandan ku heger em di vaftîzbûnê de wezîfeya li ser milê xwe bi cîh bînin, wê Yezdan me ji gunehên me pak bike. Bi vê wateyê, çalakiya vaftîzmê gaveke girînge ku em bikaribin bi riya wê xwe bi Mizgîna ku bi gotina Wî pêşkêşî me bûye, girêdin.

GOTINA NAVBEND : Careke din Vaftîzbûn

Hinek kes, dema ku zarok bûne, bi riya pijiqandina avê an jî li dêreke din bi riya ketina nava avê hatine vaftîzkirin û ji ber ku ew vê yekê rengê jî vaftîzbûnê dibînin û di ser wan re derbas bûye, li hemberî nerîna ji nû ve vaftîzbûnê, bêdeng dimînin. Lê belê, berî vaftîzmê divê mirov baweriya xwe bi Mizgînê bîne û tobe (poşman bibe) bike (*Acts 2:38 ; Mk. 16:15,16*). Vaftîzm berî ketina nava avê, bi pêkanîna van pêwîstiyên dibe vaftîzm. *Mt. 28:19,20*, vaftîzmê bi daxuyaniyên Mesîh yê belavbûyî ve girê dide. Zarokek biçûk, nikare tobe bike û Mizgînê fêm bike; pijiqandina avê ne vaftîzbûn e.

Yekî ku di hawizê avê de avjeniyê dike, dikare xwe berde binê avê jî, lê ew ne vaftîzbûn e. Li ji ber ku ew kes, bi zanebûn bersiva Mizgîna rast nade. Heman tişt dikare, ji bo kesên ku baweriya xwe bi tiştên şaş tînin û xwe dixin avê jî bê gotin; ewana ketine avê, lê vaftîz nebûne.

Bi tenê yek rengê vaftîzmê heye, û ew jî bi riya ‘yek baweriyê’ ango zanista Mizgînê pêwîste. *“Mîna ku hûn ji bo hêviyê ku ji banga we derdikeve tene vexwendin, yek beden bi tenê (ango yek dêra rastîn) heye. Mîrzayê me Îsa yek, bawerî yek, vaftîzm yek, ... Yezdan yek” (Eph. 4:4-6)*. Hinek dibêjin ku tu girîngiya wê nîne ku em bawer bikin ka wê xelata me li bihûştê an jî li serzemînê bidin me, û pê bawerî ku du hêvî hene. Lê ev yek şaş e. Bi tenê *“yek Yezdan”* heye; ji ber vê yekê Îsa ne Yezdan e. Heger em di dema vaftîzbûnê de, di têgihîştina serdestiya Yezdan, cewherê Îsa û Yezdan û zanistên bingehîn de ne serkeftî bin, wê demê vaftîzbûna me ya yekemîn nayê hesibandin.

Yehyayê vaftîzvan, bang li wan dikir ku tobe bikin, di derbarê Îsa de hinek tişt jî wan re digotin, û însan (ji bo vaftîzkirinê) dixistin avê (*Mk. 1:4 ; Lk. 1:77*). Lê ew ne bes bû. *Acts 19:1-5*, diyar dike ku hinek jî wan kes ên ku ji aliyê Yehya ve hatin vaftîzkirin piştî mecbûr man ku careke din vaftîz bibin, ji ber ku wan bûyer baş fêm nekiribûn. Mîna kesên ku Yehya ew vaftîz kirin, em jî di vaftîzbûna xwe ya yekemîn de dikarin pê bihisin ku me tobe kiriye û emê ji nû ve dest bi her tiştî bikin. Dibe ku ev raman rast be, lê belê dîsa jî piştî fêmkirina tevayê taybetmendiyên ‘baweriya bi tenê’ em dikarin ‘vaftîzma (rastîn) bi tenê’ bi dest xwe ve bînin.

MIJAR 9 : PIRS

1. **Bêyî ku em vaftîz bibin, em dikarin bigihên xelasiyê?**
 - a) Belê
 - b) Na

2. **Wateya gotina 'Vaftîzm'ê çi ye?**
 - a) Dana ser milê xwe
 - b) Pişiqandin
 - c) Bawerî
 - d) Têhildan.

3. **Divê em kengî vaftîz bibin?**
 - a) Piştî têgihîştina Mizgîna rasteqîn û tobekirinê
 - b) Dema mirov zarok be
 - c) Piştî ku meyla mirov çû ser Încilê
 - d) Dema em bixwazin têkevin dêrekê.

4. **Em ji bo çi vaftîz dibin?**
 - a) Ji bo dêra ku me vaftîz dike
 - b) Ji bo gotina Yezdan
 - c) Ji bo Mesîh
 - d) Ji bo Giyanê Pîroz

5. **Piştî vaftîzmê çi dibe?**
 - a) Em dibin endamekî nijada Ibrahîm
 - b) Emê careke din guneh nekin
 - c) Em ji bo herdemê têne rizgarkirin
 - d) Gunehên me têne bexşandin.

6. **Hûn dixwazin vaftîz bibin?**
 - a) Belê
 - b) Na

10.1 XEBATA INCÎLÊ

Piştî vaftîzbûnê, divê em bibin xwediyê jiyaneke ku ji bedenê (maddîyatê) bêhtir, ji aliyê Giyan (manewîyat) ve were birêve birin û em 'semereya pîroziyê biafirînin' (Rom. 6:22 ; 8:1 ; Gal. 5:16,25). Ev yek bi riya gotina Yezdan ya di nava me de pêk tê (Jn. 15:7,8). Me dît ku em ji aliyê Giyan ve têne birêvebirin û Giyanê Yezdan di gotina wî de ye. Divê em di tevayê jiyana xwe de bi xebat û xwendina Încîlê, nêzikî Soz'ê bin. Ji bo têgihîştina soza Yezdan xebateke girîng û vaftîzbûn pêwîstiyên bingehînin. Divê em desturê bidin ku soz bandora xwe li ser çalakîyên me bike û jiyana me bi rê ve bibe. Vaftîzbûn, di perestîya Yezdan de bi tenê gaveke. Xetereke mezin di naskirina Încîl û zanistîya Mizgînê ya bingehî de heye ku dikare nehêle soz bandora xwe li ser me bike: em dikarin gotinan bixwînin, lê ew tu bandorê li ser me nakin (Binere. Beş 2). Ji ber vê yekê berî xwendina Nivîsên Pîroz, baştire ku mirov duayekê bixwîne: "*Çavê min veke ku ez ecêbên şerîeta te bibînim*" (Ps. 119:18).

Divê gotina Yezdan, xwarina me ya rojane be. Divê girêdan û daxwaza me ya ji bo wî, ji girêdan û daxwaza me ya ji bo tiştên bedenî zêdetir be: Hestên Eyub wiha bûn: "*Min ji xwarina xwe ya rojane bêhtir qîmet da gotinên devê te*" (Job. 23:12). Yeremya bi heman şeweyê (wiha dibêje): "*Gotinên te hatin dîtî û min ew xwarin; û gotina te ji min re bû kêfxweşî û şahîya mezin ya dilê min*" (Jer. 15:16). Ji ber vê yekê, heger em bixwazin ku jiyana me ya rojane bi rêkûpêk derbas be, divê em bi awayekî bi rêkûpêk Încîlê bixwînin. Serê sibehê, heger em 30 deqîqeyî li ser Încîlê bixebitin, emê di aliyê giyanî de xwe têr bikin û baştir bilivin. Adetên wiha, wê roja dadkirinê, bi qasî giraniya xwe, di rûmeta zêr de bin.

Meyleke xuristî ye ku em bi tenê hinek beşên ji bo xwe balkêş ji Nivîsên Pîroz bixwînin û yên din berdin. Ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê, Birayên li gel Mesîh, programekî xwendinê bi navê 'rêbera Încîlê' (hûn dikarin ji weşanvanê vê pirtûkê bixwazin) dîtine. Bi riya wê mirov dikare di salekê de, du caran Ahîda Nû, carekê Ahîda Kevin, ji serî heta dawî bixwîne. Û her wiha ji bo her rojê, hejmarê beşên ku mirov bixwîne jî dide.

Demê ku em her roj wan beşan bixwînin, emê bînin bîra xwe ku di wê kêliyê de bi hezaran bawermend mîna me heman beşan dixwînin û emê hêzê ji wan bistînin. Ji ber vê yekê, kengî em hev dû bibînin, emê pê bihisin ku girêdanek di navbera me de heye. Wê mijara axaftina me ya bingehî xwendina me be.

10.2 DUA

Ji bo pêşveçûnê, yek ji çalakiyên girîng jî dua ye. Li gora ku ji me re hatiye gotin, “*di navbera Yezdan û însan de yek qasid bi tenê heye, ku xwe ji bo herkesî pêşkêşkiriye*” ew jî Mesîh Îsa ye. Pavlus ji bo danasîna karûbarê Mesîh wiha diaxife: “*Ji ber vê yekê ez dixwazim ku însan bê dudilî...li her derê dua bikin (1 Tim. 2:5-8). “Ji ber ku Serrahibekî me heye ku mîna me di her aliyê jiyânê de hatiye ceribandin, lê guneh nekiriye. Û ew ne wiha ye ku di zêfîyên me de xwe nêzîkî me neke. Ji ber vê yekê, ji bo em bikaribin xwe bigihînin dilovaniya Yezdan, û alîkariya ji bo me pêwîst, divê em bi wêrekî xwe nêzîkî textê Yezdan bikin” (4:15,16).*

Mesîh Serrahibê me ye û ew duayên me pêşkêşî Yezdan dike. Ji bo ku em wezîfeya wî teqdîr bikin, tê xwestin ku em bi bawerî dua bikin. Divê em duayên xwe mîna ‘listeya daxwazan’ pêşkêşî Yezdan nekin. Hinek ji duayên girîng ev in, ku em berî xwarinê ji bo bereketa ku Yezdan daye me duaya spasiyê bikin, di rêwîtiya xwe de duaya mayîna li selametê bikin û her wiha.

Em di duayên xwe de tevayê pirsgirêkên xwe li ber Yezdan radixin û digihîjin aramiyê: “*Tevayê daxwazên xwe (tişteki hewqasî biçûk nîne ku mirov ji bo wî nikaribe lava bike) bi rîya dua û bi spasi pêşkêşî Yezdan bikin. Wê demê wê cemala Yezdan...dil û mêjiyê we biparêze*” (Phil. 4:6,7).

Heger ku duayên me li gora daxwaza Yezdan bin, ewê bersiva xwe bibînin (1 Jn. 5:14). Em dikarin daxwazên Yezdan, bi rîya xebata li ser gotinên wî binasin ku ew Giyan/Bîra Wî bi me dide nasandin. Ji bo vê divê xebata me ya li ser Încîlê fêrî me bike, em ji bo çî û bi çî awahî dua bikin. Bi vê sedemê (Yezdan dibêje) “*Heger...gotinên min li gel we bimînin, hûn çî bixwazin ewê ji bo we were kirin*” (Jn. 15:7).

Di Nivîsên Pîroz de gelek mînakên duakirina bi rêkûpêk hene (Ps. 119:164 ; Dan. 6:10). Di rojê de çend duayên spasiyê, û dua sibehê û êvarê jî yên herî bingeîn.

10.3 WA'Z

Piştî ku mirov Yezdanê rast dinase, yek ji imtîhanên herî giran ewe ku mirov di aliyê giyanî de dibe xweperist (egoîst). Dibe ku em ji têkiliya xwe ya bi Yezdan re pir têr bibin û tevayê xebata xwe ya Încîlê û manewiyata xwe di nava xwe de bihêlin û ji bîr bikin ku van tiştan bi kesên din re –bi rêheval, bawermend û dinyaya li derdûdora xwe re- par vekin. Gotina Yezdan û Mizgîna rasteqîn ya di wê de, mîna lembe an jî ronahiyekê ye ku di tariyê de vêdikeve (Ps. 119:105 ; Prov. 4:18). Îsa destnîşan kiriye ku xwediyên wê ronahiyê, wê nikaribe wê têxe bin sîtilekê (teşt) û wê eşkere nîşanî her kesî bide (Mt. 5:15). Îsa wiha got, “*ez ronahiya dinyayê me*” (Jn. 8:12) ; *Ji ber ku hûn li hel Mesîh vaftîz bûne, “hûn jî ronahiya dinyayê ne”*

(Mt. 5:14). Mesîh wiha domand: “bajarê ku li serê gir were avakirin, nayê veşartin”.

Heger em jiyana xwe li gora Mizgîna rasteqîn bidomînin, wê pîroziya me diyar be. Emê nikaribin veşêrin ku em ji bo hêviya serdestiyê cûda bûne û em ji riya dinyaya wan ya (maddî) derketine.

Divê em bi rê û rêbazeke zerîf, zanebûna rastiyê li gel herkesê ku derkeve pêşiya me par vekin. Em dikarin axaftinên xwe li ser mijarên giyanî bikin, em dikarin bi endamên dêrên din re têkevin gotûbêja ramanî, em dikarin belavokan belav bikin, reklamên biçûk bidin medyaya xwe ya herêmî û bi riya van çalakiyan desturê bidin çirisandina ronahiya xwe. Divê em xwe ji bawermendên din cûda nekin. Her yek ji me xwediyê berpirsariyeke taybetî û şexsî ye. Birayên li gel Mesîh, li gora komên din di aliyê tevgerê de bê hêz in. Her yek ji me dikare bi aboriya xwe ya şexsî li gora taqeta xwe kar bike.

Yek ji riyên herî serkeftî ji bo Wa'zê ewe ku em baweriya xwe ji malbat û hevalê xwe re eşkere bikin û derbasî nava wan bibin. Yên ku hevalê wan ne bawermend bin, divê baweriya xwe bi wan bidin naskirin. Piştî ku mirov ev yek pêk anî, ne di cîh de ye ku mirov mijarê her demê di rojevê de bihêle û zorê li wan bike.

Kesên ku bi riya zorê vegevin, daxwazên Yezdan nasnakin. Wezîfeya me ewe ku em şahidiya rastiyê bikin. Ji bo vê şahidiyê em xwediyê berpirsariyeke mezin in (Ez. 3: 17-21). Heger Mesîh di pêvajoya jiyana me de were, “wê ji her du kesên li derve, yek biçê û yek bimîne” (Lk. 17:36). Heger me ji malbata xwe û hevalên xwe re behsa hatina Mesîh ya duwemîn nekiribe, wê hatina wî ecêb be.

10.4 JIYANA KOMELAYETÎ

Em di vê xebatê de, heta niha li ser berpirsariya xwe ya şexsî û giyanî rawestiyar in. Lê belê em di sa jî berpirsarin ku li gel civatekê kom bibin û hêviya xwe bi wan re par vekin. Divê ev hêvî her demê li gel me peyda bibe. Me nîşan da ku piştî vaftîzmê, me li çolê dest bi rêwîtiya ber bi serdestiyê ve kir. Pêwîstiya ku em têkiliyê li gel rêhevalên xwe deynin, êdî tiştêkî xwezayî ye. Em rojên dawîn ji rojên berî hatina Mesîh dijîn. Ji bo ku em di vê demê de bikaribin heq ji ceribandînan tevlihev derkevin, pêwîstiya me pê heye ku em li gel yê di rewşa xwe de hestên xwe par vekin: “em dest ji hatina gel hev bernedin...Lê belê, (di derbarê hatina duwemîn de) divê em bibînin ku ew roj nêzik dibe û em dilê hev xweş bikin” (Heb. 10:25 ; krş. Mal. 3:16). Ji ber vê yekê divê bawermend, xebata Încîlê bi hev re par vekin, beşdarî ayîna

par vekirina hestan, û çalakiyên wa'zê bibin. Ji bo vê jî divê bi riya nameyan û serdanan têtikiya di navbera xwe de bi hêz bikin.

Ji bo hêviya Serdestiyê ya mezin, ji dinyayê gazî me tevan kirin. Gotina 'Pîroz' tê wateya 'kesê ku gazî wî kirine' û li şûna çend bawermendên dema derbasbûyî, tê wateya tevayê bawermendan. Di Încîla Ingilîzî de, gotina Yunanî ya ku bi wateya 'dêrê' hatiye wergerandin, dixwaze bibêje 'komik' ku bixwe tê wateya 'komcivîna kesên ku gazî wan bûye –ango bawermend-'. Ji ber vê yekê 'dêr' ji avahiya kombûna mirovan bêhtir, tê wateya koma bawermendan. Ji bo ku pêşî li bikaranîna şaş ya vê bêjeyê were girtin, Birayên li gel Mesîh dixwazin, dêra xwe mîna 'komik' bi nav bikin.

Heger li bajarekî an jî li herêmekê, çend bawermend hebin, divê cihekî peyda bikin ku bikaribin bi awayekî bi rêkûpêk lê bicivin. Ev çîh dikare mala bawermendekî an jî saloneke kirêkirî be. Komikên Birayên li gel Mesîh, li çar hêlên dinyayê, li navendên civînan, li salonên hotêlan yên ji bo konferansan, li salonên ku bixwe avakirine û li malên taybetî tene cem hev. Armanca vê komikê ewe ku bi riya xebata Încîlê endamê xwe bi hêz bike, bi riya wa'zan bihêle ku stêrka wan biçirise ku ew bikaribin şahidiya dinyayê bikin. Programa bingeîn ya komikeke Birayên li gel Mesîh dikare wiha be:

YEKŞEM	11 : 00	Ayîna Par vekirina Nan
	18 : 00	Xebata Wa'zê Ya Ji Bo Her kesî
ÇARŞEM	8 : 00	Xebata Încîlê

Komik beşek ji malbata Yezdan e. Di komikê de endam girêdayî hev in û her endam li hemberî yê din xwedî berpirsariyê ye, û hişyare. Mesîh bixwe mînaka berbiçav ya vê têtikiyê ye. Li beramberî mezinatiya wî ya giyanî, dema ku wan di nava xwe de gotûbêja kesê herî mezin dikirin, wî lingên murîdan dişûştin û xizmeta her kesî dikir. Îsa fermoyî me kir ku em wî ji bo xwe bikin nimûne (Jn. 13:14,15 ; Mt. 20:25-28).

Ji ber ku xelatên Giyanê Pîroz bi paşve hatine kişandin, tu wezîfeya 'rîsîpiyan' nemaye: *"ji ber ku yek mamostayê we heye û ew jî Mesîh e; hûn tev bira ne"* (Mt. 23:8). Ji ber vê yekê Birayên li gel Mesîh, bêyî ku rewşa hev ya dinyayî bidin ber çavên xwe, ew dema ku behsa dikin, ji hev re dibêjin, 'bira' û 'xwişkê'. Gotina van gotinan divê di nava bawermendan de weke nîşandana rûmetê be. Wê kesên ku dixwazin bidin pey gotina Yezdan, rûmeteke mezin bidin van şîretên bawermendan. Dîsa jî wê ew (li gel xwe) ta ku gotina Yezdan bi awayekî raste rast derbasî nava wan bibe, şîretên bawermendên din bistînin.

Zanîna ku di komcivînê de were pêşkêş kirin, wê li ser gotina Yezdan be. Ji ber vê yekê, her kesê ku di komcivînê de, axaftinên ji bo her kesî vekirî pêşkêş bike, bi navê Wî diaxife û Yezdan tîne ziman. Ji ber ku Yezdan zilame, bi tenê bira dikarin gotinên wî di komcivînan de bibêjin.

1 Cor. 14:34 wiha dibêje: *“Bera jinên we di komcivînan de bêdeng bin; ji ber ku destur nîne ku ew biaxifin”*. 1 Tim. 2:11-15 ji bo sedema vê yekê me ber bi bûyerên bexçeyê bihûştê ve dibe. Ji ber ku Hewa Adem fêrî guneh kir; divê jin niha jî dersan nedin mêran. Yezdan ji ber vê yekê Adem berî Hewa afirandiyê: *“Serê jinê zilam e”* (1 Cor.11:3). Ji ber vê yekê di mijarên giyanî de, divê zilam jinê birêve bibe. Ji ber vê yekê, *“bera jin bi bêdengî fêr bibe. Lê ez desturê nadim ku ew dersan bide zilaman û serdestiyê li zilam bike. Bera jin bêdeng be. Ji ber ku pêşî Adem û piştî Hewa hat afirandin. Adem nehat xapandin, lê jin xapiya û guneh kir. Lê heger jin bi bêdengî, giranî û bawerî jiyana xwe bidomîne, wê bi anîna zarokan (bi Yunanî ‘bi rîya’) bigihîje xelasîyê”* (1 Tim. 2:11-15).

Diyare ku Încîlê wezîfeyên ji hev cûda dane ser milê jin û zilamên bawermend. Ji bo jinê hinek tişt hatine fermokirin: *“zewac, anîna zarokan û birêvebirina malê”* (1 Tim. 5:14). Ev dide nîşandan ku çerçoveya xebata wan ya giyanî, mal e. Ji ber vê yekê, di nava komikê de xebata vekirî ji zilaman re hatiye hiştin. Bawerîya wekheviya di nava jin û zilam de, li gel teoriya mirovî (humanîst) di nava nakokiyêke mezin de ye. Ji bo vê yekê jinên ku xwe dane wezîfeya xwe, dikarin bibêjin ku ew ji aboriya malbatê dikarin ji xwe re kincên Uniseks bikin û ew bi her awahî mîna zilamê xwe ne. Li vê dinyaya materyalist û egoîst, ji bo tenduristiya hestan, xwedîkirina zarokan pêwîstiyêke, lê belê ew jî êdî mîna zoriyekê tê dîtin. Bawermendên rast divê xwe ji van ramanên sedsalê bi dur xin. Divê mêr, li ser jinê nebe mîrza (xwedî) lê belê mîna ku Mesîh ji me hez dike, ji wê hez bike (Eph. 5:25).

“Zilamno, bi wan re (bi jinên xwe re) li hev bikin (li gora ku hûn gotina Yezdan dipejirînin, li hemberî jinên xwe jî çavvekirî bin). Rûmetê bidin jinên ku hebûnên bê taqet in, ji ber ku ew hevpar û mîratxwîrên jiyane ne, û Yezdan ev jiyane pêşkêşî me tevan kiriye” (1 Pet. 3:7).

Bi bêjeyên (manewî) giyanî, vafîzma li gel Mesîh jin û mêr dike mîna hev (Gal. 3:27,28 krş. 1 Cor. 11:11). Lê belê ev yek dîsa jî ayeta ku dibêje *“zilam serê jin e ye”* (1 Cor. 11:3) di meseleyên kiryarî û giyanî de, hem di nava malbatê de û hem jî di nava komikê de vala dernaxîne.

Ji bo nîşanê bidin ku ev prensîb hatiye fêmkirin, divê jinên bawermend li hemberî birayê ku li ser gotina Yezdan dersan dide, serê xwe girê din. Ev tê wateya ku divê, di tevayê civînen komikê de, şefqe an jî desmalek (ji aliyê jinan ve) were bikar anîn. Divê cûdabûna di navbera rolên jin û mêr de, bi cûdabûna şiklê porê wan were nîşandan (1 Cor. 11:14,15). *“Jina ku bê sergirêdan dua bike, serê xwe (ango mêrê xwe – a.3) biçûk dike: ji ber ku ferqa jineke wisa ji ya jinekê ku serê xwe kur kiribe, nîne. Heger jin serê xwe ne nuximîne, bera kur bike. Lê heger kurkirina por ji bo jinekê şerm be, wê demê bera serê xwe girê de... Ji ber vê yekê, divê jin, mîna nîşana ku ew*

dibin serdestiya mêrê xwe de, bibe xwedîya desmalekê” (1 Cor. 11:5,6,10 A.V. têbinî).

10.5 PARVEKIRINA NAN

Li gel kirina dua, û xwendina Încîlê, ji bo biranîna pêşkêşkirina Mesîh, divê em bi awayekî bi rêkûpêk beşdarî parvekirina nan û vexwarina meyê bibin. Ev fermana Mesîh bixwe ye û pêkanîna wê pir girînge. Îsa fermoye kir: *“Ji bo biranîna min wê bikin” (Lk. 22:19)*. Daxwaza wî bû, ku tevayê alîgirên wî, heta hatina wî ya duwemîn beşdarî parvekirina nan û vexwarina meyê bibin (1 Cor. 11:26 ; Lk. 22:16-18).

Nan, sembola bedena Mesîh e ya ku di çarmîx de hatiye pêşkêşkirin, û mey jî sembola xwîna wî ye (1 Cor. 11:23-27). Bawermendên destpêkê, ev ayîn herdemê (Acts 2:42,46), bi ihtîmaleke mezin di heftiyê de rojekê (Acts 20:7) bi cîh anîne. Heger em bi rastî ji Mesîh hez bikin, emê fermanên wî bi cîh binin (Jn. 15:11-14). Heger em bi wî re xwediyê têkiliyeke kesani bin, emê li gora daxwaza wî, roja qurbankirina wî bi bîr binin û bi biranîna wê rizgariya mezin ya ku wî biser xist, hêzê bidin xwe. Li ser êşên ku wî di çarmîx de kişandin, emê bifikirin, û dema ku em serpêhatiyên xwe bidin ber yên Mîrzayê xwe Îsa wê yên me bê wate bimînin.

Parvekirina nan, di bingeha xwe de ayîneke biranînê ye. Di encama pêkanîna wê de, tişteki bi sêhr nabe. Ew mîna Yortiya Fisihê ye (Werederbasbe) ya ku dibin hukmê şerîeta Musa de dihate pêkanîn (Lk. 22:15 ; 1 Cor. 5:7,8). Ew ji bo bi biranîna xelasiya ji Misrê dihate pêkanîn, ku birêberiya Musa di Deryaya Sor de çêbûbû. Ayîna parvekirina nan, me dibe dema xelasbûna ji guneh, ya ku di çarmîxê de dest pê kir û bi vaftîzbûnê em bi wê ve hatin girêdan, ya ku bi riya Îsa pêk hat.

Ji ber vê yekê, divê pêkanîna vê fermanê, bi daxwaz û rîza me be. Bi awayekî fizîkî rahiştina nan û meyê ji bo me hezkirina Mesîh diafirîne û her tiştê ku li ser xelasiya me hatiye gotin, careke din tene ber çavên me. Di heftiyê de carekê parvekirina nan, nîşana giyanekî bi rêkûpêk e. Heger mirov nikarinê vê çalakiyê li gel hev bawermendên xwe bike, divê mirov bi serê xwe bike. Pêwîste em nehêlin ku tu behane li pêşiya pêkanîna vê çalakiyê bibin kelem. Divê em her tiştî bikin, ji bo ku em bikaribin nan û meya xwe bixwe re bibin ayînê. Tunebûna van pêwîstiyên jî lazime li pêşiya me nebe kelem ku em Mesîh bi bîr binin. Îsa, *“berhema mêwê” (Lk. 22:18)* bikar anî û ji ber vê em jî meya tiriye sor bikar tînin.

Bi cîh anîna simbolên êş û qurbandayîna Mesîh, ji bo jin an jî zilamekî şanaziya herî giranbûha ye. Bêyî zanîna rastiyên di derbarê wî de, heger mirov xwe bike şîrkên wan, nêzîkî kufrê ye: *“Her cara ku hûn ji vî nanî*

bixwin û ji vê tasê vexwin, hûnê mirina Mîrzayê me Îsa nişan bidin...Ji ber vê yekê, herçê yê ku bi awayekî ne di cih de vî nanî bixwe, û ji tasa Mîrzayê me Îsa vexwe, wê li dijî bedena Mîrzayê me Îsa û xwîna wî tawanbar be” (1 Cor. 11:26,27). Ji ber vê yekê divê ayîna parvekirina nan li cihekî wiha çêbibe ku tiştek bala mirov neqşîne ser xwe û ramana mirov belav neke. Ew dikare sibehê zû, an jî derengî şevê, di odeya razanê de were pêkanîn. Her wiha em vê şîretê jî li we dikin: “Bera kesayet destpêkê xwe di ber çavan re derbas bike û (bi nefsbîçûkiya xwe ceribandîne) piştî nan bixwe û ji tasê vexwe (1 Cor. 11:28). Bi vî awahî emê ramana xwe li ser qurbandana Mesîh kur bikin. Bi riya pêkanîna wan, emê zanebûna xwe ya li ser Mesîh jî di ber çavan re derbas bikin.

Ji bo parvekirina nan, rêza pêkanîna çalakiya ayîne wiha ye:

1. Bi riya dua, ji Yezdan tê daxwaz kirin ku ew civînê pîroz bike û Ew çavên me ji gotina Wî re veke; pêwîstiyên bawermendên din bîne bîra me; bi taybetî jî mîna ku di kesayeta Mesîh de tê dîtin, ji bo hezkirina Wî tê lavakirin û ji bo hinek mijarên taybet dua têne kirin.
2. Li gora ku di ‘Rêbera Încîlê de’ hatiye nişandan, divê beşên Încîlê yê ji bo wê rojê werin xwendin.
3. Li ser dersên ku tu ji wan bigrî, bifikire an jî hinekî ji ‘wa’zê bixwîne. Li ser van beşan xebateke Încîlê wê me bigihîne armanca ayîna me û bîranîna Mesîh.
4. 1 Cor. 11:23-29 bixwîne.
5. Hinekî bêdeng bimîne û xwe di ber çavan re derbas ke.
6. Ji bo nan dua bike.
7. Nan tê parvekirin û her kes perçeyekî biçûk jê dixwe.
8. Ji bo meyê dua tê kirin.
9. Qurtek ji meyê tê vexwarin.
10. Dua girtinê.

Divê ayîn hinekî ji seetekê dirêjtir bidome.

10.6 ZEWAC

Emê di destpêka vê mijarê de li ser rewşa wan kesan rawestînin yê ku di dema vaftîzbûnê de fer in (bekar). Di Mijar 5:3 de me dît ku ji bo bawermendên vaftîzbûyî zewac pêwîstiyêke. Çend beş li ser mînakên mîna Îsa , Pavlus û yê mîna wan hene ku xwe dane karên Yezdan û fer (bekar) mane an jî bi kêmanî fikirîne ku nezewicin û fer bimînin (1 Cor. 7: 7-9, 32-38 krş. 2 Tim. 2:4 ; Mt. 19: 11,12,29 ; Ecc. 9:9). *“lê belê dîsa jî heger tu*

bizewicî tu guneh nakî” (1 Cor. 7:28). Piraniya hewariyan zewicîbûn (1 Cor. 9:5) û zewac li gora ku Yezdan çerçoveya wê daniye, gelek fêdeyên giyanî û bedenî dighîne mirov. “*Bera zewac di nava her kesî de bi rûmet be û (bikaranîna) textê xewê bê leke be (Heb. 13:4)*. Heger di pêkanîna meseleyên giyanî de wezîfeyeke bilind nedabe ser milê xwe, (Yezdan got ku) “*nebaşê zilam bi tenê bimîne...*” ; ji ber vê yekê Yezdan zewac afirandiye (Gen. 2: 18-24). Bi vî awahî, “*her kesê ku zewceyeke baş bibîne, wê tişteki baş bibîne; û wê salameta Yezdan bistîne...zewceyeke bi basîret ji Mîrzayê me Yezdan e*” (Prov. 18:22 ; 19:14).

Ev ayet têne wê wateyê ku têtikiya cinsî, derveyî zewacê zinê ye. Li ser zinê (têtikiya cinsî ya di navbera kesên ne zewicî de) xapandina hev (têtikiya cinsî ya di navbera kesên ku her yek ji wan bi hinekî din re zewicîne) û bê exlaqîya cinsî, Ahîda Nû, pir daxuyaniyan dide. Hema hema di her nameyekê de ev mijar derbas dibe. Yên li jêr, bi tenê çend nimûne ne: Acts 15:20 ; Rom. 1:29 ; 1 Cor. 6:9-18 ; 10:8 ; 2 Cor. 12:12 ; Gal. 5:19 ; Eph. 5:3 ; Col. 3:5 ; 1 Thes. 4:3 ; Jude 7 ; 1 Pet. 4:3 ; Rev. 2:21.

Gen. 2:24 gunehê homoseksueliyê tîne ziman. Nêta Yezdan ewe ku jin û mêr bizewicin û bi hev du ve werin girêdan. Yezdan, ji bo Adem mîna alîkar, ne mêrekî din, lê belê jinek afirand. Di Încîlê de, têtikiya cinsî ya di navbera mêran de, gelek caran hatiye şermezarkirin. Ev yek ji wan gunehan bû, ku bû sedema tunekirina bajarê Sodomê (Gen. Beşên 18.û 19.). Hewarî Pavlus dibêje, yê ku çalakîyên bi vî awahî bidomînin, wê xezeba Yezdan bikşînin ser xwe û wê ji serdestiya Yezdan bêne qewitandin (Rom. 1:18-32 ; 1 Cor. 6:9,10).

Heger mirov careke bi tenê ketibe gunehêkî wiha, mirov li derveyî alîkariya Yezdan namîne. Yezdan dibexşîne; bi riya yê ku bexşandina wî dijîn, mirov rûmeteke tijî hezkirin pêşkêşî wî dike (Ps. 130:4). Di komika li Korîntê de, para playboyên tobekar pir e: “*Hinek ji we wiha bûn, lê hûn (di vaftîzmê de) hatin şuştin, hûn hatin pîroz kirin, hûn bi navê Mîrzayê me Îsa (bi riya vaftîzmê) hatin pakkirin*” (1 Cor. 6:9-11).

10.7 HEVPARÎ

Gotinên Yunanî yê ku bi wateya ‘hevparî’ û ‘yekbûna hestan’ hatine wergerandin, di bingeha xwe de têne wateya xwedantiya yek tiştî, an jî yekîtiya hevpar. ‘Yekbûna hestan’ girêdayî gotina ‘parvekirinê’ ye. Bi riya naskirina zanîna Yezdan û bi riya mayîna li gel Yezdan û ‘Mesîh’ em bi gelek kesên din re hevpar in. Ev hevpariya li gel bawermendên din berpirsariyeye mezin dide ser milê mirov. “*Başî û parvekirinê (ango hevpariyê) ji bîr nekin*” (Heb. 13:16). Phil. 1:5, behsa “*hevpariya me*

(hevkarîya me) ya di Mizgîne de” dike. Ji ber vê yekê, bingeha hevparîya me, zanîna Încîlê ye. Hevparîya di nava bawermendan de, ji hevparîya di nava rêkxistin û civatan de mezintir e. Ji ber vê hevpariyê, ew ji bo ku li gel hev bin, û biçin serdana bawermendên li seriyekî din, rêwîtiyên demdirêj didin ber çavên xwe. Û li her cihên ku peyda dibin, divê postê û telefonan bikar bînin.

Pavlus behsa, “hevparîya giyan” (Phil. 2:1) dike. Ev di Giyan/Gotina Yezdan de tê ziman ku Giyan/Hişê Yezdan hevparîya di nava koma me de ye.

Yek ji mînakên hevparîya me, pêkanîna ayîna parvekirina nan e. Bawermendên destpêkê, “di zanîna qasidan de, di parvekirina nan û dua de, hevparî bi sebateke mezin domandin...bi kêfxweşiyê ji dil û bi pakî... nan par vedikirin” (Acts 2: 42,46). Tiştên ku em bi hev re par vedikin, divê me “bi pakiyê ji dil” bi hev du ve girê bidin. “Ma ne em bi tasa spasiyê ya ku em pê spasiya Yezdan dikin, dibin hevparê xwîna Mesîh? Her çiqasî em pir bin jî, em yek beden û yek nanin. Ji ber ku em tev hevparên wî nanê bi tenê (ango Mesîh) ne (1 Cor. 10: 16,17).

Ji ber vê yekê, em berpirsyarin ku simbolên qurbandana Mesîh li gel “hevparên wî nanê bi tenê” par vekin. Kesên ku piştî têgihîştina rastiyê li gel Mesîh vaftîzbûne, di vê rewşê de ne. Derveyî van kesan, bi hinekî din re parvekirina van sembolan karekî bê wateye.

Hevparîya me ya li gel Yezdan, Mesîh û bawermendên din, ne girêdayî li hevhatina me ya di çerçoveya ‘yek baweriyê’ de ne. Divê awayê jiyana me, li gora daxwaza wan be. “Yezdan ronahî ye û tarî li gel wî nîne. Heger em bibêjin ku em hevparên wî ne û em di tariyê de bimeşin, em derewan dikin û rastiyê pêk naynin. Lê belê mîna ku Ew di ronahiyê de ye, heger em jî di ronahiyê de bimeşin, emê hevparên hev bin; û wê xwîna Kurê Wî Mesîh Îsa me ji her gunehî pak bike” (Jn. 1: 5-7).

Li ser hevpariyê yek ji beşên herî vekirî di 2 Cor. 6: 14-18 de ye: “Bi kesên bê bawerî re nekevin bin hukmekî ne wekhev: Ma wê çi hevparî di nava rast û ne rast de, û wê çi yekîti di nava ronahî û tariyê de hebe?... Yezdan wiha dibêje: ‘Ji ber vê yekê ji nava wan (bê baweran) derkevin û cuda bibin’...’û ezê we ji bo (mala xwe) bipejirînim û ji we re bibim Bav; û hûnê jî bibin keç û kurên min’ dibêje Mîrzayê me Yezdanê ku Serdestê Her Tiştî ye”.

Me nîşan da ku Gotina Yezdan ronahî ye. Ev ayet didin nîşandan ku pêwîste em nebin hevparê dêrên ku mirov fêrî doktrînen şaş dikin. Her wiha didin nîşandan ku pêwîste em bi nezanan re nezewicin û em ji riyên dinyayê birevin. Bi riya cûdabûna ji dinyayê, em dikarin li gel kesên mîna xwe –li gel xwişk û birayên xwe- mîna beşên malbatekê, bibin xwediyê şanaziya kur û keçên Yezdan. Bi tenê yek dêra rastîn heye (Eph. 1:23) ku piştî xwe dide,

yek hêviyê, yek Yezdanî, yek vaftîzmê û ‘yek îmanê’ ango pişta xwe dide rêze zanîna yek îmanê (Eph. 4:4-6). Mirov nikare di carekê de hem bibe xwediyê vê ‘yek bedenê’ û hem jî bibe hevparê rêkxistinên din yên ku bawerîya wan bi îmana rast nîne. Tu girêdana ronahiyê bi tariyê re nîne. Heger em bixwazin bibin hevparê tariyê, emê xwe di tariyê de îlan bikin. Heger em rûmeta zanîna bizanibin, ew zanîna ku di Nivîsên Pîroz de hatiye ziman, emê bibînin ku tu hevparî di navbera navê Xirîstiyaniyê û bawermendên zanîna şaş de û di navbera Yezdan û ateîstan de nîne.

Heger we bala xwe baş dabe vê xebatê, we yê dîtibe ku têkiliya me ya bi Yezdan re ne nîvçe ye. An em bi riya vaftîzmê li gel Wî, li gel Mesîh in, an jî em li derveyî wî ne. An em bi riya têgihîştin û pêkanîna zanîna rast, di ronahiyê de ne, an jî em di tariyê de ne. Mirov nikare bi carekê de meyla her dû nerînên dijber bike.

Zanêbûna di derbarê van tiştan de, me li hemberî Yezdan dike xwedî berpirsyarî. Em ne mîna zîlamê kolanê ne, û em nikarin mîna kesên dinyayê tenê bi jiyana xwe ya rojane re mijul bibin. Yezdan çavdêriya jiyana me dike. Hem ew Mîrzayê me Îsa û hem jî tevayê bawermendan ji we dixwazin ku hûn biryareke rast bidin. Mîna Yezdan û Îsa emê jî ji bo we – mîna ku Wî kurê xwe jî bo me pêşkêşî mirinê kir- her alîkariya ku ji dest me were pêşkêş bikin. Xelasiya we girêdayî têgihîştina vê hêviya mezine ku niha ji bo we tê pêşkêş kirin. Lazime hûn bi îradeya xwe ya azad biryarê bidin. Ji kerema xwe re biryara vaftîzbûnê û meşa di vê riyê de bidin. Heger hûn ji bo navnîşana li ser pirtûkê binivîsînin, emê kêfxweş bibin û alîkariya we bikin.

MIJAR 10 : PIRS

1. ‘Pirozî’ tê çi wateyê?

- a) Mirov têkiliyên xwe li gel bê baweran çêneke
- b) Mirov ji guneh dur bikeve û berê xwe bide zanîna Yezdan
- c) Mirov biçe dêrê
- d) Mirov başiyê bi kesên din bike.

2. Di derbarê ‘Parvekirina Nan de’ kîjan hevokên jêrê rast in?

- a) Divê em hema hema heftiyê carekê wê çalakiyê pêk bînin
- b) Divê em wê di dema cejna Fisihê de, salê carekê pêk bînin
- c) Nan û mey, dibin beden û xwîna Îsa
- d) Nan û mey sembola beden û xwîna Îsa ne.

3. Di derbarê zewacê de, kîjan hevokên jêrê rast in?

- a) Divê em bi tenê bi bawermendên rast re bizewicin
- b) Ji bo bawermendan, hev berdan dikare maqul were dîtin
- c) Bawermendekî/e ku bi yekî/e bê bawerî re zewicîbe, divê ji bo domandina zewacê kedeke mezin bide
- d) Di zewacê de zilam temsîla Mesîh û jin jî ya bawermendan dike.

CARELINKS, PO BOX 152, MENAI NSW 2234
AUSTRALIA

WWW.CARELINKS.NET EMAIL: INFO@CARELINKS.NET